

T.C.  
ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê EDEBÎYATA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind



TESEWIF DI DÎWANA ŞEYDA DE

Nurettin ERTEKİN

161302101

Şêwirmendê Tezê  
Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD

BÎNGÖL – 2018

T.C.  
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi



ŞEYDA'NIN DİVANINDA TASAVVUF

Nurettin ERTEKİN  
161302101

Tez Danışmanı  
Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD

BİNGÖL - 2018

## NAVEROK

<b>NAVEROK</b> .....	<b>iii</b>
<b>TESEWIF DI DÎWANA ŞEYDA DE</b> .....	<b>vii</b>
<b>KURTE</b> .....	<b>vii</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>viii</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>ix</b>
<b>KURTEBÊJÎ</b> .....	<b>xiii</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>2</b>
<b>Tesewif û Wêje</b> .....	<b>2</b>
<b>Zimanê Wêjeya Tesewifê</b> .....	<b>4</b>
<b>Klasîkên Tesewifê</b> .....	<b>6</b>
<b>Edebiyata Kurdî û Tesewif</b> .....	<b>7</b>
Tesewif Di Edebiyata Kurdî de .....	<b>8</b>
<b>Mela ‘Ebdul’ ezîzê Bitlîsî</b> .....	<b>10</b>
Dîwana Mela ‘Ebdul’ ezîzê Bitlîsî .....	<b>12</b>
Hin Taybetiyên Dîwanê.....	<b>14</b>
<b>Armanca Tezê</b> .....	<b>15</b>
<b>Rêbazên Amadekirina Tezê</b> .....	<b>16</b>
<b>Çavkaniyên Sereke Yên Tezê</b> .....	<b>17</b>
<b>BEŞA YEKEM</b> .....	<b>19</b>
<b>1 TESEWIF</b> .....	<b>19</b>
<b>1.1 Tesewif Çi Ye?</b> .....	<b>19</b>
<b>1.2 Peyva Sofî</b> .....	<b>23</b>
1.2.1 Rayeka / Îştîqaqa Bêjeya Sofî û Tesewifê.....	<b>23</b>
1.2.2 Pênaseyên Tesewifê .....	<b>26</b>
1.2.3 Pênaseyên Hin Mûtesewifan .....	<b>27</b>
1.2.4 Armanca Tesewifê .....	<b>28</b>
<b>1.3 Peydabûna Tesewifê Di Îslamê de</b> .....	<b>28</b>
1.3.1 Terîqeta Neqşebendîyye.....	<b>30</b>
<b>BEŞA DUWEM</b> .....	<b>38</b>
<b>2 TESEWIF DI DÎWANA ŞEYDA DE</b> .....	<b>38</b>
<b>2.1 Terîqeta Şeyda</b> .....	<b>38</b>
<b>2.2 Murşid/Şêxên Şeyda</b> .....	<b>39</b>

2.2.1	Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) .....	40
2.2.2	Şêx Fethullah Werqanîsî (q.s.) .....	41
2.2.3	Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) .....	42
<b>2.3</b>	<b>Şêx/Murşidê Kamil.....</b>	<b>44</b>
<b>2.4</b>	<b>Îrşad û Cûreyên Îrşadê.....</b>	<b>46</b>
2.4.1	Îrşada bi Nezer/Nêrîn .....	46
2.4.2	Îrşada bi Sohbet .....	48
2.4.3	Îrşada bi Xizmet.....	49
<b>2.5</b>	<b>Taybetmendiye Mursid .....</b>	<b>50</b>
2.5.1	Nûnertiya Şêx .....	50
2.5.2	Îta’eta Şêx .....	51
2.5.3	Baweriya bi Şêx .....	51
2.5.4	Feyza Şêx.....	52
2.5.5	Hêviya ji Şêx.....	53
<b>2.6</b>	<b>Adabên Terîqetê.....</b>	<b>54</b>
2.6.1	Piştî Wefata Şêx Dewama Bandora Şêx .....	55
2.6.2	Rabîte.....	56
<b>2.7</b>	<b>Evîna Pêxember .....</b>	<b>56</b>
<b>2.8</b>	<b>Evîna Rêberê Terîqetê.....</b>	<b>60</b>
<b>2.9</b>	<b>Hal û Meqam Di Helbestên Şeyda De .....</b>	<b>61</b>
<b>2.10</b>	<b>Hal û Bêjeyên Hal.....</b>	<b>62</b>
2.10.1	Mehebbet (Hezkirin) .....	63
2.10.2	Şewq (Hewes).....	65
2.10.3	Uns (Hogirî).....	67
2.10.4	Celal (Mezinantî) .....	68
2.10.5	Cemal (Delalî).....	69
2.10.6	Kemal (Gihîştî) .....	69
2.10.7	Qebd (Wergirtin).....	70
2.10.8	Best (Berfirehî) .....	70
2.10.9	Sekir (mestî).....	70
<b>2.11</b>	<b>Meqam û Bêjeyên Meqaman .....</b>	<b>71</b>
2.11.1	Tewbe (Poşmanî) .....	72
2.11.2	Zuhd (Dest Jê Berdan) .....	75
2.11.3	Sebr (Aramî) .....	77
2.11.4	Rida (Qayilbûnî) .....	78
2.11.5	Şukur (Spasî).....	79
2.11.6	Îhsan (Qencî).....	79
2.11.7	Fena (Qediyayî) .....	79
2.11.8	Beqa (Sermedî) .....	80
2.11.9	Îxlas (Dilsozî) .....	80
2.11.10	Sidq (Bawerî).....	81
2.11.11	Xewf (Tîrs) .....	81
2.11.12	Reca (hêvî).....	83
2.11.13	Qurb (Nêzikayî) .....	84
<b>2.12</b>	<b>Rêberên Terîqetan Di Helbestên Şeyda De .....</b>	<b>85</b>
2.12.1	Hezretî Ebî Bekris’ siddîq (r.x.l.).....	87

2.12.2	Hezretî ‘Elî Bin Ebî Talib (r.x.l.) .....	87
2.12.3	Selmanê Farisî (r.x.l.).....	88
2.12.4	Qasim Bin Mûhemmed Bin Ebî Bekris’siddîq (r.x.l.) .....	88
2.12.5	Ce’ferî Sadiq Bin Îmam Mûhemmed Baqir (r.x.l.) .....	88
2.12.6	Ebî Yezîd El Bîstamî (q.s.) .....	88
2.12.7	Şêx ‘Arif Rêwegerî (q.s.).....	89
2.12.8	Behaeddîn Mûhemmed b. Mûhemmed El Bûxarî (Şahê Neqşebend) (q.s.).....	89
2.12.9	Şêx Ehmed Farûqî Es-Serehendî, Îmamê Rebbanî (q.s.) .....	89
2.12.10	Şêx Şemsuddîn Hebîbullah Canê Canan Mezher (q.s.) .....	90
2.12.11	Şêx ‘Ebdulqadir Geylanî (q.s.).....	90
2.12.12	Mewlana Şah ‘Ebdullah Dehlewî (q.s.) .....	90
2.12.13	Mewlana Xalid Zulcenaheyn En’neqşebendî Eş’şehrezorî (q.s.).....	91
2.12.14	Seyyîd Taha Nehrî (q.s.) .....	91
2.12.15	Seyyîd Sibxetullahê Erwasî (q.s.) .....	91
2.12.16	Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) .....	92
2.12.17	Şêx Fethullah Werqanisî (q.s.).....	92
2.12.18	Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) .....	93
2.12.19	Şêx ‘Elaeddîn Oxînî (q.s.).....	93
2.12.20	Hub û Mehebbet.....	95
2.12.21	Hub û Mehebbet.....	95
<b>2.13</b>	<b>‘İşq .....</b>	<b>105</b>
2.13.1	Cureyên ‘İşqê .....	111
2.13.2	Astên ‘aşiqê heqîqî.....	114
2.13.3	Qonaxên ‘işqa heqîqî .....	119
2.13.4	‘Aşiq .....	120
2.13.5	Me’sûq .....	121
<b>2.14</b>	<b>Dil.....</b>	<b>122</b>
2.14.1	Dil .....	122
2.14.2	Mertebeyên Dil û Nefsê .....	123
2.14.3	Letayifê Seb’e .....	126
2.14.4	Teb’ .....	126
2.14.5	Nefs.....	126
2.14.6	Eql.....	130
2.14.7	Qelb.....	131
2.14.8	Sirr .....	131
2.14.9	Xefî .....	132
2.14.10	Exfa.....	132
2.14.11	Quran û Dil .....	133
2.14.12	Tesewif û Dil .....	135
2.14.13	Astên Dil.....	136
<b>BEŞA SÊYEM.....</b>	<b>141</b>	
<b>3</b>	<b>MECAZ Û SEMBOLÊN TESEWIFÊ .....</b>	<b>141</b>
<b>3.1</b>	<b>Sembol û Mecazên Mey û Şerabê .....</b>	<b>141</b>
3.1.1	Saqî .....	141
3.1.2	Şerab û Mestî .....	145
Şerab û Şerbet.....	145	
3.1.3	Şerab .....	145
3.1.4	Şerbet .....	151
3.1.5	Mey û Meyxane .....	152

3.1.6	Bade .....	155
3.1.7	Cam.....	156
3.1.8	Cur'e .....	157
3.1.9	Kase .....	157
3.1.10	Piyale .....	159
3.1.11	Peymane.....	160
<b>3.2</b>	<b>Sembol û mecazên Xweşikahiya Mehbûbê.....</b>	<b>160</b>
3.2.1	Zulf .....	160
3.2.2	Wateyên Zulfê.....	161
3.2.3	Cureyên Zulfê .....	164
3.2.4	Xal û Xet.....	169
3.2.5	Xal.....	169
3.2.6	Leb .....	172
<b>3.3</b>	<b>Hin Têgehên Din.....</b>	<b>173</b>
3.3.1	Ab .....	173
3.3.2	Batil.....	177
3.3.3	Behr.....	178
3.3.4	Dergah.....	180
3.3.5	Dîn .....	181
3.3.6	Himmet; .....	181
3.3.7	Şeytan- Iblîs .....	184
3.3.8	Ke'be .....	186
3.3.9	Mîhrab.....	187
3.3.10	Pîr.....	188
3.3.11	Qible .....	190
3.3.12	Şîta .....	191
3.3.13	Tûr.....	191
3.3.14	Zunnar .....	192
<b>4</b>	<b>ENCAM.....</b>	<b>192</b>
<b>5</b>	<b>PÊVEK.....</b>	<b>196</b>
<b>6</b>	<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>199</b>

## TESEWIF DI DÎWANA ŞEYDA DE

### KURTE

Têkiliyek taybet û giring di navbera tesewif û edebiyatê de ava bûye. Bi vê têkiliyê, wêjeya tesewifê ava bûye. Nivîskarên wêjeya tesewifê, zimanekî taybet bikaranîne. Zimanê tesewifê pêşî di wêjeya ‘eraban de û paşê di wêjeya farisan de tê dîtin. Nivîskarên edebiyata klasika kurdî, wek wêjevanê miletên misilman, xwe ji wêjeya tesewifê bê par nemane û di vî warî de berhemên edebî anîne holê. Yek ji van wêjevanê edebiyata kurdî Mela ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî ye.

Mela ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî di edebiyata klasîk a kurdî de şa‘îrekî wenda û nenas e. Bitlîsî di helbestên xwe de nasnava Şeyda bi kar aniyê. Şeyda, xwedî dîwanek e mureteb û pirzimanî ye, ku ji çar zimanan (kurdî, ‘erebî, farisî, tirkî) pêk têt. Bitlîsî, helbestên xwe piranî bi farisî nivîsandibin jî, di dîwana wî de, zimanê duyem ê sereke kurdî ye. Helbestên xwe bi nizama klasîk a arûzê nivîsandine. Destxeta resen a dîwana wî heta niha nehatiye dîtin û nehatiye çapkirin. Me teza xwe li ser desxeteke dîwanê ya ku mustensîxê wê ne dîyar e, amade kir.

Di vê teza me a bi navê ‘Tesewif di dîwana Şeyda de’ em li ser tesewif û nêhîrîna Şeyda ya derbarê tesewifê sekînîn. Şeyda bi çar zimanan mijarên tesewif û sofîgeriyê di helbestên xwe de tehlîl kiriye. Me jî, ev mijar ji dîwana wî parzûnand. Em bi hêsanî dikarin bêjin ku bingehîn mijara helbestên wî jî tesewif bi xwe ye.

Di serî de em li ser têkiliya tesewif û wêjeyê rawestiyan. Piştî hingê me di dîrokê de li ser geşedana tesewif û terîqetê lêkolîn kir. Paşê bi hûrgulî em ketin nava helbestên Şeyda û me tesewifa wî destnîşan kir. Helbestvanekî kurdî nenas û mijareke lokal û alav bû kereste ji bo teza me.

**Miftepeyv: Edebiyata Kurdî, Tesewif, Mela ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî, Şeyda, Dîwan.**

## ŞEYDA'NIN DİVANINDA TASAVVUF

### ÖZET

Tasavvuf ve edebiyat arasında derin ve özel bir ilişki kurulmuştur. Bu ilişkiden tasavvuf edebiyatı doğmuştur. Tasavvuf edebiyatı yazarları kendilerine özel bir dil kullanmışlardır. Bu dil öncelikle arap edebiyatında daha sonra da iran edebiyatında görülmektedir. Klasik kürt edebiyatı yazarları da tasavvuf edebiyatından kendilerini mahrum etmemiş ve bu konuda edebi eserler meydana getirmişlerdir. Kürt tasavvuf edebiyatının yazarlarından birisi Mela 'Ebdul'ezîz Bitlîsîdir.

Mela 'Ebdul'ezîz Bitlîsî (1856-1928) klasik kürt edebiyatında kayıp ve tanınmamış bir yazardır. Bîtlîsî, şiirlerinde Şeyda mahlasını kullanmıştır. Şeyda, tam bir divan sahibi olup, divanını dört dil (Kürtçe, Arapça, Farsça, Türkçe) kullanmıştır. Bitlîsî'nin divanında birinci ağırlıklı dil farsça olsa da ikinci ağırlıklı dil Kürtçedir. Şiirler klasik tarzda ve aruz ölçüsü ile yazılmıştır. Divanın yazara ait el yazması şimdiye kadar bulunmamış ve basılmamıştır. Biz tezimizi müstensihî belli olmayan bir el yazma nüshasından yararlanarak hazırladık.

“Şeyda'nın divanında tasavvuf” adlı bu tezimiz de, tasavvuf ve Şeyda'nın tasavvufî görüşleri üzerine yoğunlaştık. Şeyda, şiirlerinde dört dil ile tasavvufî konuları tahlil etmiş bir şairdir. Biz de tasavvufî konuları onun şiirlerini süzerek ortaya çıkardık. Çok rahatlıkla ifade edebiliriz ki, şiirlerinin ana teması tasavvuftur.

Çalışmamızın başında edebiyat ve tasavvuf arasında var olan ilişkiye temas ettik. Daha donra tasavvuf un tarihi süreç içinde gelişimini ve bazı tarikatları ele aldık. Ana tema olarak Şeyda'nın şiirlerinde tasavvuf ve işlenen tasavvufî konuları ortaya çıkardık. Tanınmamış ve kayıp bir kürt şair ve lokal bir konu bu tezin ana unsurları oldular.

**Anahtar Kelimeler: Kürd Edebiyatı, Tasavvuf, Mela 'Ebdul'ezîz Bitlîsî, Tasavvuf, Şeyda, Divan.**



## SUFİ OF ŞEYDA'S DİVAN

### ABSTRACT

In our thesis, a deep and special relationship has been established between sufism and literature. Sufi literature has arisen from this relation. The authors of sufi literature have set up a special language for themselves. This language is firstly seen in Arabic literature and then in Iranian literature. Also the authors of classical Kurdish literature haven't deprived themselves of sufi literature and they wrote literate books about this topic. One of the authors of Kurdish sufi literature is Mela 'Ebdul'ezîz Bitlîsî.

Mela 'Ebdul'ezîz Bitlîsî (1856-1928) is a lost and unknown author in classical Kurdish literature. Bitlîsî used 'Şeyda' pen name in his poems. Şeyda has a complete divan and used four languages (Kurdish, Arabic, Persian, Turkish) in it. The first weighted language of the divan of Bitlîsî is Persian. The second weighted language is Kurdish. The poems have been written in classical style and with the scale of aruz. The handwriting of the author has not been found until now and has not been published.

In this study, we focused on sufism and the views of Şeyda on sufism. Şeyda is a poet who analyzed sufi themes with four languages in his poems. We brought sufi themes to the light by filtering some of his poems. We can easily say that the main theme of his poems is sufism.

At the beginning of our study, we mentioned the relation between literature and sufism. Then we wrote about the development of sufism in history and some sects. As the main theme, we put forward sufism and sufi themes in Şeyda's poems. An unknown and lost Kurdish poet and a local theme have become the main fact of this thesis.

**Keywords: Kurdish Literature, Sufism, The Mela 'Ebdul'ezîz Bitlîsî, Şeyda, Divan,**

## **PÊŞGOTIN**

Bi Navê Xwedayê Dilovan û Mihrîban

Hemd ji Xwedê re û silav û selam ji Resûlê Wî re be. Nivîskarên kurd wek hemû nivîskarên gelê misliman bi nivîsandina berhemana, edebiyatek anîne holê. Edebiyata klasik a kurdî ji aliyê dewlemendiya xwe ve hêjayî lêkolîn û vekolînê ye. Heta niha gelek xebatên hêja hatibin kirin jî, ji ber ku ev qad, bi derengî derketiye holê, xebatên ku hatine kirin kêma in. Me jî xwest ku xebateke mutawazî di vê warî de bikin, loma me bere xwe da dîwaneke nenas.

Bi gelek sedeman, edebiyata klasik a kurdî, ji layê ziman, dibin bandora edebiyata cîranên xwe, bi taybet a faris û 'ereban, de maye. Xebat û lêkolîna li ser edebiyata klasik a kurdî her çend ku pêdivîyek gelek giring be, ew çend jî dijwar e.

Îro, têgihastina edebiyata klasik a kurdî û bi taybet a diyalekta kurmançî gelek zor û zehmet e. Ji rexeke ve newekhevîya nivîs û bikaranîna elifbeya farsî û ji rexeke ve jî giraniya ziman vê zehmetiyê zede dike.

Yek ji wan nivîskarên wenda û nenas ku heta îro derneketiye qada edebiyata kurdî Mela 'Ebdul'ezîzê Bitlîsî ye. Di vê teza me a bi navê 'Tesewif di dîwana Şeyda de', me berê xwe da dîwana wî a muretteb û di dîwana wî de em li sofîgeriya wî û di bin şexsiyeta wî de li sofîgeriya nivîskarên kurd geriyên.

Di diwanê de helbestvan du mexles bikaraniye. "Şeyda" û " 'Ebdul'ezîz". Bi sedema ku mexlesa "Şeyda" zêdetir hatiye bikaranîn, me navê diwanê danî "Dîwana Şeyda"

Di destpêka xebatê de em li ser tîkiliya tesewif û edebiyatê sekinîn. Me zimanê wêjeya tesewifê rave kir. Li ser tîkiliya edebiyata klasik a kurdî û tesewifê û di edebiyata klasik a kurdî de tesewif jî hat sekinandin. Li ser jiyana û dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bitlîsî de lêkolîn hate kirin. Armanca teze, rebazên lêkolînê û çavkaniyên sereke di dawîya destpêkê de hat nivîsandin.

Beşa yekem teoriya tesewifê ye. Bingeha bêjeya tesewifê, pênaseyên tesewifê, armanca tesewifê, destpêka tesewifa Îslamê û danasîna terîqeta neqşebendî di vê beşê de hat destnîşankirin.

Beşa duwem li ser tesewifa dîwana Mela 'Ebdul'ezîzê Bitlîsî disekine. Di vê beşê de; terîqeta nivîskar, şexên wî, di çerçeweya nêrîna wî de; îrşad û cureyên îrşadê, şex û taybetiyên şexan, nûnertiya şex, baweriya bi şex, feyza şex, hêviya ji şex, adabên terîqetê, adabên murîd

û adabên şêx, bi alîkariya malikên wî, hatin derxistin û hatin şîrovekirin. Dîsa di vê beşê de, ji beytên şa'ir evîna Resûlê Xweda (s.x.l.), evîna rêberên terîqetê, bêjeyên hal û meqamên tesewifê me derxist û rave kir. Mijara mehebbêtê me ji 'îşqê veqetand û her yek dibin sernavekî de bi beytên şa'ir hatin destnîşankirin. Di dawîwa vê beşê de mijara dil bi nêrîna helbestvan bi cih bû.

Di beşa sêyem de em li ser hinek têgehên tesewifê ku şa'ir bi wateya wan a tesewifî bi kar aniyê, rawestiyên. Ev beş ji sê binbeşa pêk tê. Pêşî têgehên girêdayî bi şerab û meyê, paşê têgehên girêdayî bi xweşikahiyê û herî dawî, hin têgehên din bi beytên şa'ir hatin ravekirin.

Di nivîsandina beytan de, bi pîtên 'erebî, ku hinek şaşî hatibin dîtin jî nehatin rastkirin. Di nusxeya dîwanê de çewa hatibû nivîsandin me jî wusa nivîsand.

Li gorî tehlîlên ku me di derbarê tesewifê de, bi saya serê helbestên Şeyda kir, gelek encamên balkêş derketin pêşberî me. Me di encamê de panoramaya tesewifa Şeyda li ber çava raxist.

Kar û xebat ji me, tewfîq her ji Xweda ye.

**Nûrettin ERTEKÎN**

**Diyarbakir-2018**

## Spasî

Ez her spasdarê Xweda me, ji bo hemû başiyên bi min kiriye û ewê bi min bike.

Ez her spasdarê Resûlê Xweda me, ku roja heşrê ji mera mehdervan e.

Ez her sipasdarê nivîskarên wêjeya tesewifê me, bi sedema ku di berhemên xweyî giranbeha de zewqa tesewifê nîşanî me dane.

Ez her spasdarê nivîskarên edebiyata klasika kurdî me, ku bi berhemên xwe li hemberî cîranan em serbilind kirine.

Ez ji Mela 'Ebdul'ezîzê Bitlîsî re gelek sipasdikim ku dîwanek muretteb diyarî me kiriye.

Bi sedema ku derbarê dîwanê de agahî dan min, û ji bo bidestxistina fotokopiya nusxeya dîwanê ez ji apê xwe Mela Şehmûs Ertekin re gelek sipasdikim.

Ji şewirmendê xwe Dr. Hêmin Omer Ehmed spasadar im, ku di demajoya tezê, ji serî hata dawî, bi rêbertî û rênûmayên xwe rê li ber min vekir. Doc. Dr. Mehmet zahir Ertekin re gelek sipas dikim ku rêbazên akademîk ên emedekirina tezê nîşanî min da. Ji mamoste Zafer Açar gelek sipasdarim ku teza min ji layê rastnivîs û rêzimanî ve xwend û sererast kir. Birayê min Abdusselam Ertekin di warê teknîkî de û wergera kurteyê bi inglîzî de gelek alîkarî da min. Bi taybet ez ji wî re spasiyê xwe pêşkêş dikim. Ji mamoste Şerif Güzel spas dikim, ku beşa yekê bi hûrgulî xwend û gelek sererastî pêk anî.

Di hin wergerên beytên dîwanê ên farsî de me gelek zehmetî da Seyda Mela Ahmet Yalar, ez ji bo alîkariya wî gelek spasdarim. Di wergerên 'erebî de Mela Mehemed Emîn Denli ji min re bû alîkar, ez ji wî re spas dikim. Ji nivîskarên berhem, gotar û tezên ku ji teza me re bûn çavkanî, em spas dikin.

Ji bo sebr û alîkariya wê ya me'newî ji kevaniya xwe re û kufletên malê re gelek sipas dikim.

## KURTEBÊJÎ

amd.	: Amadekar
B	: Beyt
Bnd	: Bend
bnr.	: Binêrin
c.	: Cild
ç	: Cild
DÎA.	: Türkiye Diyanet Vakı İslam Ansiklopedisi
hb.	: Heman Berhem
j.	: Jimare
mlm.	: Mûlemme'
msn.	: Mesnewî
mux.	: Mûxemmes
r.	: Rûpel
ص	: Rûpel
ûwd.	: Ê wekî din
wer.	: Werger
X	: Xezel
(q.s.)	: Xweda Sîrrên Wî Pîroz Bêdêre
(r.x.l.)	: Razîbûna Xweda li Ser Wî Be
(s.l.)	: Selam li wî be
(s.x.l.)	: Silavê Xweda Li Ser Wî Be
&	: û

## DESTPÊK

### Tesewif û Wêje

Xwedayê Te'ala piştî ku însan afirand, taybetiyek mezin bexşî wî kiriye. Ev taybetî bi fermana Qurana Pîroz; <sup>1</sup> ( عَلَّمَهُ الْبَيَانَ ) e. 'Ew fêrî axaftinê kiriye'<sup>2</sup> Hasan Basrî Çantay, di şîroveya 'Beyan'ê de wiha dibêje. Beyan; qabiliyeta axaftina bi hizir e ku cudahiya navbera heywan û însanan e.<sup>3</sup> Ji ber giringiya vê taybetiya ku Xweda bexşê însan kiriye, Şêx Ehmedê Xanî dema hemd û sena û şukrê xwe li hemberî Xaliqê Rehmanî tîne ziman weha dibêje;

Ku fesahet û beyan daye lîsanî / lîsan daye însanî<sup>4</sup>

Quran beriya ku bêje ( عَلَّمَهُ الْبَيَانَ ) gotiye; <sup>5</sup> ( خَلَقَ الْإِنْسَانَ ) 'însan Afirandiye.'<sup>6</sup> Ango piştî afirandina însan yekem tiştê ku Xweda bexşî însan kiriye qabiliyeta axaftinê ye. Li gorî rêza Quranê û li gorî rêza Şêx Ehmedê Xanî yekem zanist wêje ye. Lewra wêje, hêza axaftinê ye.

Însan bi qabiliyeta axaftinê çand, huner û wêje ava kiriye. Îro di wêjeyê de ev nuqte hatiye pejirandin û hem ji hêla zanayên rêziman jî bûye mijara lêkolînê ku, ziman bi du cureyan bi kar tê. Bikaranîna gotinî/irca'î û bikaranîna 'atîfî/hunerî. Edebiyat û şî'r, ji bikaranîna 'atîfî/hunerî ya ziman hatiye holê. Dibe ku bi wezn û qafiye be û dibe ku bê wezn û qafiye be.<sup>7</sup> Însanan, bi her dû cûreyan jî hest û ramanên xwe anîne ziman û di navbera hevû dû de têkilî ava kirine.

Hemû zanist an di bin bandora hin zanistên din de mane û an bandor li hin zanistên din kirine. Tesewif jî hem bi zanistên dînî wek; fiqih, tefsîr, hedîs, kelam û hem zanistên din, wek; mûsikî, mîmarî, xweşnivîsi û wêjê<sup>8</sup> yê re têkilî ava kiriye. Tesewif, bandorek mezin li wêjeyê kiriye û di nav wêjeyê de bi navê *wêjeya tesewifî* wek beşek wêjeyê cihekî bi taybet ji xwe re veqetandiye.

Wêjeya tesewifê ji teref cûre û xina/melodî, di 'erebî, farsî û kurdî de cihekî bi taybet û girîng bi dest xistiye. Ev wêje hem xwedî nezm e, hem xwedî pexşan e, hem felsefê tê de heye û hem exlaq, hem dîrok e û hem tefsîr, hem dû'a ye û hem munacat, hem hedîs tê da heye û hem mûsikî. Beşek mezin, ji nezm û pexşana wêjeya tesewifê pend û tehqîq e. Mijara vê beşê hîn bêtir zema dinyayê û tehkîrkirina wê ye. Di nêrîna sofîyan de dinya qonaxeke li

<sup>1</sup> Qurana Pîroz, Rehman, 4.

<sup>2</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, Serokatiya Karûbarê Diyanetê, Ankara, 2015, r. 530.

<sup>3</sup> Hasan Basrî Çantay, *Kur'ân-ı Hakîm ve Meâl-i Kerîm, Tefsîrlî Meal*, Risale Yayınları, İstanbul 1996, c. 3, r. 158.

<sup>4</sup> Şêx Ehmedê Xanî, *Nûbehara Biçûkan* (Şerh Ehmed Hilmî Qoxî), İhsan Yayınları, İstanbul 2014, r. 16.

<sup>5</sup> Qurana Pîroz, Rehman, 3.

<sup>6</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 530.

<sup>7</sup> محمد رضا شفیعی کدکنی، زبان شعر در نثر صوفیه، انتشارات سخن، تهران ۱۳۹۲، ص. ۳۶۸.

<sup>8</sup> Osman Nûri Topbaş, *Îmândan Îhsâna Tasavvuf*, Erkam Yayınları, İstanbul 2014, r. 67-92.

serê rêya axretê. Lê çewa qonax? Qonaxek ku tije bela û afat e. Hezkirina dinê xeterkariyek yekem û sereke ye. Çêja wê perdeyek e di navbera Xweda û însana de. Ji sofî re şayeste ye ku behsa 'işqa Xweda bike û hêviya gihaştina Wî bike, ku yekem armanca salikî ev e û ev yek, rengê 'aşiqane dide şî'ra sofî.<sup>9</sup> Kijan 'işq? 'işqek gelek bi derd û kul, 'işqek bê umîd.

Tevlî ku tesewif û şî'r herdu jî ji zewq û îlhamê çêbûne û hatine holê, ji hevû dû cudabûn. Têkiliyek di navbera wan de ava nebûbû, nikaribûn bi hev re derkevin holê. Weyaxud, şert û merc û zemînek ji bo bihev re derketina wan amade nebû bû. Hinek ji mezin û pêşengên şî'r û tesewifê, bûn sedema avakirina têkilî û nêzîkahiya wan, ku di encamê de, di navbera herduyan de nêzîkahî û têkiliyek kûr û fireh ava bû. Bi avakirina vê têkiliyê, tesewif, hêz û taqet girt û bi vê hêz û taqetê hîn bêtir û zêdetir berhem anîn holê û şa'ir derxistin qada şî'r û edebiyatê. Bi avakirina vê têkiliyê, tesewifê bandorek têvel û girîng daniye ser edebiyatê û hem di şî'rê de û hem di şa'irî de guherandinek kûr dahêna.<sup>10</sup> Guherandinek bi terzeke cuda ku wêjeya tesewifê ava kiriye.

Tesewifê reneki taybet daye şî'rê. Şî'r, ji ser palasa zewq û te-wîlê rakir danî ser textê selteneta hunera wêjeyê. Qesîde, ji koncala zarê derewan derxist danî serê bandewa payedariya we'z û tehqîqê. Xezel, ji 'işqa şehewanî xilas kir, ew gihand 'işqa rûhanî. Mesnewî, kiriye wesîle ji bo fêrkirin û perwerdehiya 'ilm û 'irfan û exlaq. Ji vê zêdetir, kûratî û sadetiyek taybet bexşî pexşanê kir. Qisse û hîkaye, xistiye qalibê me'na û hikmetê. Rewşa nefsanî wek hinek surrealista daye ber çava. Bêjeyên nû xistiye nava felsefeyê. Ji bedel 'eql û îstîdlal, keşf û îşraq tercih kiriye. Ji sînore sebebê zahirî derbasbûye, rêya xwe gihandiye sedemê bişewat. Pirbûna 'alemê bi yekîti jimartiye. Felsefeya xwe ya wehdetul wucûdê li ser vê avakiriye. Derbarê exlaq û terbiye ji nêrînê sethê xwe dûrxisti ye. Di şîroveya Qurana Pîroz de ji nêrînê zahir dîrbu. Nêrînê derûnî bijartiye ser nêrînê zahirî, nêrînek tesewifî ava kiriye. Ji yana meşayîxa û pêşengê tesewifê ji nêrîna dîrokî derxistiye û bi çavê 'ibretê rave kiriye. Mûsîqî, bi piranî bi merkeba rûh û sîqala can nasandiye. Hemû van taybetiyan di berhemên wan de pêşkêtiye û berhemên wan ji rexê firehî, cûre, kûranî û bandorê, îmtiyazek taybet bexşandiye.<sup>11</sup> Bi van taybetiyan xwe berhem diyarî edebiyatê kiriye. Hem berhemên pexşan û hem berhemên helbest.

Tesewifê bandorek mezin hem li şî'rê kiriye û hem li şa'irî kiriye. Di şî'rê de şellaqî, melaqî û çaplûşî daye sekinandin. Lewra sofî, ji şan û navdengiya dinyayê û pesindayîna

---

<sup>9</sup> عبدالحسين زرین کوب، ارزش مرآت صوفیه، انتشارات آریا، تهران ۱۳۴۴، ص. ۱۵۶.  
<sup>10</sup> جمشید صدیقی & قسمتعلی صمدی، "تأثیر تصوف و عرفان بر شعر و شاعری"، فصل نامه تخصص ادبیات فارسی دانشگاه آزاد مشهد، تابستان ۱۳۸۸، دوره ۵، شماره ۲۲، ص. ۱۱۰.  
<sup>11</sup> زرین کوب، ص، ۱۵۷-۱۵۸.

kesan xwe diparêzin. Di şûna pesindayîn û stayîşa hukumdar, siltan û kesên bihêz, ne'tê Resûlên Xweda (s.x.l) danîne. Wêje vala kiriye ji gotinên nexweş, bê edeb û mustehcen. Piştî edebiyatê sipartine tehzîp (bilindikirina exlaq), tezkiye (pakkirina ji exlaqê xirab), teqwa (xwe parastina ji mixalefeta Xweda) û me'rîfet (zanebûn) ê. Pêşiya ş'ir û şa'irî girtiye ji hewa û hewesa nefsê. Felsefe, hikmet, kelim, bi rêbertiya şa'irên sofî ketiye qada wêjeyê. 'Işq, mehebbet, mihrîbanî, maf û 'edalet di wêjeyê de bi cih kiriye. Exlaqê hesene, yanî exlaqê Îlahî û însanî aniyê û wêje, ji kîn, kerb, rik û neyariyê xilas kiriye. Hin bêjeyên zêde xweş û bi nirx wek; rida, fena, beqa, tewekkul, tobe, uns, şewq û...wd, bi bereketa hal û meqamên sofîya, ku rewşa sofîyan rave dikin, ketiye zimanê ş'ir û şa'irî. Li hemberî çanda zordarî û dagirkirinê, rûmet, namûs û 'izzeta nefsê parastiye û giramî û rêzdariya însaniyetê, di wêjeyê de bi cih kiriye. Li temamê gerdûnê û aferîdeyan bi nêrînek 'aşîqî, 'arifî nêriye û her tişt xweşik û bi nirx dîtiye. Kûrbûniyek bexşî têgeh û wateyên ş'irê kiriye û xwendevan hişyar kiriye, bala wî daye ser teemmul (şîrovekirina bêjeyan bihûrgulê) û tefekkur (li ser wateyan hizirkirin) ê. Zêde li ser me'rîfet û bendetiya Xweda û li ser peyrewtiya Îslamê sekiniye, lê bê israr û bêyî ku têkeve nava pisgirêkên mezhebi. Bûyerên dîrokî hatine diyarkirin û di meseleyên civakî de bi derd û kulên civakê re hemderdi xistiye ş'irê. Diyarkirina sîrrên tesewifê di qalêbê ş'irê de, bi nasnavê zimanê sîrr û esrara ketiye wêjeyê.<sup>12</sup>

### Zimanê Wêjeya Tesewifê

Sofîyan ji bo vê wêjeyê zimanekî taybet ava kirine. Birastî, ji mêj ve şa'irên sofî di ş'irên xwe de hin peyv gotine, bes bi 'işqa mecazî tîn fêm kirin. Wek lêv, çav, xal, zulfa me'şûqê. Carîna derbarê hin rewşan de ş'ir ava kirine ku di zahir de bi edeba musulmaniye ne munasib in. Wek şerab<sup>13</sup>, pîrek,<sup>14</sup> ribab, awaz, reqs, dêr, xerabat, zunar. Evana delaletî 'işqa mecazî dike, ku li cem temamê musulmana mekruh e û menfur e. Ji ber hindî rexne li wan hatine kirin û ew bi kufrê îtham kirine. Ev gotinên wan teqez di halê 'istîxraq û wecd û cezbeya wan de derketiye holê, û bingeha wan peyvên jî halê wan e. Ji bo ev gotin û peyvên wan<sup>15</sup> ku jê re hatiye gotin 'sethiyat'<sup>16</sup> duçarê derda bûne. Ji ber hindî temamê peyvê wan hatine watedar kirin. Ji bo ev wateyên wan berhem hatine avakirin.

<sup>12</sup> صدرى، جمشيد & صمدى، قسمتعلى، ص. ۱۱۰-۱۱۱.

<sup>13</sup> Di derbarê remza şerab û xemrê di ş'irê sofî de bnr;

عاطف جودة نصر، الرمز الشعري عند الصوفية، دار الكندي، بيروت، لبنان، ۱۹۷۸، ص. ۳۷۴-۳۴۲.

<sup>14</sup> Di derbarê remza pîrekê di ş'irê sofî de bnr;

عاطف جودة نصر، ص. ۱۶۲-۲۵۶.

<sup>15</sup> Ji wan gotinê wan re 'sethiyat' hatiye gotin. Ew peyvên ku di wateyên xwe yê zahir de dijî şerî'etê ne. Peyvên ku bi giştî ji wan nayên fam kirin û wateyên wan girtin e. Peyvên di halê coş û kelecana hal û meqamên



Zimanê tesewifê zimanekî taybet e. Ji zimanê ku gel pê diaxive û zimanê zanistên dînî cuda ye. Zimanê sofîyan, zimanê remz û îşaret û muemmayê ye. Ji bo famkirina vî zimanî divê mirov bîr û baweriyê wan bizanibe.<sup>17</sup>

‘Elî Esxer Mîr Bâqirî Ferd û Me’sûme Muhemmedî di gotara xwe de sedema avakirina zimanê tesewifê wiha rave dikin.<sup>18</sup>

- 1- **Xîret:** *Ew sîrr û razên me’newî ji bo sofîyan gelek ‘ezîzin. Her tiştê ku ‘ezîz be însan ji bo wê bêtir bi xîret e. Her tiştê xîreta wê zede be veşartina wê zêdetir e.*
- 2- **Hifza Emanetên Îlahî:** *Sîrrê Îlahî ji bo sofî emanet e. Her kesê ku sirra xwe eşkere bike xiyanetê dike. Ji ber hindî sofîya sîrrên xwe veşartine.*
- 3- **Cudabûna meqamên goyende û guhdêr:** *Mertebeyên sofîyan jî, sedem e ji bo veşartina sirran. Dema sofîyek di meqame kî de tiştêkî bibêje dibe ew ên ku dixwînin an dibihîzin di meqamekî cuda de bin. Ew dem dibe ku yek înkara yekî bike. Ji bo vê sofîyan bi remz gotine.*
- 4- **Hebûna Namehrem:** *Namehrem ew kesên ku ne sofî ne. Sofîyan, nedana ‘ilm ji kesên ehil re zulm, û dana ‘ilm ji kesê ne ehil re zulm û heram dîtine. Ji ber ku kesên ne ehil nikaribin bigihêjin sîrrên wan bi remz gotine.*
- 5- **Xelebeya Ehwal:** *Sofî di seyr û sulûkê de mexlûbê halê xwe ye. Di ew demên ku di ehwalan de hin sir û raza dibine mexlûbê halê xwe ye. Di wê demê de dema ku dibêje ne pêkane ku rasterast tiştêkî bibêje. Ji ber hindî bi remz dibêje.*

Dabeşkirina zimanê tesewifê ji derketina vî zimanî û heta niha bala gelek nivîskarên kişandiye gelek kes li ser dabeşkirina vî zimanî rawestiyane. Bi gelemperî zimanê tesewifê bi du beşan hatiye dabeşkirin. Zimanê îşaret û zimanê îbaretê.

1- **Zimanê Îşaret:** Ev cûre sê beş e.

a- **Zimanê remz:** Taybetiya vê beşê ev e; ji îşaret, remz, îstî’are û kînayeyan pêk tê.

b- **Zimanê esrar:** Wêjekahiya vî zimanî ne remz e û ne şeth e. Sofî di bin xelebeya hal de ji bo kesên ehil sîrrên ‘irfanî bi îşaret gotiye.

---

me’newî de ji devê sofîyan derdikevin. (Süleyman Uludağ, *Tasavvuf terimleri Sözlüğü*, Kabalcı, İstanbul 2016 r. 327-328.)

<sup>16</sup> Ji bo wate ya şethê bnr;

روزبهان بقلی شیرازی، شرح شطحیات (به تصحیح و مقدمه: از هنری کرین، طهوری) تهران ۱۹۸۱، ص، ۵۶-۵۷.

<sup>17</sup> صدوری، جمشید & صمدی، قسمتعلی، ص، ۱۰۲.

<sup>18</sup> علی اصغر میرباقری فرد & معصومه محمدی، "عبارت و اشارت در زبان عرفانی"، پژوهشنامه عرفان ۱۳۹۵، دوفصلنامه، شماره ۱۵، صص ۱۹۹-۲۰۲.

c- **Zimanê şeth:** Di tesewifê de peyvên xerfbin. Di meqamên bilind de ji deve sofîyan derdikevin. Peyvên muteşabihin. Sofîyan ji ber van şetha gelekî tometbar bûne.

2- **Zimanê Îbaret:** li gorî zimanê îşaret hîn vegirîtir, zelaltir û ji tevlîhev bûnê valatir û bê remz e.<sup>19</sup>

### **Klasîkên Tesewifê**

1- **ER-RÎÂYE LÎ-HUKÛKİLLAH** <sup>20</sup> : Berhema Haris Bin Esed Mûhasibî (w.243/857) ye. Muhasibî yek ji mûtesewifê pêşî ye. Ev berhem çap bûye û Abdülhakim Yüce wergerandiye zimanê tirkî.<sup>21</sup>

2- **HATMU'L-EVLİYÂ:** Hakîm Tirmîzî ( w. 320/932) nûsiye. Berhem li ser mijara welayetê hatiye avakirin. Bi terza pirs û bersivê hatiye nivîsandin. Ji teref Osman Yehya di sala 1965a li Beyrûdê çap bûye.<sup>22</sup>

3- **EL-LÛMA':** Ebû Nasr Abdullâh bîn Ali bîn Muhammed bîn et-Tûsî (w. 378/988) nûsiye. Ji teref Ronald Ellen Nîcholson di sala 1914an de li Londra yê hatiye çapkirin. Divê çapê de berhem ji 486 rûpelan pêk hatiye.<sup>23</sup> Ji teref Hasan Kamil Yılmaz wergera wê a tirkî hatiye kirin û bi navê *İslam Tasavvufu* li Stenbolê di sala 1996an de hatiye çapkirin.<sup>24</sup>

4- **ET-TA'ARRUF LÎ-MEZHEBÎ EHLİ'T-TASAVVUF:** Di tesewifê de çavkaniyek gelek girîng e. Ji teref Ebûbekir Kelebazî (w. 380/990) hatiye nivîsandin. Bi sedema berhemek sistematîk e ji berhemên din cuda ye. Gelek caran hatiye çapkirin. Gelek şerhe vê berhemê hene.<sup>25</sup> Süleyman Uludağ ev berhem bi navê *Doğuş Devrinde Tasavvuf-Tearruf* ê wergerandiye zimanê tirkî û di sala 1979an de çap kiriye.<sup>26</sup>

5- **KÛTÛ'L-KULÛB:** Ji teref Ebû Talib Mekkî (w. 386/996) hatiye nivîsandin. Herî paşî di sala 1995an de ji teref Se'id Nesîb li Beyrûdê hatiye çapkirin. Bi tirkî du wergerên wê hene.<sup>27</sup>

6- **ER-RİSÂLE:** Abdulkerîm Quşeyrî (w. 465/1072) nûsiye. Bi 'erebî, farsî û tirkî gelek cara hatiye çapkirin. Çavkaniyek girîng e ji bo tesewifê. Berhemek sistematîk e ji bo tesewifê.<sup>28</sup>

<sup>19</sup> علی اصغر میرباقری فرد & معصومه محمدی، ص، ۱۹۸-۲۰۳.

<sup>20</sup> Navên Berheman di çavkaniyên ku me jê wan sûd wergirtin çawa hatibûn nivîsandin me jî wusa nivîsand.

<sup>21</sup> Hasan Kamil Yılmaz, *Anahatlarıyla Tasavvuf ve Tarikatlar*, Ensar Neşriyat, 10. Baskı, İstanbul 2004, r. 54.

<sup>22</sup> Salih Çift, *Tasavvuf Klasikleri*, (Moderatör, E. Cebecioğlu), Erkam Yayınları, İstanbul 2010, r. 40-45.

<sup>23</sup> Abdülhakim Yüce, *Tasavvuf Klasikleri* (Moderatör, E. Cebecioğlu), Erkam Yayınları, İstanbul 2010, r. 55-70.

<sup>24</sup> Yılmaz, hb. r. 55.

<sup>25</sup> Vahit Göktaş, "Kelâbâzî'nin Et-ta'arruf Li-mezhebi Ehli't-tasavvuf Adlı Eserinin Şerhleri ve Şârihleri", *Hitit Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 2008/2, c. 7, sayı 14, r. 135.

<sup>26</sup> Yılmaz, hb. r. 54.

<sup>27</sup> Ramazan Muslu, *Tasavvuf Klasikleri* (Moderatör, E. Cebecioğlu), Erkam Yayınları, İstanbul 2010, r. 71-88.

7- **KEŞFU'L-MAHCÛB:** Alî Bin Osman el-Cullabî el-Hucwîrî (w. 465/1072) nivîskarê vê berhemê ye. Bi farsî hatiye nivîsandin. Li Tehranê bi farsî, li Qahîreyê bi erebî hatiye çapkirin. Süleyman Uludağ ev berhem wergerandiye zimanê tirkî û di sala 1982an de çap kiriye.<sup>29</sup>

8- **İHYÂU ULÛMÎ'D-DÎN:** İmamê Xezalî (w. 505/1111) ev berhem diyarî ummeta îslamê kiriye. Di 'alema İslamê de berhemek gelek bi nav û deng e. Ji bo gelek zimanan hatiye wergerandin. Li gelek deveran û gelek caran hatiye çap kirin. Du wergerên wê bi zimanê tirkî hene.<sup>30</sup>

9- **AVÂRİFÛ'L-MA'ÂRİF:** Ebû Hefs 'Umer Şîhabuddîn Suhrewerdî (w. 632/1234) nivîskarê ev berhema girîng e. Cûdatiya vê berhemê mijara jiyana tekkeyan û adabên xelwetê di xwe de girtiye. Wegera wê bi farsî û tirkî hatiye kirin.<sup>31</sup>

10- **FUSÛSU'L-HİKEM Û EL-FÛTÛHÂTÛ'L-MEKKİYYE:** Muhyiddîn İbnî 'Erebî (w. 638/1240) nivîsandiye. Bi taybet mijara wehdetu'l wûcûdê sistematize kiriye. Gelek nîqaş û gengaşî li ser van berheman hebin jî ji tesewifê re çavkaniyên girîng in. Bi taybet li ser Fusûs'ul Hîkemê gelek şerh amade bûne. Bi tirkî hem wegera Fusûs'ul Hîkemê hatiye amadekirin.<sup>32</sup>

### **Edebiyata Kurdî û Tesewif**

Edebiyata klasik a kurdî edebiyata medreseya ne,<sup>33</sup> edebiyata feqîyan e, edebiyata mela ye û edebiyata şêxan e. Di tûrikên feqîyan de dever dever geriya ye û belav bûye, bi dengên melayan di spêdê de gel ji xew rakiriye û bi evîna şêxan di tekke û dergahan de dengveda ye. Ji Baba Tahirê 'Uryan bigire, ku pêşengê edebiyata klasik a kurdî ye, heta di dema me de jî nivîskarên edebiyata klasik a kurdî di medreseyan de perwerde bûne<sup>34</sup> û dibin. Ne tenê nivîskarên edebiyata klasik a kurdî, pêşengên edebiyata Kurdî<sup>35</sup> ya modern jî fêkiyên medreseyên kurdan in. Nivîskarên edebiyata klasik a kurdî ne tenê nivîskar bûn e. Hem

28 كذكى، ص. ۱۱۸.

<sup>29</sup> Yılmaz, hb, r. 55.

<sup>30</sup> Sezai Küçük, *Tasavvuf Klasikleri* (Moderatör, E. Cebecioğlu), Erkam Yayınları, İstanbul 2010, r. 159-178.

<sup>31</sup> Ethem Cebecioğlu, *Tasavvuf Klasikleri* (Moderatör, E. Cebecioğlu), Erkam Yayınları, İstanbul 2010, r. 223-250.

<sup>32</sup> Dilâver Gürer, *Tasavvuf Klasikleri* (Moderatör, E. Cebecioğlu), Erkam Yayınları, İstanbul 2010, r. 251-308.

<sup>33</sup> Mehmet Yalar, "Seyda, Mela ve Feqîlerin Bölgenin Dini ve Kültürel Hayatındaki Yeri", *Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler Sempozyumu*, Muş Alparslan Üniversitesi, İlahiyat Fakültesi yayınları, 2013, c.1, r. 466.

<sup>34</sup> Wek Mînak; Mela Ehmed Yalar, Melle 'Ebdulwehabê Bernîştî (öncü) ku hîn li jiyane ne

<sup>35</sup> Wek mînak Hecî Qadirê Koyî ( Mehmet Sait Çakar & F. I. Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı. İstanbul: Tarih Vakfı, İstanbul 2010, r. 178) û Cegerxîn. (Heval Zaxoyî, *Cegexwin-Şa'ir û Mirov û Kurdperwer*, Wezareta Perwerdeyî, Hewlêr 2014, r. 21-24.)

nivîskar bûne,<sup>36</sup> hem pêşengên dîn bûne,<sup>37</sup> hem jî serok û rêberên sîyasî<sup>38</sup> bûne. Edebiyata klasik a kurdî di medreseyan kurdan de tovên xwe çandiye, bi medreseyan kurdan re şaxê xwe belavkiriye û fêkiyên xwe gihandiye heta dema me.

Lê mixabin, edebiyata klasik a kurdî edebiyatek wendabûyî ye. Bi gelek sedeman berhemên nivîskarên kurd negihaştine dema me. Wek mînak; helbestên ‘Elî Herîrî, Ebdussemed Babek ê Hekarî, Ebu’l Berakatê Hekarî, Şukriyê Bitlîsî, dîwana Emîr Yaqûb Ez-Zerkî, dîwana Hemîdî ne gihaştine dema me.<sup>39</sup> Ev edebiyat, ne tenê wendabûyî ye, di heman deme de bê xwedî ye jî. Gelo çima helbestên Şêx ‘Elaeddînê Xiznewî, Qesîdeyan Şêx ‘Ebdulhekîmê Qesrewî, Mersiyeyan Mele Wehîd, serpehatiyên Mele Şêxmûsê Bernîştî, ş’irên Xalê Fexro (Fexreddînê Lawê Mela Hesenê Te’wîkî), pendên Mele Mehemedê Bernîştî nebûne mijarên gotar û teza û di berhemên me de cih negirtine. Ne tenê berhemên edebiyata kurdî, nivîskarên me jî, ji bê xwedîtiyê xilas nebûne. Derbarê jiyana Mele Nezîrê Êlihî, Mela (şêx) ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî, Mela Mûhemmed Şah el Metmûrî, Şêx Feyzullahê Xiznewî<sup>40</sup> de gelo em çî dizanin?

### **Tesewif Di Edebiyata Kurdî de**

Çi dema em dibêjin edebiyata klasik a kurdî di medreseyan de şîn bûye, di heman demê de em dibêjin ku edebiyata klasik a kurdî bi tesewifê girêdayî ye. Herçend ku ji mere ne diyar be ka kê û ji kengî ve çandiye, lê em dizanin ku tovên edebiyata tesewifa kurdî, bi Baba Tahir re zîl daye.<sup>41</sup>

<sup>36</sup>Wek Mînak; Elî Herîrî (1010-10789), Mele Ehmed Huseyn Bateyî (1417-1491), Şêx Ehmedê Xanî (1651-1707), Mele Mehmûd Bazîdî (1797- ?), Mûrad Xanê Bazîdî (1772-1832), Mele Seîdê Meşhûr (Navdarê bi gunde xwe Norsê-Bedî’u’zzaman), Şêx Mela Ehmed Cizîrî (1570-1640), Feqiyê (Mihemed) Teyran (1590-1660), Feqe Reşîdê Hekarî. Şerîfxanê Colemergî (1693- 1748), Selîm Sileman (Sedsala16-17), Mele Xelîle Sêrtî (1753-1843). Xaris Bedlîsî (1758-?), Elî Teremaxî (Sedsala IV, hicrî). Mele Ūnisê Herqetenî (1785-?), Siyapoş, Macin, Mîna, Sadiq, Mensur Girgaşî, Mele EliyêFindikî, Xelîfe Ūsiv, Mele Mihemed Emîn Heyderî, Mele Mihemed Liceyî, Mele Evdilmecîd, Mele Necmedîn Tengezarî, Mele Mûsayê Mizî û bi hezaran kesen wisa yên din. (Zeynelabîdîn Zinar, *Xwendina Medresê*, Pencînar, Weşanxaneya Çanda Kurdî, Stockholm 1983, r 13-14.)

<sup>37</sup>Wek Mînak; Mewlana Xalîdê Kurdî (1773-1826), Şêx Evdîrehmanê Axtepî (1850-1910), Şêx Diyaeddîn (Navdarê bi Hezretê Norşînî) (Zinar, *Xwendina Medresê*, hb. r.14.)

<sup>38</sup>Wek Mînak; Pertew Begê Hekarî (? -1806), Bekir Begê Erzî, Şêx Ebdulahê Nehrî (1880), Şêx Ebdulqadir ê Nehrî, (1908), Seyîd Taha Nehrî, Şêx Seîdê Pîranî, Mele Selîmê Hîzanî, Seyid (Şex) Elî, Şex Şehabeddîn, Seyîd Riza, Şêx Mihemed îsayê Cibrî, Mele Hesen Hişyar (Zinar, *Xwendina Medresê*, hb. r.14.)

<sup>39</sup>Abdulcebbâr Kavak, "Melayê Cizîrî ve Tasavvufî Kürt Edebiyatının Gelişim Dönemi", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Yıl:1, Cilt1, Sayı 2, Kasım 2015, r. 56.

<sup>40</sup>Mele Nezîrê Êlihî, nivîskarê ‘eqîdeyek kurdî û hin qesîdeya ne. Fotokopiya destxeta wî li berdestê me ye. Mela (şêx) ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî, xwedî dîwanek muretteb e, ku bû ye nijara vê teze. Mela Mûhemmed Şah el Metmûrî, xwedî ‘eqîdeyek menzûm e. Fotokopiya wê li ber destê me ye. Şêx Feyzullahê Xiznewî, nivîskarê mewlûd, ‘eqîde û berhemek li ser nimêjê ye. Her sê berhemên wî jî menzûm û çapkirîne û li ber destên me ne.

<sup>41</sup> Ji bo sofîgeriya Baba Tahir bnr;

حهیدەر لەشکری ، له شەڕ بچەشمهوه بۆ حەقیقەت سەر هەڵدانى سوڤیگەری له پانتاییی کوردیدا ، بۆلۆگراوهی موکریان ، چاپی بەکەم ، ههولێر ٢٠١٣ ، ص ، ١٧٧-١٧٨ .

Piştî baba Tahir ‘Eliyê Herîrî, ev tovên zîldayî bi helbestên xwe av daye û kiriye tirhek edebiyata tesewifa kurdî. Her çend ku dîwana wî û ew<sup>42</sup>, ji wendabûyên edebiyata kurdî bin jî, di her şeş helbestên<sup>43</sup> gu gihastine dema me, tesewif wek rojê li ber çavan e.

Ew terha ku ‘Eliyê Herîrî şin kiriye, di dîwana Melayê Cizîrî de fêkî daye. Dîwana Melayê Cizîrî di edebiyata kurdî de dara Tubayê ye. Ne her helbestek belkî her misrayek ev dîwana bêhempa fêkiyekî pêşkêşî xwendevanan dike. Melayê cizîrî, bi dîwana xweyî giranbuha hem di warê edebiyatê<sup>44</sup> de, hem di warê tesewifê de, hem di warê helbestê de rûmeta edebiyata kurdî ye

Piştî Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran hem di helbestên xwe de û hem di menzûmeya xweyî bi navê ‘Şêxê Sen’aniyan’ de, tesewif, bi zimanê gel nivîsandiye. Serê şaxek dara tûbayê xwar kiriye gihandiye ber destê gel.<sup>45</sup> Geh bi avê re guftûgo kiriye û geh bi bilbilan re axiviye û derdên dilê xwe aniye ziman.<sup>46</sup>

Şêx Ehmedê Xanî, her çend ku hin nîqaş li ser hebin jî, bi ‘Mem û Zîn’ a xwe yî navdar tesewif bi teşeya dastanê xistiye edebiyata kurdî.<sup>47</sup> Reng û ronahiyek nû daye edebiyata kurdî. Helbestên wî jî, ji tesewifê xalî nîn in.

Sîyapoş, bi ‘Bedî’ul Cemal’ a xwe, rêya Şêx Ehmedê Xanî şopandiye û tesewif bi dastan nîşanî me daye.<sup>48</sup>

Mela Xelîlê Si’irdî di ‘eqîdenameya xwe ya bi navê ‘Nehcu’l-Enam’ ê de, beşek ji bo tesewifê veqetandiye û tesewif û armanca tesewifê, nexweşiyên dil û çareseriya wan ji biçûkên kurmancan re nivîsandiye. Ev berhem, ji bo fêrkirina tesewifê gelek girîng e.

Dema em li nivîskarên edebiyata klasîk a kurdî dinihêrin berya navên wan şêx an mela nivîsandiye. Ji ber hindî di berhem, dîwan û helbestên wan de tesewif her hebûye. Wek mînak; Melayê Bateyî, Seyyid ‘Eliyê Findikî, Mela Nezîrê Bedewî, Şêx Muhemmed Hadiyê

<sup>42</sup> Ayhan Yıldız, *Qewlê Hespê Reş (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2015, r. 111-115.

<sup>43</sup> Abdurrahman, Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbihar, Îstanbul 2013.

<sup>44</sup> Dîwana Melayê Cizîrî yekem dîwan a murettab e di edebiyata kurdî de; (Mehmet Zahir Ertekin, "Agirê ‘Işqê di Perspektîfa Mela de", *Mukaddime, Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, Melayê Cizîrî Özel Sayısı, Cilt 8, Özel Sayı 1, Kış 2017, Mardin, r. 90.)

<sup>45</sup> Ji bo agahiyên berfireh derbarê tesewifa Feqîyê Teyran bnr;

Şeyhmus Orkin, *Di Berhemên Feqîyê Teyran de Hêmanên Tesewufî*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Alparslan a Mûşê, Enstîtuya Zanîstên Cîvakî, Şaxa Makezanista Ziman û çanda Kurdî, Mûş 2015.

<sup>46</sup> M.Xalid Sadî, *Feqîyê Teyran, Jîyan, Berhem û Helbestên wî*, Weşanên Nûbihar, Çapa şeşem, Îstanbul 2000.

<sup>47</sup> Ji bo tesewif di berhemên Şêx Ehmedê xanî de bnr;

عزیزەدین مستەفا رەسوول، ئەحمەدی خان، شاعیر و بێرمان، فەیلەسووف و سۆفی (وەرگیرانی لەعەرەبی یەو، نووسەر خۆی) مەکتەبی بیر و هه‌وشیاری، سلێمانی ۲۰۰۸.

<sup>48</sup> Zeydin Güllü, "Mesnewiya Seyf-ul milûk û Bedî-ul Cemal a Siyahpoş", *Kovara Wêje û Rexne*, hejmar 7, sal 2016, Diyarbakır, r. 59-80.

Qewmanî, Mela Mehemedê Liceyî,<sup>49</sup> Şêx Nûreddînê Birîfkanî,<sup>50</sup> Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepi,<sup>51</sup> Mela ‘Eliyê Baqustanî<sup>52</sup> û wd.

### **Mela ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî**

Bedlîs, ji mêj ve navenda çand, huner û edebiyatê ye. Gelek nivîskar, zana, ‘alim ji vê navendê rabûne. Yek ji wan jî Mela ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî ye. Derbarê jiyana wî de agahiyên zêde li ber destê me tune ne. Bes di du jêderan de em rastî navê wî tên. Yek, Abdulcebar Kavak e. Kavak, di gotara xwe de navê wî derbas kiriye lê derbarê jiyana wî de tu agahî neda ye. Kavak, ji bo agahiyên xwe tu jêder jî destnîşan nekiriye.<sup>53</sup> Dudo, Abdurrahman Adak. Adak, di derbarê helbestvan de hinek agahî dane. Adak, agahiyên xwe ji, *Mu’cemu’ş-Şu’erai’l-Kurd*, û fotokopiya destnivîsa *Birketu’l-Kelîmat* a M. Asim Oxînî wergirtiye. Pêkan e ku Kavak jî agahiyên xwe ji *Mu’cemu’ş-Şu’erai’l-Kurd* wergirtibe. Adak, wiha dibêje:

*Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî helbestvanekî êwra dawî ya Osmaniyan e. Agahiyên di derheqê wî de kêma in. Navê wî Ebdulezîz, navê bavê wî Ebdulkerîm e. Li cem Şêx Fethullahê Werqanîsî (w.1899) xwendiyê û îcazeta ilmî ji wî stendiye. Bi ihtîmaleke mezin, ew di riya tesewîfê de jî li pey seydayê xwe çûye û ji wî xelîfetiya Neqşebendîtiyê wergirtiye. Loma jî wek “şêx” hatiye binavkirin. Şêx Ebdulezîz li navenda Bedlîsê wefat kiriye û li wir hatiye veşartin. Herçiqas tarîxa wefata wî nayê zanîn jî, ji sala wefata Şêx Fethullahê Werqanîsî (w.1899) tê fêmkirin ku ew helbestvanê dawîya sedsala XIXem û destpêka sedsala XXem e. Şêx Ebdulezîz helbestvanekî xwedî dîwan e û di dîwana wî de bi hemû herfên elîfbêya erebî helbest hene. Loma jî di nav helbestvanên Bedlîsî yê dawîya Osmaniyan de jî helbestvanên herî girîng tê hesibandin. Di dîwana wî de helbestên wî yê bi erebî, farsî, tirkî û kurdî hene. Ev jî hêza wî ya bilind a edebî nîşan dide. Piraniya helbestên wî medhiyeyên tesewîfî ne. Mixabin ji ber ku destxeta*

<sup>49</sup> Hüseyin Koyuncu, *Di Hin Dîwanên Kurdî de Bandora Tesewîfê*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Ziman û Wêjeya Kurdî, Bîngol 2014, r. 43-101.

<sup>50</sup> Ebdurreqîb Yûsif, *Dîwana Kurmancî, Şairên Klasîk ên Kurd*, latînîze; Ziya Avcı, Dîwan, İstanbul 2012, r.111-116.

<sup>51</sup> Derbarê tesewûfa Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepi bnr;

Murat Özeydın, *Şeyh Abdurrahman Aktepe, Hayatı Eserleri ve Tasavvufî Görüşleri*, Doktora Tezi, Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, İslam Bilimleri (Tasavvuf), Anabilim Dalı, Ankara 2008.

<sup>52</sup> Ji bo Tesewîf û helbestên Mela ‘Eliyê Baqustanî bnr;

Mehmet Zahir Ertekin, *Dîwançeya baqustanî (Metn û Lêkolîn)*, Weşanên Lorya, wan 2015.

<sup>53</sup> Abdulcebar Kavak, "Hâlîdiyye Medreselerinin Anadolu’daki İlmî ve Kültürel Hayata katkıları", *Bingöl Üniversitesi Medrese ve İlahiyat Kavşağında İslamî İlimler Uluslararası Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2013, c.1, r. 283.

*dîwana wî ji aliyê me ve nehatiye bidestxistin, derfeta me ji bo agahiyên berfirehtir tune ye.*<sup>54</sup>

Di dîwana Mela ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî de derbarê sala ji dayikbûniya wî, xwendina wî û îcazeta wî ya ilmî û tesewifî tu agahî tune ne. Di dîwanê de bi beytên wî em di peyitînî ku cara yekem di tesewifê de pêgirtiyê Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) ye.

شاهی تاخی اولاً ما را بعشقی بو مشیر

Pêşî Şahê Taxê bi ‘işqê ji me re bû rayezan (mux.2,bnd.13)

Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) di navbera 1831-1886an de jiyaye. Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) di sala 1868an de xelîfetî wergirtiye û di sala 1875a de li Norşînê di medrese û dergahê xwe de dest bi îrşadê kiriye.<sup>55</sup>

Eger ku em bibêjin Mela ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî 20 salî bûye pêgirtiyê Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) û di heman sala ku Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) dest bi Îrşadê kiriye bûye sofîye wî ew dem sala 1855 dibe sala jidayikbûna wî. Piştî wefata Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.), Mela ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî dibe salike Şêx Fethullahê Werqanîsî (q.s.).

پس از ان فاروقی بو عون و پناه و دستگیر

Piştî Farûqî bû alîkar û stargeh û piştgir (mux.2,bnd.13)

Heta Şêx Fethullahê Werqanîsî (q.s.) li heyatê bûye, perwerdehiya xwe ya tesewifî li ber deste wî domandiye. Piştî, wefata Şêx Fethullahê Werqanîsî (q.s.) li ber destê Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) seyr û sulûka xwe didomîne.

صیقلا قلبی مه ما دورا ته ای شمساً منیر

Sîqala qelbê me ma dema te ey roja rewneq (mux.2,bnd.13)

Piştî wefata Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) nebûye pêgiriye tu kesî. Li ser wefata Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) ş’ir nivîsandiye û tarîxa wefata wî di ş’irên xwe de diyar kiriye.

گشت از دنیا بسوی جنة المأوی روان

در هزار و سیصد و چل دوم از سال هجر

Ji sala koçê di sala hezar û sêsed û çil û diduwan de

Ji dinyayê ber bi cennet’ul me’wa rewan bû (x.98,b.3)

<sup>54</sup> Abdurrahman Adak, "Helbestvanên Klasîk ji Perspektîfa Herêmi: Nimûneya Herêma Bedlîsê", *The Journal of Mesopotamian Studies*, c: 1/1, Havîn 2016, r. 36.

<sup>55</sup> Mehmet Saki Çakır, "Şeyh Abdurrahman-ı Tâgî ve Norşin Tekkesi’nden Yayılan Kollar", *İhya Uluslararası İslam Araştırmaları Dergisi*, c.3, s. 2, Güz 2017, 26-53, r, 30.

Di beyta jor de wefata Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) bi salê hicrî 1342 nivîsandiye ku bi dîroka zayînê 1923 ye. Ev agahî tê wateya ku Mela ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî piştî wefata Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) jî li heyatê bûye. Eger em bibejin salekê piştî wefata Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) wefat bûye, wê gavê temenê wî dibe 68. Dibe ku dema bûbe pêgiriye Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) temenê wî ji 20 salî hîn zêdetir be. Ji bo dîroka wefata wî em negihaştin tu agahiyan. Lê ev teqez e û hat peyitandin di nîvê sedsala 19an de ji dayik bûye û di serê sedsala 20an de wefat kiriye.

Ji bo îcaza xelifetiya wî di dîwana wî de tu agahî nayên dîtin. Di berhemên ku xelifeyên Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.),<sup>56</sup> Şêx Fethullahê Werqanîsî (q.s.)<sup>57</sup> û Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.)<sup>58</sup> jimartine navê wî nayê dîtin. Li ser dîwana wî jî Mela ‘Ebdul’ezîz hatiye nivîsandin, şêx nehatiye nivîsandin. Di destpêka dîwanê de li serê xezela yekem de ‘*Haza Xezeliyatî Mela ‘Ebdul’ezîz El Bidlîsî*’ hatiye nivîsandin. Yanî; ‘ev xezelên Mela ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî’ ne.

#### **Dîwana Mela ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî**

Dîwana Mela ‘Ebdul’ezîzê Bitlîsî dîwanek murettab e. Bi çar zimanan; kurdî, farsî, ‘erebî û tirkî hatiye nivîsandin.<sup>59</sup>

Zimanê Helbestan	Hejmara Helbestan
Farsî	74
Kurdî	17
‘Erebî	11
Tirkî	4
Farsî-Kurdî	6
Farsî-‘Erebî	3
Farsî-Tirkî	1
Kurdî-Farsî-‘Erebî-Tirkî	1
Giştî	117

Di dîwanê de 100 xezel, 7 mesnewî, 3 Dubeytî, 3 Muxemmes, 3 Ferd û Mûlemme’ek<sup>60</sup> bi cih bûye. Bi giştî 117 helbest di dîwanê de hene.

<sup>56</sup> Bülent Akot, "Nurşin Medresesinin Yetiştirdiği Mutasavvıflar," *Bingöl Üniversitesi Medrese ve İlahiyat Kavşağında İslamî İlimler Uluslararası Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2013, c. 2, r. 208.

<sup>57</sup> Akot, hb. r. 210.

<sup>58</sup> Mehmet Çağlayan, *Şark Uleması*, Çağlayan Yayınları, İstanbul 1996, r. 201-202.

<sup>59</sup> Hejmara helbestên kurdî û farsî li gorî tespîten me ne. Lewra ji hev veqetandina helbestên farsî û kurdî karekî asan nîne. Di gelek helbestan de herdû ziman têkilhev hatiye bikaranîn. Herweha bi sedema mijara tesewifê helbestên kurdî, farsî û tirkî ji bêjeyên ‘erebî jî ne xalî ne. Dibe hin kes hejmara helbestên kurdî derxin 27a û hin kes jî daxin 10a.



Cûreyên Helbestan	Hejmara Helbestan
Xezel	100
Mesnewî	7
Muxemmes	3
Dubeytî	3
Ferd	3
Mulemme'	1
<b>Giştî</b>	<b>117</b>

Mijarên helbestên dîwanê bi piranî; tesewif, medhîyeyên li ser şêxê şa'ir û mersiyyeyên li ser wafeta wan, 'işqa Xweda û ne't e. Sê helbest li ser dîrokê, helbestek munacat e û helbestek saqîname ye. Du helbest; yek bi kurdî/farsi û yek bi 'erebî li ser diyarkirina wafata Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) hatiye nivîsandin. Di helbestekê de Şeyda, sedema nivîsandina dîwanê diyar dike. Şeyda wiha dibêje:

این نوستم در زمان لشکر غمهای من  
مجتمع بودی چو پنهان بود آن مولای من

Min ev nivîsandin di zamanê ku leşkerê xemên mi

Komdibûn di dema ku Mewlayê min ji min wunda dibû (mes.5,b.2)

Mijara helbestan	Hejmara Helbestan
Tesewif	65
Medhiye	27
Mersiye	8
Ne't	6
Îşqa Xweda	3
Dîrok	3
Tarîxa Wefatê	2
Munacat	1
Saqîname	1
Sebbê Nivîsandina Dîwanê	1
<b>Giştî</b>	<b>117</b>

Dîwan bi kêşa erûzê hatiye nivîsandin. Di dîwanê de 61 helbest bi behra Remelê, 32 helbest bi Hezecê, 11 helbest bi Muzarî, 9 helbest bi Recezê û bi behra Serî' û Tewîl jî du helbest hatine nivîsandin.

<sup>60</sup> Ev sinfandina helbesta, li gorî kafiye ya helbestan hatiye kirin. Helbestek sê beyt bi sedema kafiye ya wê me xezel hesaband. Dîsa helbestek ji sê beytan û helbestek ji du beytan pêk hatiye bi sedema kafiye ya wan me bi mesnewî hesaband.

Behrên Erûzê	Hejmara Helbestan
Remel	61
Hezec	32
Muzarî	11
Recez	9
Serî'	2
Tewîl	2
Giştî	117

Di dîwanê de şa'ir du mexles bi kar aniyê. Şeyda û 'Ebdul'ezîz. Lê bikaranina Şeyda ji a 'Ebdul'ezîz hîn bêtir e. Em li ser fotokopiya nusxeyek dîwanê xebitîn. Em dibêjin nusxe lewra em texmîn dikin ku ne destxeta şa'ir bi xwe ye. Lewra di serê helbestan de dibêje 'Welehû Eyden' ev hevok bi gelemperî ji bo nusxeyan tê bikaranîn. Ev nusxe bi tevahî 91 rûpel e. di her rûpelekî de 14 rêz bi cih bûne. Her beytek di rêzkê de hatiye nivîsandin. Lê beyta dawî a helbestan misraya wan li pey hev û di du rêzan de hatiye nivîsandin.

Di destxetê de dîwan li gorî herfên elîfbaya 'erebî hatiye amadekirin. Di pêşî de xezel hatine nivîsandin û bi hemû tîpên elîfbaya 'erebî xezel tîn dîtin. Piştî xezela teşeyên din jî li pey hev hatine nûsîn.

### Hîn Taybetiyên Dîwanê

Xezela 3, 44 û 92an de, du ziman; farsî û 'erebî bikarhatiye. Beytek bi farsî û beytek bi 'erebî hatiye nivîsandin.

Di xezela 13an de herfên serê beyta navê 'Elaeddîn' nişan dide. 'Elaeddîn, Şêx 'Elaeddînê Oxînî<sup>61</sup> ye û Lawê Şêx Fethullahê Werqanîsî (q.s) ye. Heman taybetî di xezela 71ê de û di xezela 94an de jî tê dîtin. Di xezela 71ê de navê 'Dîyaeddîn' û di xezela 94an de jî 'Fethullah El Farûqî' bi herfên serê misraya yekem a beytan hatiye nivîsandin. Di dawiya helbestan de vê taybetiya helbestan, şa'ir bi me dide famkirin. Wek mînak;

يتمزج منه اسم من أهوى وحسن أثرى

يا زكياً خذ من الايات مالمبدأ بها

Ya kesê zekî! bigre ji beyta herfa destpêkê

Navê ew kesê ku min jê hezkiriye û husna wî tesir li min kiriye tê berhev (x.94,b.15)

Di xezela 38an de her dû misrayên beytê ji heman bêjeyan pêktên. Lê şa'ir di misreyan de cihê bêjeyan guherandiye. Ev taybetî di temamê xezelê de heye. Mînak;

<sup>61</sup> Derbarê Şêx 'Elaeddîn de agahiyên berfireh di bin sernavê 'Rêberên Terîqetan Li Cem Şeyda' de ewê werin dayîn.

کس عاشقی ندارد آشفته همچو شیدا

آشفته همچو شیدا کس عاشقی ندارد

Tu kesekî weke Şeyda xwedî 'işqekî tevlîhev tune ye

Xwedî 'işqekî tevlîhev tune ye tu kesekî weke Şeyda (x.38,b.7)

Şeyda di xezela 45an de bi me'şûqa xwe re li ser mijara tesewifê guftûgo dike. Di her beytekê de di misraya yekem de şa'ir derdê xwe dibêje û di misraya duwem de jî me'şûqa wî bersîva wî dide. Lê hêjayê gotinê ye di bersîva me'şûqê de her ayetên Quranê tîn dîtin. Wek di beyta jêr de (کل صبار شکور)<sup>62</sup> hatiye bikaranîn.

گفتمش طاقت ندارم بیش ازین صبر آورم

گفت می یابد مرادش کل صبار شکور

Min jê re got; ji vê pê ve hêza min tune ez sebir bikim

Got: ew ê bigihêjin mirazê xwe kesên pîrr sebirker û sipasker (x.45,b.4)

Ev terz guftûgo di xezela 95an de jî tîn dîtin. Şa'ir di vê helbestê de rêçên gihaştina mehbûba xwe ji mehbûba xwe dipirse û mehbûba wî rê nîşanî wî dide.

گفتا که مگر از ترب زلف برنجی

گفتم چه عجب گر تو گرفتار شوی

Go; meger tu ji kêfxweşiya zulfê dilşikestî dibî

Min got: çi ecêb eger tu bibe muhtelayê wê (x.95,b.2)

Xezela 70yê xezela mustezad e.

Di xezela 84an de her misrayek beytê bi zimanekî hatiye nivîsandin. Di her beytekê de misraya yekem bi kurdî û a duwem bi farsî hatiye nivîsandin.

Di dîwanê de du helbest bi teşeya mesnewî li ser dîrokê hatine nivîsandin. Her dû helbest jî mijara wan şerê navbera misilmana û ermeniya ne. Mesnewiya 4an şerê Bedlîsê û mesnewiya 6an şerê gundê talorî<sup>63</sup> yê ji xwe re kiriye mijar.

Di mesnewiya 4an û 6an de hem herfên serê beytan û hem herfên dawîya beytan ji bo destnîşankirina dîrokê hatine bikaranîn. Di mesnewiya 4an de herfên serê beytan 'muharebetî bitlis' û di mesnewiya 6an de 'muharebetî talorî' destnîşan dike. Herfên dawîya beytan li gorî hesabê ebcêdê dîroka van muharebeyan diyar dike.

### Armanca Tezê

Du armancên sereke yên vê tezê hene.

a- Heta niha dîroka tesewifa kurdî bi rêk û pêk nehate nivîsîn. Her wiha bi kurdî/kurmancî li ser tesewifê xebateke 'ilmî tune ye. Li ser sofîgeriya helbestvanên klasîk ên

<sup>62</sup> Qurana Pîroz, Îbrahîm, 5. ; Luqman, 31. ; Sebe, 19. ; Şûra, 23.

<sup>63</sup> Talurî, Gundek e di navbera Sason, Mûş û Qulpê de dimîne.

kurmanç jî tu xebatên ber biçav nehatine amadekirin. Me jî xwest ku li ser tesewifa kurdî/kurmançî, bi wesîleya dîwaneke kurmançî, bisekinin. Loma ev mijar ji bo me ket binê lêkolînê.

b- Li ser Şeyda ku bi dîwana xwe bûye mijara vê tezê, heta niha tu xebatên zanistî nehatine kirin. me jî xwest ku ev ‘alim, şa’ir û mutesewifê kurd bête zanîn û hebûna wî, nasnameya wî bikeve nava lîteratura kurdî.

### **Rêbazên Amadekirina Tezê**

1- Me pêşî destxeteke Dîwana Şeyda peyda kir. Xebata me ya resen li ser vê nuskeyê ava bûye. Heta niha ev nusxe û tu nuskeyên din ên dîwanê nehatine latînîzekirin û nehatine çapkirin. Lê ev nusxeya destê me, ne destxeta nivîskar bi xwe ye. Lewra di dawiya nuskeyê de de dibêje di 13 rojan de hatiye nivîsandin.

2- Ji helbestan beytên ku bûn mînak, me wek nivîsa dîwanê bi tîpên ‘erebî nivîsand.

3- Li pey nivîsandina beytan bi tîpên ‘erebî, me wateya beytên ‘erebî, farsî û tirki bi kurmançî nivîsî.

4- Dîwan hem murettab e û hem hemû teşeyên nezmê li pey hev hatine nivîsandin. Bi vê sedemê me teşeyên nezmê li gor rêza nivîsandina wan bi reqeman nasand. Yanî xezela pêşî bu xezela 1, mesnewiya pêşî bû mesnewiya 1. Dema me mînak ji helbestan anî eger xezel be; me (x.95,b.2) nivîsand. Xezela 95an û beyta 2yan. Eger helbest mesnewî be me bi (mes.5,b.2) destnîşankir. Yanî mesnewiya 5an û beyta 2yan.

5- Di destnîşankirina mînakên ji beytên dîwanê de, me hewl da ji helbestên kurdî mînakan bidin. Çi dema di helbestên kurdî de mînak nehatin dîtin, ji neçarî ji helbestên farsî, ‘erebî û tirkî me mînak anî.

6- Temamê ayetên Qurana Pîroz û Hedîsên Resûlê Xweda (s.x.l.), me bi tîpên ‘erebî nivîsand. Ayetên mînak, sûre û jimara wan, di jêrenotê de hatin destnîşankirin. Wateya ayetan ji berhema bi navê Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, ku ji teref Serokatiya Karûbarê Dîyanetê ve hatiye çapkirin, di nava kevanokan de hat dayîn. Hedîsên resûlê Xweda (s.x.l.) ji kîjan berhemana hatine wergirtin, di jêrenotan de hat destnîşan kirin û wateyên wan bi kurdî hat nivîsandin.

7- Berî ku bi hûrgulî em bikevin nava tesewifa dîwanê, di çarçoveyeke giştî de em li ser tesewifa îslamî rawestiyân. Çavkaniyên sereke yê tesewifê, ciyê zayîna wê, sofîyên mezin ên îslamî, xebatên wan, derketina terîqetê, cûre û meşrebên terîqetê, mezin û damezrînerên wê, sofîgerî, çanda sofîtiyê... weke teorî hate xebitandin. Piştî wê, me berê xwe

da tesewifa kurdî û kurdan. Helbestvanên sofî yên kurd di helbestên xwe de ev mesele çawa rave kirine û nihêrîna wan a vê babetê çî ye, li ber çavan hat raxistin.

8- Bi saya tez, ferheng, lêgerîn û pirtûkên sereke yên tesewifê, em hûr û kûr li ser helbestên Şeyda sekinîn ku ramana wî ya nihînî ya derbarê tesewif û halatên wê hate derxistin. Bi vî awayî cara yekem, ji berhemêke kurmançî ya klasîk me tesewif neqand û bi rêbazeke zanistî raçav kir û danî ber destê xwendekar û peywendîdaran.

9- Çavkani, hem di jêrenotan de û hem di bin sernava çavkaniyan de bi zimanê wan ên resen hatin nivîsandin. Çavkaniyên ‘erebî bi ‘erebî, farsî bi farsî, soranî bi elîfbaya soran, tirkî bi tîpên latînî û kurmançî jî bi elîfbaya Celadet Bedirxan hatin nivîsandin.

### **Çavkaniyên Sereke Yên Tezê**

Me di amadekirina tezê de ji gelek berhemên tesewifê yên sereke sûd wergirt. Her wiha ev berhemên sereke bi kurdî, ‘erebî, farsî û tirkî bûn. Lewra mijareke wisa pêkan nebû ku tenê bi berhemên kurdî were rave kirin û bête encam dayîn. Hin ji berhemên sereke yên teza me ev in;

Bi sedema ku tesewif zanistêke îslami ye, *Qurana Pîroz* di teza me de bû çavkaniya sereke. Gelek ayetên Qurana pîroz ketin tezê û me ayetên Quranê bi erebiya wan nivîsand. Ji bo ayetên Quranê bi kurdî bînin famkirin *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî* ku ji teref Serokatiya Karûbarê Dîyanetê hatiye çapkirin me bi kar anî.

Ji bo mijarên tesewifê, ji klasikên tesewifê; ji berhema Ebî Nesir Sîracê Tûsî *El Lûme‘û*,

Ji *Rîsale ê Quşeyriye* ‘Ebdulkerim Quşeyrî, hem ji wergera wê a farsî û a tirkî,

Ji *‘Ewarif’u-l Me’arif* a Suhrewerdî (wergera farsî),

Ji *Et-te’erruf* a Ebûbekir Mûhemmed bîn Îshak El Kelebazî,

*Mesnewî* ya Mewlana,

*Îhyâu ‘Ulûmiddîn* a Îmamê Xezali (wergera tirkî), sud hat wergirtin.

Ji bo mijarên tesewifî ji berhemên ‘erebî; *Mi’racu’t- teşewwufî*, berhema Ehmed bîn ‘Ecîbe

*Dirâsetun fi’t-Tesewif*, Berhema Îhsan Îlahî Zehîr,

*et-Tesevvufu 'l-Îslâmî*, Berhema Feysel 'Ûn,

*Heqaîqun 'Enit Tesewifî*, Berhema 'Ebdulqadir 'Îsa û hin pirtûkên din, bi farsî; *Sofînameya Erdîşîr 'Ubadî*, bi soranî; *Tesewif çî ye*, berhema Şêx 'Elaeddîn Neqşebendî, bi tirkî; *Büyük Sürür, Âdâb*, a Mûhammed bîn Abdullah Hanî, *Îmândan Îhsâna Tasavvuf* berhema Osman Nûri Topbaş hat bikaranîn.

Ji bo dîroka tesewifê; terîqeta û jiyana serokên terîqetan; berhema Selçuk Eraydın *Tasavvuf ve Tarikatlar*, berhema Heyrani Altıntaş *Tasavvuf Tarihi* û berhema Hasan Kamil Yılmaz *Anahatlarıyla Tasavvuf ve Tarikatlar* bû çavkanîyên sereke.

Ji bo ravekirina şî'rê Şeyda û têgehên tesewifî; bi zimanê farsî; berhema Xetmî Lahorî *Şerh-ê 'Îrfân-ê Xezelhâ-yê Hafîz*,

Berhema Bûxarayî *Ferheng-ê Eş'ar-ê Hafîz*,

Berhema Zerrînkûp *Erziş-ê Mîras-ê Sûfiye*,

Berhema Seyyid Ce'fer Secadî *Ferheng-ê Istilahat ve Te'birê 'Irfanî*,

Berhema Cewad Nûrbexş *Ferheng-ê Nûrbexş*,

Bi 'erebî; berhema Sû'ad Hekîm *El Mu'cemi's Sûfi*,

Berhema Refîq 'Ecem *Mewsû'etî Mustelihatî Tesewif-il Îslamî*,

Bi tirkî; berhema Ethem Cebecioğlu *Tasavvuf Terimleri Ve Deyimleri Sözlüğü*,

Berhema Süleyman Uludağ *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü* wek berhemên sereke hatin bikaranîn.

Me her hewl da ku em ji berhemên kurdî zêde sûdê werbigirin. Ji ber hindî ji *Dîwan* a Melayê Cizîrî, *Mem û Zîn* û *Nûbihara Biçûkan* a Şêx Ehmedê Xanî, *Mewlûd* a Mela Huseynê Bateî, *Rewdi'n Ne'im* a Şêx 'Ebdurrehmanê Aqtepeî jî wek çavkanî di tezê de cih girtin.

## BEŞA YEKEM

### 1 TESEWIF

#### 1.1 Tesewif Çi Ye?

Xwedayê Te'ala, ji bo bendeyên Wî li ser rûyê dinyayê bi aşitî, aramî, biratî, xweşî, şadî û bextewarî bijîn û bi taybet ji bo bextawariya jiyana wan a axretê bi navê dîn, rê û rêgez saz kiriye. Pêxember û nebiyên Xweda ew kes in ku ev rê û rêbazên Xweda, fêrî însanan dikin û ji wan re rêbertiyê dikin. Pêxembertî, bi yekem însan Hz. Adem (e.s) dest pê kiriye û bi Hz. Mûhemmed (s.x.l.) vexwendina rîsaletê bi dawî bûye. Di navbera pêxemberê yekem û pêxemberê dawî de ji sed û bîst hezaran zêdetir<sup>64</sup> pêxember hatine û însan vexwendine bal fermanên aferîdeyê gerdûnê, Xweda.

Di navbera vexwendina pêxemberan de cudahî tune ye, teqez di banga wan de wekhevîyek heye. Hemû pêxemberan pêşî însan vexwendine bal tewhîdê.<sup>65</sup> Temamê pêxemberan însan vexwendine bal yek dînî, bal yek peristeyî/mebûdî, bal yek bang û dawetê. Derbarê yekîtiya yek peristeyî/mebûdî de Quran wiha dibêje.<sup>66</sup> *وَاللَّهُمَّ إِلَهًا وَاحِدًا لَا إِلَهَ إِلَّا هُوَ الرَّحْمَنُ* (66) *(Gelî mirovan')* Xwedayê we Xwedayekî tek û tenê ye. Ji Wî pê ve tu Xweda nînin. Ew e yê *Rehman û Rehîm*.<sup>67</sup> Quran derbarê wekhevîya dînê semawî de dibêje; *تَعَالَوْا إِلَى كَلِمَةٍ* (68) *Werin bêjeyekê qebûl bikin ku em û hûn tê da wekhev in*<sup>69</sup> Quranê puxteya banga hemû pêxemberan bi yek ayetekê aniye ziman; *فَاتَّقُوا اللَّهَ وَأَطِيعُوا* (70) *Vêca ji Xwedê bitirsîn û bi gotina Wî bikin*.<sup>71</sup>

Di navbera gotinên pêxemberan de yên ku ji ummetên xwe re kirine, ew rê û regezên ku dane ber wan, ku jê re 'şerî'et' tê gotîn, cudahî tune ye. Belkî şerî'eta ku pêxemberê dawî ji însanan re vegotiye, şerî'eta herî mikemmel, herî baş û berhevkirina şerî'etên hemû dînên

<sup>64</sup> Topbaş, hb. r. 13.

<sup>65</sup> ابوالمظفر منصور بن اردشير العبادى، صوفنامة التصفية فى احوال المتصوفة (به تصحيح : دكتور غلام حسين يوسفى) بنيادفر هنگ ايران، تهران، ۱۳۴۷، ص، ۱۱.

<sup>66</sup> *Qurana Pîroz*, Beqere, 163.

<sup>67</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 23.

<sup>68</sup> *Qurana Pîroz*, Alî 'Îmran, 64.

<sup>69</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 57.

<sup>70</sup> *Qurana Pîroz*, Şû'era, 110.

<sup>71</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 370.

semawîne. Quran wiha ferman dike. <sup>72</sup> شَرَعَ لَكُمْ مِنَ الدِّينِ مَا وَصَّى بِهِ نُوحًا وَالَّذِي أَوْحَيْنَا إِلَيْكَ وَمَا وَصَّيْنَا بِهِ (إِبْرَاهِيمَ وَمُوسَى وَعِيسَى) ‘Di dîn de ya ku li Nûh hatiye emirkirin û ya ku me ji bo te şandî û ya ku me Îbrahîm, Mûsa û Îsa pê fermanber kirin, ji bo we kiriye rêk û rêbaz...’<sup>73</sup> Navê dînê hemû pêxemberan yek e, Îslam e. <sup>74</sup> (مَلَّةَ أَبِيكُمْ إِبْرَاهِيمَ هُوَ سَمِيكُمُ الْمُسْلِمِينَ مِنْ قَبْلِ) ‘Bidin pey dînê bavê xwe Îbrahîm. Xwedê, ji berê de û di Quranê de jî hûn bi mislimanî nav kirine’.<sup>75</sup>

Vexwendîna pêxemberan a duwem ji bo bendetiya ji Xweda re ye. Lewra li gorî fermana Quranê armanca afirişa insanen bendetiya bo Xweda ye. <sup>76</sup> وَمَا خَلَقْتُ الْجِنَّ وَالْإِنْسَ إِلَّا (لِيَعْبُدُونِ) ‘Min, cin û insan bes ji bo ku îbadetê Min bikin afîrandine.’<sup>77</sup> Ev vexwendîna bendetiyê ji bo mefaya ummetê ye. Hem mefaya dînê û hem mefaya axretê. Yek ji sedema ku pêxember hatine şandin jî ev e. Hedîsa Resûlê Xweda ya di vî warî de wiha dibêje:<sup>78</sup> (بَعثت we.?’

Ji bo bidestxistina mefaya her du dinyayan divê bendeyên Xweda li gorî wan rêbazên Pêxember nîşanî wan dide – di dînê îslamê de navê wan Şerî’et e- jiyanekê ava bikin û bijîn. Di vê mijarê de Xweda wiha ferman dike. <sup>79</sup> (لِكُلِّ جَعَلْنَا مِنْكُمْ شُرَعَةً وَمِنْهَا جَا) ‘Me, ji bo her yekî ji we şerî’et û rêbazek daniye’.<sup>80</sup>

Xweda rêbaz û regezên dîn bi wesîteya fireşte Cebraîl ji pêxemberên xwe re hinartiye. Ji vê hinartinê re wehiy tê gotin. Pêxember ew rê û rêbazên bi wehyê hatine, digihînin însanan. Ji vê gihandinê re Rîsalet tê gotin. Ji ev rê û rêbazên ku histûna bendetiyê û bingehên jiyanê ne, jê re Şerî’et tê gotin. Ji pêkanîna şerî’etê re ta’et/peristin tê gotin. Ji vê peristinê re Îslam tê gotin. Ev hemû dibe dîn, ku sedema bextewarî û xilasiya temamê ‘aleman e.

<sup>72</sup> Qurana Pîroz, Şûra, 13.

<sup>73</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r.483.

<sup>74</sup> Qurana Pîroz, Hec, 78.

<sup>75</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 340.

<sup>76</sup> Qurana Pîroz, Zariyat, 56.

<sup>77</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 522.

<sup>79</sup> Qurana Pîroz, Maide, 48 .

<sup>80</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 115.

<sup>78</sup> العبادى، ص، ١٦ .



Fermanên ku şerî'et ji însanan re pêwîst dike du cure ne. Yek; fermanên girêdayî bi kirinên zahir, bi gotinek din kirinên bi bedenê, dudu; fermanên girêdayî bi kirinên derûnî yanî kirinên girêdayî bi qelb in. Fermanên kirinên bi bedenê du beş in: Emir, tiştên ku divê bête kirin; Nimêj, zekat, hec ji vê beşê ne. Nehiy; tiştên ku divê neyên kirin; kuştin, dizî, vexwarina şerabê ji vî beşî ne. Fermanên kirinên dil jî du beş in. Emir; baweriya bi Xweda û kitêbên Xweda, pêxemberên Xweda, dilsozî, qaîlbûnî, rastgoyî, ewlehî mînakên vê beşê ne. Nehiy; înkâr, quretî, pozbilindî, xurûr û çavnebarî wek mînakên vê beşê ne.<sup>81</sup> Her çend ku her du cure jî girîng bin lê cureya duwem ku girêdayî bi qelb ve ye ji cureya yekem girîngtir e.

Her du çavkaniyên dînê Îslamê ku Quran û Hedîsa Resûlê Xweda (s.x.l.) ye girîngî dane ser cureya duwem. Lewra derûnî bingeha zahir e û kirinên derûnî destpêkin ji bo kirinên zahirî. Derûn/qelb ne pak be kêmasî û qusûr di kirinên zahirî de peyda dibe. Ji ber hindî Resûlê Xweda (s.x.l.) islahî însanan bi islahî qelb girêdaye.<sup>82</sup> (الَا وَإِنْ فِي الْجَسَدِ مَضْغَةٌ إِذَا صَلَحَتْ) *Hişyar bin! Di cesed de parçeyek heye, dema ew selihî cesed giş diselihê, û dema ew çû fesadê cesed giş diçe fesadê. Hişyar bin ew qelb e.*

Girîngiya însanan li cem Xweda li gorî qelbê însan e. Lewra Xweda li qelbê însan dinihêre, li cesed û bedena însan nanihêre. Em vê yekê ji Hedîsa Resûlê Xweda (s.x.l.) hîn dibin:<sup>83</sup> ( لَا يَنْظُرُ إِلَىٰ أَجْسَادِكُمْ وَلَا إِلَىٰ صُورِكُمْ وَلَكِنْ يَنْظُرُ إِلَىٰ قُلُوبِكُمْ يَا اللَّهُ! ) *Xweda li cesede we û li ser çavê nanihêre, lê, li qelbê we dinihêre.*

Dema islahî însanan hat girêdan bi islahî qelb, ew qelbê ku esas û bingehe ji kirinên zahirî re, pêwîst dibe li ser însanan ku qelbê xwe islah bikin, qelb xilas bikin ji wan xisletên nebaş ên ku Xweda ji wan hez nekiriye û ji bedel wan xisletên nebaş qelbê xwe bi xisletên pak û rind bixemilînin ku Xweda jî vê yekê ferman dike;

(يَوْمَ لَا يَنْفَعُ مَالٌ وَلَا بَنُونَ\* إِلَّا مَنْ آتَى اللَّهَ بِقَلْبٍ سَلِيمٍ)<sup>84</sup> *Ew roja ku mal û zarok feyde nadin tu kesî. Ji bilî yê ku bi dilekî pak bête bal Xwedê ve.*<sup>85</sup>

<sup>81</sup> عبدالقادر عيسى، حقا نق عن التصوف، دارالعرفان، حلب، سورية ١٩٩٣، ص، ٢٧.  
<sup>82</sup> محمد زكى إبراهيم، أبجدية التصوف بعض ماله وما عليه، مطبوعات ورسائل العشيرة المحمدية، الطبعة الخامسة، القاهرة، مصر ٢٠٠٦، ص، ١٧.  
<sup>83</sup> عيسى، ص، ٢٩.

<sup>84</sup> Qurana Pîroz, Şû'era, 88-89.

<sup>85</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 370.

‘Alim û zanyarên Îslamê wek Suyûtî, Xezalî li ser pak kirina qelb sekinîne û zanista qelb, naskirina qelb û paqijiya qelb ji xisletên neqenc li ser kesan ferd û ‘eyn dîtine.<sup>86</sup> ‘Alim û zanyarê gewre Mela Xelîlê Sêrtî jî giringiyê dide paqijiya qelb, paqijkirina qelb ji zenga xisletên nebaş ferdû ‘eyn dibîne û xisletên nebaş ji qelbî re nexweşî dihesibîne.

Ji emradê dil ra ne ferd û dewa      Ku hirs û hesed kibr û ‘icb û riya<sup>87</sup>

‘Alim û zanyarên Îslamê ev ferdiyeta pakkirina qelb ji Qurana Pîroz û Hedîsên Resûlê Xweda (s.x.l.) deranîne. Quran wiha ferman dike:<sup>88</sup> (قُلْ إِنَّمَا حَرَّمَ رَبِّي الْفَوَاحِشَ مَا ظَهَرَ مِنْهَا وَمَا بَطَّنَ) ‘(Resûlê min!) Bibêje: Bêguman Xwedayê min, bes neqenciyên aşkera û yên veşarî,.. qedexe kiriye.’<sup>89</sup> Hemû hedîsên Resûlê Xweda ( s.x.l.) ên derbarê kibir, hesed, riyayê ku her yek beşek serbixwe di pirtûkên hedisan de cih girtine mînakî. Hedîsek Resûlê Xweda (s.x.l.) wek mînak em bidin ji bo girîngiya mijarê ew ê bes be:<sup>90</sup> (لا يدخل الجنة من كان في قلبه مثقال ذرة من كبر) ‘Naçe bihiştê ew kesê ku di qelbê wî de zereyek kibir hebe.’ Belê, kibir nexweşiyek ji nexweşiyên qelb e û dibe sedem ku însan ji Xwedê û ji bihiştan dûr bikeve.

Ne şayeste ye ku însan dema derkeve pêşberî însanan bi cil û bergên pak be û dema derkeve pêşberî Xwedayê xwe bi qelbekî gemarî be. Dervayê însan çawa cihê nêrîna însanan e, qelbê însan jî nezergaha Xweda ye. Hem ne şayeste ye ku însan nexweşiyên bedena xwe tedawî bike û nexweşiyên qelbê xwe tedawî neke ku xweşiya qelbê wî sedema selameta axreta wî ye û sedema xilasiya wî ye û sedema hezkirina Xweda ye.

Însan çawa bi dervayê xwe dizane, divê bi derûn/qelbê xwe jî bizanibe. Hin kêmasî û qusûrên însan hene bi dizî ne û ji qelb re nexweşî ne, lê însan pê nizane. Hay ji wî heye ku qelbê wî saxlem e. Ji ber hindî însan divê li rêya kifşa nexweşiyên qelbî bigere, li ser naskirina nexweşiyên bi hûrgulî bisekine û ji bo saxkirina wan tekoşînê bike.

Tesewif; rêyeke tenik û zirav e, ji şerî’etê derketiye ji bo pakkirina dil. Şerî’et, rave û şîroveya baweriyê, nimêjê, cihadê, rojiyê, zewacê, zekatê, karûxebatên dinyewî wek kirîn û firotinê, hesabgiriya axretê ye. Lê tesewif; daxwaza tehqîqa van hemûyan e. Xemilandina temamê ‘emelan/kirinan bi şahî û kêfxweşiya dil e. Perwerde û pakkirina exlaq ji tarîtiyên siruştî wek; riya/rûmetî, cefa, şirk/hevber a bi dizî, kîn, dijminahî, kibir/quetî,

<sup>86</sup> عيسى، ص، ٢٩.

<sup>87</sup> Mela Xelîl Si’irdî, *Nehcu’l-Enam*, (Şerh; Ahmed Hilmî Qoxî) Îhsan Yayınları, Stenbol 2004, r. 38.

<sup>88</sup> *Qurana Pîroz*, ‘Eraf, 33.

<sup>89</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 153.

<sup>90</sup> عيسى، ص، ٢٩، ٣٣.

hesed/çevnebarî û hemû tiştên ku ji dil re nexweşî ne. Her tiştê ku bi perwerdehî û pakkirina dervayê însên ve girêdayî be, şerî'et e. Her tiştê bi batin/derûn ve girêdayî be tesewif e. Ango; paqijkirina secadeyê ji tiştên necis şerî'et e, paqijkirina dil ji tarîtiyên beşerî tesewif e. Ji bo nimêjê destmêj girtin şerî'et e, her tim bi destmêj bûnî tesewif e. Di nimêjê de berê xwe bide qibleyê şerî'ete e, bi dilê xwe pêşberî Xweda be di nimêjê de tesewif e. Guhdarîkirina her tiştên ku bi dest, nig, çav, guh tîn kirin şerî'et e, rêzdariya her tiştên di derûnî de pêk tîn tesewif e. Her tiştê ku pêxember ji ummetê re gotiye bikin şerî'et e û her tiştên ku li ser ummetê sivik kiriye, lê pêxember bi xwe kiriye tesewif e. Wek nimêja şevê, negirtina zekatê, nimêja duha.<sup>91</sup>

Ji ber van tîkiliyên şerî'et û tesewifê em dikarin bibêjin tesewif 'Şerî'eta Derûnî ye'.<sup>92</sup> Tesewif bê şerî'et pêk nayê. Şerî'et bê tesewif nîvcî dimîne. Her du hewcedarê hev in. Hewcedariya wan hatiye şibandin bi cesed û rih. Tu hebûnek ji rih re çênabê bê cesed û tu jiyanek ji cesed re çênabe bêyî rih. Çi dema şerî'et û tesewif bi hev re derkeve holê 'heqîqet' tê meydanê.<sup>93</sup> Bi ev tîkilîyên xwe tesewif parçeyek ji dînê Îslamê ye û jê nayê veqetandin.

Wek puxteyek agahiyên li jor hatin dayîn em dikarin bibêjin tesewif; jiyanek sehabewarî ye. Murşîdên kamil jî, bi sîretên xwe yên nebîwarî nûnerên pêxember in û rêber in ji vê jiyanê re.

## 1.2 Peyva Sofî

### 1.2.1 Rayeka / Îştîqaqa Bêjeya Sofî û Tesewifê

Li ser rayek/îştîqaqa bêjeya sofî û tesewifê gelek nêrîn hene.<sup>94</sup> Lihevkirinek li ser rayeka wan tune ye. Bêjeya sofî û tesewifê bingegehên xwe ji zimanê 'erebî digirin an ji zimanê yewnanî digirin, li ser wê jî tifaqa zanyarên tesewifê çênebûye û gengeşiyêke mezin li ser heye. Hin ji wan bêjeyên ku ji bo rayeka tesewif û sofîyê hatine nîşandan em ê li jêr li ser wan

<sup>91</sup> العبادى ، ص، ١٧-١٨ .

<sup>92</sup> عبدالبارى الندوى، *بين التصوف والحياة* (نقله الى العربية: محمد الرابع الحسنى الندوى )، مكتبة دار الفتح ، دمشق ١٩٦٣، ص، ٢١ .

<sup>93</sup> محمد بن عيسى زروق الفاسى البرنسى، *قواعد التصوف* (تحقيق عبدالمجيد خيالى) دار الكتب العلمية ، بيروت ، لبنان ٢٠٠٥، ص، ٢٢ .

<sup>94</sup> Ji bo agahiyên zêdetir derbarê rayeka sofî û tesewifê bnr:

عيسى، ص، ٢٠-٢٢ .

فيصل عون، *التصوف الاسلام، الطريق والرجال*، مكتبة سعيد رأفت، القاهرة، مصر ١٩٨٢، ص. ٥٦-٤٢ .

احمد على رجاىى بخاراىى، *فرهنگ اشعار حافظ*، انتشارات علمى، چاپ هفتم، تهران ١٣٧٥، ص، ٣٩٧-٣٧٩ .

ماسينيون & مصطفى عبدالرازق، *التصوف* ، دار الكتاب اللبنانى - مكتبة المدرسة، بيروت، لبنان ١٩٨٤، ص، ٥١-٦٢ .

Selçuk Eraydın, *Tasavvuf ve tarikatlar*. Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Vakfı yayınları, İstanbul 2014. r. 51-54.

سيد جعفر سجادی، *فرهنگ اصطلاحات و تعبيرات عرفانى*، انتشارات طهورى، چاپ هفتم ، تهران ١٣٨٣، ص، ٥٣٦-٥٤٤ .

كامل مصطفى الشيبى، *صفحات مكثفة من تاريخ التصوف الإسلامى* ، دار المناهل ، بيروت، لبنان ١٩٩٧، ص، ٧-١٢ .

احسان الهى ظهير، *التصوف المنشأ والمصادر* ، ادارة ترجمان السنة ، لاهور ، باكستان ١٩٨٦، ص ، ٢٠-٣٥ .

bisekinin. Em li ser nîqaşa rêzimanîya van bêjeyan nasekinin, bes em ê wateya wan a ferhengî û tîkiliya wan bi peyva sofî û tesewifê re bidin.

1- (صوف) Sûf. Hirî. Bi sedema ku kesên sofî cilê hirî li xwe dikirin dibêjin peyva sofî ji hiriyê hatiye.<sup>95</sup>

2- (صوفيا) Sofus. Bêjeyeke yewnanî ye. Sophia an Sofos tê nivîsandin.<sup>96</sup> Di zimanê yewnaniyan de bi wateya hikmet û zanayiyê ye. Bêjeya feylesof jî ji ev bêjeya sofos hatiye. Hin kes dibêjin ew zanyarên misliman ku agahdarên felsefeya yewnaniyan bûn ev bêje ji bo tesewifa Îslamê bikar anîne. Bi vî rengî bêjeya sofî û tesewifê derketiye holê.<sup>97</sup>

3- (صفه) Sûffe. Bi wateya Ehlê Sûffe. Ev bêje ji Eshabê Sûffe hatiye wergirtin. Eshabê sûffe, hin ji sehabeyên mûhaciranin, di mizgefta Resûlê Xweda (s.x.l.) diman. Zahid û ‘abidên îslamê ên pêşînin. Bi piranî xizanbûn. Hejmara wan 400 an ji 400î zêdetirbûn. Ebû Zer ê Xeffarî, Selman ê Farisî, Bîlal ê Hebeşî, Suheyb, Hezîqe bîn Yeman (r.x.l.) ji meşhûrên ehlê sûffe ne. Bi sedema jiyana van sehabiyan ku wek jiyaneke tesewifî ye, hin kesan gotiye gotina tesewif û sofî ji sûffeyê hatiye wergirtin.<sup>98</sup>

4- (صوفه) Sûfe. Ji bo vê bêjeyê çar wate hatine diyarkirin.<sup>99</sup>

a- Navê qebîleya Benî Sûfe ye. Ev qebîle di zemanê borî de xizmetkarên Ke’bê bûne. Ji heciyan re rêbertî dikirin. Bi sedema ku ev qebîle ehlê xizmetê bûn bêjeya sofî jê hatiye wergirtin. Lewra sofî jî bi ta’et û ‘ibadetên xwe wekî xizmetkarekî ye.

b- Sûfe an sîf, bi wateya zeftkirina wan mûyê di kortika paş serê însan de şîn tîn hatiye. Wek mecaz dema însan li pey yekî revîya û bi mûyê paş serê wî bigire bi kar hatiye. Tîkiliya bêjeyê bi sofîtiyê, sofî jî li pey razîbûna Xweda digere û dixwaze bi dest bixe.

c- Sûfe, bi wateya hiriyê veçirandî û ji hev belav bûyî ye. Ev wate di tesewifê de tewazû û tezellula sofîyan tîne ziman.

d- Sûfe, bi wateya wan kesên ku ne endamê tu civat û qebîleyane hatiye bi kar anîn. Tîkiliya vê wateyê bi tesewifê ev e ku sofî, her çend qebîleyên wan cuda jî bin bi tesewifê bi hev du re tîn girêdan. Cûdatiya qebîleyan nabe pirsgirêk ji bo tîkiliya navbera sofîyan.

5- (صوفان) Sûfan. Ev bêje jî ji navê civateke din ji qebîleya Benî Sûfe hatiye.<sup>100</sup>

<sup>95</sup> رفیق العجم ، موسوعة مصطلحات التصوف الاسلامی ، مكتبة لبنان ناشرون ، لبنان ١٩٩٩ ، ص ، ٥٥٣ .

<sup>96</sup> Eraydın, hb. r. 52.

<sup>97</sup> عون، ص، ٤٦ .

<sup>98</sup> بخاری، ص، ٣٨٨ .

<sup>99</sup> سجادی ، ص ، ٥٣٨ - ٥٣٩ .

6- (صفا و صفوت) Sefa û Sefwet. Ji bo van bêjeyan pênc nêrîn hatine nîşandan.<sup>101</sup>

a- (صُفُوهُ) Sufwe. Bijarte. Boneya sofî bi vê bêjeyê ev e ku sofî jî bijarteyê însanan e.

b- (صَفْو) Sefwe. Bi wateya hêja û bijarteyê her tiştî tê bikaranîn. Hem bi wateya sêdaqeta di evînê de jî tê bikaranîn. Ji ber ku her du wate jî bi xisletên sofîyan re têkildar in hatiye gotin ku bingeha bêjeya sofî ev peyv e.

c- (صَفِي) Sefî. Wateya vê bêjeyê, dostê dilpak û safî ye. Bi pakî û saffîbûna dil bi bêjeya sofî re têkiliya wê ava dikin.

d- (صفا) Sefa. Şadî û Xweşî. Mebest ji vê bêjeyê, şadîbûna qelbê sofî ye. Ew kêfxweşiya ku bi razîbûna Xweda dikeve qelbê sofî. Hem bi wateya ew kêfxweşiya salik e ku digihêje me'rîfeta Xweda û ji tarîtiya nezaniyê xilas dibe.<sup>102</sup>

e- (مصافات) Mesafat. Secadî, li ser nîqşa rêzimaniya vê bejeyê gelekî sekiniye, lê wateya wê diyar nekiriye.

7- (الصفوانة) Sûfane. Sûfane navê cureyeke baqilêye. Ev baqil bi xwe şîn dibe. Ji ber hewcedariya însanan zêde bi ev cure baqilê re tune ye ew îhmal kirine û guh nedanê. Meşreba sofî şibandine ev cureya baqilê. Lewra sofî jî nefsa xwe îhmal dike û giringiyê nade nefsa xwe.<sup>103</sup>

8- (صف) Sef. Rêza yekem. Sofî bi dilê xwe nêzîktirînê Xweda ye, ji ber hindî xwe li hemberî Xweda di rêza yekem de dibînin.<sup>104</sup>

9- Hin kesan, wek Cuneydê Bexdadî, gotine peyva sofî ne ji tu zimanan hatiye. Bêjeya sofî ji *sûf* ê hatiye. Her herfek peyva sûfê jî remz û îşaretek e. Sad, bi wateya sebir, sidq û sefayê ye. Waw, wudd, werd û wefayê tîne ziman. Fê, ferd, feqr û fena yê îşaret dike.<sup>105</sup>

Rayeka bêjeya sofî û tesewifê ji kîjan peyvê an ji kîjan zimanî hatibe an ji tu zimanan nehatibe jî, îro tesewif zanistêke dînê Îslamê ye û sofî jî pêgirtiyê vê zanistê ye.

<sup>100</sup> سجادی ، ص ، ۵۳۹.

<sup>101</sup> سجادی ، ص ، ۵۴۱ - ۵۳۹.

<sup>102</sup> ماسینیون & مصطفى عبدالرازق ص ، ۵۷.

<sup>103</sup> الشیبی، ص، ۸.

<sup>104</sup> عون، ص، ۴۴.

<sup>105</sup> سجادی ، ص ، ۵۴۲.

### 1.2.2 Pênaseyên Tesewifê

Însan di du 'alemên gelek fireh de dijî. 'Alema zahirî û 'alema batinî, me'newî/derûnî. Tesewif bi piranî bi 'alema derûnî re têkildar e. Bendeyên Xweda di ev 'alema derûnî de bi rêyeke dûr û dirêj dixwazin bigihêjin armançê ku ev armanç Xweda ye. Di ev rêya gihiştina Xweda de di navbera Xweda û bendeyên Wî de hezar qonax û merhele hene.<sup>106</sup> Dibêjin Hz. Xidir (s.l.) gotiye hezar meqamê me'newî hene. Cuneydê Bexdadî gotiye hezar kax hene. Zenûnê Misrî gotiye hezar 'elem/al/nîşan hene. Ketanî jî wek Hz. Xidir (s.l.) gotiye hezar meqam hene. Dîsa Cuneydê Bexdadî gotiye hezar asteng û rêgir hene.<sup>107</sup> Wek kesekî ku bixwaze here deverê lê ji bo gihiştina vê deverê li ser rêya wî hezar bajar hebin û divê di van bajaran re derbas bibe. Ne pêkan e ku hezar bajar wekî hev du bin. Teqez ew ê ji hev du cuda bin.

Ji ber firehî û kûrbûna 'alema derûnî û bi taybet dûr û dirêjahiya rêya gihiştina Xweda gelek pênase ji bo tesewifê derketine holê. Bi gelemperî pênaseyeke tesewifê nayê dayîn. Suhrewerdî gotiye pênaseyên mutesewifan derbarê tesewifê de ji hezarî bêhtirin.<sup>108</sup> Em dikarin bibêjin her 'alim û zanyarekî tesewifê an her mûtesewifekî ji bo tesewifê pênaseyek aniyê ziman. Sedema cudahiya pênaseyên tesewifê bi cudahiya qonaxên seyr û sulûkê ve girêdayî ne. Di seyr û sulûkê de salik, li gorî hêz, taqet û qabiliyetên xwe bi pêş dikevin û meqamên me'newî bidest dixin. Pênaseya her yekî rewşa hal û meqamê ku tê da dijî tîne ziman.<sup>109</sup> Wek ku me li jor got, her yek pênaseya bajarekî dike. Bi teswîreke din; tesewif, bax û baxçeyekî gelek mezin û fireh e ku tê da hezar darên fêkî û gulan bi cih bûne. Her salikekî tesewifê li bin darekê sekiniye û pesnê wê darê daye.<sup>110</sup> Nayê gotin ku hemû dar yek cins e. Belkî her darek ji darên fêkî cinsekî cuda ye. Ew dem em dikarin bibêjin hemû pênase rastin lê di heman demê de hemû pênase kêr in. Lewra ne pêkane bi yek hevokekê hezar bajar an hezar darên fêkî bîn nasandin.

Hin kesên ku li ser tesewifê berhem nivîsandine pênaseyên tesewifê senifandine. Osman Nûrî Topbaş pênaseyên tesewifê di bin şeş beşan de senifandine û beşên xwe rave kirine.<sup>111</sup> Beşên Osman Nûrî Topbaş ev in:

- 1- *Tesewif xulqê xweşik û edeb e.*
- 2- *Tesewif tezkiyeya nefîsê û tesfîyeya qelb e.*
- 3- *Tesewif cengeke me'newî ye ku aşîtiya wê tune ye.*

<sup>106</sup> ابى محمد روزبهان البقلی، مشرب الأرواح ( ضبطه وصرحه عاصم إبراهيم الكيالى ) دارالكتب العلمية، بيروت، لبنان ٢٠٠٥، ص، ٩.

<sup>107</sup> البقلی، ص، ٩.

<sup>108</sup> يوسف خطار محمد، الموسوعة اليوسفية فى بيان أدلة الصوفية، مكتبة دارالآلآباب، دمشق، سورية ١٩٩٩، ص، ٢٨.

<sup>109</sup> إبراهيم، ص، ١٤.

<sup>110</sup> إبراهيم، ص، ١٤.

<sup>111</sup> Topbaş, hb. r. 27-45.

- 4- *Tesewif îxlas e.*
- 5- *Tesewif îstîqamet e.*
- 6- *Tesewif qayilbûn û radestî ye.*

Hasan Kamil Yılmaz jî pênaseyên tesewifê senifandine. Wî di bin deh beşan de pênaseyên tesewifê senifandine û her deh beş yek bi yek rave kirine.<sup>112</sup> Beşên senifandina Hasan Kamil Yılmaz ev in:

- 1- *Tesewif zuhd e.*
- 2- *Tesewif xulqê xweşik e.*
- 3- *Tesewif tefsiye, pakkirina dil e.*
- 4- *Tesewif tezkiye, yanî tekoşîna li hemberî nefse ye.*
- 5- *Tesewif îstîqamet e, yanî pêgirtina kîtab û sunnetê ye.*
- 6- *Tesewif radestbûna bo Xweda ye û Rebbanîti ye.*
- 7- *Tesewif gihiştina Heqq e (îhsan)*
- 8- *Tesewif jiyana rihê Îslamê ye.*
- 9- *Tesewif zanista batîni ye.*
- 10- *Tesewif zanista ledunn e ku aidê/têkilî xewasan e.*

Li ser pênaseyên tesewifê helbest hatine nivîsandin. Di her misrayeke vê helbestê de pênaseyê tesewifê heye. Helbest ji teref şêxê dergahê ‘Olanlar’ hatiye nivîsandin. Navê helbestvanî Îbrahîm Efendî ye. Helbest ji 24 beytan pêk hatiye<sup>113</sup>. Beytê serî ji vê helbestê ev e.

Bidayette tasavvuf sûfî bî-can olmağa derler  
Nihayette gönül tahtında sultân olmağa derler<sup>114</sup>

### 1.2.3 Pênaseyên Hin Mûtesewifan

Şêx ‘Ebdulqadirê Geylanî; tesewifji qîl û qalan nehatiye wergirtin. Lê hatiye wergirtin; ji bîrsîbûniyê, dûrbûniya ji tiştên jê tê hezkirin û tiştên xweşik.<sup>115</sup> Ebî Hesenê Nûranî; Tesewif, terkkirina temamê tiştê ku behra nefse tê da heye.<sup>116</sup> Cuneydê Bexdadî; Tesewif, bikaranîna temamê xulqê ku hatine pesinandin û terkkirina temamê xulqê ku hatine zemkirin.<sup>117</sup> Îbnî ‘Eta; Tesewif, hogiriya bi Xweda ye.<sup>118</sup> Seyyid Şerîf Curcanî; Tesewif,

<sup>112</sup> Yılmaz, hb. r. 28-53.

<sup>113</sup> Topbaş, hb. r. 42-45.

<sup>114</sup> Di destpêkê de tesewuf ji bêcanbûna sofî re tê gotin  
Di dawiyê de li ser textê dil ji siltantiya wî re tê gotin.

<sup>115</sup> محمد ، ص، ٢٨.

<sup>116</sup> ظهير ،التصوف المنشأ والمصادر ، ص، ٣٧.

<sup>117</sup> عيسى ، ص، ١٧.

<sup>118</sup> عيسى ، ص، ١٧.

<sup>118</sup> الكلابي، أبو بكر محمد بن إسحاق، التعرف لمذهب أهل التصوف (تحقيق وتعليق، محمود، عبدالحليم & سرور، طه عبدالباقى) مكتبة الثقافة الدينية، القاهرة، مصر، ١٩٦٠، ص، ٩١.

zanebûn û jiyana zahir, batin, daraz û rêzanên şerî'etê ye.<sup>119</sup> Ebû 'Elî Rûzbarî; Tesewif; ku bê qewirandin jî, bi sidq û teslîmiyet li ser çogan seknandina li ber deriyê hezkiriyê ye.<sup>120</sup>

#### 1.2.4 Armanca Tesewifê

Em dikarin her beşek ji beşên senifandina pênaseyên tesewifê an her pênaseyeke tesewifê wek armanceke tesewifê bipejirînin. Topbaş, di berhema xwe de du armanc ji tesewifê re danîne; exlaqê xweşik û însanê kamil.<sup>121</sup> Eraydî, yek armancekê ji tesewifê re datîne, ew jî; gihiştina kemala/bê kêmasiya exlaq û bi vî rengî bidestxistina wêristiya Resûlê Xweda (s.x.l.) ye.<sup>122</sup> Hasan Kamil Yılmaz dibêje; 'bidestxistina bextewariya ebedî' armanca tesewifê ye.<sup>123</sup>

### 1.3 Peydabûna Tesewifê Di Îslamê de

Di gerdûnê de sofîyê yekem, peyamber û însanê yekem Hezretî Adem (s.l.) e. Piştî ku bavê me Adem (s.l.) û dayika me Hewwa ji ew dara qedexe xwarin ji bihiştê hatin avêtin. Xweda ew hinartin dinyayê. Adem (s.l.) bi fermana Quranê <sup>124</sup>(وَعَصَىٰ آدَمُ رَبَّهُ فَغَوَىٰ) 'Adem bêemriya Xwedayê xwe kir, vêca riya xwe şaş kir.'<sup>125</sup> Çi dema ku Adem (s.l.) li xwe hay bû, wek ku Quran beyan dike: <sup>126</sup>(قَالَ رَبِّمَا ظَلَمْنَا أَنفُسَنَا) '(Adem û Hewwa) Gotin: Xwedayê me! Me neheqî li xwe kir.'<sup>127</sup> dest bi îstîxfarê kir. Toreya îstîxfara sofîya ji vê dest pê dike.<sup>128</sup> Demek dirêj ku bi îstîxfarê derbasdike ji teref Rebbê xwe rastî hin bêjeyan tê û bi wan bêjeyan tobe dike çawa ku Quran dibêje; <sup>129</sup>(فَتَلَقَىٰ آدَمُ مِنْ رَبِّهِ كَلِمَاتٍ فَتَابَ عَلَيْهِ) 'Paşê Adem ji Xwedayê xwe hin peyv wergirtin, bi van peyvan bi bal Xwedê ve tobe kir.'<sup>130</sup> Toreya tobeya sofîyan ji ev toba Adem (s.l.) dest pê dike. Bi vê tobeyê Adem (s.l.) tefsiye/ paqij bû, safî/pak bû û bû sofî<sup>131</sup>. Piştî hingî Xwedê tobeya Adem (s.l.) pejirand, bi fermana Quranê em dizanin ku hatiye

<sup>119</sup> Eraydî, hb. r. 39.

<sup>120</sup> Topbaş, hb. r. 41.

<sup>121</sup> Topbaş, hb. r. 49.

<sup>122</sup> Eraydî, hb. r. 56.

<sup>123</sup> Yılmaz, hb. r. 59.

<sup>124</sup> Qurana Pîroz, Taha, 121.

<sup>125</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 319.

<sup>126</sup> Qurana Pîroz, E'raf, 23

<sup>127</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 152.

<sup>129</sup> Qurana Pîroz, Beqere, 37.

<sup>130</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 5.

<sup>128</sup> العبادى، ص ، ٢٧ .

<sup>131</sup> العبادى، ص ، ٢٨ .





gel hev bûna bi Xweda re û di berdewama heman ayetê de sirra (فَأَنْزَلَ اللَّهُ سَكِينَتَهُ عَلَيْهِ) îtmînan/aramiya bi Xweda ji hevalê xwe re rave dike. Lê ev ravekirin ne bi dev e. Ji dilekî bal dilekî din ve ye. Ji aliyekî din ve em dizanin ku Resûlê Xweda (s.x.l.) zikrê cehrî/eşkere fêrî Hezretî ‘Elî (r.x.l.) kiriye.<sup>138</sup> Ji ber hindî ye ku hemû terîqet an bi rêya Hezretî Ebûbekir (r.x.l.) û an bi rîya Hezretî ‘Elî (r.x.l.) digihêjin Resûlê Xweda (s.x.l.).

### 1.3.1 Terîqeta Neqşebendiyye

Di berhemên dîroka tesewifê de sê qonax ji dîroka tesewifê re hatine destnîşankirin. Qonaxa zuhdê, qonaxa tesewifê û qonaxa terîqetan.<sup>139</sup> Di qonaxa tesewifê de gelek terîqet derketine holê. Terîqeta neqşebendiyye jî yek ji van terîqetan e. Şa’irê me pegirê vê terîqetê ye.

Yek ji wan terîqetên ku li erdnîgariya Kurdistanê belav bûye û hê jî berdewam e Terîqeta Neqşebendiyye. Avakarê vê terîqetê, Bahaeddîn Mûhemmed b. Mûhemmed El Bûxarî ye. Bi navê Şahê Neqşebend meşhûr bûye. Şahê Neqşebend, xelîfetiya terîqetê ji Seyyid Emîr Kulal (q.s.) wergirtiye. Şahê Neqşebend li nêzî Buxarayê li Qesrê ‘Arifan di sala 718an de ji dayîk bûye. Di sala 789an de di 71 saliya xwede wefat kiriye.<sup>140</sup> Bi sedema ku şa’irê me endamê vê terîqetêye em dixwazin hinekî li ser vê terîqetê bisekinin.

Ev terîqet, ji Hz. Ebûbekir (w.40/660) heta dema Şêx Teyfûr Bîn ‘Îsa Ebî Yezîd El Bîstamî (w.261/875) bi navê ‘*Siddîqiye*’ hatiye nasîn.<sup>141</sup>

Ji dema Ebî Yezîd El Bîstamî heta Mewlana ‘Ebdulxaliq Xucdewanî (w.617/1221) bi navê ‘*Teyfûriye*’ meşhûr bûye.<sup>142</sup>

Ji dema Mewlana ‘Ebdulxaliq Xucdewanî, ku bi ‘Helqeya Terîqeta Xwacegan’ nav peyda kiriye û belav bûye, heta zemanê Bahaeddîn Mûhemmed b. Mûhemmed El Bûxarî (Şahê Neqşebend) bi ‘*Xwaceganiye*’ tê nasîn.<sup>143</sup>

Ji Bahaeddîn Mûhemmed b. Mûhemmed El Bûxarî (Şahê Neqşebend) heta dema Nasuriddîn ‘Ubeydullah Ehrar Taşkendî (w.895/1490) bi navê ‘*Neqşebendiyye*’ an bi sedema navê Şahê Neqşebend bi ‘*Bahaiyye*’ tê zanîn.<sup>144</sup>

<sup>138</sup> Topbaş, hb. r. 21-22.

<sup>139</sup> عبد الحكيم عبدالغنى قاسم، المذاهب الصوفية ومدارسها، مكتبة مدبولي، الطبعة الثانية، القاهرة، مصر، ١٩٩٩، ص، ١٨.  
<sup>140</sup> ئيبيراهيم ئە حمە د شوان، سۆفيگه رى شيعرى ئابيينى و سۆفيگه رى له شيعره كوردبييه كانى محويدا، چاپخانه ي وهزارتى پروه رده، هه وئير ٢٠٠١، ص، ٧٨-٧٧.

<sup>141</sup> Muhammed bin Abdullah Hâni, *Büyük Sürür- Âdâb* (Tercüme, Abdülkâdir Akçiçek) Gonca Yayınları, İstanbul 1976, r. 39.

<sup>142</sup> Hâni, hb. r. 39.

<sup>143</sup> Hâni, hb. r. 39.

<sup>144</sup> Eraydın, hb. r. 374-375.

Piştî Şêx ‘Ubeydullah Ehrar Taşkendî heta ku digihêje dema Şêx Ehmed Farûqî Es-Serehendî (w.1034/1625) , ku bi navê Îmamê Rebbanî şuhret peyda kiriye, ev terîqet bi ‘*Ehrariye*’ hatiye binavkirin.<sup>145</sup>

Ji Şêx Ehmed Farûqî Es-Serehendî heta dema Şêx Şemsuddîn Hebîbullah Canê Canan Mezher (w.1195-1781) , bi sedema leqeba/bernavê Şêx Ehmed Farûqî Es-Serehendî ku ‘*Muceddid*’ e bi navê ‘*Muceddidiye*’ belav bûye.<sup>146</sup>

Şêx Şemsuddîn Hebîbullah Canê Canan Mezher û heta digihêje Mewlana Xalid Zulcenaheyn En’neqşebendî Eş’şehrezorî (w. 1242/1826) bi ‘*Mezheriye*’ tê nasîn.<sup>147</sup>

Ji Mewlana Xalid Zulcenaheyn<sup>148</sup> heta dema me bi navê ‘*Xalidiye*’ hatiye nasîn û ev terîqet hîn berdewam dike.<sup>149</sup>

### 1.3.1.1 Yazdeh Rêgezên Terîqeta Neqşebendî

Terîqet gelek giringî daye van rêbazan. Ehlê terîqetê van rêbazan ji xwe re pîroz dipejirînin. Bi sedema vê pîrozahiyê navê wan danîne Kelîmatê Qudsiyye (Bêjeyên Pîroz)<sup>150</sup>. Ji bo ku salik van rêbazan ji bîr neke û bi asanî bikaribe ji ber bike bi helbest nivîsandine.<sup>151</sup> Ev jî girîngiya van yazdeh rêbazan nîşan dide.

#### 1.3.1.1.1 Wuqûfê Zemanî (Pêzaniya Demê)

Zanebûna salikî li ser demên ku borandiye bi ‘Wuqûfê Zemanî’ anîne ziman. Salik divê ji demên ku jê boriye agahdar be. Zanibe ku demên derbas kirine bi çi rewşê derbas kirine. Gelo ev demen derbaskirî bi spasdariya Xweda derbas kirine û bûye sedema aramiya wî an bi xeflet derbas kirine û bûye sedema poşmaniya wî. Salik, pêwîst e bi xîretek wisa kar û xebatên xwe bidomîne ku ew demên lê diborin, hetta ew kêlikên wî jî divê ji armanca wî ya eslî re bixebitin. Salik divê herdem ev ayeta Qurana Pîroz bi bîr bîne û bizanibe ku Xweda herdem li ser wî agahdar e.<sup>152</sup> (وَمَا يُعْزُبُ عَنْ رَبِّكَ مِنْ مِثْقَالِ ذَرَّةٍ فِي الْأَرْضِ وَلَا فِي السَّمَاءِ)<sup>152</sup> ‘*Ne li erdê ne ji li asîmên bi qasî giraniya zereyekê tiştê ji ber Xwedayê te winda nabe.*’<sup>153</sup> Çi tiştê ku dike Xweda şahid e û dibîne. Bi ew fikr û ramanê taêt û ‘îbadetên ku dike di ber çavên xwe re

<sup>145</sup> محمد علي القره داغي، مکتوبات مولانا خالد، المكتبة الهاشمية، بقسمها العربي ولفارسی، بيروت، لبنان ۲۰۱۵ (قست فارسی) ص، ۳۶.

<sup>146</sup> Hâni, hb. r. 41.

<sup>147</sup> Hâni, hb. r. 41.

<sup>148</sup> Zulcenaheyn, bêjeyek erebiye. Wateya wê xwediyê du baskaye. Mewlana xalid bi sedema ku hem xelifetiya teriqeta qadirî û hem xelifetiya teriqeta neqşebendî wergirtiye ev bernavk lê hatiye kirin. Ji bo agahiyên berfireh bnr;

القره داغي، (قسم العربي)، ص، ۵۷-۲۵.

<sup>149</sup> Eraydın, hb. r. 374-375.

<sup>150</sup> Ali Kadri, *Risâle-i Behâiyye, Tarikat-ı Nakşibendiyye* (Çeviren Rahmi Serin) Pamuk Yayınları. İstanbul 1994, r. 77.

<sup>151</sup> Kadri, hb. r. 96.

<sup>152</sup> *Qurana Pîroz*, Yûnûs, 61.

<sup>153</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 214.

derbas bike. Mihasebeya kirinên xwe bike. Eger salik li ser vê rewşê be, ango Wuqûfê Zemanî di jiyana xwe ya sulûkê de pêk bîne ew ê bigihêje astekê ku di vê astê de êdî dizane Xweda hertim li ba wî hazir e. Bi pêla yeqînê dizane ku Xweda wî dibîne. Dema gihaşt vê astê heta ku bigihêje me'bûda xwe merzê 'ebdêtiya xwe derbas nake.<sup>154</sup>

#### **1.3.1.1.2 Wuqûfê Adedî (Zanebûna Hejmaran)**

Salik dema zikir kir divê hejmara zikrê xwe zanibe. Hem salik rêzdar be li ser hejmara zikrê xwe. Dema salik rêzdariya hejmara zikrên xwe bike hişê wî her tim ew ê li ser zikrên wî be. Di zikrê de mebest ne hejmar e. Mebest aramiya qelb e. Dema salik bi aramiya qelb zikir bike ew ê ji zikrê xwe sûd wergire û bandora zikrê wî di wî de xuya bibe. Di nefy û îsbatê de (kişandina zikrê La Îlahe Îllellah) de hebûna beşerî diçe û li dewsa wê cezbeya Îlahî bi cih dibe. Ev mertebeya yekem e ji bo 'ilmê ledunnî.<sup>155</sup>

#### **1.3.1.1.3 Wuqûfê Qelbî (Agahdariya Qelb)**

Salik divê agahdarê qelbê xwe be. Agahdariya qelb bi du rêyan derdikeve pêşberî salik. Yek, Sofî di her dema xwe de divê Xweda ji bîr neke. Di dilê xwe de ji Xweda pê ve cih nede tu tiştêkî din. Dudu, sofî dema zikir dike hiş û ramanê wî li ser qelbê wî be. Nehêle qelbê wî ji zikrê Xweda xafil bibe. Dema sofî nehişt ku qelbê wî ji zikir xafil bibe ew dem tecelliyatên Xweda dikevin qelbê wî.<sup>156</sup>

#### **1.3.1.1.4 Hûş Der Dem (Aramiya Nefesê)**

Wateya wê, hişyariya sofî ye li ser ew nefesa ku dikişîne û berdide. Sofiyekî bi hiş, hişyar û agahdar e li ser wê nefesa ku dikişîne û berdide. Lazim e ku nefesên xwe ji xefletê biparêze. Dema ku nefesên xwe ji xefletê parast qelbê wî pêşberî Xweda dibe. Ev jî rastiyeke e, lewra nefesa bi hiş tê sitandin û tê berdan, zindî ye û digihêje Xweda. Nefesa bi xeflet miriye û nagihêje Xweda. Hejmara tecelliyên Xweda li gorî nefesên mexlûqane. Heçî kesê nefesên xwe ji xefletê biparêze, pêşberî Xweda dibe û ji vê pêşberiyê ji tecelliyatan behredar dibe. Hem kesê ku zikir dike, li ser wateyên zikrê xwe bifikire ji xefletê xilas dibe. Hizra li ser wateya zikir, sofî digihîne tecelliyatên me'nan/wateyan.<sup>157</sup>

#### **1.3.1.1.5 Nezer Ber Qedem (Çav Li Piyan)**

Wateya wê; di meşê de li serê piyê xwe nêrîn e. Di meşê de kesê ku li der û dora xwe dinihêre dîqeta wî belav dibe û tiştê ku dibîne dikeve qelbê wî. Kesê di meşa xwe de li ber

<sup>154</sup> Hâni, hb. r. 270-271.

<sup>155</sup> Hâni, hb. r. 271-272.

<sup>156</sup> Yilmaz, hb. r. 259-260.

<sup>157</sup> Hâni, hb. r. 270-271.

piyê xwe binihêre çavê xwe ji nezera heram diparêze. Lewra perdeyên ku tèn ser qelb û qelb dorpêç dikin bi piranî ji nêrîna nepêwîst peyda dibe. Çav casus/ajan ê qelbe. Tiştê ku çav dibîne qelb mijûl dike. Di nêrîna li ber pêyan de tewazû heye, sînorê xwe zanîn heye, peyrewtiya sunneta Resûlê Xweda (s.x.1.) heye.<sup>158</sup>

Wateyek din jî ev e. Kesên ku ji sofî re axyar/biyani ne, divê sofî li rûyê wan nenihêre. Sedema vê ev e. Kesên dilpak wek neynika bi sîqal e. Ew xisletên ne pak û fikren xirab ên ji kesên dilhişk tèn zû bi zû di dil de cih digire. Ev cih girtin ji nêrîna ser çavên wan kesên dilhişk derdikeve. Ev nêrîn tîrek ji tîrên şeytan e. Loma ji salik re pêwîst dibe ku li ber piyê xwe binihêre û bimeşe ku ji vê xeterê reha bibe.<sup>159</sup>

#### 1.3.1.1.6 Sefer Der Weten (Geşta Bal Welat)

Di tesewifê de wateya wê, geşta ji xelkê, bal Heqq e. Geşta salikî ji vê ‘alema hebûnê bal Xweda ve ye. Ehle terîq ev mijar, li ser ayeta Qurana Pîroz ava kirine. <sup>160</sup> وَقَالَ إِنِّي ذَاهِبٌ إِلَى رَبِّي سَيِّئِينَ ‘Ez diçim bal Xwedayê xwe ve, Ew ê min rasterê bike’<sup>161</sup> Wateyek din dibe ku ev be; derbasbûna ji rewşekê bal rewşek hîn çêtir û xweşiktir, an ji meqamekî, bilindbûna bal meqamê bilindtir. Geşta salikî ji bo peydakirina murşide kamil jî dikeve bin vê têgehê.<sup>162</sup>

#### 1.3.1.1.7 Xelwet Der Encumen (Xelweta Nav Civakê)

Sofî di nav civakê de bi hebûna xwe ya maddî bi civakê re têkil be jî lê bi qelb hertim bi Xweda re be, di hizûra Xweda de be.<sup>163</sup> Bi vê wateyê ev hevok tê wateya muraqebeyê. Şahê Neqşebend (q.s.) gotiye terîqeta me li ser xelweta di nav civakê de hatiye avakirin. Hem gotiye xêr di civakê de ye û civak jî sohbet e.<sup>164</sup> Şahê Neqşebend (q.s.) bi ev gotinên xwe tesewifê ji ruhbantiyê xilas dike û rêbazeke îrşadê ku sohbet e destnîşan dike. Şahê Neqşebend (q.s.) ev rêbazên xwe ji ayeta Qurana Pîroz wergirtiye. <sup>165</sup> رَجَالٌ لَا تُلْهِهِمْ تِجَارَةٌ وَلَا بَيْعٌ ‘Hin merivên wisa (di wan de hene) ku ne bazirganî ne jî danûstandin nikare ji bîranîna (navê) Xwedê, ji kirina nimêjê û

<sup>158</sup> Yilmaz, hb. 259-260.

<sup>159</sup> Hâni, hb. r. 274-275.

<sup>160</sup> Qurana Pîroz, Saffat, 99.

<sup>161</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 448.

<sup>162</sup> Hâni, hb. r. 276-277.

<sup>163</sup> Hâni, hb. r. 277.

<sup>164</sup> Eraydın, hb. r. 378.

<sup>165</sup> Qurana Pîroz, Nur, 37.

*dana zekatê wan mijûl bike. Ew ji rojek wisa ditirsin ku tê de dil û çav serûbinê hev dibin.*<sup>166</sup>

Li gorî neqşebendiyên xelweta rasteqîn ev e. Di vê xelwetê de salik di nav gel de rûdinê, kar û barê xwe dike, kirîn û standina xwe dike, dizewice, têkilî gel dibe lê, kêlikekê jî ji Xweda xafil nabe. Xelweta bi vî rengî pêkanîna sunnetê ye. Lewra Resûlê Xweda (s.x.l.) di nav civatê de maye, tenêbûn nepejirandiyê.<sup>167</sup>

#### **1.3.1.1.8 Yad Kerd (Zikir Kirin)**

Zikirkirina bi qelb û dev bi hev du re ye. Salik di halê muraqebeyê de dema zikrê nefy û îsbatê (zikre tewhêdê- kelîma La Îlahe Îlallah) dikişîne bi ziman û devê xwe zikir dike. Ev zikirkirina bi dev ji bo jêbirina zingara qelb û ziman e. Qelb girêdayî bi unsûrên maddî ve ye. Dema ev unsûrên maddî zeng digirin qelb jî bi wan re zeng digire. Ev zikrê nefy û îsbatê vê zengê jê dibe û qelbî sîqal dike. Bi vî rengî qelb ji halê muraqebê derdikeve dikeve halê muşahedeyê.<sup>168</sup>

#### **1.3.1.1.9 Baz Geşt ( Veger)**

Di hengama kişandina zikrê nefy û îsbatê de salik nefesa xwe dikişîne. Dema nefesa xwe berdide divê bibêje: (إلهي انت مقصودي و رضا ك مطلوبی) ‘*Ya Rebî, meqseda min Tu yî, daxawaze min jî razîbûna Te ye*’. Ev hevok wateya zikrê ya nefy û îsbatê di qelbê salik de bi cih dike. Sirra tewhîdê dikeve dilê wî. Hebûna hemû kesan li pêş çavê wî winda dibe. Hebûna zatê Xweda ji wî re zahir dibe.

#### **1.3.1.1.10 Nîgah Daşt (Parastin)**

Wateya wê; parastina qelb ji xewatiran – fikr û ramanên dikevin qelb<sup>169</sup> - e. Di dema zikrê de salik divê qelbê xwe ji xewatiran biparêze. Li qelbê xwe xwedî derkeve. Nehêle tiştêk têkeve qelbê wî. Dema xewatir têkevin qelbê wî encama ku ji zikrê tê xwestin hasil nabe.<sup>170</sup>

#### **1.3.1.1.11 Yad Daşt ( Nîşe Girtin)**

Famkirin û têgihiştina ‘Nîgah Daştên’ê bi hûrgulî ye. Derxistina her tiştê ji dil û her tim fikra Xweda jî dikeve bin wateya vê têgehê. Divê salik bihêle ku qelbê wî muşaheda tecelliyatên Xweda bike û bi vî rengî qelbê xwe biparêze. Ev têgeh bi wateya hizur/aramî jî

<sup>166</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 354.

<sup>167</sup> Hâni, hb. r. 277-279.

<sup>168</sup> Hâni, hb. r. 279.

<sup>169</sup> Ali Kadri, xwatirên ku dikevin qelb û qelb perde dikin bi şeş cureyan destnîşan kiriye. (Kadri, hb. r. 83.)

<sup>170</sup> Hâni, hb. r. 281-282.

hatiye. Li cem neqşebendiyan hizûr, muşahedeya nûrên Zatê Ehedî ye. Lê şiklê vê muşahedeyê cuda ye. Bes kesên ji civata xewasan dizanin.<sup>171</sup>

### 1.3.1.2 Zikir Di Terîqa Neqşebendî De

Terîqet li ser pêkanîna îxlasê di kirina ‘îbadetan de û bidestxistina mehebbeta Xweda hatiye avakirin. Ji bo bidestxistina van mebestan pêkanîn û emr û fermanên şerî’etê merca yekem e. Sofî divê xwe ji temamê heramiyan dûr bixe, hetta xwe nêzîkî tiştên bi şik û şubhe jî neke. Merca duwem; rî’ayet/rêzdariya suneta Resûlê Xweda (s.x.l.) ye.<sup>172</sup> Jiyanekê li ser pêkanîna hemû şert û mercên şerî’etê û bi cih kirina suneta Resûlê Xweda (s.x.l.) ji sofîyên terîqeta neqşebendî tê xwestin.

Kesek ji bo bibe pêgirê/sofîyê vê terîqetê piştî ku li ber destê şêx/murşidê kamil tobe kir, pêwîst e heşt mercan pêk bîne. Di berhema ‘El Kelimati’l Qudsiyyetî Li’s Sadati’n Neqşebendiyyetî’ de van şertan wiha rêz dîke.<sup>173</sup>

- 1- *Bi niyeta tobeyê destmêj girtin.*
- 2- *Bi niyeta tobeyê xusil girtin.*
- 3- *Kirina du rik’et nimêj. An bi niyeta tobeyê û an bi taybet bi niyeta îstîxareyê vê nimêjê bike.*
- 4- *Hem bi qelb û hem bi dev tobe kirin.*
- 5- *Herî kêr bîst û pênc û herî pir heftê û pênc caran gotina bêjeya ‘Estexfîrullah’.*
- 6- *Xwendina pênc fatihe (sûreyê fatihe ji Qurana Pîroz) û bexşandina xêra van fatiheyên ji Resûlê Xweda (s.x.l.) û sadatên terîqetê re.*
- 7- *Rabîteya mirinê.*
- 8- *Rabîteya şêx.*

Sofî van şertan bi şev pêk tîne. Bi tenê û li ser kêleka xwe ya rastê berê wî li qibleyê radikeve û heta derketina rojê xeber nade.

#### 1.3.1.2.1 Vird

Di terîqeta Neqşebendî de du cure zikir hene. Ji van zikran re wird tê gotin. Zikrê lefzê Celal (lefzê Ellah) û zikrê lefzê tewhîd (Laîlaheîlallah) e. Zikrê lefzê celal tenê bi qelb tê kişandin/gotin. Di destpêka tesewifê de – dema sofî hîn nû dest bi seyr û sulûkê dîke – bi pênc hezaran dest pê dîke (sofî her roj pênc hezar car lefzê celal dibêje). Mebesta kişandina vî

<sup>171</sup> Hâni, hb. r. 282.

<sup>172</sup> *El Kelimati’l Qudsiyyetî Li’s Sadati’n Neqşebendiyyetî, Nâkşibendi Şeyhlerinin Mukaddes sözlere* (Tercüme Salih Uçan) Huzur Yayınevi, İstanbul 1983, r.495-496.

<sup>173</sup> *El Kelimati’l Qudsiyyetî Li’s Sadati’n Neqşebendiyyetî*, r. 495-501.

zîkrî, bidestxistina halê muraqebeyê ye.<sup>174</sup> Dema ji letaîfên sofî exfa gihaşt sîfatê kemalê dev ji zîkrê celal berdidê û dest bi zîkrê tewhîdê dike. Ji vî zîkrî re dibêjin *Nefy û Îsbat*. Ango, tunekirina nefsê û îsbat/peyitandina Xweda di qelb û bedenê de. Terîqetê ji bo vî zîkrî çar rukun, çar şert û pênc adab destnîşan kirine.<sup>175</sup>

### 1.3.1.2.2 Rabîte

Rabîte xeyal kirina rûyê şêx e û ji rûhaniyeta wî xwestina îstîmdadê ye. Rabîte, di terîqeta Neqşebendî de cihekî girîng digire. Cureyên rabîteyê gelek in di terîqetê de. Rabîteya li cem şêx, rabîteya ne li cem şêx, rabîteya dema ji xew hişyar dibe, rabîteya dema têkiliyê bi civakê re ava dike, rabîteya dema destpêka xitmê, rabîteya li gel ‘aliman û rabîteya li gel surîştî û xweşikahiya gerdûnê. Lê rabîteya herî girîng di navbera nimêja mexrib û ‘îşayê de tê kirin. Ev rabîte rabîteya şêx e. Sofî, bi qelbê xwe rûyê şêxê xwe di xeyala xwe de bi cih dike. Bi vî rengî qelbê xwe bi qelbê şêxê xwe ve girêdidê. Ev rabîte pêwîst e her roj bête kirin. Ev rabîteya vê demê du cure ne. Rabîteya şeklî (sûrî) û rabîteya me’newî. Di her cureyeke rabîteyê de pêkanîna rabîteyê ji hev cuda ye.<sup>176</sup> Ji bo pêkanîna rabîteyê hin şîkl û dirûv û form hene. Ali Kadrî di berhema xwe de çar dirûvên pêkanîna rabîteyê nîşan kirine.<sup>177</sup> Tê famkirin ku di terîqeta Neqşebendî de sofî di hemû jiyana xwe de pêwîst e rabîteyê bi cih bike.

### 1.3.1.2.3 Xitmeya Hacegan

Zikrek e ku sofîyên vê terîqetê bi hev re dikin. Du cureyên wê hene. Xitmeya biçûk û xitmeya mezin. Eger koma sofîyan ji deh kesan hindiktir be xitmeya biçûk tê kirin, lê ji deh kesan bêtirbin xitmeya mezin tê kirin. Di xitmeya mezin de, ji sûreyê Qurana Pîroz ‘*Elem Neşreh*’ tê xwendin di ya biçûk de nayê xwendin. Di xitmeya mezinde 1001 sureyê ‘*Îxlas*’ tê xwendin, di ya biçûk de, ji bedel sûreyê ‘*Îxlas*’ê 500 car ‘*Ya Baqî Entel Baqî*’ tê gotin. Fatihe îxlas, elem neşreh û selewatên ku tên xwendin xêr û sewaba wan ji erwahê sadatên terîqetê re tê bexşandin. Navên sadatê terîqetê yek bi yek tê xwendin.<sup>178</sup>

### 1.3.1.3 Silsileyê Terîqeta Neqşebendî ji Destpêkê Heta Dema me

Temamê silsileyê terîqeta ji Pêxemberê Xweda Muhemmed Mustefa (s.x.l.) dest pê dike.

<sup>174</sup> *El Kelimati'l Qudsiyyeti Li's Sadati'n Neqşebendiyyeti*, r. 508-510.

<sup>175</sup> *El Kelimati'l Qudsiyyeti Li's Sadati'n Neqşebendiyyeti*, r. 518.


<sup>176</sup> *El Kelimati'l Qudsiyyeti Li's Sadati'n Neqşebendiyyeti*, r. 504-508.

<sup>177</sup> Kadri, hb, r. 56.

<sup>178</sup> Eraydın, r. 387-388.



## ZINCÎRA SILSILEYA TERÎQETA NEQŞEBENDÎ



Ev Silsileya terîqeta neqşebendiyye heta şêxê Şeyda ê sêyemin hatiye nivîsandin. Terîqet di dema me de bi gelek şaxên xwe xebata xwe didomîne.

## 2 TESEWIF DI DÎWANA ŞEYDA DE

### 2.1 Terîqeta Şeyda

Şeyda pêgirê/mensûbê terîqeta neqşebendî ye. Di beytên xwe de pêgiriya xwe wiha bi me nîşan dide.

جمله عالم مانه بیچار و حزین و دردمند  
 لوژدنیای کو چو پیری طریقاً نقشبند  
 صد هزاران هر وکی عبدالعزیز مستمند  
 دل کنییم دل کنییم دل کنییم دل کنییم  
 دردمندم دردمندم دردمندم بی طیب

Hemû ‘alem mane bêçare û bihuzn û kuldar  
 Lewra ji dinya yê ku çû pîrê terîqa neqşebend  
 Dil şikestîme dil şikestîme dil şikestîme dil şikestî  
 kuldarim kuldarim kuldarim bê bijîşk (mux.1,bnd.6)

Ew beytên jor wek ku xuya dike li ser wefata şêxekî terîqa neqşebendî hatiye nûsîn. Wek şa’irê me ‘Ebdul’ezîz<sup>179</sup>, gelek kes bi wefata şêx xemgînî, bi derd û kul in. Di beytê de bi bêjeya ‘mustemend’ em têdigihêjin ku şa’ir pêgirê tereqîqa neqşebendî ye. Lewra wateya ‘mustemend’ xizanî û hewcedarî ye. Şa’ir hewcedariya xwe li hemberî şêxê wefatbûyî tîne ziman ku bes salik hewcedarê şêxên xwe ne û xizanên deriyê şêxên xwe ne û ji bo wefata şêxên xwe xemgîn dibin û kul û derd di dilê wan de cih digire. Bi vî rengî şa’ir pêgirîya xwe yî terîqeta neqşebendî tîne ziman.

Şa’ir di beytên jor de terîqa Neqşebendî bi lêv nekira jî dîsa me yê fêh bikira ku mensûbê terîqa Neqşebendî ye lewra aşkereye ku helbest li ser wefata şêxekî hatiye nûsîn û helbestvan navê şêx di helbestê de aniye ziman.

حسرتی ایرو لمه غائب بو او قطب زمان  
 حضرت ثانی ضیاء دین وارض و آسمان  
 دستگیر هر فقیران مستغاث عالمان  
 دل کنییم دل کنییم دل کنییم دل کنییم  
 دردمندم دردمندم دردمندم بی طیب

Hesretê îro li me wenda bû ew qutbê zeman  
 Alîkarê her hejaran hewara ‘aleman  
 Hedretê sanî ronahiya dîn û erdû asîman

<sup>179</sup> ‘Ebdul’ezîz, navê helbestvan ê rasteqîn e. Di helbestan de hem navê xwe yê rastî (‘Ebdul’ezîz) û hem Şeyda wek mexles bikaraniye. Lê bikaranina Şeyda ji ‘Ebdul’ezîz gelekî zêdetirt e. Ji ber pîrbikaranina mexlesa Şeyda me navê dîwanê danî ‘Dîwana Şeyda’.

Dil şikestîme dil şikestîme dil şikestîme dil şikestî  
kuldarim kuldarim kuldarim bê bijîşk (mux.1,bnd.3)

Ji misraya sêyem bi zelalî xuya ye ku şêxê ku wefat kiriye Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s) e ku bernavkê vî şêxê mezin ‘Hezret’ e. Weke ku li jor di ‘Zincîra Silsileya Terîqeta Neqşebendî’ de hat destnîşan kirin Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s) yek ji sadatê terîqeta Neqşebendî ye. Bi van agahiyan jî em têdigihêjin helbestvanê me pêgirtiyê terîqeta Neqşebendî ye.

Helbestvan di helbestên xwe de şêxên xwe yek bi yek bi me dide nasîn. Li jêr em ê li ser şêxên helbestvan rawestin. Dema em li şêxên wî mêze dikin hemû şêxên wî sadatên terîqeta Neqşebendî ne. Bi van agahiyan jî em dizanin ku helbestvanê me mensûbê terîqeta Neqşebendî ye.

## 2.2 Murşid/Şêxên Şeyda

Şeyda di helbestên xwe de murşidên xwe bi me dide nasîn. Li gorî nasandina wî em fam dikin di jiyana xwe de sê murşid ji xwe re pejirandine. Ev pejirandina wî bi sedema wefata murşidên wî ne. Şeyda piştî pêgiriya murşidekî, heta ew murşid li jiyane be, dev ji murşidê xwe bernedaye û ne bûye mensûbê murşidekî din. Piştî wefata murşidê xwe murşidekî din ji xwe re hilbijartiye.

شاهی تاخی اولاً مارا بعشقی بو مشیر  
پس ازان فاروقی بو عون و پناه و دستگیر  
از فقیرم بی نصیبم هم غریبم دل کتیب  
صیقلا قلبی مه ما دورا ته ای شمساً منیر  
طالب وصلاً تمه نینه ژ غیر ته طیب

Pêşî Şahê Taxê bi ‘îşqê ji me re bû rayezan  
Piştî Farûqî bû alîkar û stargeh û piştgir  
Sîqala qelbê me ma dema te ey roja rewneq  
Ez hejarim bê nesîbim hem xerîbim dil şikestî  
Dilxwazê gihaştina te me nîne ji xeyrê te bijîşk (mux.2,bnd.13)

Şa’ir di benda mûxemmesê de hersê şêxên xwe bime dide nasîn. Ji bo her şêxekî misrayek honandiye. Di misrayan de tevî nasandina şêxên xwe gelek agahiyên di derbarê nêrîna xwe ya tesewifî de jî bi cih kirine. Li jêr em ê li ser şîroveya misrayên wî bisekinin û şêxên wî nas bikin.

## 2.2.1 Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.)<sup>180</sup>

Murşidê helbestvan ê yekem Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) ye. Şa’ir navê şêxê xwe rasterast negotibe jî bi bêjeya Taxî bi me dide famkirin.

شاهی تاخی اولاً مارا بعشقی بو مشیر

Pêşî Şahê Taxê bi ‘işqê ji me re bû rayezan (mux.2,b.13)

Ji bêjeya ‘ewwela’ em têdigihêjin ku şa’ir, beriya Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) nebûye sofîyê tu şêxî. Di misraya şa’ir de xala girîng ev e ku dibêje ‘*mara bi ‘işqê bû mûşîr*’. Ango Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) di ‘işq û mehebbet’e de ji wî re bû şewirmend û rêber. Ev gotin mercek terîqeta Neqşebendî tîne ziman. Lewra Neqşebendî, di destpêka seyr û sulûkê de ji bo salik bikaribe bigihêje meqamê ‘ubûdiyetê ‘işq û mehebbetê wek mercekî terîqetê dizanin.<sup>181</sup> Melayê Cizîrî vê pêwistiyê wiha rave dike;

Cezbe û seyra sulûkê bê mehebbet nabitin

Cehdeya bê‘işq û hub çendî ku kir bê feyde bû<sup>182</sup>

Salik ji Xweda re nabe ‘ebdekî heqîqî (nagihêje meqamê ‘ubûdiyetê) heta dema ku di qelbê wî de ji Xweda pê ve tiştêk (masîwa) hebe. Ev cureyek *Zuhdê* ye. Lewra ji bo pênaseya zuhdê wiha hatiye gotin. Zuhd, valakirina qelbe ji hemû tişt û têkiliyên xeyrî Xweda. Ev wate ji hedîsa Resûlê Xweda (s.x.l.) hatiye derxistin. ( *أزهد في الدنيا يجبك الله* ) ‘*Di dinyayê de bibe zahid Xweda ewê ji te hezbike*’<sup>183</sup> Ev hezkirin dibe sedema seyrê û gihaştina meqsedê. Di qelb de seyr çênabe dema qelb ji xeyrî mehbûbê xwe bi tiştêkî din girêdayîbe.<sup>184</sup> Çi dema di dilê salik de masîwa derketin ew dem dibe ‘ebdekî heqîqî. Çi dema salik bû ‘ebdekî heqîqî, çavê dilê wî bi nûra ‘eql ronahî dibe. Lewra ‘eql di bin perdeyên nefîsê de ye. Dema ji perdeyên nefîsê reha bû, li ku binihêre ew ê nîşanek (ayet) ji nîşanên Xweda bibîne. Wek ku Hezretî ‘Elî (r.x.l.)ferman kiriye ( *ما نظرت في شيء الا ورأيت لله فيه* ) ‘*Min li çi nihêrî min Xweda dît.*’ Û bi zimanê hal ji hemû zerratê kaînatê bi guhê ‘eqlê xwe vê dibihîze;<sup>185</sup> ( *إنا لله وإنا إليه راجعون* ) ‘*Em hemû (bende)yên Xwedê ne û em ê li wî jî vezerin.*’<sup>186</sup> Meqamê ‘ubûdiyetê ev e. Çi dema ku

<sup>180</sup> Di derbarê jiyana her sê şêxên helbestvan de di bin navê ‘Rehberê Terîqetan li Cem Şeyda’de agahiyên berfireh ewê bèn dayîn.

<sup>181</sup> محمد فوزي ابن شريف الباطومي، (بی تاریخ)، خلاصت التصوف، آستانه، اسكدار، ص، ۲۶.

<sup>182</sup> Melayê Cizîrî, *Dîwan*, (Wergêr: Osman Tunç), Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, Ankara 2012, r. 164.

<sup>183</sup> عيسى، ص، ۱۷۲.

<sup>184</sup> أحمد بن عبيدة، معراج المشوف إلى حقائق التصوف و بليته كتاب كشف النقاب عن سر لب الألباب (تحقيق الدكتور عبد المجيد خيالي) مركز التراث الثقافي المغربي الدار البيضاء، (بدون تاريخ)، ص، ۳۰.

<sup>185</sup> *Qurana Pîroz*, Beqere, 156.

<sup>186</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 23.

salik bi gavên ‘ebdîtiyê, xwe bi regezên terîqetê girêda, ew ê esmayên Xweda di ef’alan de muşahede bike û ew ê heqîqeta <sup>187</sup> (سُرِّيهِمْ آيَاتِنَا فِي الْأَفَاقِ وَفِي أَنْفُسِهِمْ حَتَّى يَتَبَيَّنَ لَهُمْ أَنَّ الْحَقَّ) *Teqez em ê delîlên xwe di asoyan de û di nefsa însên bi xwe de jî nîşanî wan bidin, heyânî ku ji wan re tam eşkere bibe ku ev (Quran) heq û rast e.*<sup>188</sup> fam bike.<sup>189</sup> Ji ber hinde, ji bo têtikiya qelbê salikî bi tiştêkî (masiwa) nemîne pêdivî bi ‘işq û mehebbetê heye. Şa’irê me di misraya xwe de vê merca terîqeta Neqşebendî tîne ziman.

## 2.2.2 Şêx Fethullah Werqanisî (q.s)

Şêxê Şeyda yê duwem Şêx Fethullah Werqanisî (q.s) ye. Şa’ir bi sedema ku şêxê wî ji nesla Hezretî ‘Umer (r.x.l.) e wî bi Farûqî, ku bernavkê Hezretî ‘Umer (r.x.l.) e dide nasîn. Lewra em dizanin ku Şêx Fethullah Werqanisî (q.s) ji nesla Şêx Mûsayê Zolî ye<sup>190</sup>. Şêx Mûsayê Zolî jî ku bi navê Siltan Şêxmûs<sup>191</sup> dengdaye ji nesla Hezretî ‘Umer (r.x.l.) e.<sup>192</sup> Şeyda di dîwanê de pîrî caran ji dewsa navê şêxê xwe Farûqî bi kar aniye.

پس ازان فاروقی بو عون و پناه دستگیر

Piştire Farûqî bû alîkar û stargeh û piştgir (mux.2,b.13)

Ev misra li pey misraya jor hatiye. Di serê misrayê de dema şa’ir dibêje ‘pes ez an’ ‘piştî wî’ yanî piştî Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.), em fam dikin piştî wefata Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) Şêx Fethullah Werqanisî (q.s) bûye şêxê wî.

Di misraya şa’ir de têtikiyên navbera şêx û sofî jî hatiye ziman. Şa’ir navê Şêxê xwe bi ew xisletên ku pêwîst e şêx pêk bîne, bi vegotîneke din, xisletên ku pêdiviya sofî bi wan re heye, bi bêjeyên ‘*ewn, penah û destegîr*<sup>193</sup>’ aniye ziman. Di geşta seyr û sulûkê de tecelliyên cûr bi cûr tîne pêşiya sofî, dikevin dilê sofî. Lewra dil weke deryayê ye. Carinan dibe ku aram be û carinan pêlên bagerê tê de radibin. Di vê deryayê de keştîbanekî şareza ji sofî re divê ku bikaribe wî bigihîne perava silametiye.<sup>194</sup> Ew tecelliyatên dikevin dilê sofî, rehmanî ne an şeytanî ne pêwîst e bîne peyitandin. Ji ber hindî pêdiviya sofî bi alikariya şêx heye ku şa’ir’ê me bi bêjeya ‘*Ewn*’ ê vê yekê tîne ziman.

<sup>187</sup> *Qurana Pîroz*, Fûssîlet, 53.

<sup>188</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 481.

<sup>189</sup> شیخ محمود شبسترى، مراتب العارفين (مقدمه و تصحيح و توضیحات صمد موحد، طهورى) تهران ۱۳۸۱، ص. ۲.  
<sup>190</sup> İbrahim Baz, "Osmanlı'dan Cumhuriyet'e Norşin Dergâhı ve Şeyh Abdurrahman-ı Tâğî", *Tasavvuf ilmi ve akademik araştırma dergisi*, 34 [2014/2], r. 90

<sup>191</sup> Li ser rêya Amed û Mêrdînê li gundê bi navê wî ‘Siltan Şêxmûs’ hatiye veşartin. Meqbera wî wek ziyaretgahekê tê ziyaretkirin.

<sup>192</sup> Ertekin, Mehmet Zahir, *Biyografîyeke Menzûm a Mela ‘Eliyê Baqustanî, Siltan Şêxmûs (metn û Lêkolîn)*, Weşanên Lorya, Wan 2015, r. 74-75

<sup>193</sup> ‘Ewn: Alîkarî, Penah; Sitargeh, Destegîr; Piştgir, Piştewan (Kandar, Mehmet, *Farsça-Türkçe Sözlük*, Say Yayınları, İstanbul 2011, r. 500, r. 195, r. 345)

<sup>194</sup> Topbaş, hb. r. 241

Keştiya dil di nîvê deryayê de ku merûzê ba, bahoz, bager û firtûne bibe, sitare û sitargehek jê re divê. Her wiha li hemberî zexm û zorên şeytan jî sitargehek ji sofî re pêwist e. Ev sî û Sitare, murşidê kamil e ku şa'ir bi bêjeya 'penah'ê nîşanî me dide.

El Batûmî di berhema xwe ya bi navê Xulasetut'tesewifî de dibêje; '*Di nav ehlê terîqetê de li ser pêdiviya kesekî ji bo pêgiriya murşidekî kamil lihevkirinek heye. Lewra murşidê kamil, alikariya sofî dike da ku ew xisletên ku dibin asteng rake û sofî bigihêje Xweda.*'<sup>195</sup> Ew xisletên ku nexweşiyên derûniyên însan in, nexweşiyên dil in û nahêlin sofî bigihêje miraza xwe. Ji bo pak kirin û sax kirina van nexweşiyên pişgirî û piştevaniya şêx pêwist e ku şa'ir bi bêjeya 'destegîr' ew aniye ziman.

### 2.2.3 Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s)

Şêxê şa'ir ê sêyem Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s) e. Muxemmes bi gelemperî li ser wî hatiye nivîsandin. Şa'ir di mûxemmesê de rewşa xwe ya tesewifî jê re rave dike.

صیقلا قلبی مه ما دورا ته ای شمساً منیر

Sîqala qelbê me ma dema te ey roja rewneq (mux.2,bnd.13)

Bi bêjeyên '*ma dewra te*' em têdigihêjin ku şa'ir behsa murşidekî din dike. Piştî şewirmendiya Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) û piştî alîkarî û piştevaniya Şêx Fethullah Werqanîsî (q.s) sîqal kirina qelbê Şeyda, maye dewra şêxê wî yê sêyem ku navê wî Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s) e. Lewra helbest bi tevahî li ser Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s) hatiye nivîsandin û em vê yekê ji misraya yekem a helbestê fam dikin. Şa'ir wiha dibêje di serê helbestê de.

ای ضیاء الدین و دنیا وی شهی عالی همم  
وی سراجی راهی عقلی منبعاً حلم کرم  
ته فکر دیسا دلدلدا حسرت و ایش و الم  
از فقیرم بی نصیبم هم غریبم دل کتیب  
طالب وصالا تمه نینه ژ غیر ته طیب

Ey Diyaê dîn û dinya wey şahê himet mezin

Tu çiraya rêya 'eqlî kaniya hilm û keremêyî

Te vekir dîsa di dil da hesret û êş û elem

Ez hejarim bê nesîbim hem xerîbim dil şikestî

Dilxwazê gihaştina te me nîne ji xeyrê te bijîşk (mux.2,bnd.1)

<sup>195</sup> الباطومی ، ص، ۲۸ .

Di misrayê de li ser bêjeya 'seyqel'ê pêwîst e bê sekinandin. Beriya peydakirina camê, hesin sîqal (cîla) dikirin ji bo ku bikaribin xwe tê de bibînin an tiştêk tê de xuya bike.<sup>196</sup> Zeng û gemara hesin ji ser radikirin û paşê sîqal dikirin û wek neynikê bikar dianîn. Ev taybetiyek sîqalê ye. Sîqal herwiha ji bo parastinê, bi taybet parastina hesin û alavên ji daran hatine çêkirin tînan bikaranîn. Tiştên tînan sîqalkirin hem ji zeng û gemarê tê parastin hem birqandin li wan peyda dibe û hem paqijkirina wan sehl dibe. Mûtesewifan ji ew taybetî û xisletên sîqalê sîd wergirtine û di berhemên xwe de wek têgehêk tesewifî cih dane vê bêjeyê.<sup>197</sup> Şeyda jî ji bikaranîna vê bêjeyê xwe bêpar nehiştiye.

Dilê sofî wek neynikê ye. Sofî û salik divê bi rê û rêbazên terîqetê neynika dilê xwe sîqal bikin ji bo ku dilê wan zelal bibe û bi sîtav be. Dil divê bi sîtav be ji bo ku herçî tiştê di 'alemê de heye sîtava wan tê da xuya bike.<sup>198</sup> Ku dil ne sîqalkirî be sîtava tu tiştî tê de xuya nabe. Her me'rîfet û zanebûna ku salik bi dest dixwe cîlweyên celal û cemala Xweda ne. Ev cîlweyên celal û cemala Xweda, di dilê salik de xuya dibin. Kîjan dil? Ew dilê ku zengirtî ye û bi bernameyên seyr û sulûkê hatiye sîqalkirin û zelal bûye.<sup>199</sup> Cîlweyên celal û cemala Xweda jî li hemberî bûyerên mezin ê jiyana salikî ya di rêya seyr û sulûkê de dil sîqal dikin.<sup>200</sup> Ji bo ku dilê salikî li hemberî wan bûyerên mezin bê parastin û zeng û gemar xwe lê negire.

Şeyda bi bikaranîna bêjeya sîqalê vê yekê tîne ziman. Ji gotina Şeyda em têdighêjin ku Şeyda hay ji xwe heye. Hay ji rewşa xwe ya seyr û sulûkê jî heye. Bi zanebûn ev bêje bi kar aniye. Ev zanebûn û me'rîfeta şa'irî jî, taybetiyek tesewifê ye. Neseffî di berhema xwe ya bi navê 'Însanê Kamil' de ji bo her kesekî ku bixwaze têkeve rêya sulûkê zanebûna çar tiştan

<sup>196</sup> Ziya Şükun, *Farsça-Türkçe Lûgat, Gencineî Güftar, Ferhengî Ziya*, Milli Eğitim Bakanlığı Basımevi, İstanbul 1984, c.1, r. 96.

<sup>197</sup> *Seyqelê* ayîne yeqîn şumast

Çîst mehdê sefaê dîn şumast

ابوالمجد مجود بن آدم سنائی غزنوی، حدیقه الحقیقه و شریعه الطریقه، (به کوشش: دکتر علی محمد صابری، رفیه تیموریان و بهزاد سعیدی) ص، ۲۷.

Ey şukrê te cewhera zebanî, wey zikrê te *seyqela* cinanî  
(Şêx Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Nûbihar, İstanbul 2009 r. 2.)

Lewhê ji nû *sîqal* bidin, her dem ji nû ve xal bidin

احمد بن ملا محمد الزفنگی، العقد الجوهری فی شرح دیوان الشیخ الجزری، مطبعة الصباح، دمشق ۱۹۷۸، ج. ۲، ص، ۶۵.

Dil ez cewahirê mihret çu *seyqelî* dared

bûwed z zengê hewadîs her ayîne *mesqûl*

شمس الدین محمد شیرازی، دوان حافظ، دفتر نشر معارف، چاپ سوم، قم ۱۳۹۱، ص، ۳۶۳.

<sup>198</sup> نسفی، کشف الحقایق، ص، ۸۰.

<sup>199</sup> سید محمد راستگو و سید محمدفرید راستگوفر، "جمال جلال و جلال جمال"، مطالعات عرفانی (مجله علمی پژوهشی)، دانشکده علوم انسانی دانشگاه کاشان، شماره دهم، پاییز و زمستان ۸۸، ص ۱۸۲.

<sup>200</sup> محمد نقی تسکین دوست، مدار سیر و سلوک عرفانی حافظ، ص، ۳۲۳.

pêwist dibîne. Yek ji van çar tiştan zanebûna rêya sulûkê ye.<sup>201</sup> Şeyda zanayê rêya sulûkê ye. Lewra dizane ku rewşa wî ya sulûkê di kîjan astê de ye û pêdivîya wî bi çi heye.

Dema di misraya yekem de got ‘*bi işqê bû mûşîr*’ zanebûna xwe ya rêbaza terîqetê nîşan da. Dema di misreya duyem de got ‘*bû ewn û penah û destegîr*’ zanebûna rewşa xwe rave kir. Ê di misreya sêyem de dema got ‘*Seyqela qelbê me ma dewra te*’ zanebûna xwe ya pêdivîya xwe anî ziman. Bi vî rengî em jî dizanin ku Şeyda salikekî zana ye.

Ji sofî re pêwist e piştî wefata şêxê xwe şêxekî din hilbijêre. Ev hilbijartin ji sofîre wacibek terîqetê ye. Sofî divê perwerdehiya xwe bidomîne. Lewra dawî ji tesewifê re tune ye û sofî hewcedarê perwerdehiyê ye. Ji ber hindî pêdivîya wî bi şêxekî din heye ku li ser perwerdehiya şêxê yekem perwerdehiya sofî bigihîne astek bilindtir.<sup>202</sup> Şeyda vê wacibiya terîqetê pêk aniye. Piştî wefata şêxê xwe ji bo ku bikaribe perwerdehiya xwe bidomîne bûye salikê şêxekî din.

### 2.3 Şêx/Murşidê Kamil

Li jor me got Neseffî di berhema xwe ya bi navê ‘Însanê Kamil’ de ji bo her kesekî ku bixwaze têkeve rêya sulûkê zanebûna çar tiştan pêwist dibîne. Li gorî rêza Neseffî şertê çaran zanebûna hadî ye ku hadî, şêx û pişewayê terîqetê ye.<sup>203</sup> Salik divê bizanibe ku murşidê wî murşidekî kamil e an na. Ji ber hindî divê xisletên murşidên kamil bizanibe.

شیدا تو ببه ز بووی وامق

شیخی کو لسیرتی نبی بت

Şeyxê ku li sîretê Nebî bit

Şeyda tu bibe ji bo wî Wamiq (x.61,b.14)

Şeyda hemû xisletên ku pêwist e di şêx/murşidekî kamil<sup>204</sup> de hebe bi du bêjeyan nivîsandiye. ‘*sîretê Nebî*’. Dema ku şêx di sîretê nebî de be, ji xwe pêdivîya wî bi tu xislet û exlaqên din namîne. Lewra Xwedayê kaînatê ji bo Resûlê Xwe (s.x.l.) wiha ferman kiriye di Qurana pîroz de ;<sup>205</sup> ‘*وَأَنَّكَ لَعَلَىٰ خُلُقٍ عَظِيمٍ*’<sup>206</sup> ‘*Birastî tu li ser rewîşteki (exlaqekî) mezin i*’<sup>206</sup> Herwiha Hezretî ‘Aîşe (r.x.l.) di derbarê exlaqê Resûlê Xweda (s.aw.) de wiha gotiye( *خُلُقُهُ*)

<sup>201</sup> نسفی ، انسان کامل ، ص ، ۴۲-۴۳.

<sup>202</sup> عبد الوهاب الشعرانی، الأنوار القدسیة فی معرفة قواعد الصوفیة ، مكتبة المعارف، بیروت ، لبنان ۱۹۸۸، ص، ۷۱.

<sup>203</sup> نسفی ، انسان کامل ، ص ، ۴۲-۴۳.

<sup>204</sup> Ji bo agahiyên berfireh derbarê şert û xisletên şêx/murşid bnr;

محمد ، ص ، ۳۸۱-۳۹۱.

عیسی ، ص ، ۴۰-۴۲.

Kadri, hb. r. 28-30

<sup>205</sup> Qurana Pîroz, Qelem. 4.

<sup>206</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 563.



الْقُرْآن ( 'xuyê Wî (s.x.l.) Quran bû.'<sup>207</sup> Şêx dema ku xuyî wî Quran be êdî hewceyê tu xuy û xisletên din nabe. Dema şêxekî bi van xuy û xisletan hat dîtin, pêwîst e ji bo vî şêxî bibe wekî Wamiq.<sup>208</sup> Biranîn/telmîha Wamiq hilibijartinek bi enqeste. Lewra di destanên 'işqê de bi gelemperî 'aşiq û me'sûq nagihêjin hev. Wek Mem û Zîn, Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şêrîn. Lê di destana Wamiq û 'Ezrayê de her du lehengên destanê digihêjin hev. Şa'ir dixwaze bide famkirin; dema ku şêxekî di sîretê Nebî de, te dît, têbikoşe heta ku tu xwe bigihîni wî, heta ku tu hezkirina wî bi dest bixî.

Xuya ye ku di derbarê xisletên şêx/murşidê kamil de agahî û zanebûnek giştî li cem Şeyda heye.

هم دفع دكت همه عوانق

او بو ته دبت دليل و رهبر

Ew bo te dibit palpişt û rêber

Hem diqewitîne hemû rêgira (x.61,b.15)

Şêxê ku bi vî rengî be ji salik re dibe delîl û rêber, piştrast e, wî dibe ser rêya rast, rêberêkî piştevan e. Ev şêxê bi vî rengî mezherê ayeta Qurana pîroz e.<sup>209</sup> فَلَوْلَا نَفَرَ مِنْ كُلِّ فِرْقَةٍ ( ' Ji wan civatek derkeve (cîhadê) da ku (yên mayîn) di emrê dîn de zana bibin û dema gelê wan (yên çûne cîhadê) li wan vegeyriyan wan agahdar bikin, ji bo ku ew jî (ji gunehan) xwe piparêzin.'<sup>210</sup> Ev şêx, nefsê tezkiye/pak dike ji xetera, 'eyb û kêmasiyên nefsê ji holê radike, nexweşiyên nefsê derman dike û wan sax dike. Warêşê pêxember (s.x.l.) e li gorî hedîsê.<sup>211</sup> ( 'العلماء ورثة الأنبياء) 'Ûlema warisê nebiyane'. Wek Şêx Muhyeddînê 'Erebî aniyê ziman; ew şêxê ku warisê Resûlê Xweda be, nûnerê Xweda ye di 'alemê de ji bo dema xwe, ji bo parastina şerî'etê, parastina qelban û rîayeta edeb/pir û pergalên Îslamî nûner e ji bo dema xwe.<sup>212</sup>Şeyda bi bêjeyên 'delîl' û 'rehber' ev xisletên murşid tîne ziman.

لورا بعدو دبت مطابق

ورنه ته دكت هلاک و خاسر

Werne te dixê hilakê û dixesirîne

Lewra piştê yeksan dibe (x.61,b.16)

<sup>207</sup> ابو حفص عمر شهاب الدين سهروردي، عوارف المعارف (ترجمة، ابو منصور اسماعيل بن عبدالمؤمن اصفهاني) ص ٧٤.

<sup>208</sup> Wamiq û 'Ezra navê destaneke 'işqê ye. Di vê destanê de Wamiq 'aşiqê 'Ezrayê ye. Ji bo agahiyên zêde bnr; Yıldırım, Kadri, *Ehmedê Xani'nin Fikir Dünyası*, Ağrı Kültür ve Yardımlaşma Derneği, Ağrı 2011 r. 104.

<sup>209</sup> *Qurana Pîroz*, Tewbe, 122.

<sup>210</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 205.

<sup>211</sup> محمد، ص ٣٨٣.

<sup>212</sup> محمد، ص ٣٨٣.

Werne, eger şêx ne bi wî rengî be salik dixê xesaretê û wî dibe helakê. Şêx ku cahilê dîn be, li pey daxwazên nefsa xwe bimeşe, çavê wî li destê kesan be, ew şeytanê exres/lal e.<sup>213</sup> Ne durust e ku kesek here cem şêxekî ku ne kamil be. Ev yek hatiye şibandin bi wî kesî ku diçe bijîşkê cahil.<sup>214</sup> Ew qedêr bi xeter e, ku hatiye şibandin bi bal Şeytan ve. Şêx dema di hemû têkiliyên xwe yê dînî û dinyewî de, ne di sîretê Nebî de be; rêya wî ne rê ye, sulûka wî ne sulûk e, li ser rêya şaş e û peyrewên xwe dibe ser rêya şaş<sup>215</sup>. Ev şêx digere ji wan kesên ku Qurana pîroz di derbarê wan de wiha ferman kiriye. <sup>216</sup> (الَّذِينَ ضَلَّ سَعِيَهُمْ فِي الْحَيَاةِ الدُّنْيَا وَهُمْ يَحْسَبُونَ) 'Ew ên ku kar û xebata wan li jiyana cîhanê pûç bûye. Hal ev e wan hizir fikir ku ew karekî qenc dikin'<sup>217</sup> Şa'ir di beyta xwe de bi me dide zanîn ku agahdar e di derbarê şêxên ne şêx de û dizane şêxên ne şêx çî bela û mûsêbetên uxrewî tînin serê sofiyên xwe.

Ji her sê beytên Şeyda tê fêmkirin ku pêgiriya wî, bi şêxan ne pêgiriye hestiyarî û cahilî ye. Pêgiriye bi 'eqîlî û 'ilmî ye. Şeyda bi hemû şert û xisletên şêxên heqîqî dizane. Hem dizane ku şêx ne şêxê rasteqîn be çî xeter û belayan tîne serê pêgirên xwe.

## 2.4 Îrşad û Cûreyên Îrşadê

Murşid ku wek rêber bê watedar kirin, ew dem îrşad jî ew rêya ku şêx ji bo salik/sofiyê xwe dipejirîne û bi vê rêyê dixwaze wî bigihîne armancê tê famkirin. Topbaş, di berhema xwe de pênc cûreyên îrşadê destnîşan dike. Mehebbet û rabite, sohbet, xizmet, tewecuh û di'a.<sup>218</sup> Di berhema Hasan Kamil Yılmaz de sê cûreyên Îrşadê; Seyahet, Sohbet û Xelwet hatiye nasandin.<sup>219</sup> 'Ebdulhekîm 'Ebdulxenî Qasim di berhema xwe ya binavê *El Mazahibu's Sûfiye we Medarisîha* de sêzdeh rêçên îrşadê dide nasîn û ji van her sêzdeh rêçan, rêça ş'ir û helbestê herî girîngtir û bi bandortir dibîne.<sup>220</sup> Xuya ye li ser rê û cûreyên îrşadê lihevkirinek tune ye.

### 2.4.1 Îrşada bi Nezer/Nêrîn

Di helbestên Şeyda de em sê cûreyên îrşadê dibînin. Nezer, sohbet û xizmet. Ji şîroveya senifandinê şa'ir tê famkirin ne zera şêx wek tewecuhê hatiye ravekirin. Di

<sup>213</sup> محمد ، ص ، ٣٨٦ .

<sup>214</sup> عيسى ، ص ، ٤١ .

<sup>215</sup> احسان الهى ظهير، دراسة فى التصوف ، دار الإمام المجدد ، القاهرة ، مصر، ٢٠٠٥، ص ، ٧٣-٧٤ .

<sup>216</sup> Qurana Pîroz, Kehf, 104.

<sup>217</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 303.

<sup>218</sup> Topbaş, hb. r. 241-276.

<sup>219</sup> Yılmaz, hb. r.186.

<sup>220</sup> قاسم ، ص ، ١٢١-١٢٤ .

berhemên tesewifê de û bi taybet di menqibeyên sadat û rêberên terîqetê de perwerdehiya bi nezera şêx cihekî gelek girîng digire û gelek kes bi nezera şêx an gihaştine meqamên bilind û an hatine ser rêya rast.<sup>221</sup> Ehlê tesewifê bingeha nezerê li ser vê hedîsê Resûlê Xweda (s.x.l.) ava dikan.<sup>222</sup> (إنه ينظر بنور الله) *xwe bi parêzin ji feraseta kesên bawermend, lewra ew bi nûra Xweda dinihêre.* Ehlê tesewifê ferasetê, bi keşfa yeqînê û teftîşa xeybê dinasînin. Herwiha bi wateya tecelliyên Xweda ên ku tên ser qelbê pak jî hatiye watedar kirin.<sup>223</sup> Ji ber hindî nezera şêx gelek bi bereket hatiye dîtin.<sup>224</sup> Ev nêrîn û bandora wê em li cem şêxên Şeyda jî dibînin. Şeyda di bin bandora nezera şêxê xwe de maye.

از مدی عمرم ندیدم لذتی جز لحظتی      که دران کردی نظر بر این عیب روسیاه

Min di hemû temenê xwe de nedît lezzetek ji bil wê kêlikê  
Ku di wê kêlikê de nêrînek kir li koleyê xwe yê rûreş (x.81,b.10)

Şa'ir kêf û şahiya nêrîna şêxê xwe aniye ziman. Di hemû temenê xwe de ji wê kêlika ku şêxê wî nezerek lê kiriye tu tam û lezetek bi vî rengî nedîtiye. Ev tam û lezet ne tam û lezetek bedenî ye. Tam û lezetek rûhî û me'newî ye.

برآفت چون نگه کرد عبدالرحمن      مرا شد روزی عشق روی خوبان

Çewa ku bişefqet 'Ebdurrehman li me nêrî  
Ji me ra bû roja aşiqbûna rûyê xweşikan (x.76,b.1)

'Ebdurrehman, wek ku li jor hat gotin Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) ye û murşidê Şeyda yê yekem e. Dema şêxê wî bi şefqet û merhemet lê dinihêre hezkirina hemû tiştên dinyewî ji dilê wî derdikeve û ew roj dibe roja 'işqa wî ya heqîqî. Lewra rû/serçav têgehek tesewifi ye û bi wateya xwe ya tesewifi wechê zatê Heqq e.<sup>225</sup> Bi nêrîna şêxê wî 'işq û mehebbeta Xweda dikeve qelbê wî. Di serî de misraya ku me mînak dabû; 'Şahê Taxê ewwela mara bi 'işqê bû mûşîr' heman şîrove û misogeriya vê beytê ye.

مارا بیک کرشمه مفتون کرد و مدهوش      امراض بی نهایت خوش کرد همچو لقمان

Bi yek çav şikandinekê me 'aşiq û serxweş kir  
Wek Luqman nexweşiyên bêdawî sax kir (x.77,b.9)

<sup>221</sup> Wek mînak ji bo bndora nezera şêx, bnr; Topbaş, hb. r. 275-276.  
Gökbulut, hb. r. 77.  
Kadri, hb. r. 60-62.

<sup>222</sup> شوان، ص ۱۹.

<sup>223</sup> عیسی، ص ۲۰۷.

<sup>224</sup> الشعرائی، الأنوار القدسیة فی معرفة قواعد الصوفیة، ص ۱۷۶.

<sup>225</sup> جواد نوربخش، فرهنگ نوربخش: اصطلاحات تصوف (جلد اول و دوم)، انتشارات خانقاه نعمت اللهی، تهران ۱۳۶۶، ج. ۱، ص ۵۰.

Helbestvan di vê beytê de, du taybetiyên nêrîna şêx aniye ziman. Di misraya yekem de ‘aşiqbûnî aniye ziman ku şîroveiyên wê li jor hate kirin. Di misraya duwem de, bi nêrîna şêx hemû nexweşiyên wî ên derûnî sax bûne. Di tesewifê de rê û rêbaz hene. Yek ji rêbazên salikî ev e ku xwe bispêre şêxê xwe. Lewra tesewif; şêx wek pizişk û sofi jî wek nexweş dibîne.<sup>226</sup> Şa’ir di misraya duwem de vê taybetiyê tîne ziman. Ew nexweş e û murşidê wî wek pizîşkekî gelek mahir - ku şa’ir ew şibandiye Hezretî Luqman (s.l.) - hemû nexweşiyên wî ên me’newî ku dibin asteng di rêya seyr û sulûkê de bi yek nêrînekê sax kiriye.

#### 2.4.2 Îrşada bi Sohbet

Sohbet di tesewifê de cihekî gelek girîng digire. Ewqas girîng hatiye dîtîn ku di derbarê sohbetê de berhemên xweser hatine nivîsandin.<sup>227</sup> Şayanê gotinê ye, sohbet tenê ne bi wateya ‘bi hev re axaftin’ê hatiye. Herwiha bi wateya ‘hevaltî û xwedî lê derketin’ê jî tê bikaranîn.<sup>228</sup> Wek ku di Qurana Pîroz de derbas dibe.<sup>229</sup> ثَانِي اثْنَيْنِ إِذْ هُمَا فِي الْغَارِ إِذْ يَقُولُ لِصَاحِبِهِ لَا (‘Ew yek ji diduyan bû (ew û Ebûbekir bi hev re bûn) wê dema ew her dû di şikeftê de bûn, ji hevalê xwe re got: xemgîn mebe, bêguman Xwedê bi me re ye’<sup>230</sup>

Sohbeta bi wateya bi hev re axaftin jî cihekî giring e di tesewifê de û hin şêxan wek rêyek îrşadê ji xwe re bikaranîne. Di derbarê sohbetê de wiha hatiye gotin: ‘Sohbet, ji bo bidestxistina kesp û karê seyr û sulûkê rêyeke herî bilind, sedemeke herî bihêz e, bi sohbetê kole digihêje asta padîşahtiyê.’<sup>231</sup> Di sohbetê de bandorek girîng û taybetiyek mezin heye. Kê çi bidest xistibe, ji sohbeta zanayan bi dest xistiye. Hemû tekoşînê din wek mucahedê, adab û şert û şurûtên mayî xebat in ji bo ku salik bikaribe şayesteyî sohbeta şêx bibe. Bi sohbetê xuy û xisletên neqenc pak dibin. Peyv û axaftinên şêx eger salik fam bike gelek baş e û ku fam neke divê bi dil û can qebûl bike.<sup>232</sup> Sohbetên murşidên kamil panzehîrek ceribandî ye. Bi sohbeta vî murşidî, îman û teqwaya salik û sofi zêde dibe û nexweşiyên dil sax dibin û nefis ji ‘eyban pak dibe.’<sup>233</sup> Peyv û gotin bi xwe bandorek mezin li kesan dike. Bêguman ew kesên ku gotin û kirinên wan wekî hev bin, teqez bandora wan mezintir e.

<sup>226</sup> نسفى ، انسان كامل ، ص ، ٤٤.

<sup>227</sup> Wek mînak;

عبد الوهاب الشعراني ، آداب الصحبة ( تحقيق؛ عباس يوسف شامي) دار الفارابي ، دمشق ١٩٦٧.

<sup>228</sup> Ji bo bingeha bêjeya sohbetê û wateya bêjeya sohbetê, bnr;

الشعراني ، آداب الصحبة ، ص ، ٢٢-٢٦.

<sup>229</sup> Qurana Pîroz, Tewbe, 40.

<sup>230</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 192.

<sup>231</sup> محمد ، ص ، ٣٩٣.

<sup>232</sup> نسفى ، انسان كامل ، ص ، ٥٧.

<sup>233</sup> عيسى ، ص ، ٢٢-٢٣.

Alem hemû ji zatê we sohbetekê daxwaz dikin

Kesê bû hevalê we gihaşt hîdayet û berekete (x.17,b.5)

Di misraya yekem de şa'ir sohbeta şêx aniye ziman. Şa'ir dibêje hemû 'alem ji zatê we sohbetekê daxwaz dike. Kesên ku wê sohbetê guhdarî bikin, ku salik û sofî bin ew ê di xebata xwe ya seyr û sulîkê de pêşve biçin. Eger ku ne sofî û salik bin bîr û baweriya wan, îman û teqwatiya wan zêde dibe. Belkî ev sohbet dibe sedem ji bo softiya wan. Ji ber hindî herkes daxwaz dike ku şêx sohbetekê bike û ji vê sohbetê sûd bête wergirtin. Helbestvan di misraya xwe de bandor û giringiya sohbeta murşidê kamil nîşan daye.

Di misraya dûwem de şa'ir, hevaltî û dostaniya şêxê xwe aniye ziman. Li gorî şa'ir, ew kesên ku hevaltî û dostaniya şêxê xwe bidest bixe, hem ew ê bigihêjin hîdayetê û hem ew ê bigihêjin gelek bereketan. Helbestvan di vê misrayê de girîngiya hevaltî û dostaniya ehlên Xweda, ên wek murşidên kamil nîşan dide. Lewra bi vê hevaltiyê xelasbûna ji delaletê, gihaştina hîdayetê û piştî hîdayetê gelek cahên me'newî tên bidestxistin.

### 2.4.3 Îrşada bi Xizmet

Xizmet hem, cureyek îrşadê ye. Salik divê emr û fermanên şêxê xwe ji xwe re wek xel'et bizanibe.<sup>234</sup> Çawa padîşahek ji kesekî hezdike û xil'et/cubbeyekî diyariyê wî dike, salik hem emr û fermanên şêxê xwe divê wisa bizanibe. Salik vê xizmeta murşidê kamil ji xwe re wek wacibekî bizanibe.<sup>235</sup> Pêkanîna waciban çawa pêwîst e pêkanîna emrê şêx û xizmeta şêx an xizmeta ku şêx ferman bike li ser salikî wacib e. Ehlê tesewifê, kirina xizmetê wek meqamekî 'ezîz destnîşan kirine. Heta xizmetkirin ji nimêj û rojiya sunnet hîn bi fezîlet e li cem ehlê tesewifê. Lewra dermanê pakkirina riyayê di xizmetkirinê de dîtine.<sup>236</sup> Salik ji bo ku nefsa wî dakeve, biçûk bibe, ji kibr û riyayê xilas bibe pêwîst e hem ji murşidê xwe re û hem ji dergahê re xizmet bike.

میشوم خادم آن خاک که جای پای است

تا که میدارد مرا از مکر غداران نگاه

Ez bibim xizmetkarê wê xaka ku dewsa piyê te ye

Heta ku tu me biparêzî ji xapandina xiraban (x.81,b.9)

Helbestvan ji dek û dolab û xapandinên nefis û şeytan gelekî ditirse. Ji bo xelasbûna ji van dijminan piwîst e ku murşidê wî, wî biparêze. Ji bo vê parastinê bidest bixe xizmetkirin di rêya murşidê xwe de, wek çareseriyekê dibîne. Tenê ne xizmeta murşid bi xwe belkî xizmeta

<sup>234</sup> عين القضاة عبدالله بن محمد، تمهيدات، (http://www.sufism.ir/MysticalBooks(37).php)، ص، ۱۲.

<sup>235</sup> نورالدین عبد الرحمن جامی، نفحات الانس من حضرات القدس (به تصحيح؛ محمود عابدی، اطلاعات) تهران ۱۳۷۴، ص، ۱۱۸.

<sup>236</sup> سهروردی، ص، ۲۹.

dergahê jî, belkî xizmeta sofiyan jî li xwe qebûl dike. Bi vê sedemê dibêje ‘xizmeta dewsa piyê te’. Bi sedema ku bikaribe bibe şayesteyê parastina murşidê xwe, hemû cureyên xizmetê li ser xwe qebûl dike.

## 2.5 Taybetmendiye Murşid

Ji bo kesek bikaribe bibe murşid divê xwedî hin xislet û taybetmendiyan bin. Şa’ir di medhiye û di mersiye yê ku li ser şêxên xwe honandiyê xisletên ku pêwist e di şêxan de hebin aniye ziman.

صيقلا قلب ملولى رهبرى هر طالبانى

مفتىي شرعا رسولى منهجا اهل عقولى

Muftiyê şerî’ ta Resûlî, reya rastî ji kesên bi hiş re

Sîqala dilê melûlî rêberê hemû telebkara yî (x.93,b.10)

Helbestvan di zahirê peyvên xwe de pesnê şêxê xwe dide û medhê wî dike. Lê di heqîqetê de çar xislet û taybetmendiye ku pêwist e di şêx de hebin aniye ziman. Şêxên helbestvan biqasî ku karibe fetweyên şerî’etê bide di ‘ilmê fiqhê de zana ye. Bi qasî ku karibe ji kesên bi ‘aqil re bibe wek rêyek vekirî, zana û danişmend e. Hem derman û sîqala dilan e û hem rêber e ji bo salik û sofiyên ku bixwazin di seyr û sulûkê de pêşve biçin.

Taybetmendiye ku pêwist in di şêx de hebin li gorî beyta helbestvan.

1- Zanebûna şerî’etê. Şêx divê şerî’etê baş bizanibe û pê ‘emel bike.<sup>237</sup>

2- Rêbertiya kesên bi ‘aqil. Şêx divê bi îrşada xwe, bi sohbet û bi zanebûna xwe ya tesewifê rê ji zanayan re veke.<sup>238</sup>

3- Zanebûna tesewifê. Şêx divê tesewifê zanibe. Nexweşiyên dil, çareseriyên wan nexweşiyên, tezkiye û terbiyeya nefsê bizanibe.<sup>239</sup>

4- Rêbertî. Şêx rêber e di rêya seyr û sulûkê de ji bo salik û sofi.<sup>240</sup> Şeyda di beytekê de di bin pesnê şêxê xwe de çar taybetmendiye şêx anîne ziman.

### 2.5.1 Nûnertiya Şêx

ان من خالفه كان غريقا سيئات

قولك قول النبي آميرا او ناهيا

Gotinên te gotinên Nebî ne çî tu emir bikî û çî nehiy

Ew kesê ku dijberiyê bike ew ê di gunehan de noq bibe (x.17,b.7)

<sup>237</sup> عيسى ، ص ، ٢٠ .

<sup>238</sup> محمد ، ص ، ٣٨٣-٣٨٤ .

<sup>239</sup> عيسى ، ص ، ٢٠ .

<sup>240</sup> محمد ، ص ، ٣٨٣ .

Şeyda, di beyta xwe de girîngiya gotin û peyvên şêx tîne ziman. Beyta wî tê du wateyan. Wateya yekem. Ji şêxê xwe re dibêje; peyva te ji me re di meqamê peyv û gotinên Resûlê Xweda (s.x.l.) de ne. Lewra tu nûnerê Resûlê Xweda (s.x.l.) yî, ji ber hindî divê peyvên te wek peyvên Resûlê Xweda (s.x.l.) bîn pejirandin û tiştên tu emir dikî, bêne kirin û tiştên ku tu qedexe dikî jî, neyêne kirin. Berhemên tesewifê, murşidê kamil nûnerê Resûlê Xweda (s.x.l.) qebûl dikin.<sup>241</sup> Ş'air ev nûnertiya şêx rave dike. Wateya duwem: Peyvên ji devê te derdikeve, peyvên Resûlê Xweda (s.x.l.) ne. Ango tu li gorî hedîsê diaxivî. Bi vê wateyê şa'ir 'alimtiya murşid tîne ziman ku ev 'alimti wek ku li jor hat gotin, yek ji taybetmendiyan şêx e.

### 2.5.2 Îta'eta Şêx

Di hemû kar û xebatên xwe de pêwist e ku sofî ramê emrê şêxê xwe be. Îta'eta şêx ji sofî re yek ji adabê sofîtiyê yê batîni ye. Îbnî Hecer Heytemî gotiye; 'kesê ku ji şêxê xwe re bibêje çima, îfleh nabe.'<sup>242</sup> Kesê ku razî nebe bi emr û terbiya şêxê xwe ew bi kîtab û sunnetê edebê nagire. Di vir de divê bê gotin ev emr û îta'eta şêx ji bo terbiye û perwerdehiya derûniye. Pêwist e bê gotin murşidên kamil ji bo nefsa xwe, ji bo berjewendiyên xwe tu daxwaza wan ji salikî tune ye û nabe. Dema ku tişteki wiha bê holê di kamilbûna murşidî de şik û şubhe heye.

اطاعت گشت واجب رهبر من

بتيغش گر زند گردن نهم چون

Bi şûrê xwe ger li stûyê min bidî ez dihêlim lewra

Ey rehberê min îta'eta te wacib e (x.80,b.7)

Eger tu bi şûrê xwe min bihangavî, ez ê stûyê xwe li ber te xwar bikim. Lewra ey rehberê min îta'eta te ji me re wacib e. Şeyda di vê malikê de, pêwistiya îta'eta şêx aniyê ziman. Ji şêxê xwe re ram û amade ye. Îtaeta şêx ji xwe re wacib/pêwist dibîne. Tiştê ku şêxê wî ferman bike, eger ev tişt serjikirina wî be jî li hemberî şêxê xwe ranabe. Teslîmiyetek tevahî û giştî em li cem Şeyda dibînin.

### 2.5.3 Baweriya bi Şêx

Sofî eger baweriya wî bi şêxê wî tunebe û xwe radeştî şêxê xwe neke ji şêxê xwe tu sûtê bidest naxe. Şêx di mesaba bijîşk; bijîşkê derûnî, me'newî de ye. Bi hemû nexweşên derûnî û çareseriya wan dizane. Hem şêx rêya seyr û sulûkê dizane, xeter û astengên wê

<sup>241</sup> الشعرائى، الأنوار القدسية فى معرفة قواعد الصوفية، ص، ٦٤، محمد، ص، ٣٩٨.

<sup>242</sup> عيسى، ص، ٥٠-٤٨.

dizane.<sup>243</sup> Sofî jî bi bîr û bawer e ku murşidê wî hemû asteng û xeterên sulûkê dizane û di vê rêyê de ew ê alîkariya wî bike.

اگر صد دشمن از لشکر بقصد من کمین سازند      چو فتح الله فاروقی شهی لشکر شکن دارم

Eger hezar leşkerê dijminan ji bo min xefikan vedin

Lê, yekî bi dijminan dikare, Fethullahê Farûqî (q.s) li pişta min e. (x.73,b.7)

Şa'ir di beyta xwe de bi dilekî aram û asûde dibêje eger zatekî wekî cenabê Şêx Fethullahê Werqanisî (q.s.) ji min re şêx û murşid be çi xem e. Eger hezar leşkerê dijminê min, leşkerên nefis û şeytan, li ser rêya min xefikan vedin jî ez bi bîr û bawer im ku murşidê min ew ê di hewara min de were û ew ê min ji van xefikan xilas bike. Şa'ir bi teslimiyetek tam û bi baweriyeke qewî bi murşide xwe ve girêdayî ye.

#### 2.5.4 Feyza Şêx

Feyz, têgehek tesewifê ye. Hesta ku bi rêya îlhamê di nava dil de zîl dide, feyd e. Feyz bi xebatê hasil dibe. Hem ji kirdeya kirdarî û kirinên wî yên bêgerew e û berdewam jî feyd dibêjin. Ji ber hindî Xweda serdestpêka feydê ye û feyda wî her didome û digihêje aferîdeyan.<sup>244</sup> Bi sedema van wateyan û bi sedema ku Xweda serdestpêka feydê ye ehlên tesewifê feyd û tecellî di heman wateyê de bikaranîne.<sup>245</sup> Murşidên kamil an ehlên Xweda, bi bandora wê feyza ku Xweda diyariyê wan kiriye, bi nêrînên xwe rewşên kesan diguherînin. Mebest û wateya feyzê ku sofî bikartînin û ji murşidên xwe daxwaz dikin ev e.

Ji ber hindî Şeyda aniye ziman;

گفتم اگر ببخشی بر ما سحاب فیضت      از اهرمن چه باکم اماره را چه عصیان

Min got eger tu bibexşî li ser me ewrên feydê

Ez ê ji ehremen çi bitirsim û ji nefsa emmera îsyân bikim (x.77,b.6)

Eger tu ji feyda xwe ji me ra ewrekî feydê bibexşîni, bişîni ez ne ji ehremen/şeytan ditirsim û ne li hemberî ew nefsa min a ku serdestiyê li min dike ez 'îsyân dikim, ji zordestiya wê feryad dikim. Lewra bi hatina feyzê ez ê ji wan hemûyan xilas bibim.

Suhrewerdî, di 'Ewarifu'l Me'arifê de, di derheqê vê mijarê de wiha dibêje. 'Şêxê me Dîyauddîn Ebunnecîb (q.s.) li Minayê li dora Mescidû'l Xîfayê tewaf dikir. Jê re gotin ev çi rewşe? Got; dema Xwedayê Te'ala ji 'ebdekî hezbike nîşanê feyz û fedla Rebbanî di çehreya

<sup>243</sup> الشعرائی، الأنوار القدسیة فی معرفة قواعد الصوفیة، ص، ۱۷۳.

<sup>244</sup> سجادی، ص، ۶۳۰.

<sup>245</sup> عبدالحسین طریقی، "تجلی در عرفان اسلامی"، فصلنامه تخصصی عرفان، سال چهارم، شماره ۱۶، تابستان ۸۷، ص، ۱۴۰.



wî kesî de xuya dibe. Dema şexsek bikeve ber nezera wî şexsê ku Xweda jê hezkiriye, ew ê bigihêje bextewariyekê ku ji vê bextewariyê mezintir tu bextewarî tune ye. Di vê tewafê de ez li vî şexsî digirim. Dibe ku bi nezera wî, ez bexşandinek û me'rifetek tamamî ji Xweda bidest bixim.<sup>246</sup> Daxwaza sofîyan ji murşidê kamil ev feyz e. Wek ku Şeyda aniye ziman;

طالب فیضا عزیزم هر دیژم عرضحال

بنده ئی سوی الفریزم هم کلیب آستان

Ez bendeyek ber bi hişkbûniyê ve diçim hem kûçikê deriyê te me

Dilxwazê feyda ezîzim her rewşa xwe pêşkêş dikim (x.64,b.22)

Helbestvan di rêzika yekem de biçûkiya xwe, bêqîmetbûniya xwe dest nîşan dike. Bêjeya hişk, hişkbûniya dilê wî ê me'newî tîne ziman. Ne hişkbûniyek bedenî ye. Ji rexa me'newîde ber bi hişkbûniyê ve diçe. Hem wek kûçik, xizmetkarê deriyê şêx e. Bi van sedeman rewşa xwe pêşkêşî şêxê xwe dike û ji bo xilasbûna ji vê rewşê daxwaza feyzê dike.

### 2.5.5 Hêviya ji Şêx

Li jor hat gotin ku şêx bijîşkê dilan e, şêx rêber e. Sofî kesê nexweş e û di rêya seyr û sulûkê de nezan e. Ji ber hindî her hewcedarê şêx e. Di dermankirina birîn û nexweşiyên dil de hewcedarê şêx e. Di seyr û sulûkê de hewcedarê şêx e. Bi vê sedemê sofî her bi hêvî ye ji şêxê xwe. Sofî bi hêvî ye ku şêxê wî di teziyeya/pakkirina nefsê de jê re alîkar be. Dema nefs ji xwepêşandin û riyayê pak dibe neynika dil ronî dibe. Pertewên nûrên Xweda di wî dilî de zahir dibe û cemala tewhîdê xwe nîşan dide. Çavên besîretê vedibe û celala qedîm û kemala ezêlî dibîne. Dema neynika dil bi nûra besîretê pak bû, heqîqeta herdû 'aleman hasil dibe. Tiştên fanî û bê fayde wek dijmin dipejirîne û tiştên baqî û bi sûd dost dipejirîne. Ev yek çênabe encax bi terbiyeya şêx<sup>247</sup>.

گر ل حال ما نپرسی میشویم اهل ضلال

کی رهم از دوزخ نفس ایا شاه جهان

Kengî xilas dibim ji dozexa nefsê ey şahê cîhan

Eger li rewşa min nepursî ez dibim ji ehlê delaleta (x.64,b.19)

Şa'ir di misreya yekem de vê pak kirinê daxwaz dike. Nefsa xwe jî şibandîye dojhê. Lewra dojh hem dijwar e û xilasbûna ji dojhê zehmet e. Nefsa xwe jî dijwar dibîne û bê alîkariya şêxê xwe xilasiya ji wê zehmet dibîne.

<sup>246</sup> سهوردی، ص، ۴۲.  
<sup>247</sup> سهوردی، ص، ۲۵-۲۶.

Bi hebûna şêx, sofî û salik rêya rasteqîn bidest dixin û derveyê xwe û derûnên xwe (zahir û batin) bi pertewa nûra terbiyeya şêx ronî dikin. Wek Quran nîşan dike;<sup>248</sup> (أُولَئِكَ الَّذِينَ) ‘Ha ew Pêxember in, ew ên ku Xwedê ew li ser heqiyê rasterê kirine, nexwe tu jî bide ser rêya wan’.<sup>249</sup> Murşidên kamil ji wê taîfeyê ne ku Xweda bi kemala lutfê xwe, bi berfirehiya înayeta xwe û bi pîrbûna diyariyên xwe, ew anîne ser rêya rast. Xweda ew (murşidên kamil) xistiye bin siya refet û înayeta xwe. Murşidên kamil wesîle ye ji bo gihastina Xweda ji kesên ku li pey wan diçe û peyrewtiya wan dike.<sup>250</sup> Di misreya duwem de şa’ir teleba vê hîdayetê dike ji şêxê xwe. Bi wesîleya şêxê xwe daxwaza gihastina Xweda dike. Eger murşidê wî li halê wî nepirse ew ê bigere ji ehlê delaletê. Eger şêxê wî bi pertewa nûra terbiyeya xwe lê nenihêre zahir û batinê wî ronî nabe û nagihêje Xweda.

## 2.6 Adabên Terîqetê

Di terîqetê de adabên şêx hene û adabên sofî hene. Adab, ew şert û mercên ku pêwist e pêk werin. Şeyda, di beyta jêr de, di rêzika yekem de adabê şêx aniye ziman. Şêxê kamil divê bizanibe mebesta Xwedayê Te’ala ku hêza me’rifetê, kemaliyeta besîretê, pîrbûna zanebûnî daye wî ji bo îrşadê ye û ji bo perwerdehiya sofîyan e. Rêya rast nîşanî wan bide. Bi nermayî bi wan re biaxive. Çawa bav ji zarokên xwe re bi şefqet in û şîretan li wan dikin, şêx jî ji bo murîdên xwe şîretvan û mihriban û qencîxwaz e. Ku emrê wan bi tiştê bike divê ji bo qenciya dîn û dinyaya wan be.<sup>251</sup> Helbestvan di beytekê de hem adabên şêxan û hem adabên sofîyan bi cih kiriye.

بچشم رأفتی بنگر برین پروانه عاشق      که در راحت تبه کردم دل و دین و تن و جانم

Li vî perwaneyê ‘aşiq bi çavê şefqetê binihêre

Ku wî di rêya te de dil û dîn û beden û canê xwe kerrixand (x.65,b.7)

Şa’ir di misreya yekem de dema dibêje ‘bi çavê şefqetê binihêre’ vê yekê tîne ziman. Ji bona kê? Ji bo wî ‘perwaneyê ‘aşiq’. Perwane hem têgehek tesewifê ye ku şa’ir xwe şibandîye wê. Perwane nîşana ‘aşiqiyê ye<sup>252</sup> ku di heman misrayê de şa’ir jî aniye ziman. Me’şûqa perwaneyê jî şem’e û mûm e. Di deverekê ‘aşiq hebe divê me’şûq jî hebe. Me’şûqa ‘aşiqî di vir de – mûma wî- , ku ‘aşiq nêrînek bi şefqet jê dixwaze, şêxê wî ye. Ev şibandîna şa’ir şibandînek bi zanebûn e. Lewra mûm çawa ronahiyê dide dora xwe, şêx jî pertewên nûrê

<sup>248</sup> Qurana Pîroz, En’am, 90.

<sup>249</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 137.

<sup>250</sup> سه‌روردی، ص، ۲۵.

<sup>251</sup> سه‌روردی، ص، ۱۱۳.

<sup>252</sup> Yıldırım, Ehmedê Xani’nin Fikir Dünyası, r. 208.

li dora xwe belav dike. Bi ev pertewên nûrê me'rifeta Xweda dixê dilê sofîyan. Mebesta şa'irî ev e, ku şêxê wî bi çavê merhemet û şefqetê lê binihêre û ji pertewên nûra Îlahî dilê wî dagire ji bo ku bigihêje me'rifeta Xweda.

Misreya duwem adabê sofî tîne ziman. Sofî pêwîst e hemû hilbijartinên xwe bide destê şêx. Pêwîst e bê destûra şêx dest bi tu kar û xebatên xwe yê dînyewî û dînî, çî pîrr û çî hindik, neke. Nexwe, venexwe, li xwe neke, nebexşîne, negirî, nede, encax bi destûra şêx. Herwiha di hemû 'îbadetan de wek; kirina sunnetan, zikir, xwendin û mûraqebe, bê destûra şêx tiştê neke.<sup>253</sup> Şa'ir dema dibêje 'di rêya te de dil û dîn û beden û canê xwe kerrixand' sipartina hemû tiştên xwe tîne ziman. Hemû tiştên xwe sipartiyê şêxê xwe. Bi destûra şêxê xwe tiştê nekiriye. Dilê xwe, dînê xwe, canê xwe, bedena xwe di emr û fermanên şêxê xwe de kerrixandiye ku ev yek ji adabên sofîtiyê ne.

### 2.6.1 Piştî Wefata Şêx Dewama Bandora Şêx

Sofî ku gihastibe asta ku bikaribe bi qelb têkiliyê bi şêxê xwe re ava bike perwerdehiya xwe ya tesewifî piştî wefata şêxê xwe jî dikare bidomîne. Şêxê wî wefat kiribe jî ji şêxê xwe sûd werdigire û îrşada xwe didomîne. Ev yek ji bo sofîyê mirî jî bi vî rengî ye.<sup>254</sup> Mewlana Xalid (q.s) destnîşan kiriye ku sofî eger murşidê wî wefat kiribe bi rêya rabîteyê dikare ji şêxê xwe feydê bistîne û perwerdehiya xwe ya me'newî bidomîne.<sup>255</sup> Ustad Bedî'uzzaman Se'îd Nûrsî, îşaret dike ku hinek welîyên Xweda jiyane nêzîkî jiyana Xidir (s.l.) didomînin û wefata wan wek jiyana wan e.<sup>256</sup> Ev tê vê wateyê, welîyên Xweda piştî wefata xwe teserrufatên/perwerdehiyên me'newî didomînin. Sofî jî li gorî hêza xwe ya me'newî ji murşidê xwe yê wefatbûyî dikare sûd wergire.

گر چه پنهان است پیش چشم ما شاه شهیر  
گر ازو غافل نباشی حاضر و با شفقت است

Her çend veşartibe li pêş çavê me ew şahê bi nav û deng

Eger ji wî xafil nebî hazir û bi şefqet e (x.16,b.10)

Şa'ir di beyta jorîn de vê yeke tîne ziman. Her çend ku ew şahê gelekî bi nav û deng wefat kiribe, ne li pêş çavê me be, lê eger em ji wî ne xafil bin – tîkilîyek bi qelb em bikaribin ava bikin – her tim bi şefqet e û hazir e ji bo perwerdehiya me'newî.

<sup>253</sup> Eraydın, hb. r. 384.

<sup>254</sup> Bediüzzaman Seid Nursî, *Barla Lâhikası*, Sözlür Yaymevi, İstanbul 1987, r.180.

## 2.6.2 Rabîte

Terîqeta Neqşebendî gelek giringî daye rabîteyê. Rabîte, xeyalkirina rûyê murşidê kamil e û ji rûhaniyeta wî xwestina îstîmdadê/alîkariyê ye. Sofî qelbê xwe bi qelbê şêxê xwe ve girêdide, rûyê şêxê xwe di xeyala xwe de bi cih dike. Lewra qelbê şêx wekî teraziyê ye. Feyd ji behra mûhît - ew qelbê şêxe ku wek teraziyê ye - nazil/dadikeve ser qelbê sofîyê ku bi rabîte ye.<sup>257</sup> Mifaya rabîteyê ji sofî re ev e, dema sofî ne li cem şêx be bikaribe bi rêya rabîteyê ji feyda şêx sûd wergire, ji feyd û bereketa wî mifadar bibe. Sofîyê ku rêzdariya rabîteyê bike ew xisletên şêxê wî hêdî hêdî derbasî wî dibin û sofî bi vî rengî digihêje meqamê 'FenaFi's Şeyx'. Ev yek dibe sedema ku sofî bikaribe bigihêje meqamê 'Fena fi'r Resû'l û 'Fena Fîllah'.<sup>258</sup> Rabîteya şêx ji bo ku sofî bikaribe bigihêje kemalê û ji feyd û bereketa şêxê xwe sûd werbigirê pêwîst hatiye dîtin.

چون خیال تو خیال در دل کند عبدالعزیز      ینجو من کیدالاعاد فاز فی یوم عصب

Çi dema ku xeyala te di dilê xwe de xeyal kir 'Ebdul'ezîz

Xilas bû ji xefikên dijminan û rizgar bû di roja tengasiyê de (x.9,b.11)

Şeyda di beyta jor de mifaya rabîteyê aniye ziman. Çi dema ku rabîteya şêxê xwe dike û bi rabîteyê xwe bi şêxê xwe girêdide ji dek û dolabên dijminên xwe ku nefis û şeytan in xilas dibe. Bi ew feyd û bereketên ku bi rêya rabîteyê bidest dixê, rêya wî a seyr û sulûkê ronî dibe, ji dafikên neyarên xwe xilas dibe. Hem bi sedema ku rabîte dibe wesîle ji bo gihaştina Xweda di roja axîretê jî dibe sedema rizgariya wî. Şeyda, rabîte hem ji bo rêya seyr û sulûkê û hem ji bo xilasbûna roja axîretê gelek giring dibîne.

## 2.7 Evîna Pêxember

Pêxember (s.x.l.) ji bo rêbertiya însanan bike, însanan bigihîne Xweda, ji teref Xweda hatine hilbijartin û hatine hinartin. Jiyana Pêxember (s.x.l.) mînaka herî başe û xweşik e ji bo însanê ku dixwaze bigihêje Xweda. Ne tenê ji bo kesên ku xwe bi tesewifê girêdane û girêdidin, ne tenê ji bo kesên misliman, ji bo jiyaneke bi aşîtî, aramî, xweşî, asûde û bextewar hemû însaniyet hewcedarê peyrewtiya jiyana Pêxember (s.x.l.) in. Lewra di Qurana Pîroz de Xweda wiha ferman kiriye. <sup>259</sup> (لَقَدْ كَانَ لَكُمْ فِي رَسُولِ اللَّهِ أُسْوَةٌ حَسَنَةٌ) '(Geli bawermendan) *Sond be ji bo we, di (jiyan û tevgerên) Resûlê Xwedê de mînak û nimûneyeke spehî û kamil heye*'<sup>260</sup> Nexwe ji jiyana Pêxember (s.x.l.) hîn xweşiktir, hîn şewaztir jiyaneke nayê hizirkirin.

<sup>257</sup> محمد، ص ٣٦٥.

<sup>258</sup> Eraydın, hb. r. 383-384.

<sup>259</sup> Qurana Pîroz, Ehزاب, 21.

<sup>260</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 419.

Resûlê Xweda (s.x.l.) hem bi hinartina xwe ya pêxembertî, hem bi rêbertiya xwe û hem bi jiyana xwe ji bo hemû ‘aleman rehmet e bi fermana Qurana pîroz.<sup>261</sup> وَمَا أَرْسَلْنَاكَ إِلَّا رَحْمَةً (للْعَالَمِينَ) ‘(Hey Muhammed!) Me tu şandî bes da ku tu ji heyînan re bibî rehmet)’<sup>262</sup> Ji vê rehmetê ehlê tesewifê jî bi behrin û ji ber hindî di dilê wan de hezkirinek mezin heye.

چون رحمت عالم شدى ای بحر کرمکار  
صیرت لقلبی بفنا بابک قیدا

Bi sedema tu bû rehmet ji ‘alemê re ey behra camêriyê

Te qelbê min tune kir û bi xwe ve girêda (x.5,b.6)

Şeyda heman ayeta ku me li jor nîşan da bi bîr tîne. Bi sedema ku Resûlê Xweda (s.x.l.) bûye rehmet ji hemû ‘aleman re, hezkirinek wisa ketiye dilê wî ku wî tune kiriye û qelbê wî bi deriyê Resûlê Xweda (s.x.l.) girêdaye. Bi evînek wisa mezin ji Resûlê Xweda (s.x.l.) hez dike ku xwe di vê evînê de tune dibîne.

Jiyana Resûlê Xweda (s.x.l.) pêkanîna sunneta Wî ye. Pêkanîn û peyrewtiya sunnetê yekem destûra – pêk anîna ferdan, dûrbûna ji heramiyan, ango pêkanîna emrê şerî’etê ji xwe ji hemû mislimanan re ye - tesewifê ye. Tesewif bê vê peyrewtî û pêkanîne teqez nayê holê. Ji ber hindî di hemî berhemên ku mijara tesewifê di wan de heye rî’ayeta sunnetê ji şêx re wek xislet<sup>263</sup> û ji sofî re wek adab<sup>264</sup> anîne ziman.

کنت کنزاً چون شنیدم از شکر بار حبیب  
اقتداء پیشوا انبیا ات گشت فرض

Çi dema ji hebêbê te yê wek şeker min bihist te gotiye ez gencîneme

Pewrewtiya pişewaê enbiya yên te li min ferd bû (x.53,b.4)

Şeyda ev Hedîsa Resûlê Xweda (s.x.l.) îşaret dike.<sup>265</sup> كُنْتُ كَنْزًا مَخْفِيًا فَخَلَفْتُ الْخَلْقَ

‘Ez gencîneyek veşartî bûm, min xwest ez werim naskirin, ji ber hindî min mexlûq afirandin’.<sup>266</sup> Ey Xwedayê min! Çi dema ku min ji hebêbê te yê devşêrîn bihist ku te gotiye ez gencîne me, peyrewtiya piş û pişewayê hemû enbiyayên te, ku Mûhemmed (s.x.l.) e, ji me re wek ferd pêwist bû. Ehlên tesewifê wek ku şa’ir jî anî ziman ji bo gihaştina gencineya veşartî-Xweda- peyrewtiya Resûlê Xweda (s.x.l.) gelekî girîng dibînin.

<sup>261</sup> Qurana Pîroz, Enbiya, 107.

<sup>262</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 330.

<sup>263</sup> عیسی، ص، ٤٠-٤٢.

<sup>264</sup> سجادی، ص، ٣٠٠.

<sup>265</sup> Der barê vê hedîsê de gengeşî heye. Hin kes wek hedîs qebûlnakin. Derbarê gengeşiya vê hedîsê bnr; Ergül, hb. r. 262.

<sup>266</sup> Muhyiddîn İbn Arabî, *Sırrın Sırrı (Lübbü'l-Lübb ve Sırru's-Sırr)*, Arzu Meral, Revak Kitabevi, İstanbul 2013, r. 5.

Di tesewifê de ev peyrewtî ji bo gihaştina meqamên bilind, ji bo pêşketina di seyr û sulûkê de pêwist hatiye dîtin.<sup>267</sup>

هرکه باشد پیروش بالا رود درراه حق      هم ژ مکر نفس و شیطان و جحیم هجر رست

Her kesê ku bibe peyrewê te ew ê di rêya heq de bilind bibe

Hem ji xefikên şeytan, nefis û dojhê ew ê dûr bibe (x.22,b.7)

Şa'ir vê hizrê dike û tîne ziman, ku ew kesê ku peyrewtiya Resûlê Xweda (s.x.l.) bike di rêya rast de ew ê bi jor ve hilkişe. Mebest ji rêya rast tesewif e. Di tesewifê de meqamên me'newî ew ê bi dest bixe. Di vê rêyê de ew ê ji dek û dolabên nefis û şeytan dûr bibe. Dema ku ev yek bidest xist roja axiretê ew ê ji dojhê jî dûr bibe. Hezkirin û peyrewtiya Resûlê Xweda (s.x.l.) dibe bextewariya her du dinyayan.

Xweda hezkirina xwe bi peyrewtiya pêxember û bi hezkirina wî girêdaye. Di Qurana Pîroz de gihaştina hezkirina Xweda bi hezkirina Resûlê Xweda (s.x.l.) wiha derbas dibe.

‘(قُلْ إِنْ كُنْتُمْ تُحِبُّونَ اللَّهَ فَاتَّبِعُونِي يُحْبِبْكُمُ اللَّهُ وَيَغْفِرْ لَكُمْ ذُنُوبَكُمْ وَاللَّهُ غَفُورٌ رَحِيمٌ)<sup>268</sup> Bibêje: Eger hûn bi rastî ji Xwedê hez dikin, nexwe bidin pey min, Xwedê dê ji we hezbike û li gunehên we bibore, Xwedê her gunehbexş e, dilovîn e<sup>269</sup> Wek ku Qurana Pîroz ferman kiriye ehlê tesewifê gihaştina hezkirina Xweda di hezkirina Resûlê wî de dîtine.

گفتمش چون خسته خاطر میشوم از هجرتو      چیست ای شاه جهان کاین دردرا باشد علاج

Min jê re got; dilê min ew ê bibetile ji dûrbûniya te

Ey şahê cîhan ji vê derdî re ew ê çî bibe derman (x.29,b.9)

بایدت در چشم کردن هم نعالش کرد تاج      گفت خاک پایمال آن حبیب بی نظیر

Go: xaka binê nigê ew hebîbê bê hemta

Divê tu bixî çavê xwe û sola wî jî ji xwe re bike tac (x.29,b.10)

Şeyda ji bo gihaştina Xweda û razîbûna Xweda û hezkirina Xweda hezkirina pêxember yekem çare dibîne. Dilê wî dike biweste, nema dikare tehemil bike ji dûrbûna Xweda. Ji bo vê dûrbûnê ji holê rake çare, ji vî derdî re derman; hezkirina Resûlê Xweda (s.x.l.) e. Hezkirinek ewqas mezin e ku tu bikaribî axa bin nigê wî weke kil di çavên xwe bidî û solên wî wek tacekê bi şan û şeref bidî serê xwe.

Resûlê Xweda (s.x.l.) çawa ji ummeta xwe re rêbere û wan digihîne bextewariya her du dinyayan herwiha ji ehlê tesewifê re jî rêberê yekem e. Lewra hemû zincirên silsileyên

<sup>267</sup> روزبهان بقلی شیرازی، عیهر العاشقین، قسمت ایران شناسی انستیتو ایران وفرانسه، تهران ۱۹۵۸، ص ۱۱.

<sup>268</sup> Qurana Pîroz, Alî 'Îmran, 31.

<sup>269</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 53.

terîqetan digihêjin Resûlê Xweda (s.x.l.).<sup>270</sup> Destpêka hemû terîqetan, destpêka tesewifê Resûlê Xweda (s.x.l.) ye. Ji ber hindî Resûlê Xweda (s.x.l.) rêberê yekem e<sup>271</sup> ji bo ehlê tesewifê.

مرجع ارباب عرفان الغیاث

رهبر اهل دلان در راه حق

Rehberê ehlê dilan ên di rêya heq de

Penahê erbabê îrfanê hey hawar (x.28,b.4)

Di beyta jor de şa'ir rêbertiya Resûlê Xweda (s.x.l.) tîne ziman. Resûlê Xweda (s.x.l.) hem rêber e ji bo ehlê tesewifê û hem ji ehlê 'îrfanê re cih û warê serîlêdanê ye. Kesên ku dikevin tengasiyê alikariyê ji Wî dixwazin, çareseriyê pisgirêkên xwe ji Wî dipirsin. Bi vê sedemê şa'ir jî bi bêjeya 'el xîyas' hawar û gaziyê dibe bal Resûlê Xweda (s.x.l.).

Xweda beriya afirandina her tiştî, beriya afirandina heyînan û gerdûnê ji nûra xwe nûra Resûlê Xweda (s.x.l.) anî holê. Di tesewifê de ji vê afirandinê re dibêjin heqîqeta Mûhemmedî (s.x.l.)<sup>272</sup>. Ji ber hindî, Resûlê Xweda (s.x.l.) puxte ya hemû heyînane, kaniya tamamê xweşikahiyan e, mînak û nimûneya kemalê ye. Bi van sedeman jî bûye mehbûb ji bo ehlê teswufê.

قد صیر جسمی وفؤادی لک صیدا

ان نور مقدس که نما بود برویت

Ew nûra mûqeddes ku di wechê te de xuya bû

Cismê min û dilê min bû seyd ji te re (x.5,b.5)

Dema nûra Xweda a pîroz, di wechê Resûlê Xweda (s.x.l.) de xwuya dike,<sup>273</sup> hezkirina Resûlê Xweda (s.x.l.) dikeve dilê şa'ir û 'aşîqê Resûlê Xweda (s.x.l.) dibe. Resûlê Xweda (s.x.l.) bi ew nûra ku di wechê Wî de xuya bûye wek seydvanekî dilê şa'ir nêçîr dike. Dil û canê wî bi 'işq û mehebbeta xwe ve girê dide.

Di tesewifê de meqamên me'newî hene. Yek ji van meqaman 'Fena fi'r Resû'l' e. Sofî bi pêkanîna rê û regezên terîqetê exlaqê Resûlê Xweda (s.x.l.) di jiyana xwe de bi destdixe. Bi vî rengî digihêje astekê ku herdem xwe li cem Resûlê Xweda (s.x.l.) dibîne. Di hezkirina Wî de winda dibe<sup>274</sup>.

همی خاهم بقائی با هوای نیک خوهانرا

چو شیدا در غمت فانی شده ای سرور عالم

<sup>270</sup> Eraslan, hb. r. 322-449.

<sup>271</sup> Ali Tenik, *Ahmed Kuddûsî ve Tasavvuf Düşüncesi*, Doktora Tezi, Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Temel İslâm Bilimleri, Tasavvuf Anabilim Dalı, Ankara 2007, r. 266.

<sup>272</sup> Ethem Cebecioğlu, *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, Anka yayınları, İstanbul 2010, r. 263.

<sup>273</sup> Şa'ir, di beyta ku li pey vê beytê hatiye dibêje "Çon rehmetê 'alem şodî ey behrê keremkar", bi vê misrayê em dizanin ku şa'ir basê Resûlê Xweda (s.x.l.) dike. Lê, ew nûra pîroz ku di wechê Resûlê Xweda de xuya bûye, ji teref şa'ir çewa hatiye dîtin, an şa'ir çewa fam kiriye tiştêkî wusa heye ew ji me re veşartiyê.

<sup>274</sup> Topbaş, hb. r. 254.

Bi sedema ku Şeyda di xema te de fanîbûye ey serwerê 'alem

Ez tim bi dil ji kesên qencîxwaz re beqayê dixwazim (x.6,b.7)

Ey serwerê 'alemê! Madem ez ji xema te, di hezkirina te de fanî bûme, tune û winda bûme, tew ne be ez ê herdem ji kesên qencîxwaz re beqayê/mayinê bixwazim. Şeyda işq û evîna xwe ya di meqamê *Fena fi'r Resû'l* de bi vê beytê aniye ziman.

## 2.8 Evîna Rêberê Terîfetê

Sofi pêwîst e ji şêxê xwe hezbike. 'Izzeddîn Neseffî di 'Însanê Kamil' de hezkirina şêx ruknê duwem ê seyr û sulûkê nîşan kiriye.<sup>275</sup> Ev 'işq û mehebbeta şêx ne ji bo şexsê şêx e. Ne ji bo xweşikahiya şêx e. Bi sedema ku şêx wî digihîne mebesta wî ya eslî ji şêx tê hezkirin. Mebesta eslî hezkirina Xweda ye û mehbûbê eslî jî Xweda ye. Ango şêx wasite ye di navbera sofî û Xweda de. Bêşik, ji ew wasiteya ku mirov digihîne mehbûba eslî jî tê hezkirin.<sup>276</sup> Hemû wasiteyên di navbera wî û Xweda de ne û dibin sedema gihaştina Xweda; eger ji wan bê hezkirin, ev ji hezkirina Xweda ye. Ji nan û avê hezbike bi sedema ku hêzê dide wî li ser ta'et û 'îbadetê, ji hezkirina Xweda ye. Ji jina xwe hezbike bi sedema ku nesla wî qut nebe û ewladên salih bîn perwerdekirin ji hezkirina Xweda ye. Ji zêr û zîv hezbike bi sedema aboriyê ji hezkirina Xweda ye. Bêşik hezkirina sermayê, germayê, berfê, baranê, asîman, xak ku nîşanên Xweda ne, ji hezkirina Xweda ye.<sup>277</sup> Herkesê ku ji Xweda hezbike teqez divê ji Resûlê Xweda (s.x.l.) jî hez bike û ji şêxê xwe jî hez bike.<sup>278</sup> Lewra di terîfetê de wesîle ya herî mezin Şêx e ji bo gihaştina Xweda. Ew sofîyê ku hezkirina şêxê wî nekeve pêşiya hezkirina temamê hezkirinên wî di terîfetê de nagihêje felahê.<sup>279</sup> Bi vê sedemê divê sofî hezkirina şêxê xwe gelekî girîng bigire. Mehebbet û hezkirina wî çiqas bihêz be ewqas bêhtir ew ê zû bigihêje mebesta xwe ya eslî ku gihiştina hezkirina Xweda ye.

قط نمی یابم قراری زان حبيب بی مثال

دین و شیدا بوم ژ دردی فرقنا شاه دلال

Ez dîn û Şeyda bûm ji dûrketina şahê xweşik

Ez tebatiyekê qet bi dest naxim ji wî hezkiriyê bê hemta (mlm. b,8)

که شیدا گشت مشتاق جمالت

بکن مسکین را روز وصال

Ji rebenê xwe re bike roja gihaştinê

Ku Şeyda bûye muştaqê xweşikahiya te (msn.3,b.10)

<sup>275</sup> نسفی، انسان کامل، ص، ۴۰.  
<sup>276</sup> Ebû Hamid Mûhemmed Gazâlî, *Îhyâu 'Ulûmi'd-Dîn*, (Tercüme, Ahmet Serdaroğlu) Bedir yayınevi, İstanbul 1973, c. 2, r. 406-407.

<sup>277</sup> Gazâlî, c. 2, r. 406-407-408.

عين القضاة، ص، ۶۰.

<sup>278</sup> عين القضاة، ص، ۶۰.

<sup>279</sup> الشعراى، الأنوار القدسية فى معرفة قواعد الصوفية، ص، ۱۶۷.



عاشق حسنا ته مه ای نازکا طبعت ملک

'Aşiqê husna te me ey nazika teb'et melek (mux.2,bnd.3)

هم ز مروارید او حیران شود مرد لیب کس نباید در جهان شاه فاروقی حبیب

Kes nabe di dinyayê de wek Şahê Farûqî yar  
Kesê zana heyran dimîne ji gotinên wek durr (x.9,b.1)

رفیق روز محنت هم خلیل خالق وهاب لکلی آسیتان خدو پیرس ای مهربان من

Li kuçikê ber deriye xwe bipir se ey mihrîbanê min  
Hevalê roja dijwar û dostê Xaliqê Wehhab e (x.11,b.8)

مظهر انوار حق محبوب و دلدارم کجاست قطب ارشاد نجل استاد ملجئی بیچاره گان

Qutbê îrşadê, ji nesla ustad, stareya bêçareyan  
Mezherê nûrên Xweda, mehbûba min dildara min li ku ye (x.21,b.3)

نباشد جز وصال تو نصیم شهی فاروقی فتح الله حبیب

Ey hebîbê min, Şahê Farûqî Fethullah  
Ji gihâştina te pê ve tiştêk bila nebe para min (x.66,b.1)

Şeyda di dîwana xwe de gelek medhiye û mersiye li ser şêxên xwe nûsîne. Medhiye û mersiyyên ku tên nivîsandin ji hest û ramanên evîn û mehebbetê tên. Li jor me çend beytên Şeyda ku li ser evîn û hezkirina şêxên xwe nivîsandiye, dest nîşan kir. Ji beytên wî tê fam kirin ku dilê Şeyda bi 'îşq û evîna şêxên wî ve pihêt girêdayî bûye.

## 2.9 Hal û Meqam Di Helbestên Şeyda De

### Hal û Meqam

Hal û meqam di tesewifê de, rêya seyr û sulûkê de rewşa salikî tînin ziman. Salik di vê rêyê de her ku pêş ve diçe nefsa wî ber bi kemalê diçe, dil paktir dibe û rih jî hinek îmtiyazan bi dest dixê. Ev rewşa nefsa, dil û ruh bi hal û meqaman hatiye nasandin. Helbestvanên sofî di helbestên xwe de ev rewşa xwe ya me'newî geh bi remz û îşaretan, geh bi wateyek veşartî di beytên xwe de anîne ziman.

Li ser hejmara hal û meqaman di berhemên tesewifê de yekîtiyê nayê dîtin. Di berhema *El'lûme'û Fit'tesewifî* de 7 meqam û 10 hal hatine jimartin.<sup>280</sup> Şeqîqê Belxî (q.s) çar meqam

<sup>280</sup> أبی نصر عبد الله بن علی السراج الطوسی، *اللمع فی التصوف* (تحقیق رنولد الین نیکلسون، مطبعة بریل) لیدن ۱۹۱۴، ص، ۴۱-۷۶

diyar kirine ji bo rêya salikî.<sup>281</sup> Selçûk Eraydın hal û meqam ji hev veneqetandiye û bi giştî 22 hal û meqam hijmartiye.<sup>282</sup> Hin kesên hejmara hal û meqaman gihandine sedî (100) jî hene.<sup>283</sup> Di berhema *Et'tesewiful İslamî* de heft meqam û heft hal hatine destnîşankirin.<sup>284</sup> Pirtûka *Tesewif çi ye* 15 hal<sup>285</sup> û 25 meqaman<sup>286</sup> nîşanî me dide.

Di dîwana Şeyda de bêjeyên hal û meqaman derbas dibin. Li jêr em ê li ser wateyên bêjeyên hal û meqam ên ku di beytên Şeyda de derbas dibin bisekinin. Em ê binêrin bê Şeyda bi kîjan wateyê; bi wateya tesewifî bi kar aniye an bi wateya bêjeyî.

Emîn Şêx 'Elaeddîn Neqşebendî di berhema xwe ya bi navê *Tesewif Çiye* de 15 hal jimartine. Navên van halan ev in: "*Qebd, Best, Mehû û Îsbat, Sehû û Sekr, Xeybet û Şuhûd, Şewq, Uns, Wecd, Celal, Cemal, Kemal, Mehebbet, Lewaîh, Cezbe, Warid.*"<sup>287</sup> Emîn Şêx 'Elaeddîn Neqşebendî hejmara meqaman jî gîhandiye 25 an. "*Tewbe, İnabe, Zuhd, Qena'et, Wer', Sebir, Şukur, Tewekkul, Teslîm, Rida, Mûhasebe, Xewf û Rica, Feqr, Sidq, Mûraqebe, Îhsan, Qurb, Îxlas, Fena, Beqa, Tewhîd, Tecrîd, Tefrîd, Tenzîh, Ûbûdiyet*"<sup>288</sup>. Li gorî vê rêzandina Neqşebendî em ê bêjeyên hal û meqaman ku di dîwana Şeyda de derbas dibin rave bikin.

## 2.10 Hal û Bêjeyên Hal

Hal, ew tişt in ku salik ji meqamekî vediguherine meqamekî din.<sup>289</sup> Hal ji rêwî re wek xwarin û vexwarinê ye. Hal divê nemîne û nedome. Wek ku Cuneydê Bexdadî gotiye; 'divê wekî birûskê derbas bibe.' Eger derbas nebe ew ne hal e.<sup>290</sup> Hal, li hemberî hezkirina salikî ji fedl û kerema Xweda tê, ji teref Xweda wek xelatekê ji salikî re tê. Dawiya her meqamekî destpêka halekî ye.<sup>291</sup> Dema salik digihêje dawiya meqamekî Xweda ji fedla xwe xweşî û aramiyekê dişîne ser dilê salikî, ji vê re hatiye gotin hal.

<sup>281</sup> Hayrani Altıntaş, *Tasavvuf Tarihi*, Ankara İlahiyat Fakültesi yayınları, Ankara 1986, r. 51.

<sup>282</sup> Eraydın, r. 151-203.

<sup>283</sup> محمد مشهدی نوش‌آبادی، "نخستین تبیین احوال و مقامات عرفانی در مناجات «خَمْسَ عَشْرَةَ»"، *مطالعات عرفانی (مجله علمی پژوهشی)*، دانشکده ادبیات و زبانهای خارجی دانشگاه کاشان، ۲۴۰ شماره بیست و دوم، پاییز و زمستان ۹۴، ص ۲۲۰.

<sup>284</sup> عون، ص، ۱۰۲-۱۳۹.

<sup>285</sup> شیخ نه مین شیخ علاءالدین نهقشبندی، *تصصوف چی به*، ئەمپندارنیتی گشتی روشنبیری و لاوان، دار الحرية لطباعة، به‌عداد ۱۹۸۶، ص، ۲۹۶.

<sup>286</sup> نه قشبه ندی، ص، ۲۰۰.

<sup>287</sup> نهقشبندی، ص، ۲۹۶.

<sup>288</sup> نهقشبندی، ص، ۲۰۰.

<sup>289</sup> Necmeddîn-i Kübrâ, *Fevâihu'l-Cemâl ve Fevâitihu'l- Celâl*, (Çeviren, H. İsmail Hakkı Altıntaş) ( *Bê Cihê Çapê*), İstanbul 2010, r. 52.

<sup>290</sup> علی بن عثمان هجویری، *کشف المحجوب*، ([http://www.sufism.ir/MysticalBooks\(53\).php](http://www.sufism.ir/MysticalBooks(53).php))، ص، ۱۱۲.

<sup>291</sup> محمد دامادی، *شرح بر مقامات اربعین یا مبانی سیر و سلوک عرفانی*، دانشگاه تهران، تهران، ۱۳۶۷، ص، ۱۳-۱۲.

Şeyda di helbestên xwe de bêjeya hal bikar tîne. Lê ev bikaranîn ne ji bo ravekirina bêjeyên hal e. Yanî dema Şeyda vê bêjeyê bikar tîne piştî nabêje di tesewifê de evqas hal hene. Belkî ji bo rewşa ew dema ku Şeyda tê de jiyaye, aniye ziman. Yanî Şeyda halek bi dest xistiye, navê hal nabêje lê dide xuyakirin ku di halekî de ye.

افتاده ام در دام تومی جویم از انعام تو      خوش میشود اکرام تو در کشف این احوالها

Ez ketim xefika te li n'imetê te digirim

Xweş dibe îkramên te di keşfa van halan de (x.3,b.6)

Şeyda xuya ye ji halekî derbasî halekî din bûye. Ketiye seyda me'şûqa xwe û li qencî û ni'metên me'şûqa xwe digere. Di wî halê ku tê de ye, bidest xistiye îkram û pêşkêşiyên me'şûqa wî gelekî li xweşa wî çûye. Şeyda di vê beytê de bi bikaranîna bêjeya hal ew halên me'newî bi nav nekiriye, lê bi me dide fam kirin ku halek bi dest xistiye. Belkî ne halek tenê bidest xistiye. Ji hin halan derbasî hin halên din bûye. Lewra bêjeya halê bi bi pirjimarî (احوال) ) bikar tîne.

شیدا شب وصال آمد بوفق حالت      چون حور بی مثلت آن شاهباز آید

Şeyda, şeva wîsalê li gorî munasibîya halê te hat

Lewra ew şebazê te yê wek horiya xweşik hat (x.40,b.8)

Şeyda kêfxweşiya xwe ji dilê xwe re rave dike. Dibêje şeva (xaye ji şevê dem e) hevghiştinê, wîsalê hatiye. Ew halê ku te bidest xistiye ji xwe pêdiviya wê wîsal bû. Herî tiştê munasibê ev halê ku tu têdayî wîsal e. Ew hezkirîya te ya wek şebazan ku ji horiyên jî xweşiktir e vaye hat û hûn ghiştin hev.

Şeyda di vê beytê de jî navê ew halê ku bi dest xistiye nayîne ser zimanê xwe, lê bi encama hal ku wîsal e dixwaze wî halî bide famkirin. Di vê beytê de jî bêjeya hal bi wateya ew halê ku Şeyda bi dest xistiye hatiye bikaranîn.

### 2.10.1 Mehebbet<sup>292</sup> (Hezkirin)

Mehebbet di tesewifê de gelek girîng e. Heta em dikarin bibêjin sofîtiya bê mehebbet ne pêkan e. Mûtesewifan mehebbet ji Qurana pîroz wergirtine û li ser wateyên ayetên Qurana pîroz ava kirine. <sup>293</sup> (فَسَوْفَ يَأْتِي اللّٰهُ بِقَوْمٍ يُحِبُّهُمْ وَيُحِبُّونَهُ) 'Xwedê, dê civatekê wisa ( di şûna wan de)

<sup>292</sup> Derbarê mehebbetê û nêrina Şeyda li ser mehebbetê di beşa *mehebbetê* de agahiyên berfireh ew ê were dayîn. Bes li vir wek bêjeyek hal ewê derbas bibe.

<sup>293</sup> *Qurana Pîroz, Maide*, 54.

*bîne ku Xwedê ji wan hez dike ew jî ji Wî hez dikin.*<sup>294</sup> <sup>295</sup> *قُلْ إِنْ كُنْتُمْ تُحِبُّونَ اللَّهَ فَاتَّبِعُونِي يُحْبِبْكُمُ اللَّهُ*  
*(وَيَغْفِرْ لَكُمْ ذُنُوبَكُمْ وَاللَّهُ غَفُورٌ رَحِيمٌ)* ‘Bibêje: Eger hûn bi rastî ji Xwedê hez dikin, naxwe bidin pey  
 min, Xwedê dê ji we hez bike û li gunehên we bibore. Xweda her gunehbexş e, dilovîn e.’<sup>296</sup>  
<sup>297</sup> *(يُحِبُّونَهُمْ كَحُبِّ اللَّهِ وَالَّذِينَ آمَنُوا أَشَدُّ حُبًّا لِلَّهِ)*<sup>297</sup> ‘Mîna ku ji Xwedê hez dikin ji wan jî hez dikin. Belê  
 ew ên ku bawerî anîn ji wan bêhtir ji Xwedê hez dikin.’<sup>298</sup> Xwedayê te’ala di ayeta yekem de  
 mehebbeta xwe xistiye pêşiya mehebbeta ‘ebdên xwe. Di ayeta duwem de behsa mehebbeta  
 xwe li hemberî ‘ebdên xwe û mehebbeta ‘ebdên Wî li hemberî Wî kiriye. Di ayeta sêyem de  
 mehebbeta li hemberî Xwedê heye. Halê mehebbetê ji salikî re; salik bi çavên xwe li ni’metê  
 Xwedê binihêre û bi qelbê xwe li nêzîkahiya Xwedê binihêre.<sup>299</sup> Ew nêzîkahiya ku Xwedayê  
 Te’ala bi ni’metên xwe û bi hîdayeta xwe û bi înayeta/ îltîmasa xwe û hezkirina xwe ya qedîm  
 jê hezkiriye bi qelbê xwe û bi baweriya xwe lê binihêre.

Mehebbeta Xwedê li hemberî ‘ebdê Wî rehmet e, pêşwazî ye, pejirandin e, kerem û  
 lutfa Xwedê ye. Mehebbeta muminan li hemberî Xweda; daxwaza razibûniya Xweda ye,  
 pêkanîna emrê şerî’etê û xweparastina ji hemû aferîdeyan e. Çi dema ku qelbê mumin ji leke,  
 kêmasî û qusûran pak bû û di dilê xwe de mehebbeta Xwedê tercîh kir li ser hezkirina her du  
 dinya, ew dem bende ji Xweda hez dike û Xweda jî jê hez dike.<sup>300</sup> Qelbê mumin bi pêkanîna  
 emr û fermanên şerî’etê ji hemû kêmasiyan pak dibe û bi vî rengî hezkirina Xweda dikeve  
 pêşiya her tiştê ku li vê dinyayê û li axretê heye.

Nûra çavên salikan, sutûna hebûna erbabê terîqetê, sebat û berdwama kesên bi besîret  
 ji mehebbetê ye. Mehebbeta kê zêde be ew ji sir û razên Îlahî hin bêtir û ji tam û kemala hal  
 hîn zêdetir bi par dibe. Cemala Îlahî bi nûra mehebbetê tê dîtin, razibûna Xweda, bi wesîleya  
 mehebbetê tê bidestxistin, gihiştina jiyaneke ebedî bi hêza mehebbetê tê bidestxistin.<sup>301</sup>  
 Mehebbet di tesewufê de serokê her tiştî ye.

<sup>294</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 116.

<sup>295</sup> *Qurana Pîroz*, Alî ‘Îmran. 31.

<sup>296</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 53.

<sup>297</sup> *Qurana Pîroz*, Beqere, 165.

<sup>298</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 24.

<sup>299</sup> الطوسي ، ص ، ٥٧-٥٨.

<sup>300</sup> العبادي ، ص ، ١٢٢.

<sup>301</sup> العبادي ، ص ، ١٢٢.

Sê astê mehebbetê hene. Asta yekem mehebbeta ‘am/giştî ye<sup>302</sup> û herwiha halê wan kesan e ku di destpêka seyr û sulûkê de ne.<sup>303</sup> Ev mehebbet ji qencyên Xwedê tê holê<sup>304</sup> û di vî halî de ji salik re şewq pêwîst e.<sup>305</sup> Asta duwem, bi qelb li zengîntiya Xweda binihêre, li celala Xweda binihêre, li ‘ezemeta Xweda binihêre û li zanin û hêza Xweda binihêre.<sup>306</sup> Di vî halî de ji salik re xelîltî<sup>307</sup> pêwîst dibe.<sup>308</sup> Pêşengê vî meqamî Hezretî Îbrahîm Xelîl (s.l.) e. Asta sêyem; asta mehebbeta siddîqan (gelekî rastgo) û ‘arifan e. Bi qelbê xwe û me’rîfeta xwe gihiştina heqîqeta hezkirina Xweda ye. Ew dem xisletên mehbûb di mûhib de xuya dibe.<sup>309</sup> Ango muhib di mehbûbê de tune dibe. Û ev wateya peyva Xwedê ( حَتَّىٰ أُحِبَّهُ ) ye. Dema Xwedê hezkir ew dem wateya<sup>310</sup> (فاكون سمعه الذى يسمع به ، وبصره الذى يبصر به ، ولسانه الذى ينطق به )<sup>310</sup> derdikeve holê. Ev meqamê Mûhememd Mustefa (s.x.l.) e. Lewra Xweda ew ji xwe re mehbûb qebûl kiriye.

Di tesewifê de mehebbet gelekî girîng hatiye nîşandan. Mehebbet di nav halên tesewifê de herî mezin û herî girîng halê ‘arif e û bingeha tesewifê ye.<sup>311</sup> Mehebbet ji bo salikî divê girîng be lewra sofitî bê mehebbet çênabe. Bi kurtasî mehebbet, hezkirina Xweda ye.

داغ انوار محبت بر رخس آثار عشق

از بنی آدم نباشد هرکه نبود در دلش

Ji ademîzadan tune ye kesek tunebe di dilê wî de

Daxê nûra mehebbetê û di rûyê wî de nîşanên ‘işqê (x.62,b.4)

Şeyda di beyta xwe de mehebbet bi wateya ferhengî bi kar aniye, ne wek halê tesewifê. Lê di vî beytê de mehebbet bêjeyek tesewifî ye li gorî wateya beytê ya giştî.

### 2.10.2 Şewq (Hewes)

Ji hewesa zêde re şewq tê gotin. Ji bidestxistina lezeta mehebbetê şewq tê holê ku ji pîrbûna irade/xwestekê çêdibe. Di halê seyr û sulûkê de piştî bi şîdbûna xwestinê şewq pêwîst dibe. Salik her ku di seyr û sulûkê de bi pêş bikeve şewqa wî ewqas zêde dibe û sebra wî

<sup>302</sup> الطوسی ، ص ، ۵۸.

<sup>303</sup> العبادى ، ص ، ۱۷۳.

<sup>304</sup> الطوسی ، ص ، ۵۸.

<sup>305</sup> العبادى ، ص ، ۱۷۳.

<sup>306</sup> الطوسی ، ص ، ۵۸.

<sup>307</sup> Xelîl, ji astên ‘işqê asta hefta ye. Wateya wê; ‘aşîq divê ji me’şûqa xwe pê ve tiştekî nexwaze. Bnr;

داود حسن زاده کریم آباد، "مراتب قرب در عرفان اسلامی"، دو فصلنامه حکمت عرفانی، سال اول، شماره چهارم، پاییز و زمستان ۱۳۹۱، ص ، ۹۶.

<sup>308</sup> العبادى ، ص ، ۱۷۳.

<sup>309</sup> الطوسی ، ص ، ۵۸.

<sup>310</sup> ‘Ez dibim guhên wî yên ku dibihîze, çavên wî yên ku dibîne, zimanê wî yê ku pê diaxive, (Sadreddin Konevi, *Tasavvufa 40 Hadis* (Tercüme Harun Ünal) İhvan Neşriyat, İstanbul, (Bê Tarîx) r.125)

<sup>311</sup> فاطمه اسلامی ، "مقامات و احوال" ، آفتاب اسرار فصلنامه فرهنگی هنری ( عرفانی) ، سال دوم ، بهار ۱۳۸۷ ، شماره ۵ ، ص ، ۶۵.

kêmtir dibe heta ku bigihêje daxwaza xwe.<sup>312</sup> Şewq sê cure ne. Şewqa ‘amî ji bo dinyayê ye, şewqa xasan ji bo axretê ye û şewqa xasê xasan jî ji bo Xwedê ye. Kesê ku şewqa wî ji bo dinyayê be şewqa agir jî ji bo wî ye. Kesê ku şewqa wî ji bo axretê be şewqa bihiştê jî ji bo wî ye. Kesê ku şewqa wî ji bo Xwedê be şewqa Xwedê jî ji bo wî ye.<sup>313</sup> Hatiye rîwayetkirin ku bihişt bi şewq e ji bo sê kesan. Hezretî ‘Elî (r.a.), Hezretî ‘Emmar (r.a.) û Hezretî Selman (r.a.).<sup>314</sup>

Şewq ji salikî re wek keştiyê ye, wî digihîjîne armanca wî. Ji dilê wî re pasban e, wî ji xetereyan vedigerine, diparêze. Ji ‘elametê kesên ‘aşiq e ku her tiştê ku dijberê emrê muştaya wî be neke. Her tiştê ku razîbûna muştayê pê hebe yan jî ew tiştê ku muştayê dixwaze pêk were bi cih bîne. Resûlê Xweda (s.x.l) ferman kiriye; (من اشتاق الى الجنة سارع الى الخيرات) ‘*Kesê ku muştayê bihiştê be ew ê li ‘ibadetê xwe ‘ecele bike.*’<sup>315</sup> Ji ber hindî şewq sebebê xwesteka salikî ye ku pêwîst e hezkirina Xweda bixwaze. Keştî ye ji bo salikî di rêya tesewufê de. Diyarîyeke girîng e ji bo salikî di tesewufê de ji bo gihiştina meqsed û meramê.

Dema navê mehbûbê hat gotin dilê ‘aşiq helecana û kelecana digire, ji vî halî re şewq tê gotin.<sup>316</sup> Di tesewufê de halê şewq bi heman wateyê hatiye. Heyecana û kelecana salikî dema navê Xweda tê gotin û arezûya gihaştina Xweda ye.

آنکه یافتی لذت شوق رخت شد اهل عشق  
از تمنای وصلت دائما بر عهد بود

Ew kesê tama şewqa rûyê te tam kir bû ji ehlê ‘işqê  
Û bi hêvîya gihaştina te herdem li ser soza xwe bû (x.34,b.3)

Şeyda di vê beytê de bêjeya şewqê weke hal nîşan dide. Lewra hin kesan bêjeya şewqê wiha rave kirine. “İşqa heqiqî, dilşadî û dilgeşiya tesewwura Xweda ye. Şewq jî ew xebat û tevgera ku vê dilşadiyê bi rê ve dibe ye.”<sup>317</sup> Ew kesên ku şewqa rûyê te dîtî û lezzeta wê fam kirin bûn ji wan kesên ku ji wan re dibêjin ehlê ‘işqê. Ev kes bi hêviya ku xwe bigihînin te, herdem li ser soza xwe man.

<sup>316</sup> Cebecioğlu, hb. r. 319.

<sup>312</sup> سجادی ، ص ، ۵۱۲.  
<sup>313</sup> العجم ، ص ، ۵۱۳.  
<sup>314</sup> الطوسی ، ص ، ۶۰.  
<sup>315</sup> العبادى ، ص ، ۱۴۰-۱۴۱.

<sup>317</sup> العجم ، ص ، ۵۱۱-۵۱۲.

Ji bo mirov bikaribe li ser tişteki bisekine divê xebatek û tekoşînek hebe. ‘Aşiq ji bo mayîna li ser soza xwe xebat kiriye. Tekoşîna ‘aşiq, bi vê tekoşîne bi dest xistina wîsalê û lezzeta wîsalê di vir de halê şewqê ye.

Bi rastî Şeyda ev bêje mahîrane bi kar aniye. Dema mirov zêde ne hişyar be, şewq wek birqandina ser çav xuya dike di beytê de. Şeyda bêjeya şewqê hem di wateya ferhengî û hem di wateya têgehek tesewifî de bikar aniye.

### 2.10.3 Uns (Hogirî)

Di hin berhemên tesewufê de heybet û uns wek halekî destnîşan kirine. Di hin berhemên de uns bi tenê wekî hal hatiye pejirandin.<sup>318</sup> Uns bi wateya hogiriyê ye. Tecelliya sifate celal e. Heybet jî bi wateya tirsê û xwe parastinê ye.<sup>319</sup> Yanî salik ji ‘ezamet û celala Xwedê bitirse û xwe biparêze. Dema Xweda bi sifate xwe yê celal tecellî bike heybet çêdibe û bi sifate xwe yê cemal tecellî bike uns derdikeve holê. Heybet ji halê qebdê û halê qebdê jî ji tirsê peyda dibe. Uns, ji halê bestê ye û best jî ji halê recayê derdikeve holê.<sup>320</sup> Ew dem halê heybetê ji qebdê û qebd jî ji tirsê mezintir dibe. Halê unsê ji bestê û best jî ji recayê mezintir dibe.

Ji halê unsê re sê ast hene: Asta yekem, hogiriya bi zikrê Xweda û revandina ji xefletê, hogiriya ta’etan û revandina ji gunehan e. Asta duwem, salik hogiriya Xwedê bike û xwe dîr bike ji hemû tiştên xeyrê Xwedê, wek, arid û xwatirê wî meşxûl dikin. Asta sêyem; bi hebûna heybet, qurb û te’zîmê; çuyîna ber bi dîtina unsê ye.<sup>321</sup> Salikê di halê unsê di pêla herî jêr de be û ku wî bavêjin dogehê, ji unsa xwe tişteki wînda nake. Ewqas hişyar e. Di halê unsê de salik digihêje astekê wek ku Sirriyê Seqetî aniye ziman; eger şûr li ser çavê wî bidin jî, haya wî jê çênabe.<sup>322</sup> Di qisseyaya Hezretî Yûsûf de, dema Zuleyxa gazî jinên Misriyan dike û kêr di destê wande Hezretî Yûsûf dibînin û di wî halî de destê xwe dibirin mînakê vî halî ye.

Uns, dema dilê salikî hogirî mehebbeta Xweda dibe kêfxweşiyek di dilê wî de çêdibe.<sup>323</sup> Ev kêfxweşî halê unsê ye. Uns wek nêzikahiya gihaştina hezkirina Xweda jî em dikarin rave bikin.

<sup>318</sup> عون û العبادى، Cebecioğlu، قشیری، heybet û uns yek hal، الطوسی، uns bi tenê wekî hal destnîşan kiriye.

<sup>319</sup> Cebecioğlu, r. 149.

<sup>320</sup> عون، ص، ۱۲۹.

<sup>321</sup> الطوسی، ص، ۶۶-۶۵.

<sup>322</sup> Eb'u-l Kasim Kuşeyrî, *Tasavvufun İlkeleri (Risale-i Kuşeyrî)*, (Çeviren Tahsin Yazıcı) Tercüman Yayınları, İstanbul 1978, c. 1, r. 132.

<sup>323</sup> نه‌قشیه‌ندی، ص، ۳۰۸.

Kübrâ, r. 74.

Şeyda bêjeya unsê bi kar neaniye lê du bêjeyên ku ji unsê pêk hatine bikaranîne ‘enîs’ û ‘mûnis’.

توی شاه همه مردان و پادشاه همه عالم      جلیسی تخت ارشادی انیس آل و هم اصحاب

Tu yî şahê heme merdan û padşahê heme ‘alemê  
Xwediyê textê îrşadê hogirê al û hem eshab (x.11,b.6)

Şeyda di pesindana murşidê xwe de dibêje tu bûyî dost û hogirê Al û Eshabê Resûlullah (s.x.l.). Dema em bifikirin, yekî li jiyane ew ê çawa bibe dost û hogirê hin kesên ku ne li jiyane bin? Ev dostanî û hogirtî eger hebe divê me’newî be. Eger me’newî be ew dem dibê hal ji bo kesên ehlê tesewifê. Vêca em dikarin bêjin Şeyda di pesindana murşidê xwe de halê wî jî destnîşan kiriye.

بی چاره و بی مونسیم هم مجرم و هم مفلسم      لیکن د عشق مخلصم لبر درگهی شهبال شاه

Bêçare û bêhogirim hem mucrim û hem muflisim  
Lê belê di ‘işqê de muxlisim li ber dergehê şahê şahan (x.87,b.6)

Şeyda di vê beytê de bêjeya mûnîs bi wateya ferhengî bi kar aniye. Wek halekî rêya seyr û sulûkê di vê beytê de xuya nabe.

#### 2.10.4 Celal (Meziantî)

Celal sifetekî Xweda ye. Celal mezintiya bi qehr û seltenetê ye. Qehr û selteneta bi şifqet e. Xweda tiştêkî bixwaze û kes nikaribe wê daxwazê pêk neyne rewşa celalê ye.<sup>324</sup> Di vê pêkanîne de hezkirinek heye ango salik ewqas ji Xweda hez dike her emrê wî bi cih tîne.

ای پادشهی منبع احسان و جلالت      خالی نشود لوح دل از نقش خیالت

Ey padîşahê kaniya îhsana celala xwe  
Lewheya dilê min vala namîne ji xeyala te (x.18,b.1)

Şa’ir bangî me’şûqa xwe dike û wê bi kaniya îhsana cemelê dipesinîne. Rewşa xwe jî wiha nîşan dide; xiyala te tu demî ji dilê min dernekeve, dilê min herdem bi xiyala te dagirtîbe. Şa’ir di beyta xwe de sifetê celalê wek ew xulamê herdem amade ye ji bo pêkanîna xizmeta xwediyê xwe rave dike. Ji siltan û padîşahê xwe re dibêje tu kaniya qenciya celalêyî û ez herdem amade me ku emr û fermanên te pêk bînim.

<sup>324</sup> سجادی ، ص ۲۸۷.



### 2.10.5 Cemal (Delalî)

Cemal yek ji sifetên lutf û rehmeta Xwedaye. Wek têgehekî hal celal, valabûna dilê ‘aşiq ji her tiştî û tijîbûna wî dilî bi evîna me’şûqê hatiye nasandin. Neseffî vî halî wiha şîrove dike: Di encamê de wisa bibe ku cemala me’şûq dilê ‘aşiq ji xeyrê xwe vala bike û dilê wî bi evîna xwe tijî bike. Dilê ‘aşiq wisa bibe ku ji tişteki re cih tê da nemîne. Ew dem ‘aşiq xwe nabîne herdem me’şûqa xwe dibîne.<sup>325</sup>

شأن محبوبان بود هم عاشقان بر بست حظ      گر کرمکاری کنی گه گاه با کشف جمال

Eger tu hin dema keşfa cemala xwe îkramî me bikî

Ji navdariya mehbûban e û ‘aşiqê bi kêfê girêdide (x.56,b.6)

Li gorî vê pênasê Neseffî, bêjeya cemal ku di beyta Şeyda de derbas dibe halê salikî aniye ziman. Şeyda dibêje eger tu cemala xwe ji me re weke îkramekê vekî û em bibînin, ku ev yek ji şanê mehbûban e û hem bi vî rengî tu ‘aşiqan jî bi xwe girêdidî. Ango ewqas ‘aşiqî te dibin û bi te tîr girêdan ji xeyrê te tu kesî nema dibînin.

### 2.10.6 Kemal (Gihîştî)

Neseffî, ji bo gihîştina însanan ast nîşan kiriye. Asta yekem asta hukema ye (kesên xwedî hîkmet). Hukema gihîştine zanebûniya tebî’eta eşya. Asta duwem, asta weliyan e. Welî digihêjin heqîqeta eşya. Asta sêyem asta Nebiyan e. Nebî digihêjin xewasê eşya.<sup>326</sup> Ew halê ku salik tê de digihêje heqîqeta eşya, halê kemalê ye.

حسن روز افزون تو چون گشت در حد کمال      میزند هر لحظه بر جرک و دلم صد گونه داغ

Xweşikahiya rûyê te ji zêdahiyê derbas bû gihaşt bandevê

Herdem cerg û dilê min bi sed derbî dikewîne (x.58,b.2)

Şeyda di vê beytê de cemala mehbûba xwe ewqas zêde dîpesinîne, digihîne bandevê. Şeyda di halê kemalê de gihîştîye heqîqeta xweşikahiya mehbûba xwe. Lê ew xweşikahî bi sedema negihîştina wê, bi hesreta xwe dilê Şeyda her dem bi sed derbî dikewîne. Şeyda di beyta xwe de bêjeya kemalê bi wateya wê ya ferhengî bi kar aniye.

<sup>325</sup> سجادی، ص ۲۸۸.

<sup>326</sup> نسفی، کشف الحقایق، ص ۶۷.

### 2.10.7 Qebd (Wergirtin)

Xema di dilê salikî de peyda dibe jê re qebd hatiye gotin. Heta dema ku nefsa emmare bidome halê qebdê jî didome. Qebd cezakirina dil e. Heta dema ku nefsa salikî terbiye bibe.<sup>327</sup> Ew halê ku di wî halî de nefsa salikî perwerde dibe û ji nefsa emmare reha dibe halê qebdê ye.

چیزی از تدبیر حال خود نمی بینم ولی      میکنم هر گاهی قبض روح خود را ارتقاب

Ji bo tedbîra halê xwe tişteki nabînim lê

Herdem ez li benda standina ruhê xwe me (x.12,b.6)

Şeyda di beyta xwe de qebd bi wateya standina ruh, mirinê bi kar aniye. Nefsa wî di cezayê de ye. Ji ber ev cezayê giran hindik maye ruhê xwe ji dest bide. Xuya ye şa'ir di beyta xwe de qebd bi wateya halê tesewifê bi kar aniye.

### 2.10.8 Best (Berfirehî)

Wek meqamekî tesewifê best bi wateya dîtina nûrên tecelliyatan û zewqa gihiştina mehbûbê hatiye.<sup>328</sup>

ای پادشاه مه جبین تا کی در این بسط زمین      مفتون شوم با ان و این از حیلۀ بسیار چرخ

Ey padîşah a enî wek hîvê, heta kengî li ser erde

Bi hîleyên gerdûnê ez ê dilê xwe bidim bi tiştikan (x.33,b.3)

Şeyda di vê beytê de bêjeya bestê bi wateya dinyayê bi kar aniye. Em wateyek tesewifî di beyta wî de nabînin.

Di beytek din de Şeyda bêjeya bîsatê bi kar tine ku ev bêje ji bestê peyda bûye.

خیال خال خوبان زاهدان سر گرم میدارد      بساط زهد و تقوا طی کنند در فکر آن عارض

Xeyala deqên xweşikan zahidan mijûl dike

Qada zuhd û teqwayê derbas dîkin di ramana çêbûyî de (x.54, b.4)

Di vê beytê de Şeyda bîsat bi wateya halê meqamên zuhd û teqwayê bi kar aniye. Salik bi mijûliya xeyala xweşika xwe, me'şûqa xwe firehiya meqamê zuhd û teqwayê derbas dike.

### 2.10.9 Sekir (mestî)

Sehû û Sekir (hişyarî û mestî) du bêje ne ji bo nîşandana hal tîn bikaranîn. Bi sedema ku Şeyda sehû bi kar neaniye me mestî tenê mînak da. Mestî, serxweşbûn û mendehoşbûnî ye.

<sup>327</sup> سهروردی، ص، ۱۲۹.  
<sup>328</sup> عبدالرزاق الکاشانی، معجم اصطلاحات الصوفیة (تحقیق: عبد العال شاهین) دار المنار، الطبعة الأولى، القاهرة، مصر، ۱۹۹۲، ص ۳۵۴.

Di zimanê salikan de metel, heyran mayina di 'işqê de û kêf û şahiya wê rewşê ye.<sup>329</sup> 'Aşiq ji 'işqê û kêfxweşiya 'işqê heyran dimîne.

یالاگر عرض ایلدم یاره فط آلدیرمدیم      مست اولوب حیرتده قالدیم گوگلمی سیلدرمدم

Bes min ji yara xwe re got, lê min guh nedayê

Mest bûm, metel mam, lê min ji dilê xwe paqij nekir (x.74,b.3)

Şeyda di beyta beriya vê beytê de şewitandina xwe ya di 'işqê de tîne ziman. Rewşa şewitandina xwe ya di 'işqê de ji yara xwe re gotiye, lê guh nedaye wê şewitandinê, mest bûye bi wê şewitandina di 'işqê de, metel maye ji wê rewşê, lê dîsa ew 'işq ji dilê xwe dernexistiye. Xuya ye Şeyda di vê beytê de mestî wek bêjeyek hal bi kar aniye.

## 2.11 Meqam û Bêjeyên Meqaman

Li jor di pênasaya hal de me got hal, tûşe û zwadeyên rêya seyr û sulûkê ye. Meqam jî di rêya seyr û sulûkê de qonaxên ku salik lê disekine û bêhna xwe lê vedide ye.<sup>330</sup>

Meqam, di seyr û sulûkê de xisletê salikê sabit û daîmiye. Dema dilê salikî ronahî û derûnê wî pak bû digihêje astekê. Ev ast ji salikî re meqam hatiye dîtin. Ev meqam ji salikî naqete, herdem bi wî re ye.<sup>331</sup> Di rêya seyr û sulûkê de bilindbûna salikî ji meqamekî bi bal meqamekî din wek mercekî sofitîyê hatiye dîtin. Meqam, mertebeyek ji mertebeyên sulûkê ye ku salik di wê de disekine.<sup>332</sup> Meqam, ji temamê 'emelên/kirinên salikê pêk tê, meqam, kar û xebata salikî ye, meqam, bi tekoşîna salikî hatiye bidest xistin.<sup>333</sup> Eger em seyr û sulûkê wek rêya rêwiyeke binasînin, ew cihê ku salik lê disekine û bêhna xwe vedide meqam hatiye dîtin.

Mûtesewifan wek hemû têgehên tesewufê bêjeya meqam jî ji Qurana pîroz wergirtine. Quran; <sup>334</sup> (وَمَا مِنَّا إِلَّا لَهُ مَقَامٌ مَّعْلُومٌ) 'firîşteyan got) Ji bo her yekî jime meqamekî kifşkirî heye.<sup>335</sup>

Şeyda di dîwana xwe de bêjeya 'meqam'î bi kar aniye. Bikaranîna bêjeya 'meqam'î wek têgehek tesewifî ye. Şeyda ev bêje ji bo meqamê herî mezin ku Xweda ji bo resûlê xwe Mûhemmed Mustefa (s.x.l.) hilibijartiye, meqamê Mehmûd, bi kar aniye.

مولی چو وعد داده است تو مقام محمود      بر ما چرا نبخشی مانیم بس خطرناک

<sup>329</sup> العجم ، ص ، ۵۱۱-۵۱۲.

<sup>330</sup> Kübrâ, r. 186.

<sup>331</sup> محمدرضا نكونام ، " عرفان و مقامات ؛ شرح و نقد دو نمط نهم و دهم كتاب «الاشارات و التنبیهاات» ، ظهور شفق ، قم ، ایران ۱۳۸۶ ، ص ، ۳۹.

<sup>332</sup> دامادی ، ص ، ۹.

<sup>333</sup> هجویری ، ص ، ۱۱۲.

<sup>334</sup> Qurana Pîroz, Safat, 164.

<sup>335</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 451.

Xweda çi soz daye te di hundurê meqamê Mehmûd de

Çima ji me re nabexşînî em mane di tehlûkê de (x.63,b.6)

Şeyda, ew sozên ku Xweda di Meqamê Mehmûd de daye Resûlê Ekrem (s.x.1.) ji xwe re jî dixwaze. Xwe di tehlûkê de dibîne û xelasiya ji vê tehlûkeyê jî di ew soza ku Xweda daye de dibîne.

Di helbestên Şeyda de ew bêjeyên meqamên salikî ku di seyr û sulûkê de bi dest dixwe tînin. Li jêr li ser bêjeyên ku wek navê meqaman tînin bikaranîn em ê bisekinin.

### 2.11.1 Tewbe (Poşmanî)

Divê bête zanîn tobe ji bo hemû bawermend/muminên Îslamê emr û fermana Xweda ye. Xweda di Qurana pîroz de wiha ferman kiriye:<sup>336</sup> ( وَتُوبُوا إِلَى اللَّهِ جَمِيعًا أَيُّهُ الْمُؤْمِنُونَ ) 'Tev bi bal Xwedê ve tobe bikin.'<sup>337</sup> Wek ku ji ayetê bi zelalî tê famkirin Xweda tobe ji bo hemû bawermendên Îslamê ferman kiriye. Tobe, vegera ji hemû kirinên nebaş bi bal hemû kirinên qenc e. Tobe, ji bedel temamê xisletên denî/pîs bicihkirina hemû xisletên seniyye/mezin û baş e. Tobe, ji şuhûd/dîtina aferîdeyan vegera bal îstixraqa/noqbûna şuhûda/dîtina Cenabê Heqq e.<sup>338</sup> Ev pênase pênaseyeke tesewufî ye û di heman demê de wateyên cureyên tobeyê nîşan dike.

Di tesewufê de tobe ji bo salik mercê yekem e û hem yekem meqam e. Li ser yekembûna meqamê tobeyê ji sofî re di rêya seyr û sulûkê de lihevkirineke mutesewifan heye. Mutesewifan meqamê tobeyê bingeha hemû meqamên seyr û sulukê danasîn kirine.<sup>339</sup> Pêdiviya hemû meqaman bi tobeyê heye, pêdiviya tobeyê jî piştî tobeya nesûh bi tobeyeke din heye.<sup>340</sup> Tobeya li ser tobeyê. Ev jî tê wateya ku pêdiviya sofî di her meqamî de bi tobeyê heye. Bê tobe, tesewuf û sofîti pêk nayê.

Sofî pêwîst e ji hemû gunehên xwe, çi biçûk û çi mezin, tobe bike. Guneh ayîneya/neynika dil gemarî dike. Dema neynika dil gemarî bû sofî bi ew dilê gemarî nikare tiştêkî bibîne lewra tecelliyatên Xweda nayên dilê gemarî. Mebest ji terîqetê û sofîtiyê pakkirina neynika dil û sîqalkirina dilan e ku sofî bikaribe şewq û sîtava 'alema xulqiyetê û emrê bibîne. Ê bi vî rengî bikaribe ji civata 'ewaman derbasî civata xewasan bibe. Dema neynika dil tarîbe, bi vê tarîtiyê di dil de qeswet/hişkbûnî çêdibe. Derbarê hişkbûniya dil de

<sup>336</sup> Qurana Pîroz, Nûr, 31.

<sup>337</sup> Qurana Pîroz û Meala wê a Kurdî, r. 352.

<sup>338</sup> بن عجيبة، ص، ٢٧.

<sup>339</sup> عون، ص، ١٠٢.

<sup>340</sup> بن عجيبة، ص، ٢٧.

Resûlê Xweda (s.x.l.) wiha kerem kiriye: (و القلب القاسى بعيد من الله بعيد من الجنة قريب من الشيطان) ‘Dilê hişk dûre ji Xweda, dûr e ji bihiştê û nêzîkî şeytan e.’<sup>341</sup> Sofî bi tarîtiya dil teqez ji tesewufê tu mefayê bi dest naxe. Divê dilê xwe bi tobê pak bike û bi nûra ta’et û ‘îbadetan û bi rêgezên terîqetê hişkbûniya dilê xwe nerm bike.

Xweda ji tobekaran hez dike. Di Qurana pîroz de wiha ferman kiriye:<sup>342</sup> (إِنَّ اللَّهَ يُحِبُّ) ‘Bêguman Xwedê ji yên gelek tobekar hez dike û ji yên xwe paqij dikin ji hez dike.’<sup>343</sup> Ji bo bawermend û sofî bikaribe bigihêje ev hezkirina Xweda pêwîst e hem bi zimanê xwe, hem bi dilê xwe û hem bi canê xwe tobe bike. Kesê bi devê xwe bibêje min tobe kir û di dilê wî de fesadî û nerastî hebe ev xiyanet e. Bi zimanê xwe bibêje min tobe kir û bi canê xwe di nav gunehan de be ev ze’iftî, bêzarî û keslanî ye. Eger can di qeyd û benda tobeyê de be, dil bi tobeyê ronahî bibe û ziman di zîkrê tobeyê de be heta ku bigihêje civata taîba (kesên tobedar) ew dem dibe mezherê ayeta Quranê ku li jor hat nivîsandin.<sup>344</sup> Bi vî rengî sofî, digere ji ew kesên ku Xweda ji wan hez dike. Ji xwe ji sofî re yekem armanc her bidestxistina hezkirina Xweda ye. Li gorî ku ji ayeta Quranê bi zelalî tê famkirin sofî bi tobeyek rastî dikare bigihêje hezkirina Xweda.

Sê cureyên tobeyê hene. Cureya yekem tobeya ‘ewaman e. Di vê cureyê de bawermend ji gunehên kebaîr/mezin<sup>345</sup> vedigere û xwe diparêze ji hemû tiştên ku Xweda û Resûlê Xweda (s.x.l.) haram kirine. Deriyê vê cure tobeyê bi mizgîniya Resûlê Xweda (s.x.l.) ji bawermendan re vekirî ye heta dema qîyamet rabe.

‘Deriyek ji (إِنَّ لِلَّهِ أَبَابًا مِنْ قَبْلِ الْمَشْرِقِ يُقَالُ لَهُ بَابُ اتَّوْبَةِ لَا يَغْلُقُ عَلَى الْعِبَادِ حَتَّى تَطْلُعَ الشَّمْسُ عَنْ مَغْرِبِهَا) Xweda re heye ji rexê rojhilat, jê re tê gotin deriyê tobeyê, ew derî nayê girtin heta ku roj ji rojava derkeve.’<sup>346</sup> Yanî heta ku qîyamet rabe Xweda toba bendeyên xwe qebûl dike.

Cureya duwem, tobeya xewasan e ku ji gunehên biçûk tobe dikin. Çawa gunehên mezin/kebaîr ji ‘ewaman re afet û bela ye her wiha gunehên biçûk ji ehlê xewasan re afet û bela ye. Ji tirsê kirina gunehên mezin pêwîst e ji gunehên biçûk xwe dûr bike. Lewra bi kirina

<sup>342</sup> Qurana Pîroz, Beqere, 222.

<sup>343</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 34.

<sup>345</sup> Her gunehê ku Xweda bendeyê xwe bi wî gunehê bikişîne hesabê ew gunehê kebaîr e. Bnr;

<sup>341</sup> العبادى ، ص ، ٥٠.

<sup>344</sup> العبادى ، ص ، ٥٠.

العبادى ، ص ، ٥٢.

<sup>346</sup> العبادى ، ص ، ٥١.

yek gunehêkî biçûk rê vedibe ji bo kirina gunehêkî mezin. Israra li ser gunehên biçûk dibe sedema kirina gunehên mezin. Divê nefsa wî bi kirina gunehên biçûk cesaret û wêrekiyê negire<sup>347</sup>. Her tim bi hizir be ku bikaribe bigihêje sirra<sup>348</sup> (عَسَى اللَّهُ أَنْ يَتُوبَ عَلَيْهِمْ) *Nêzîk e ku Xwedê tobeya wan qebûl bike.*<sup>349</sup> Lewra tobeya ji seyyiatan di heman demê de deriyê hêviyan ji Xweda vedike ji bo sofî.<sup>350</sup> Sofî tim li bendê be ku tobeya wî bê qebûl kirin. Ji bo qebûl kirina tobeyê jî dûrbûniya ji gunehên biçûk û xweparastina li ser israra wan wek biryardayîna sofî ye. Dema sofî gunehêkî biçûk/seyyie kir divê zû bi zû qenciyeke bike ku ew qencî wî gunehê biçûk ji holê rake. Wek ku Resûlê Xweda (s.x.l.) ferman kiriye:

(اتبع السيئة الحسنه تمحها) Piştî seyyîyê (karekî xirab, karekî neqenc) zû bi zû hesenekê (karekî baş, qencî) bikin ku wê seyyîyê mehû bike.

Cureya sêyem, tobeya pêxember û weliyan e. Hatiye gotin (حسنات الابرا سيئات المقربين) Qenciyeke ebraran<sup>351</sup> ji mûqerrebînan<sup>352</sup> re seyyiat in. Ji wan re pêwîst e agahdarê qelbên xwe bin. Hal û meqamên ku derbas dikin wek kêmasiyekê bibînin û li ser îltîfata wan hal û meqamên Xweda ji kerema xwe daye wan tobe bikin. Tobeya Mûsa (e.s)<sup>353</sup> (قَالَ سُبْحَانَكَ تُبْتُ) *Got: Ez te ji hemû kêmasiyan pak didêrim, ez li ber te tobe dikim.*<sup>354</sup> Ev cure tobe ye. Dîsa ji heman cureyê tobê ye Resûlê Xweda di hedîsa xwe de gotiye; (يا ايها الناس توبوا الى ربكم) 'Gelî însanan li ber dergahê Xweda tobe bikin. Ez ku Resûlê Xweda me û her rojê sed carî tobe dikim.' Tobeya Resûlê Xweda (s.x.l.) ne ji ber kirina gunehan e, ne ji ber kirina zelleyan e. Belkî ji bo parastina qelb e.<sup>355</sup>

<sup>347</sup> العبادى ، ص ، ٥٢.

<sup>348</sup> *Qurana Pîroz*, Tewbe, 102.

<sup>349</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 202.

<sup>350</sup> أبو الوفا الغنيمي التفتازاني ، مدخل إلى التصوف الإسلامي ، دار الثقافة للنشر والتوزيع ، الطبعة الثالثة ، القاهرة ، مصر ، ١٩٥٠ ، ص ، ٧٣.

<sup>351</sup> Ebrar, kesên qenc, kesên qenciyan dikin û kesên ramê emrê Xweda ne. Bnr;

سيد صادق گوهرين ، شرح اصطلاحات تصوف ، زوار ، چاپ دوم ، تهران ١٣٧٦ ، ج ١ ، ص ، ٤٥.

Quran pesnê wan daye. Di sûreya Înfîtar di ayeta 13yan de (إِنَّ الْأَبْرَارَ لَفِي نَعِيمٍ) *Bi rastî mirovên çak û Xwedênas di nava nîmetan de ne* (*Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 586.)

<sup>352</sup> Mûqerrebîn, ew kesên li ber deriyê Xweda li nêzikahiya Xweda digerin, dixwazin bi dest bixin. Hem di terîqetê de navêmeqamekî mezine ji bo salikan. (سجادی ، ص ، ٤٣٩). Xweda di Quranê de di sûreya Waqî'e de di ayeta 11an û 12an de derbarê Mûqerrebûnan de wiha pesnê wan dide: (أُولَئِكَ الْمُقَرَّبُونَ \* فِي جَنَّاتِ النَّعِيمِ) 'Ew in, ên ku bi bal Xwedê ve hatine nêzîkkirin. Ew li bihiştê Ne'imê ne.' (*Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, s. 533.)

<sup>353</sup> *Qurana Pîroz*, E'raf, 143.

<sup>354</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 166.

<sup>355</sup> العبادى ، ص ، ٥٤.

Ji kesên di destpêka seyr û sulûkê de ye û ji ‘ewaman re pêwîst e ku ji hemû gunehên mezin dûr bibin û ji bo wan tobe bikin. Kesên ku di tesewufê de pêş ketine û bûne ji civata xasan pêwîst e ji xetayên biçûk û tiştên bi şibhe xwe biparêzin. Û ji bo weliyan pêwîst e agahdarê dilê xwe bin. Herkes divê bikoşe ku tobeya wî bête qebûlkin. Lewra Xweda kerem kiriye; <sup>356</sup> ( إِنَّهُ هُوَ التَّوَّابُ الرَّحِيمُ ) ‘*Bi rastî Xwedê pir tobepejrên û dilovîn e.*’<sup>357</sup>

Tobe pîleya yekem e ji bo salikî di rêya seyr û sulûkê de. Salik dema li tiştê ku kiriye poşman bû û ji vê poşmaniyê venegeriya dibêjin Tobeya Nesûh.<sup>358</sup> Tobeya nesûh di Qurana pîroz de di sûreyê Tehrîm de di ayeta heyştan de derbas dibe.

نتوب عن الشرك توب التصوح

تركنا متاع الغرور لكي

Me terk kir pertalên xurûrê ji bo

Em tobe bikin ji şirkê bi tobeyek nesûh (x. 31,b.8)

Şeyda xuya ye bêjeya tobê wek meqamekî tesewifê bi kar aniye. Bi tobeya nesûh, tobeya ku careke din li gunehên xwe venegere, ji şirkê tobe kiriye. Ji bo ku bikaribe di tobeya xwe de rastgo be û li ser tobeya xwe bisekine hemû tiştên ku bi wan serbilindayî dikir terk kiriye, dev ji wan berdaye.

### 2.11.2 Zuhd (Dest Jê Berdan)

Zuhd, di ferhengan de bi wateya ji tiştêkî rû zîvirandin, bê rexbetî hatiye.<sup>359</sup> Di Qurana pîroz de bêjeya zuhdê di Sûreya Yûsuf de bi wateya bê rexbetiyê derbas dibe. <sup>360</sup> ( وَشَرُّهُ بِتَمَنٍ )

‘*Wan Yûsuf bi nixekî hindik, bi çend dirheman fîrot û dilê wan li ser jî nebû.*’<sup>361</sup> Zuhd, bê rexbetî ye. Bê rexbetiya tiştên bi dinyayê girêdayî ye, wek, xwarin, vexwarin, cil û berg, xanî, tiştên ku dil dibijê û hem bê rexbetiya tiştên bi hestên însan giradayî ye, wek; hezkirina pirbûna mal, meqam, şan û şuhret, nêzikahiya bal fermanbaran, erka fermanrewaniyê. Bi kurtasî ew tiştên bi mirinê ji meriv vediqetin mirov rû nede wan û ji wan bê rexbet be. Lê ev rûnedan û bê rexbetî divê ne ji bêkêrî, ji bi destnexistinê be, û ne ji cahiltiyê be, bê rexbetî û rû zîvirandinek bi zanayî be. Her kesê ku ev xislet di wî de hebe jê re tê gotin zahid. Lê zahide heqîqî, ew kes e ku zuhda wî ne ji bo xilasiya ji ezabê dogehê ye û ne

<sup>356</sup> Qurana Pîroz, Beqere, 37.

<sup>357</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 5

<sup>358</sup> شوان، ص ٣٥١.

<sup>359</sup> Ethem Cebecioğlu, *Tasavvuf Terimleri Ve Deyimleri Sözlüğü*, r. 379.

<sup>360</sup> Qurana Pîroz, Yûsûf, 20.

<sup>361</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 236.

ji bo bidestxistina ni'metên bihiştê ye. Zahidê heqîqî ew kes e ku nefsa wî ew tiştên li jor hatin jimartin nas bike, bikaribe wan bidest bixe, lê ne di dinyayê û ne di axretê de tu hêviyê ji wan neke û berê nefsa xwe ji wan vegehrîne.<sup>362</sup> Zuhd, divê di tiştên ku bi dest dixê bê kirin ne di tiştê ku bi dest nakeve. Dema kesek vê zuhdê pêk bîne bi mizgîniya Resûlê Xweda (s.x.l.) hem ew ê Xweda jê hez bike û hem ew ê bendeyên Xweda jê hez bikin. ( جَاءَ رَجُلٌ إِلَى النَّبِيِّ فَقَالَ : يَا رَسُولَ اللَّهِ دُلَّنِي عَلَى عَمَلٍ إِذَا أَنَا عَمَلْتُهُ أَحَبَّنِي اللَّهُ وَأَحَبَّنِي النَّاسُ ؛ فَقَالَ رَسُولُ اللَّهِ ازْهَدْ فِي الدُّنْيَا يَحِبُّكَ اللَّهُ ، وَازْهَدْ يَا رَسُولَ اللَّهِ دُلَّنِي عَلَى عَمَلٍ إِذَا أَنَا عَمَلْتُهُ أَحَبَّنِي اللَّهُ وَأَحَبَّنِي النَّاسُ ) ( فيمَا فِي أَيْدِي النَّاسِ يَحِبُّكَ النَّاسُ ) 'Zilamek hat ba Resûlê Xweda (s.x.l.) got: Ya Resûlellah 'emelekî şanî min bike, dema ku min ew 'emel kir Xweda ji min hez bike û însan jî ji min hez bikin. Resûlê Xweda (s.x.l.) got: Li dinyayê zahid be ewê Xweda ji te hez bike û ji destê însanan zahid be ew ê însan ji te hez bikin.<sup>363</sup> Di Hedîsa Resûlê Xweda de du xal hene. Xalek, zuhda ku mijara me ye, dûrketina ji tiştên dinyayê ye. Xala din jî çav li destbûna însanan e. Divê çavê mirov ne li destê însanan be.

Ehmed Bîn Henbel sê cureyên zuhdê destnîşan kirine:

- 1- Terkkirina heraman; ev zuhda 'ewaman e.
- 2- Terkkirina tiştên zêde ji helalan; ev zuhda xewasan e.
- 3- Terkkirina tiştên ku wî xafil dike ji Xweda; ev zuhda 'arifan e.<sup>364</sup>

Zuhd, meqamê sisiyan e ku piştî meqamê tobeyê û wer'ê tê. Çi dema salikê terîqa Heq bi tobeya nesûh ji gunehên xwe poşman bû û rê û rêçên vegeza ser gunehan girt, piştê bi sîqala wer'ê neynika dilê xwe ji gemar û zingarê pak kir ji bo heqîqeta dinyayê û axretê tê da xuya bibe, ew dem divê dinyayê pîs û fanî bibîne û jê dûr bikeve, axîretê jî xweşik û baqî bibîne û ji bo wê bibeze û bigihêje heqîqeta zuhdê.<sup>365</sup> Heta dema ku salik nebe zahid di seyr û sulûka xwe de pêş nakeve.

Bi kurtasî zuhd, devjêberdana dinyayê ye.<sup>366</sup> Kesên ku di vê rewşê de bin ji wan re hatiye gotin zahid. Şeyda hem bêjeya zuhdê û hem bêjeya zahid di yek beytê de bi hev re bi kar aniye.

بساط زهد و تقوا طی کنند در فکر آن عارض

خیال خال خوبان زاهدان سرگرم میدارد

<sup>362</sup> سجادی ، ص ، ۴۴۹-۴۵۰.

<sup>363</sup> عیسی ، ص ، ۱۷۲.

<sup>364</sup> عون ، ص ، ۱۱۰.

<sup>365</sup> سجادی ، ص ، ۴۴۸.

<sup>366</sup> Cebecioğlu, hb. r. 377.



Xeyala deqên xweşikî zahidan mijûl dike

Qada zuhd û teqwayê derbas dîkin di ramana çêbûyî de (x.54, b.4)

Şeyda di vê beytê de halekî (halê best) û meqamekî (meqamê zuhdê) bi hev re dide xuyan. Her du bêjeyan jî di wateya wan a tesewifî de bi kar tîne. Dema zahid bi xeyala deqên xweşikî mijûl bibe firehiya meqamê zuhd û teqwayê pir zû derbas dike. Şeyda bêjeya zahid bi wateya ew kesên di meqamê zuhdê de û bêjeya zuhdê jî bi wateya meqamî bi kar aniye.

Di vir de şayanê gotinê ye şa'ir teqwayê jî wek meqamekî dinasîne. Lewra dibêje 'Bîsatê zuhd û teqwa'. Lê di tu berhemên tesewifê de me teqwa wek meqamekî ku hatibe destnîşankirin nedît.

### 2.11.3 Sebr (Aramî)

Sebir, bênfirehî, tehemil, tebat û hedan e. Di tesewufê de, hepskirina qelbe li ser fermanên Xweda.<sup>367</sup> Meqamê sebrê piştî meqamê feqrê tê û pêdiviya sebrê bi feqrê heye.<sup>368</sup> Lewra cureyeke sebrê sebra li ser feqrê ye. Hem sebir sutûnek ji her du sutûnê îmanê ye. Di hedîsa Resûlê Xweda (s.x.l.) de wiha derbas dibe : (الایمن نصفان: نصف صبر و نصف شكر) 'Îman du niv e: nivê jê sebr e, nivê jê şukr e.' Her tiştê ku tê pêşiya mumin çî n'imet be û çî bela be, divê bê zanîn ku encama qeda û qedera Xweda ye, û bi îradeya Xweda hatiye holê. Ji ber hindî eger ev ni'met û bela ji tiştên ku ji bo mirov zehmet be divê li ser wan zehmetiyan sebir bê kirin. Eger ji wan tiştên ku pê kêfxweşî çêdibe be divê ji bo wan şukur/spasî bê kirin.<sup>369</sup> Girîngiya sebrê ji hedîsê derket holê ku nivê îmanê ye.

Wek meqamekî tesewifê sebr, tebatî û hedaniya li ser tiştên ku ji Xweda tê ji bo Xweda hatiye nasandin.<sup>370</sup>

Şeyda di dîwana xwe de hem bêjeya sebrê û hem bêjeya kesên ku pîrr sebir dîkin 'sebbar' bi kar aniye.

گفت می یابد مرادش کل صبار شکور

گفتمش طاقت ندارم بیش ازین صبر آورم

Min jê re got; ji vê pê ve hêza min tune ez sebir bikim

Got: ew ê bigihêjin mirazê xwe kesên pîrr sebirker û sipasker (x.45,b.4)

Şeyda bêjeya sebrê bi wateya wê ya meqamê tesewifê bi kar aniye. Şa'ir, gazinan dike bi mehbûba xwe. Dibêje; ji vê pê ve ez nema dikarim sebir bikim. Mehbûba wî dibêje ma tu nizanî kesên pîrr sebirker û sipasker digihêjin mirazê xwe. Şeyda di meqamê sebrê deye û

<sup>367</sup> بن عجبیة ، ص ، ۲۸ .

<sup>368</sup> عون ، ص ، ۱۵ .

<sup>369</sup> سجادی ، ص ، ۵۲۱ .

<sup>370</sup> اسلامی ، ص ، ۶۴ .

mehbûba wî jî jê re dibêje ji bo ku tu bikaribî bigihêjî mirazê xwe pêwîst e tu gelekî sebirker bî û spasdar bî.

#### 2.11.4 Rida (Qayîlbûnî)

Rida, dilkirin, qayîlbûnî û razîbûnî ye. Rida, yek ji mercê Îslamê yê bingehîn e. Resûlê Xweda (s.x.l) wiha ferman kiriye: (ذاق طعام الايمان من رضى با الله ربنا و بالاسلام ديناً وبمحمد رسولاً) 'Ew kesê bi Xwedatiya Ellah qayîl e, bi dînê Îslamê qayîl e û bi pêxembertiya Mûhemmed qayîl e, zewqa îmanê tehm kiriye.'<sup>371</sup> Heqîqeta îmanê di hundirê van her sê qayîlbûniyan de ye. Beriya her tiştî ev hersê qayîlbûnî pêwîst e.

Rida, di temamê rewşan de qayîlbûnî û dilxweşbûniye li hemberî qeza û ferwarên Xwedê. Dema salik di dilê xwe de qayîlbûnî bi cih kir, ji wî re heqîqeta qeda û qederê vedibe. Heqîqeta qeda û qederê bi alîkariya hîdayetê, nûra tewhîdê di dilê wî de bi cih dike. Dil bi nûra tewhîdê ronî dibe, dixemile û zelal dibe. Heta dema salik qazî û hakimê mutleq nas neke, teqdîr û hukmê wî birastî û durustî nas nake. Ev naskirin bi ridayê pêk tê.<sup>372</sup> Ji bo bidestxistina ridayê tewekkuleke giştî pêwîst e. Ji ber hindî meqamê ridayê piştî meqamê tewekkulê hatiye.

Gelek pênaseyên ridayê hatine kirin. Wekhevbûna şîrînî û taliyê, tercihkirina bela û mûsîbetan li ser qencî û başiyan<sup>373</sup> yek ji nasandina ridayê ye. Wekhevbûna rewşa (hal û meqaman) li cem salikî, dema hal û meqam hatin bidestxistin kêfxweşî çênebe û dema hal û meqam ji dest çûn mehzûnî çênebe, li cem salik nî'met û bela, tengasî û firehî, şadî û şînî wekî hev be, rewşa rida ya salikî ye.<sup>374</sup> Salik tenê bi vê ridayê dikare bigihêje mizgîniya fermana Xweda. Quran wiha mizgîniyê dide:<sup>375</sup> (إِذْجِئى إِلَى رَبِّكَ رَاضِيَةً مُّرْضِيَةً) 'Qailbûyî û qailkirî li Xwedayê xwe vegere.'<sup>376</sup>

Rida, bi mehebbetek tam razîbûna li ser hemû qeza û qederên ku Xweda tîne pêş salikî.<sup>377</sup> Ev meqam yek ji meqam'ên mezin hatiye dîtin.

شكرنا كل المصائب واعف عتاً يا كريم

ما لنا غير الرضا انا اليه راجعون

Tune ji me re ji razîbûnê pê ve, em ê vegezin bal wî

<sup>371</sup> العبادى ، ص ، ٨٨.

<sup>372</sup> گوهرين ، ج. ٦، ص ، ٥٦.

<sup>373</sup> أبو القاسم عبد الكريم بن هوازن القشيري ، أربع رسائل في التصوف (بتحقيق قاسم السامرائي، دار الوراق) بيروت ، لبنان ، ٢٠٠٨، ص ، ٩٦.

<sup>374</sup> أبو إسماعيل عبد الله بن محمد بن علي الأنصاري الهروي ، منازل السائرين (شرح عبد الرزاق القاشاني) (تحقيق محسن بيدارفر) انتشارات بيدار ، قم ، ايران ، ١٣٨٥، ص ، ٣٦٢.

<sup>375</sup> Qurana Pîroz, Fecr, 28.

<sup>376</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 593.

<sup>377</sup> اسلامى ، ص ، ٦٤.

Ji her musîbetan re sipaskarin me bi bexşîne ya kerîm (x.72,b.4)

Şeyda li ser wefata murşîdê xwe ev beyt ava kiriye. Bêjeya ridayê bi wateya wê ya ferhengî bi kar aniye.

### 2.11.5 Şukur (Spasî)

Şukur, spasî ye. Spasiya her kesekî li gorî rewşa wî veguhertî ye. Şukrê ‘aliman bi dev e, belavkirina ‘ilmê ye, şukrê ‘abidan bi f’îl û kirinê wan e û şukrê ‘arifan jî di hemû rewşan de mayina li ser îstiqametê ye.<sup>378</sup>

با شد جناب حقراکان سر فراز آید

حمد و ثنا عیبی حد شکرو سپاس سرمد

Pesn û medhê bêdawî şukr û spasê herheyî

Ji Cenabê heq re be ku serfirazê me hat (x.40,b.2)

Şeyda di vê beytê de û di beyta ‘ji bo ridayê hat mînak dayîn de’ bêjeya şukrê bi kar aniye. Lê ev bikaranîn, bikaranînek ferhengî ye, ne tesewîfî ye.

### 2.11.6 Îhsan (Qencî)

Bi wateya tesewîfî îhsan ew e ku salik herdem Xweda li ber çavê xwe bizanibe û bizanibe ku Xweda herdem agahdarê wî ye.<sup>379</sup> Şeyda di dîwanê de bêjeya îhsanê bi kar aniye. Û ev bikaranîn meqamê tesewîfê nîşan dide.

تا که یا بیم لذت احسان و اکرام ترا

چون بلا گفتیم گشتیم مبتلای درد هجر

Ji dema min got erê, ez bûm mibtelayê derdê dûrketinê

Heta ku ez bidestxim lezzeta îhsan û îkramê te (x.1,b.6)

Xuyaye ku Şeyda di vê beytê de bêjeya îhsanê bi wateya wê ya tesewîfî bi kar aniye. Ji dema ‘qal û bela’yê de bi sedema ku gotiye erê girîftarê ‘îşq’e bûye. Bi sedema ku ne ghiştiye me’şûqa xwe derdê dûrketina me’şûqê dikişîne. Heta ku negihije meqamê îhsanê û lezzeta xweşî û qenciya wî meqamî bi dest nexe ew ê her derdê dûrketina me’şûqa xwe bikişîne.

### 2.11.7 Fena (Qediyayî)

Meqamê fena, ew meqam e ku salik ji hemû xisletên xwe yên nebaş pak dibe.<sup>380</sup> Di vî meqamî de xisletên neqenc tê veguhestin bi xisletên pak.

شاهدی دیدم چو پری ازبشر

سوی بیابان فنا برد ما

Me ji rexê çola fenayê dûr kir

<sup>380</sup> Eraydın, hb. r. 196.

<sup>378</sup> قشیری، ص، ۱۱۵.

<sup>379</sup> شوان، ص، ۳۵۲.

Min xweşikêk dît ji însanan lê wek periyên bû (x.44,b.4)

Bi destê Şeyda girtine û ew ji rexê çola meqamê fenayê bi dûr xistine. Ew xisletên wî yên nebaş hemû veguhestine bi xisletên qenc. Ji bo vê yekê jî mînakêk nîşanî Şeyda dane ku beşer e lê ji periyên jî xweşîktir e. Ev mînak Resûlê Xweda (s.x.l.) ye. Ji bo exlaq û xisletên herî qenc mînaka herî xweşik Resûlê Xweda (s.x.l.) ye. Di vê beytê de eşkere ye ku Şeyda bêjeya fenayê bi wateya tesewifî bi kar aniye.

### 2.11.8 Beqa (Sermedî)

Di wateya fenayê de me got fena, pakbûna ji xisletên neqenc e. Fena jî piştî pakkirina xisletên neqenc bidestxistina xislet û exlaqên qenc e.<sup>381</sup> Ji xwe dema xisletên nebaş ji mirov hat avêtin li dewsa wan xisletên qenc ew ê bê danîn. Şeyda di beyta jêr de her du meqaman tîne ziman. Têkiliya navbera her du meqaman de jî dide fam kirin.

صوفى به بيابان فنا تا كه نرفت      از باغ بقا هيچ نصيبش ثمرى نيست

Sofi heta ku neçe çola fenayê

Ji bexê beqa tu fêkî nabe qismetê wî (x.25,b.5)

Sofi heta ku xisletên neqenc ji xwe dûr neke xisletên pak nabin qismetê wî. Divê pêşî sofî xwe ji exlaqên pîs xilas bike ku bikaribe xisletên baş bi dest bixe. Şayanê gotinê ye Şeyda ji bo xisletên nepak di her du beytan de jî bêjeya ‘yaban’ ê ango çolê bi kar aniye. Wek ku dîyar e li çolê tiştêk hişîn nayê, jiyan lê tune ye. Şeyda exlaqên pîs şibandiye çolê ku ji salikî re di van exlaqan de di rêya seyr û sulûkê de tu jiyan jê re tune ye. Ne dikare tiştêkî biçîne û fêkî jê bixwe. Çola hişk û rût e. Dîsa şayanê bîranînê ye beqa jî wek bax şibandiye ku bax cih û wargeha fêkî û heşinayî û jiyanê ye. Di meqamê beqayê de ji sofî re ew ê jiyan hebe lê divê pêşî ji çola fenayê xilas bibe. Dîsa pêwîst e em bibêjin Şeyda meqamê fenayê xistiye pêşiya meqamê beqayê. Ango pêşî meqamê fena tê û paşê meqamê beqayê tê.

Weke ku ji beytên Şeyda û ji pênasan diyar bû, Şeyda, her du bêje jî bi wateya wan a tesewifî bi kar aniye.

### 2.11.9 Îxlas (Dilsozî)

Di tesewifê de îxlas perestina Xweda bi dilsozî ye û dûrbûniya ji riyayê ye.<sup>382</sup> Di tesewifê de û her wiha di pêkanîna pêdiviyên dîne Îslamê de xisletekî sereke ye. Nemaze di tesewifê de ku îxlas nebe salik tu mifayê nabîne.

فطوبى للذى يلقيه بالاخلاص فى يوم      رهد ازمحنت دوزخ كسى همراه فتح الله

<sup>381</sup> Eraydın, hb. r. 196.

<sup>382</sup> شوان، ص ٣٥٦.

Dara tûba ji wî kesî re be ku rojekê bi îxlas bigihêje

Xilas dibe ji tengasiya dogehê kesê bi Fethullah re be (x.84, b.7)

Em dibînin Şeyda di beyta xwe de bêjeya îxlasê bi kar aniye. Wateya beyta Şeyda ev e. Çi bextewar e (tûba darek ji darên bihiştê ye. Ew kesên ku diherin bihiştê fêkiyên wê darê dixwin. Lewma ji bo çûna bihiştê û ji bo bextewariya wan bêjeya tûba yê tê bikar anîn.) ew kesê ku rojekê bi îxlas rastî Fethullah ( yanî, Şêx Fethullahê Werqanisî q.s) were û bibe sofiyê wî, ew ê ji tengasiya dogehê xilas bibe.

Şeyda di vê beytê de ji bo salikî di rêya seyr û sulûkê de îxlasê rêyek xelasiyê dibîne. Xuyaye Şeyda bêjeya îxlasê bi wateya tesewifî bi kar aniye. Salik dema ji xwe re murşidek hilbijart divê li hemberî murşidê xwe jî bi îxlas be. Şeyda vê yekê jî di beytê de tîne ziman.

### 2.11.10 Sidq (Bawerî)

Sidq, yanî rastî û durustî. Ne tenê pêdiviya salikan û sofiyan, ne tenê pêdiviya mislimanan belkî û heta ji bo jiyaneke bi rûmet, ji bo civakeke bi xweşî û aramî pêdiviya her kesekî pê heye. Dîne Îslamê gelek girîngî daye ev têgeha sidqê. Lewma sidq bûye meqamekî tesewifê. Di tesewifê de pêşengê vî meqamî jî Hezretî Ebî Bekris'siddîq (r.x.l.)e.

گفتمش ترسم هلاکم میکند چون قوم عاد      گفتا ار صادق شوی در آرزویت لاتغور  
Minêje re got, ez ditirsim wek gelê 'ad hilak bibim

Got: eger tu di xwestekên xwe de sadiq bî naxewirî (x.45,b.2)

Xuya dike ku Şeyda bêjeya sidqê weke meqamekî tesewifê bi kar aniye. Di guftûgoya bi mehbûba xwe re dike mehbûba wî jê re dibêje eger tu di daxwazên xwe de, ev daxwaz gihiştina mehbûbê ye, û mehbûba heqîqî jî her Xweda ye, rastgo bî û bi rastî û durustî di vê rêyê de bimeşî tu naxewirî. Mehbûba wî ji bo gihiştina xwestekên wî sadiqbûnê şert dibîne. Di vê beytê de Şeyda bi dîzî gefekê jî derdixe holê. Ew kesên ku di rêya me'sûqa xwe de ne sadiq be; ew ê wekî gelê 'ad here hilakê, ew ê bixewire. Bûyera gelê 'ad di Qurana pîroz de derbas dibe.

### 2.11.11 Xewf (Tirs)

Tirs gelek girîng e, hem ji bo muminan û hem di tesewufê de ji bo salikan di hemû rewş û axaftinên wan de. Gelek girîng e lewra yek ji mercê îmanê hatiye jimartin. Xweda wiha ferman kiriye: <sup>383</sup> (وَحَافُونَ إِنْ كُنْتُمْ مُؤْمِنِينَ) 'Her ji Min bitirsin eger hûn bi rastî

<sup>383</sup> Qurana Pîroz, Alî 'Îmran, 175.

*bawermendin*.<sup>384</sup> Her kesê ku di dilê wî de tirs zêde hebe di dilê wî de zacirek<sup>385</sup> peyda dibe. Ev zacir dibe mani' ji salikîre ku gunehan bike, destê xwe bavêje heraman û xeteyan bike. Berê salik dide ta'et û 'ibadetên Xwedê.<sup>386</sup> Salik divê di tu demê de ji qehra Xwedê ne emîn be. Her tim bi tirs be. Emînûbûna ji qehra Xwedê xeflet û xurûr e. Xweda bendeyên xwe wiha tehdît dike:<sup>387</sup> (أَفَامِنُوا مَكْرَ اللَّهِ فَلَا يَأْمَنُ مَكْرَ اللَّهِ إِلَّا الْقَوْمُ الْخَاسِرُونَ) 'Ma ew ji dehfiika Xwedê piştrast bûne? Vêca ji civata yên xesirî pê ve, ji dehfiika Xwedê tu kes xwe piştrast (ewle) nebîne.'<sup>388</sup> Tu kes ji encama xwe ne emîn e. Hemû rewş di bin perdeya qedayê de veşartî ye. Hemû rewş bi mora qehr û qederê hatiye morkirin.<sup>389</sup> Roja qiyametê rewşa her kesekî ew ê aşkere bibe. Ji ber hindî divê kesek ji 'aqîbeta xwe ne bi bawer be û ji encama xwe bitirse. Salik jî divê ji wî hal û meqamên ku Xweda jê re bexşandiye ji dest berdana wan bitirse. Bitirse ku her dem dibe ku hal û meqamên xwe winda bike.

Sê astên tirsê hene. Xewf, xeşyet û heybet.<sup>390</sup> Xewf şertê îmanê ye. Delîla wê ayeta (وَخَافُونَ إِنْ كُنْتُمْ مُؤْمِنِينَ) e ye. Xeşyet bi rêya 'ilm û zanebûnê tê bidestxistin. Delîla wê ev ayet e:<sup>391</sup> (إِنَّمَا يَخْشَى اللَّهَ مِنْ عِبَادِهِ الْعُلَمَاءُ) 'Ji bendeyên Xwedê bes yên alim ji Xwedê bi heqî ditirsin.'<sup>392</sup> Heybet jî şert û mercê me'rîfetê ye. Di derbarê wê de Xweda wiha ferman kiriye:<sup>393</sup> (وَيُحَذِّرُكُمُ اللَّهُ نَفْسَهُ) 'Xwedê we ji xwe dide tirsandin.'<sup>394</sup> Salikê destpêka tesewufê û kesên mumin tirsana wan ji encama wan e û ji wendakirina xêrên wan e. Tirsana xas a ji 'itab û dûrketina Xweda ye. Tirsana xasê xasa izdiraba qelbê wan e li hemberî perdebûna me'rîfeta Xwedê.<sup>395</sup> Pêwîst e di kirin/ef'alên sofî de tirs hebe, di rewşa wî de xeşyet hebe û dilê wî biqilqile ji ber tiştên berê kirine. Ji hemû salikan re divê, bi keştiya tirsê di ev behra gelekî bi xeter de xwe bigihîne sahîla selametê û bi bayê nesîmê hogirtiya Xweda bêhn bike.<sup>396</sup> Tirs hem ji bo muminan û hem ji bo kesên ku di tesewufê de seyr û sulûkê dikin mercekî gelek girîng e.

<sup>384</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 72.

<sup>385</sup> Zacir; va'iz ê Xwedayê Te'ala ku salik de'wet dike bi bal Xweda ve. ([www.vajehyab.com](http://www.vajehyab.com) di bin xala (زاجر) <sup>386</sup> العبادى ، ص ، ٦٣.

<sup>387</sup> Qurana Pîroz, 'E'raf, 99.

<sup>388</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 162.

<sup>389</sup> العبادى ، ص ، ٦٤.

<sup>390</sup> قشیری ، ص ، ٨٤؛ الطوسی ، ص ، ٦٠.

<sup>391</sup> Qurana Pîroz, Fatir, 28.

<sup>392</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 436.

<sup>393</sup> Qurana Pîroz, Alî 'Imran, 28.

<sup>394</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 52.

<sup>395</sup> بن عجيبة ، ص ، ٢٨.

<sup>396</sup> العبادى ، ص ، ٦٧.

Baskekî salik tirs e û baskê din hêvî ye. Salik herdem bitirs e ku li hemberî Xweda tişteki bike bi wê sedemê Xweda qehra Xwe lê bike. Salik dîsa bitirs e ku ew qenciye ku bi dest xistine ji destê xwe berde<sup>397</sup>.

ورنه کس از خوف اجالت نمی یابد خلاص      همچنان در عارض و خالت نمی گوید درود

Yan na kes ji tirs meznantiya te xilas nabe

Û herwiha kes pesnê rûyê te û deqên te nake (x.34,b.6)

Di beytên pêşî de ji nezera Xweda ya bi heybet hatiye bas kirin. Şeyda dibêje ger Xweda bi nezerek rehmê li me nenihêre tu kesek ji tirs meznantiya Wî xelas nabe. Di beytê de bêjeya ‘îclal’ ji bêjeya ‘celal’ê hatiye ku Celal yek ji navê Xweda ye û tecelliyatên ji navê Celal tîn bi xezeb û qehr û tolhildanin.<sup>398</sup> Şeyda vê yekê rave dike. Pêwîst e ku salik bitirs be li hemberî xezeb û qehra Xweda. Di vê beyte de bêjeya xewfê wek têgehekî tesewifî nehatiye bikaranîn.

### 2.11.12 Reca (hêvî)

Reca/hêvî, dil bixwaze di dema pêş de tişteki bidest bixe hêvî ye. Hêvî dijwariya agirê tirsê kêr dibe û dibe sedema husnûzennê.<sup>399</sup> Di tesewufê de hêvî rehmata Xweda ye. Wek ku Qurana pîroz kerem dike; <sup>400</sup> ( وَيَرْجُونَ رَحْمَتَهُ وَيَخَافُونَ عَذَابَهُ ) ‘*Rehma Wî hêvî dikin û ji ezabê Wî ditirsin.*’<sup>401</sup> Di ayeteke din de hêvî, ji bo ghiştina ba Xweda hatiye bikaranîn.<sup>402</sup> ( فَمَنْ كَانَ يَرْجُوا )<sup>403</sup> ‘*Êdî kesê ku xelata Xwedayê xwe hêvî bike û ji ezabê Wî bitirse, bila karekî qenc bike û di îbadetê xwe de qet tişteki ji Xwedayê xwe re neke heval û hevpişk.*’<sup>404</sup> Tirs û hêvî du baskên ta’et û ‘îbadetê ne ji bo salik. Salik, bê wan nikare di seyr û sulûkê de pêş bikeve.<sup>404</sup> Divê salik dilê xwe bike terazî û tirs û hêvîyê bixe tasikên teraziyê û wan wekahev bike.

Sê cureyên hêvîyê hene: Yek, hêviya ew kesê ku qencî û başiyê dike û li bendê ye ku tiştên kiriye bîn qebûl kirin. Dudu, hêviya ew kesên ku nebaşî û guneh kirine, paşê vegeriyaşe poşman bûye û tobe kiriye û li bendê ye ku bê bexşandin. Sisê, hêviya ew kesê ku li ser xeta û gunehên xwe israr dike û tevî vê israrê hêviya bexşandina xwe dike. Ev hêviya derewkeran

<sup>398</sup> Uludağ, hb. r. 85.

<sup>397</sup> اسلامی، ص ۶۴.

<sup>400</sup> Qurana Pîroz, Îsra. 57.

<sup>401</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 286.

<sup>402</sup> Qurana Pîroz, Meryem. 110.

<sup>403</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 303.

<sup>399</sup> اسلامی، ص ۶۵.

<sup>404</sup> الطوسی، ص ۶۳.

e.<sup>405</sup> Ji van pênaseyan tê famkirin ku salik ji bo tiştê ku hêvî dike divê bikoşe, keslantiyê neke. Ji aliyên din pêwîst e ku herdem tirs jî di dilê wî de hebe.

Hêvî, peydabûna ew umîda di qelb de derdikeve holê ku bi pêkanîna emrê Aferîdê kaînâtê di pêş de bidestxistina hin qenciyan hatiye nîşandan<sup>406</sup>.

هر رجاكارم بچشم لطف ما را بنگری  
تا باحیان سماحت لحظکی بیمه خیال

Ez her ji te hêvî dikim bi çavê delalî li me binêrî

Heta ku di demen camêrtiyê de me bîne bîra xwe (x.64,b.17)

Xuyaye Şeyda di beyta xwe de bêjeya ricayê bi wateya tesewifî bi kar aniye. Hêvî dike ku murşîdê wî bi çavên delalî lê mêze bike û di demên camêrtiya xwe de hema lehzeyek jî be Şeyda bîne bîra xwe, ku Şeyda ji camêrtiya wî sûd wergire. Şeyda li hêviya camêrtiya murşîdê xwe ye. Camêrtiya murşîdan belavkirina feyd û himmetê ye.

### 2.11.13 Qurb (Nêzîkayî)

Nêzîkbûniya salik bi bal Xweda ve tîne ziman. Ev nêzîkbûnî nêzîkbûniyeke qelbî ye. Bêjeya qurbê di Qurana pîroz de derbas dibe.<sup>407</sup> ( وَنَحْنُ أَقْرَبُ إِلَيْهِ مِنْ حَبْلِ الْوَرِيدِ ) ‘Em dizanin û em ji rahjiyana (şahdamara) wî jî bêhtir nêzîkî wî ne.’<sup>408409</sup> ( وَنَحْنُ أَقْرَبُ إِلَيْهِ مِنْكُمْ ) ‘Em (bi ilm û agahiyên xwe) ji we bêhtir nêzîkî wî ne.’<sup>410</sup> Salik vê nêzîkbûniyê bi ta’et û xebata xwe ya seyr û sulûkê bi dest dixê.<sup>411</sup> Sê cureyên qurbê hene. Yek, qurba bi ta’etê û xweparastina ji bê emriyâ Xweda û Resûlê Xweda.<sup>412</sup> Di derbarê vê qurbê de hedîs wiha dibêje: ( وَمَا يَزَالُ عَبْدِي ) ‘Ebdê min bi ‘ibadetên nafiye (sunneta) wisa nêzîkî min dibe, li ser vê ez jê hez dikim.’<sup>413</sup> Salik di destpêkê de bi ta’et û bi taybetî jî bi pêkanîna sunneta Resûlê Xweda digihêje astekê ku Xweda jê hez dike. Ev asta yekem a qurbê ye. Duwem, qurba bi riyazetê û mûcahedeyê ye.<sup>414</sup> Piştî ku salik bi peyrevtiya sunnetê gihaşt asta yekem, bi pêkanîna rê û rêbazên tesewufê wek riyazet, sebat û xîreta ser adabên tesewufê hîn nêzîktirî Xweda dibe. Hindî perde ji ber çavê dilê salik radibe û Xweda ji her tiştî nêzîktir dibîne. Ev

<sup>405</sup> قشیری ، ص ۸۸.

<sup>406</sup> اسلامی ، ص ۶۴.

<sup>407</sup> Qurana Pîroz, Qaf, 16.

<sup>408</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 5 18.

<sup>409</sup> Qurana Pîroz, Waqî’e, 85.

<sup>410</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 536.

<sup>411</sup> الطوسی ، ص ۵۶-۵۷.

<sup>412</sup> بن عجبیة ، ص ۷۱-۷۲.

<sup>413</sup> Konevi, hb. r. 125.

<sup>414</sup> بن عجبیة ، ص ۷۱-۷۲.



asta duwem e. Sêyem, qurba bi wusûl û muşahedeyê ye.<sup>415</sup> Asta fenabûna salikî ye di hişmendiya her tiştî de. Hetta di nefsa xwe de jî. Di vê astê de li ber çavê salikî ji hebûna Xwedê pê ve tiştekan namîne.

Qurb, di tesewifê de bi nêzikahiya Xweda hatiye ravekirin. Li hemberî qurbê 'bu'd' heye ku ew jî bi wateya dûrbûniyê ye<sup>416</sup>.

که نام نامور شد عبد الرحمن

مقرب شد بسوی رب منان

Nêzikê rexê Xwedayê Mennan bû

Ku navê wî ê bi nûr 'Ebdurrehman bû (mes.3,b.3)

Şeyda di vê beytê de di pesindana Şêx 'Ebdurrahmanê Taxî (q.s.)<sup>417</sup> de bêjeya muqerrebê bi kar tinê ku ev bêje ji qurbê pêk hatiye. Xuyaye ku Şeyda ev bêjeya muqerrebê bi wateya meqamê qurbê aniye ziman. Lewra qurb, wek îta'etê hatiye ravekirin.<sup>418</sup> Dema îta'et çêbû nêzikahî jî çêdibe. Şeyda dibêje Şêx 'Ebdurrahmanê Taxî (q.s.) gelekî nêzikî Xweda bûye. Lewma gelekî îta'eta Xweda kiriye û ev yek ji navê wî yê 'Ebdurrehman 'bendeyê Xwedayê Rehman' xuya dibe.

Şeyda di helbestên xwe de gelek bêjeyên hal û meqamên tesewifê bi kar aniye. Ji van bêjeyan hinek bi wateya ferhengî hatibin bikaranîn jî, bêjeyên bi wateya tesewifî hatine bikaranîn jî tîn dîtin. Hejmara bêjeyên bi wateya tesewifî hatine bikaranîn ji bêjeyên bi wateya ferhengî hatine bikaranîn zêdetirin.

## 2.12 Rêberên Terîqetan Di Helbestên Şeyda De

Salik di bin nêrîn û çavdêriya murşidê kamil de di rêya seyr û sulûkê de dimeşe. Ev yek ji salikî re pêdivî ye. Divê rêberê salikî hebe ku rênûmayiyê jê re bike û astengên ser rêya wî rake. Lewra şêx an murşidê kamil ji bo murîdê xwe emînê îlhamê ye. Wek ku Cebrail (s.l.) emînê wehyê bû û xayîntî bi emanetê xwe re nekir, şêx jî xîyanetê bi murîd û salikê xwe re nake.<sup>419</sup> Li ser ev pêbawerbûna murşid divê salik li hemberî murşidê xwe bi mehebbet û sdaqet be. Li ser vê mehebbetê helbestvanan di helbestên xwe de an eşkere navê wan anîne ziman an jî wan wek yar, dost, me'şûq, mehbûb wesifandine û bi vî rengî bi bîr anîne.

Di helbestên Şeyda de navên gelek rêberên terîqetan derbas dibin. Ev rêberên terîqeta ji xeynê Şêx 'Ebdulqadirê Geylanî bi tevahî sadatên terîqeta neqşebendî ne. Her çend ji wan

<sup>415</sup> بن عجيبة ، ص ، ٧١-٧٢.

<sup>416</sup> كريم آباد ، ص ، ٩٠.

<sup>417</sup> Derbarê jiyana Şêx 'Ebdurrahmanê Taxî (q.s.) di bin sernavê 'Rêberên Terîqetan li Cem Şeyda' agahî ewê bête dayîn.

<sup>418</sup> سجادی ، ص ، ٦٣٧.

<sup>419</sup> شوان ، ص ، ٣٥٦.

hin hem sadatê terîqeta qadirî bin jî, di heman demê de sadatên terîqeta neqşibendîne jî. Wek Şêx Şemsuddîn Hebîbullah Canê Canan Mezher (q.s.), Mewlana Şah ‘Ebdullah Dehlewî (q.s) û Mewlana Xalid (q.s.).

Navên rêberê terîqetê li gorî bi cih bûna di helbestan de wek çar beşan em dikarin dabeş bikin.

Di beşa yekem de, Şeyda, ji bo Xwedayê Te’ala wî biparêze ji dek û dolab û xapandinên nefis û şeytan, bi hurmeta van rêber û sadatên terîqetê ji Xweda alîkarî xwestiye.

نگه دار از همه مکر رقیبان

خودایا این گدائی لا ییالی

Xwedaya! Ev gedayê tiştê di dil de tune

Biparêze ji hemû xapandinên reqîban

Ey Xwedayê min! Ev gedayê ku tiştê di qelb û dilê wî de tune ye, tu wî biparêze ji hemû dek û xapandinên nefis û şeytan.

حبیب و سرور جمله حبیبان

بجاه سید اولاد آدم

Bi qedr û şerefa Seyyidê ewladê Adem

Hebîb û serwerê hemû hebîban

Şeyda piştî ku merema xwe anî ziman di serî de ji bo bidestxistina vê alîkariyê qedr û hurmeta Resûlê Xweda (s.x.l.) ji xwere dike mehder. Paşê her çar xelîfeyên Îslamê û li dû wan, rêberê terîqeta Neqşebendî li gorî zincîra silsileya terîqetê navê wan rêz dike.

Beytên Şeyda wiha ne:

بکرار و بزوجه اش نسیبان

بصدیق و بفاروق و بعثمان

Bi Siddîq<sup>420</sup> û bi Farûq û bi ‘Usman

Bi Kerrar û bi zewce eş nesîban (x.76,b.6)

ببسطامی و با جمله ادیبان

بسلمان وبقاسم هم بجعفر

Bi Selman û bi Qasim hem bi Ce’fer

Bi Bistamî û bi hemû edîban (x.76,b.7)

بطه صبغت الله کتیبان

برایانی بوئقی ذوالجناحین

Bi Rebbanî bi Wusqa Zulcenaheyn

Bi Taha Sibxetullahê kuldaran (x.76,b.8)

<sup>420</sup> Di van beytan de "bi" di wateya "bi cahê" de ye ku tê wateya " bi qedr û şerf û hürmet"ê.

Di beşa duwem de, di pesindana murşidên xwe de Şeyda ji rêberên terîqetê sûd wergirtiye. Murşidên xwe bi wesf û taybetiyên sadatên terîqetê pesinandiye û ew derxistiye asta wan.

Di beşa sêyem de, Şeyda li ser her sê murşidên xwe ku me li jor destnîşankir hem medhiye û hem mersiye nivîsandine.

Di beşa çaran de em ê ji beytên ku Şeyda li ser murşidên xwe nûsîne û navên wan eşkere negotine mînakên bînin.

Em ê navên van rêberên terîqetê li gorî zincîra silsileyê terîqeta Neqşebendî tev mînakên wan binûsin. Resûlê Xweda (s.x.l.) ji ber ku serok û rêberê hemî terîqetan e û li jor beyta derheqê wî de jî hat ravekirin, me nexist nav hejmarê.

### **2.12.1 Hezretî Ebî Bekris'siddîq (r.x.l.)<sup>421</sup>**

Di zincîra silsileyê terîqa Neqşebendî de piştî Resûlê Xweda (s.x.l.) cih digre. Şeyda, di helbesta xwe de piştî cenabê Resûlê Xweda (s.x.l.) Hezretî Ebûbekir (r.x.l.) bi bîr aniye. Di heman beytê de tê dîtin ku Şeyda, ji silsileyê tesewifê bêtir rêza her çar xelîfeyên Îslamê şopandiye. Navê her çar xelîfeyên Îslamê li gorî rêza xelîfetiya wan bi kar aniye. Ev yek girtina giramiya xelîfeyên Îslamê ne.<sup>422</sup>

### **2.12.2 Hezretî 'Elî Bin Ebî Talib (r.x.l.)<sup>423</sup>**

Hezretî 'Elî (r.x.l.) di tesewifê de pêşwayê gelek terîqetan e. Terîqeta Mewlewî, Qadirî û Celwetiye<sup>424</sup> bi Hezretî 'Elî (r.x.l.) xwe dighînin Resûlê Xweda (s.x.l.)

Şeyda di beyta xwe<sup>425</sup> de ji bedêla navê Hezretî 'Elî (r.x.l.) bernavkê wî yê herî bi nav û deng 'Kerrar' bi kar aniye. Bi sedema mîrxasbûna Hezretî 'Elî (r.x.l.) di cengan de ku bi hêzek bilind êriş dibir ser dijminan ev bernavk lê bûye.

<sup>421</sup> Navê Wî, Ebû Bekir *'Ebdullah b. Ebî Kuhafe Osman b. 'Emr El Qureyşî Et-Teymî* ye. Piştî bûyera Filê bi sê salan li Mekkeyê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Ebû Kuhafe û navê dayika wî Ummu'l Xeyr Selma Bintî Sehr e. Bi bernavka xwe ya *'Siddîq'* (pîr rastgo) meşhûr bûye. Xelîfeyê Îslamê yê yekem e. Di sala 634ê zayînê de li Medîneyê wefat kiriye û li rex Resûlê Xweda (s.x.l.) hatiye veşartin. (Mustefa Fayda, DÎA, *Ebû Bekir*, c.10, r. 101-106.)

<sup>422</sup> Ji bo beyta mînak bnr; sehîfe 85, (x.76,b.6)

<sup>423</sup> Hezretî 'Elî (r.x.l.) yanî, *Ebu'l Hesen 'Elî b. Ebî Talib el- Qureyşî el- Haşimî*, beriya bûyera koçê di sala 600ê zayînê de li Mekkeyê hatiye dinyayê. Navê bavê wî, Ebî Talib e, ku Ebî Talib apê Peyxemberê Xwedaye (s.x.l.). Yek ji wan kesên ku herî pêşî dîne Îslamê pejirandine Hezretî 'Elî (r.x.l.) ye. Bi keça Pêxemberê Xweda (s.x.l.) re zewiciye û bûye zavayê Resûlê Xweda (s.x.l.). Di xelîfetiya îslamê de xelîfeyê çaremîn e. Di sala 661ê zayînê de ji teref kesekî bi navê 'Ebdurrehman b. Mulcem li ser nimêja sibehê bi xencerek bi jehr tê birîndar kirin û piştê bi du rojan wefat dike. Li Kufeyê (vêga Necef e) tê veşartin. (Ethem Ruhi Fığlalı, DÎA, *Ali*, c.2, r.371-374.)

<sup>424</sup> Eraydın, hb. r. 359, 430-437.

### 2.12.3 Selmanê Farisî (r.x.l.)<sup>426</sup>

Selmanê Farisî (r.x.l.) di zincîra silsileya terîqeta Neqşebendî de piştî Hezretî Ebûbekir (r.x.l.) sadatê duwem e.

Şeyda di beytê<sup>427</sup> de wek rêza sadatê terîqa Neqşebendî, Selmanê Farisî (r.x.l.) hema piştî Hezretî Ebûbekir (r.x.l.) nivîsandiye.

### 2.12.4 Qasim Bin Mûhemmed Bin Ebî Bekris'siddîq (r.x.l.)<sup>428</sup>

Di zincîra silsila terîqeta Neqşebendî de piştî Selmanê Farisî (r.x.l.), Hezretî Qasim (r.x.l.) tê. Şeyda jî piştî Selmanê Farisî (r.x.l.) ji bo xelasiya xwe bi qedr û qîmetê Hezretî Qasim (r.x.l.) ji Xweda alîkarî xwestiye.

### 2.12.5 Ce'ferî Sadiq Bin Îmam Mûhemmed Baqir (r.x.l.)<sup>429</sup>

Şeyda di heman beytê de zincîra silsila terîqeta Neqşebendî şopandiye bi navê Ce'ferî Sadiq (r.x.l.) alîkarî ji Xweda xwestiye.

### 2.12.6 Ebî Yezîd El Bîstamî (q.s.)<sup>430</sup>

Di silsileya terîqa Neqşebendî de Ebî Yezîd El Bîstamî (q.s.) piştî Ce'ferî Sadiq (r.x.l.) tê. Şeyda, wek hurmetek dabe silsileyê piştî Ce'ferî Sadiq (r.x.l.) Ebî Yezîd El Bîstamî (q.s.) bi bîr aniye.<sup>431</sup>

---

<sup>425</sup> Ji bo beyta mînak bnr; sehîfe 85, (x.76,b.6)

<sup>426</sup> Navê wî yê rastî *Mâhbe b. Bûzehmeşan b. Mûrselan b. Yehbûzan* bû, lê piştî ku dînê Îslamê ji xwe re qebûl kir navê xwe guherand û danî *Selman İbn'ul İslam*. Nasnavê wî *Ebû 'Ebdillah Selman El Farisî* ye. Di destpêkê de atêşperest bû. Paşê dînê Mesîhî ji xwe re dipejirîne û fêrî vî dînî dibe. Keşeyê ku dînê Mesîhî fêrî wî dikir di ber mirina xwe de derheqê pêxemberê herî dawî agahiyan dide wî. Li ser van agahiyan tê Medîne û dibe misilman. Selmanê Farisî (r.x.l.), kesekî gelek zahid bûye. Zêde ji fêrbûna 'ilmê hez dikir. Zêde zêde sunneta Resûlê Xweda (s.x.l.) di jiyana xwe de pêk tanî. Ev yek di dema walitiya wî ya Medîne de jî xuya dibe. Di sala 656ê zayîne de li Medîne wefat dîke. (İbrahim Hatiboğlu, *Selmân-ı Fârisî*, DİA, c. 36, r. 441-443.)

<sup>427</sup> Ji bo beyta mînak bnr; sehîfe 85, (x.76,b.7)

<sup>428</sup> Lawê Hezretî Ebî Bekris'siddîq (r.x.l.) e. Ji tabî'înay e. Li Medîneyê hatiye dinyayê. Ji wan heft kesên ku di 'ilmê fiqhê de bi nav û deng bûn, yek ji wan e. Di zanistên Îslamî de gelekî pêşkeftî bû. Di warê teqwa û werayê de gihiştibû pêlên gelek bilind. Di sala 720ê zayîne de li devera bi navê 'Qadîd' rehmî bûye. (Altıntaş, hb. r. 137.)

<sup>429</sup> Li Medîne hatiye dinyayê. Ji teref bavên ve digihêje Hezretî 'Elî (r.x.l.) û ji teref dayikê ve digihêje Hezretî Ebûbekir (r.x.l.). Tê gotin ku kesê Îmamê 'Ezem Ebû Henîfe perwerde kiriye Ce'ferî Sadiq (r.x.l.) e. Di 'ilmê batin de bi pir pêşketibûna xwe hatiye naskirin. Di sala 148/765an li Medîneyê wefat kiriye. (Altıntaş, hb, s.137.)

<sup>430</sup> Di sala 188/804an de welidiye. Navê wî *Teyfûr Bin 'İsa El Bîstami* ye. Bi bernavê *'Eb-ul Yezîd' û 'Bayezîd'* jî tê nasîn. Li 'Bîstam'ê ku di navbera Xorasan û 'Iraqê de dimîne di sala 188/804an de welidiye û li heman deverê di sala 261/875an de çûye ber rehma Xweda. Zêde 'abid û zahid bûye. 30 salî li gor zanistên Îslamî bi nefsa xwe re têkoşîn kiriye. Kesê ku yekem car behsa 'fena'ê kiriye ew e. Bnr;

أيمن حمدى، قاموس المصطلح الصوفى، دارقبا، القاهرة، مصر، ٢٠٠٠، ص، ٩٧.

<sup>431</sup> Ji bo beyta mînak bnr; sehîfe 85, (x.76,b.7)

### 2.12.7 Şêx ‘Arif Rêwegerî (q.s.)<sup>432</sup>

توی عارف توی فانی بنسبت قطب ربّانی      تو عبدالقادری سانی رأیس جمله اقطابان

Tu wî ‘Arif tu wî Fanî bi nisbet Qutbê Rebbanî

Tu yî ‘Ebdulqadirê duwem serokê hemû qutban (x.78,b.9)

Şeyda, şêx û murşidê xwe pesinandiye bi Şêx ‘Arif Rêwegerî (q.s.). Şêx ‘Arif Rêwegerî (q.s) di nava rêberên terîqetê de çawa di astek bilind de ye, Şeyda jî murşidê xwe wek Şêx ‘Arif Rêwegerî (q.s.) di astek bilind de dibîne.

### 2.12.8 Behaeddîn Mûhemmed b. Mûhemmed El Bûxarî (Şahê Neqşebend) (q.s.)<sup>433</sup>

مجدد کر شعار دین وکی شاهی بخارائی      بلاف کر نسبتا رنگین لسر جمله عباد الله

Nûjen kir şî’arê dîn wekî Şahê Bûxarayê

Belav kir nisbeta rengîn li ser hemû bendeyên Xweda (x.82,b.5)

Şeyda, murşidê xwe dişibhîne Şahê Neqşebend (q.s). wek ku Şahê Neqşebend (q.s) terîqeta Neqşebendî bi rê ve biriye û ji nû ve geş kiriye, murşidê xwe jî bi nûjenkirina şan û nîşanên dîn, şibandiye Şahê Neqşebend (q.s).

### 2.12.9 Şêx Ehmed Farûqî Es-Serehendî, Îmamê Rebbanî (q.s.)<sup>434</sup>

Şeyda, di helbesta xwe de beyta xwe bi navê Îmamê Rebbanî (q.s) didomîne<sup>435</sup> û bi hurmeta vî rêberê gewre xwestina alikariyê dike ji Xwedayê Te’ala.

<sup>432</sup> Li nêzî Xucdewan û Buxara liRêwegerê hatiye dinyayê. Yek ji her çar xelîfeyên gewre yên Şêx Ebdulxaliqê Xucdewanî ye. Di terîqa Neqşebendî de cihekî giring girtiye. Di sala 715/1315an de rehmet kiriye. (Süleyman Uludağ, *Arif Rîvegerî*, DÎA, c. 3, r. 369.)

<sup>433</sup> Behaeddîn Mûhemmedê kurê Mûhemmedê kurê Mûhemmed, bi nav û dengê *Neqşebend* an *Şahê Neqşebend* an *Mûhemmedê Bûxarî* an *Şahê Bûxara* meşhûr bûye, di meha Mûherremêya sala 717/1218an li gundê Qesrê Hîndewan, ku paşê navê wî gundî bûye Qesrê ‘Arifan, nêzîkî Bûxarayê hatiye dinê. Bi nesla xwe seyîd e û Huseynî ye. Navê bavê wî Mûhemmed Celaleddîn e. Bnr;

نەقشەبەندی، ص ۴۴۸.

Bavê Şahê Neqşebend, Mûhemmed Celaleddîn murîdê Baba Semmasî ye (q.s.). Şahê Neqşebend (q.s.) pêşî li cem Baba Semmasî (q.s.) dest bi perwerdehiyê dike. Baba Semmasî (q.s.) perwerdehiya Şahê Neqşebend (q.s.) sipartiye xelîfê xwe Seyyid Emîr Kulal (q.s.). Piştî wefata Baba Semmasî (q.s.) Şahê Neqşebend (q.s.) perwerdehiya xwe li cem Seyyid Emîr Kulal (q.s.) didomîne û dibe xelîfeyê wî. Şahê Neqşebend (q.s) di sala 791/1389an de li Qesra ‘Arifan nexweş dikeve û di 73 saliya xwe de diçe ber dilovaniya Xwedê. (Eraydın, hb. r. 370-372.)

<sup>434</sup> Navê wî *Ehmed*, bernavka wî *Bedruddîn*, nasnava wî *Ebu’l Berekat* e. Ji ber ku ji nesla Hezretî ‘Umer (r.x.l.) e bi *Farûqî*, bi sedema bajarê wî *Serhendî*, û bi sedema pêşvebirina terîqetê û xizmeta dînê Îslamê li Hindîstan û derdora wê kiriye bi *Muceddidê Elfê Sanî* tê nas kirin.

Di sala 971/1563an li bajarê Serehindê hatiye dinyayê. Navê bavê wî ‘Ebdulehed e. Di seretayî de li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye. Paşê li cem ‘alimên dema xwe xwendina xwe domandiye. Di terîqeta Neqşebendî de xelîfê Mewlana Şêx Mûhemmed Baqî Billah (q.s.) e. Îmamê Rebbanî (q.s.) di sala 1034ê h. çûye ber dilovaniya Xwedê. (Eraydın, hb, r. 292-294.)

<sup>435</sup> Ji bo beyta mînak bnr; sehîfe 85, (x.76,b.8)

### 2.12.10 Şêx Şemsuddîn Hebîbullah Canê Canan Mezher (q.s.)<sup>436</sup>

Di zîncîra silsileya terîqa Neqşebendî de di rêza 27an û di zîncîra silsileya terîqa Qadirî de di rêza 31ê de ye<sup>437</sup>. Di her du terîqetan de şêxê şêxê Mewlana Xalid (q.s.) e.

مجدد ذى الجناحين قدم زد قاب قوسينى ضياء دين و دارين بعد الله و مظهر شاه

Tu nûjenkerekî wek zîl Cenaheyn î, te gav avêt bal qabê qewseyn ê

Ronahiya ê dîn û herdû dinyayî be ‘Ebdullah we Mezher Şah (x.86,b.8)

Şeyda, murşidê xwe şibandiye her du şêxên bi nav û deng ku heman her du şêx di silsileya terîqa Neqşebendî de tê dîtin û di silsileyê de li pey hev dû tîn. Şeyda, bi şêx Şemsuddîn Hebîbullah Canê Canan Mezher (q.s.) sond dixwe ku murşidê wî ronahiya dîn e û ronahiya dinya û axretê ye.

### 2.12.11 Şêx ‘Ebdulqadir Geylanî (q.s.)<sup>438</sup>

Pîş û pêşûwayê terîqeta Qadirî ye. Şeyda di beytê<sup>439</sup> de murşidê xwe pesinandiye. Murşidê xwe şibandiye Şêx ‘Ebdulqadir Geylanî (q.s.) û murşidê xwe wek Şêx ‘Ebdulqadir Geylanî (q.s.) yê duwem dide nasîn. Şêx ‘Ebdulqadir Geylanî (q.s.) çawa ku bingehên rê û rêbazên terîqa Qadirî daniye, Şeyda, murşidê xwe şibandiye ev taybetiyên Şêx ‘Ebdulqadir Geylanî (q.s.).

### 2.12.12 Mewlana Şah ‘Ebdullah Dehlewî (q.s.)<sup>440</sup>

Şeyda, di xezela 86an de û di beyta 8an de<sup>441</sup> murşidê xwe bi ronahiya her du dinya û dîn dipesinîne. Ji bo tekîda pesnê xwe bi serê Mewlana Şah ‘Ebdullah Dehlewî (q.s.) sond dixwe.

<sup>436</sup> Navê wî, *Şemsuddîn Hebîbullah Mîrza Mezher Canê Canan b. Mîrza can b. Ebdissubhan Dihlewî* ye. Di sala 1699an de dema ku mala wan koç dikir li navçeya Qalabax hatiye dinyayê. Li cem gelek ‘alim û zanayan ‘ilmê zahirî xwendiyê. Bi mensûbiyeta terîqeta Çeştî, Suhrewerdî, Qadirî û Neqşebendî her çar terîqet di xwe de civandiye. Di sala 1781ê zayîne de li dergahê xwe ji teref sê kesên bi çek tê birîndar kirin. Piştî vê êrîşê bi sê rojan diçe ber dilovaniya Xwedê. (Hamit Algar, *Mazhar Cân-ı Cânân*, DÎA, c. 28, r. 195-196.)

<sup>437</sup> القره داغى، (قسم العربى)، ص، ۹۳-۹۷.

<sup>438</sup> Navê bavê wî Ebû ‘Ebdullah, navê dayika wî Fatîma ye. Nasnava wî *Ebû Mûhemmed*, bernavkên wî, *Muhyeddîn, Baz’ul Eşheb, Xews’us-Seqeleyn, Bazê Geylanî* ye. Neseba wî digihêje Hezretî ‘Elî (r.x.1.). Di sala 470/1077an de li herêma Gîlan-Geylan li gundê Nîfê hatiye dinyayê. Bnr;

القره داغى، (قسم العربى)، ص، ۹۳-۹۷.

Di teqwa û werayê de gelekî pêşketiye. Di ‘ilmê zahirî û batîne de gelek mahir bûye. Şêxê wî Eb’ul Xeyr Mûhammed b. Muslim Ed-Debbas e. Pîş û pêşûwayê terîqeta Qadirî ye. Di sala 561/1166an de li Bexdayê wefat dîke û li heman derê tê veşartin. (Altıntaş, hb, r. 146-147.)

<sup>439</sup> Ji bo beyta mînak bnr; rûpel 88.

<sup>440</sup> Mewlana Şah ‘Ebdullah Dehlewî, li Beytale ya eyaleta Pencapê hatiye dinyayê. Ji nesla Hezretî ‘Elî ye. Girseyekî ‘aliman e. Der barê ‘ilmê tefsîr, tesewîf, fiqh û hedîsê de gelek berhem anîye holê. Xelîfetiya terîqeta Neqşebendî û Qadirî wergirtibû. Di her du terîqetan de şêxê Mewlana Xalid (q.s.) e. Di sala 1240/1824an de li Dehla girêdayî bi Pencapê rehmet kiriye. (Altıntaş, hb, r. 151.)

<sup>441</sup> Ji bo beyta mînak bnr; rûpel 88.

### 2.12.13 Mawlana Xalid Zulcenaheyn En'neqşebendî Eş'şehrezorî (q.s.)<sup>442</sup>

Şeyda, hem di xezela 76a di beyta 8an de û di xezela 86a û dîsa di beyta 8an<sup>443</sup> de, ango di du helbestan de bi bernavkê '*Zulcenaheyn*' Mawlana Xalid (q.s) bi bîr aniye. Zulcenaheyn, tê wateya '*xwediyê du baskan*' ku, baskek terîqeta Neqşebendî ye û baskê din jî terîqeta Qadirî ye. Di beyta yekem de, Şeyda daxwaza alikariyê ji Xweda dike bi hurmeta Mawlana Xalid (q.s). Di beyta duwem de, murşidê xwe dişibîne Mawlana Xalid (q.s). Mawlana Xalid (q.s) di terîqeta Neqşebendî de sadat û rêberekî gelek mezin e. Ji ber vê mezinbûna Mawlana Xalid (q.s) Şeyda navî bi du cureyan bi bîr aniye.

### 2.12.14 Seyyîd Taha Nehrî (q.s.)<sup>444</sup>

Şeyda, di heman helbestê<sup>445</sup> de û di heman beytê de wek rêza silsileyê, piştî Mawlana Xalid (q.s.) Seyyîd Taha (q.s.) tîne bîra xwe.

### 2.12.15 Seyyîd Sibxetullahê Erwasî (q.s.)<sup>446</sup>

Şeyda her daxwaza alikariyê ji Xweda bi hurmeta sadatan dike. Di beyta xwe de piştî Seyyid Tahayê Nehrî (q.s.) bi qedr û qîmeta xelîfeyê wî Seyyid Sibxetullah Erwasî (q.s.)<sup>447</sup> alikariyê dixwaze.

<sup>442</sup> Dîyaeddîn Ebu'l Beha Mawlana Xalid Zulcenaheyn En'neqşebendî El Bexdadî Eş'şehrezorî (q.s.) di sala 1193yê koçî de li navçeya Qeredax ku nêzî bajarê Silêmaniyê ye hatiye dinyayê. Navê bavê wî Mawlana Ehmed Huseynî ye, navê dayika wî Fatime ye. Nesla wî digihêje Hezretî 'Usman (r.x.l.).

Destpêka xwendina wî li cem bavê wî ye. Paşê li gelek deveran û li rex gelek 'alimên gewre xwendina xwe domandiye. Di 'ilmên Îslamî de gelek pêş dikeve û dest bi dersdayînê dike. Di sala 1224ê koçî de diçe dergahê Şah 'Ebdullahê Dehlewî (q.s). Piştî wergirtina xelîfetiye vedigere welatê xwe û dest bi îrşadê dike. Di sala 1242an li Şamê diçe ber dilovaniya Xwedê. (القره داغی، (قست فارسی)، ص، ۵۳-۷۲.)

<sup>443</sup> Ji bo beyta mînak bnr; rûpel 85, (x.76,b.8) û rûpel 89, (x.86,b.8)

<sup>444</sup> Derbarê dîroka ji dayikbûna wî de tu agahî tunene. Li gundê Xumaro hatiye dinyayê. Zaroktiya xwe li gundê Nehriyê ya girêdayî navçeya Şemzînana Colemêrgê derbas kiriye. Li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye. Paşê li gelek devera xwendina xwe domandiye.

Apê wî Seyyid 'Ebdullah (q.s.) ew biriye rex Mawlana Xalid (q.s.). Li dergahê Mawlana Xalid (q.s.) hem perwerdehiya 'ilmî û hem perwerdehiya tesewifê dibîne û xelîfetiya terîqetê ji Mawlana Xalid (q.s.) werdigre. Di sala 1853ê zayînê diçe ber dilovaniya Xwedê û nêzî tirba apê xwe Seyyid 'Ebdullah (q.s.) li gundê Nehriyê tê veşartin. (Abdulcebbar Kavak, *Hakkâri'den Yükselen İlim ve Tasavvuf Güneşi, Seyyid Taha-i Nehri, Hayatı, Tasavvufî Yönü ve Tesirleri*. Daka, Van 2016, r. 27-49.)

<sup>445</sup> Ji bo beyta mînak bnr; rûpel 85, (x.76,b.8)

<sup>446</sup> Li gundê Arwas, girêdayî Miks a bajarê Wanê hatiye dinyayê. Derbarê dîroka welidandina wî de agahiyên qethî tunene. Bi nav û nîşananên '*Xewsul E'zem*', '*Xewsê Hîzanê*', '*Xews*', '*Seyda*' hatiye naskirin. Piştî wergirtina xelîfetiya terîqetê, murşidê wî Seyyid Taha Nehrî (q.s.) ji bo îrşadê wî dişîne Xeyda. Xeyda gundê navçeya Hîzan a Bedlîsê ye. Seyyid Sibxetullah Erwasî (q.s.) di sala 1870ê zayînê de li gundê Xeyda wefat dike û li heman gundî tê veşartin. (Ali Tenik, *Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*, Nûbihar, İstanbul 2015, r. 121-122.)

<sup>447</sup> Ji bo beyta mînak bnr; rûpel 85, (x.76,b.8)

### 2.12.16 Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.)<sup>448</sup>

Murşidê Şeyda yê yekem e.

شأنك صفوت الله يا دافعاً عنائي

وصف تو صبغت الله اصل تو عبدالرحمان

Wesfên te Sibxetullah e eslê te ‘Ebdurrehman e

Şanê te sefwetullah ya ew kesê ku belayan diqewirîn e (x.92,b.2)

Şeyda di vê beytê de pesindariya murşidê xwe dike. Tu di ewsafê Seyyid Sibxetullah Erwasî (q.s.) de yî. Eslê te ji Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) ye. Sefwetullah jî bûye şanê te. Bi vê agahiyê em fehm dikin ku ev medhiye li ser Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s) hatiye nivîsandin. Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s) lawê Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) ye.

### 2.12.17 Şêx Fethullah Werqanîsî (q.s.)<sup>449</sup>

Li gorî ji dîwana Şeyda tê famkirin murşidê Şeyda yê duwem e. Şeyda di dîwanê de gelek medhiye li ser Şêx Fethullah Werqanîsî (q.s) nivîsandine.

خدایا هر فرا باشد مقام و جاه فتح الله

شکر دیسا مه دی إرو جمالا شاه فتح الله

Şikir dîsa medî îro cemala Şahê Fethullah

Xwuda ya her bilind be meqam û cahê fethullah (x.84,b.1)

Şayanê gotinê ye Şeyda xezela 94an ku ji panzdeh beytan pêk hatiye herfa serê her beytekê ji navê murşidê xwe Şêx Fethullah wergirtiye. Dema herfên serê beytan bîn nivîsandin ‘Fethullah El farûqî’ jê derdikeve. Şeyda di beyta dawî de dibêje li herfên serê beytan binêrin navê ew kesê ku ez jê hezdikim ew ê derkeve holê.

يتمزج منه اسم من أهوى وحسن أثرى

يا زكياً خذ من الابيات مالمبدأ بها

Ya kesê zekî ji beyta destpêka wan bigire

Wan bigihîne hev navê ku xweşikahiya wî tesir çawa kiriye bibine (x.94,b.15)

<sup>448</sup> Di sala 1831ê zayînî li gundê Taxê girêdayê Bedlîsê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Mela Mehmûd e. Destpêka xwendina wî li cem bavê wî bûye. Paşê li rex gelek mela û ‘aliman ders xwendiyê û di temenekî gelek ciwan de dest bi dersdayînê kiriye. Pêşî bûye mensûbê terîqa Rifa’î, paşê bûye mensûbê terîqa Qadirî û paşê bûye mensûbê terîqa Neqşebendî û ji destê Seyyid Sibxetullah Erwasî (q.s.) xelifetiya terîqa Neqşebendî wergirtiye. Di sala 1886ê zayînî diçe ber dilovaniya Xwedê. Aramgaha wî li Norşinêye. (Tenik, *Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*, r. 125-126.)

<sup>449</sup> Di sala 1846an deli gundê Werqanîsê girêdayî navçeya Hewêl/Bayqan a bajarê Bedlîsê hatiye dinyayê. Li gelek deveran xwendina ‘ilmî xwendiyê. Di ‘ilmê Fiqhê de gelek zana bûye. Bi fetwayên xwe yên fiqhî nav û deng daye. Bûye muntisibê Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) û xelifetiya terîqetê ji wî wergirtiye. Di sala 1899an de rehmet kiriye. (Kavak, *Hakkârî’den Yükselen İlim ve Tasavvuf Güneşi*, r. 148-149.)  
Eqîda İmanê, Rîsalet-ul Kufî wel Kebairî, El Hemaîlu Fîş’şemaîlî, Durret- ul Fethiye fi Ewamilun-Nehwiye, Menasik- ul Hec Wel Umre, Adabi Terîqeti Neqşebendiye, Mektubat navên berhemên wî ne. (Zeynelabidîn Zinar, "Şêx Fethullahê Werqanîsî", *Kovara Nûpelda*, hejmar. 5, Van, 2011, r. 11-16.)



Şeyda li ser wefata murşidê xwe Şêx Fethullah Werqanisî (q.s.) di dîwanê de cih daye mersiyeyan jî.

قوى ارو حزينم از ژ هجرا شاهى فتح الله  
لدنيای نمينم از د پشت شاهى فتح الله

Qewî îro bi hiznim ez ji koça şahê Fethullah

Li dinyayê nemînim ez di piştî şahê fethullah (x.82,b.1)

### 2.12.18 Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.)<sup>450</sup>

Murşidê Şeyda ê sêyem e. Ji bo Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) jî medhiye û mersiye nivîsandiye. Lê hejmara wan ji medhiye û mersiye li ser Şêx Fethullah Werqanisî (q.s.) gelekî kêmtirin. Di xezela 71ê de dîsa Şeyda herfên beytan ên yekem bi navê ‘Dîyaeddîn’ neqîşandiye.

ضياء اضاء الدهر كالشمس ضوئه  
وينكره الاعمى لما فيه من الم

Wek ronahiya tavê ronahiya wî demê rohnî dike

Kesên kor ji nexweşiya korahiyê wî înkâr dikin (x.71,b.1)

Şeyda xezela xwe ya 97an bi zimanê ‘erebî û ya 98an bi farsî li ser wefata Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) nivîsandiye û dîroka wefata wî diyar kiriye.

در هزار و سیصد و چل دوم از سال هجر  
گشت از دنیا بسوی جنت الماوی روان

Di sala sê sed û çil û diduyan de ji salên koçê

Ji dinyayê ber bi cennet ul mewa de rewan bû (x.98,b.3)

### 2.12.19 Şêx ‘Elaeddîn Oxînî (q.s.)<sup>451</sup>

كو چو بابی علاء الدین ژ دنیا ئی مئید کر  
لجه خو شیخ ضیاءالدین مشید بو بعون الله

Ku çû babê ‘Elaeddîn jî dinyayê koç kir

Li cih xwe şeyx Dîyauddîn bilind bû bi alikariya Xweda (x.82,b.12)

<sup>450</sup> Lawê Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) ye. Di sala 1272an de koçî li Usp ê giridayî bi navçeya Hîzana Bidlîsê hatiye dinyayê. Li cem bavê xwe xwendina xwe ya ‘ilmî qedandiye. Perwerdehiya tesewîfê jî bi bavê xwe fêr bûye. Piştî wefata bavê xwe, xelîfetiya terîqetê ji Şêx Fethullahê Werqanisî (q.s.) wergirtiye. Di dala 1342 yê koçî de li Norşînê wefat kiriye. (Çağlayan, hb. r. 201-202.)

<sup>451</sup> Di sala 1299/1881an de li Norşînê hatiye dinyayê. Lawê Şêx Fethullahê Werqanisî ye (q.s.). Neviye Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî ye (q.s.). Li cem bavê xwe dest bixwendina ‘ilmî kiriye. Paşê li Bidlîsê li cem ‘Ebdulkerîm El Hîzanî xwendina xwe domandiye û îcaza xwe ya ‘ilmî ji wî wergirtiye. Perwerdehiya xwe ya tesewîfî li cem bavê xwe destpêdike, piştî wefata bavê xwe li cem Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) vê perwerdehiyê didomîne û ‘îcazeya tesewîfî ji Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) wergire. Di sala 1369/1949an de li Oxînê diçe ber dilovaniya Xwedê. Şêx ‘Elaeddîn Oxînî (q.s.) ‘alîmekî gelek zanabûye. Cela’ul-Ayn, Hîdayetu’s-Sibyan, Xulasatu’l-Wad’, Xulasatu’l-Beyan, Mulahassu’l-Adab, Tezhibu’t-Tehzib navên hin berhemên wî ne. (Mehmet Bilen, "Ohinli Şeyh Alauddin ve Hadis Usulune Dair Manzumesi", *Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, sayı.37, Erzurum 2012, r. 87-108.)

Lawê Şêx Fethullah Werqanîsî (q.s.) ye. Xelîfe yê Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) e. Şeyda di beyta jor de navê wî eşkere nivîsandiye. Di xezela sêzdehan de herfên serê beytan navê vî şêxê mezin dide. Ev xezel bi tevahî li ser wî hatiye nivîsandin.

Di beytên jor de wek ku hat dîtin navên sadatan bi eşkereyî derbas dibû. Li jêr em ê beytên ku navê sadatan û xasma murşidên Şeyda derbas nabe lê ew bi şibandîne anîne ziman em ê binivîsin.

ای صبا بر خیز کان شاه کرمکارم کجا ست      سروری اهل دلان کشف اسرارم کجا ست

Ey bayê seba were şahê pîr bi kerem min li ku ye?

Serwerê ehlê dilan û keşifkarê esrarê min li ku ye? (x.21,b.1)

Şeyda di beyta jor de navê şêxê xwe neaniye ziman lê dema ku behsa wî dike wî bi şahê pîr bikerem, serwerê ehlê dilan û keşifkarê esraran diwesifine.

ز هجر روی تو صبر و قرارم نیست ای دلبر      بمثل بلبلان مستم بفریاد و بافغانم

Ji dûrbûniya rûyê te ez bê sebr û hedan im ey dîlber

Wekî bulbulan mest bûme bi feryad û fixanim (x.65,b.3)

Şeyda di beyta xwe de murşidê xwe wek dîlber dide nasîn. Navê şêxê xwe nabêje. Lê dema li temamê helbestê tê nêrîn em fam dikin ku dîlbera Şeyda Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) e.

رخت بنما و ما خود را فدا کن      الا ای سرور جمله طیبیان

Ruyê xwe rê me bide û me ji xwe re feda bike

Ey serwerê hemû tebîban (x.75,b.2)

Şeyda di pesinandina şêxê xwe de rastiyeke jî tîne ziman. Lewra şêx di heman demê de divê bijîşkên nexweşiyên dil bin jî. Bi sedema ku bikaribin nexweşiyên dilê salikan derman bikin.<sup>452</sup> Şeyda murşidê xwe di vê astê dibîne, navê wî bi lêv nake lê wî wek serwerê hemû tebîban dinasîne.

او دما پیر خراباتی ز دنیا ارتحال      کرد با نالین و آهم جان من در ضیقست

Ew dema pîrê xerabatê ji dinyayê koç kir

Bi ax û nalîn can ê min ket tengasiyê (x.16,b.3)

Pîrê xerbat di têgehziya tesewifê de ji murşidê kamil re tê gotin.<sup>453</sup> Şeyda di vê beytê de ji bedel navê şêxê xwe wî wekî pîrê xerabat dide nasîn. Dema bi giştî li helbestê tê

<sup>452</sup> الباطومی، ص، ۳۸.  
<sup>453</sup> نوربخش، ج. ۱، ص، ۱۱۴.

nêrîn xuya dibe ku Şeyda helbesta xwe li ser wefata Şêx Fethullah Werqanîsî (q.s.) honandiye.

جز یار دلربایم کس رهبری ندارد

کس رهبری ندارد جز یار دلربایم

Ji bilî yara min a dîlrûba kes ne xweyî rêberekî ye

Kes ne xweyî rêberekî ye ji bilî yara min a dîlrûba (x.38,b.6)

Şeyda di ev helbesta xwe ya ku li ser pesinandina Şêx Mûhemmed Dîyauddîn (q.s.) ava kiriye şêxê xwe wekî yar tîne ziman. Ne tenê yar, yarekî wisa ye ku yarek dîlruba ye, yanî yarê ku dilan direvîne.

Li gorî rêbazên terîqeta Neqşebendî, salik divê di rêya seyr û sulûkê de bav û kalên xwe, ango pîr û meşayixên terîqeta xwe bizanibe. Li cem sofîyan kesê ku bav û kalên xwe yên seyr û sulûkê nizanibe kor e. Pîrî caran bi sedema vê nezanbûniyê bi hin kesên din ve xwe girêdidin. Lewra di vî warî de Hedîsa Resûlê Xweda (s.x.l.) wiha ferman dike. *‘kesê bi zanebûn ji xeynî bavê xwe bi yekî din ve girebide û jê re bibeje bavo Xwdeda le’netê lê bike.’*<sup>454</sup> Ji ber hindî ehlê tesewifê navên sadatên terîqa xwe ji bo ku bi asanî bê ezberkirin bi nezm nivîsandine û ezber kirine. Em menzûmeyên navê sadatên terîqa Neqşebendî bi kurdî, erebî û farsî di berhema Hânî de jî dibinin.<sup>455</sup> Ji ber hindî em li jor dibînin ku Şeyda li gorî rêza silsileya terîqa Neqşebendî navê sadatan ezber e. Şeyda di vê mijarê de rêbazê terîqeta Neqşebendî pêk aniye.

Şeyda li ser murşidên xwe hem helbestên pesindanê, medhiye û hem helbestên li ser wefata wan mersiye nûsîne.

Şeyda di hin helbestan de navê şêxên xwe nivîsandibe jî bi pirranî navê wan negotiye. Di helbestên ku navê şêxên xwe negotiye de ew bi bêjeyên ‘yar’, ‘dîlber’, ‘pîrê Xerabat’, ‘tebîb’ û hin bêjeyên tesewifî pesinandine.

Şeyda ji xeynê murşidên xwe navên hin rêberên terîqeta Neqşebendî û Qadirî jî aniye ziman.

## 2.12.20 Hub û Mehebbet

### 2.12.21 Hub û Mehebbet

Mehebbet, hebandin, hezkirin û yaranî ye. Mehebbet, bêjeyek erebî ye, bingeha wê ji mesdera (حَبَّ) hatiye. Pênc wate ji bo bêjeya (حبيب) hatine destnîşankirin.

<sup>454</sup> Hâni, hb. r. 33.

<sup>455</sup> Hâni, hb. r. 585-586.

“Bi wateya zelaltî/xwerû/safî û spîtiyê hatiye bikaranîn. Wisa ku ji spîti û birqandina diranan re ‘ereb dibêjin (حب الاسنان).

Bi wateya bilindî û eşkere bûnî, derketina holê tê bikaranîn. Di dema barana bi şid de ew tiştên derdikevin ser avê ji wan re dibêjin (حب الماء).

Dema deve li deverekê mexel tê û ranabe jê re dibêjin (حب البعير), bi wateya biryardayîna mayîna li deverekê û sebat/tebat a li ser tiştêkî hatiye bikaranîn.

Bi wateya tov, dendik madeya tiştêkî eslî, puxta tiştêkî jî tê bikaranîn, wekî dibêjin (حبوة) ku mufred/yekjimara (حبوب) ê (حبوات) ye.

Hem bi wateya parastin, hilanîn û veşartinê jî tê, ku derheqê firaxa avê jê re dibêjin (حب الماء).<sup>456</sup>

Dema em difikirin ji bo mehebbetê û di têkilîya navbera dildar û mehbûbê de her pênc wate jî pêwîst in<sup>457</sup>. Paqijbûna dil ji xeyrê mehbûbê, eşkere bûn û eşkere kirina mehebbetê, cih girtina mehbûbê û hubba wê di dilde û tebat û sebra li ser mehebbetê, dîtîna mehbûbê wek sedema jiyanê, fedakirina dil ji bo parastina rêya hezkirina mehbûbê, wek taybetmendiye mehebbetê divê bête dîtîna. Herwiha, di dil de peydabûna heyecan û kelecana li hemberî mehbûbê, xwestina dûrneketa ji mehbûbê, herdem daxwaza dîtîna mehbûbê jî, ji taybetiyên hebandinê ne.

Mehebbet, eger bi paqijbûna dil û kamilbûna xisletên însanan bê watedarkirin, wê demê nabe ji sofîyan tenê re bête teksîs kirin. Mehebbet ne girêdayî bi tesewifê, bi hin faktorên xwe yê taybet wek daxwazên giyanî, xwestekên nefse, bidestxistina hin berjewendîyan û hin pêwîstên ku li gorî dem û deveran tî guhertin girêdayî dimîne.<sup>458</sup> Lê mehebbeta tesewifê; mehebbetê ‘am e, giştî ye. Bê şert û merc, bê qeyd û bend, azad, ji bo hemû nêrîn, helwest û ramanan, ji bo herkes û hemû nijad û netewan, ji bo hemû reng û zimanan, ji bo hemû bîr û bawerîyan, li hemû cih û deveran; wek tava rojê, wek xunava baranê, wek nesîmê sibehê, wekî germa agirê zivistanê ye.

Ji salik re mehebbet çira ye ku pê tarîtiyê dike ronahî, hêman û faktorên ku dilan nerm dike, zindanan germ dike, dijminantiyê bi dostaniyê, kerb û rikan bi dilovanî û dilnermiyê, nexweşîyan bi tendurustiyê, derd û kovan û keseran bi dilnazikiyê û kulxaneyan bi gulistanê

<sup>456</sup> بخارایی ، ص ، ۵۹۶.

<sup>457</sup> بخارایی ، ص ، ۵۹۶.

<sup>458</sup> بخارایی ، ص ، ۵۹۶.

diguhezîne. Ji ber hindî Mewlana di xezela xwe de her tişt bi mehebbetê ve girêdide. Mewlana wiha dibêje:

وز محبت مسها زرین شود

از محبت تلخها شیرین شود

Ji mehebbetê tehlî şêrîn di be

Ji mehebbetê hesin di be zêr<sup>459</sup>

Bi mehebbetê tal şêrîn dibe, bi mehebbetê hesin dibe zêr. Di berdewama xezelê de; bi mehebbetê histrî dibe gul, sirke dibe şerab, zîndan dibe gulistan, agir dibe nûr. Ji bo tunebûna mehebbetê jî di heman xezelê de wiha dibêje; bê mehebbet bexçe dibe kulxan, bê mehebbet mûm dibe hesin.

Ji ev taybetiyên mehebbetê ku Mewlana di xezela xwe de tîne ziman tê fam kirin, girîngiya mehebbetê ne tenê ji bo paqijbûna dilê salik û bi encambûna vê paqijiyê bi dest xistina înayeta Xweda ye. Belkî di hemû kar û xebatên jiyane de, di avakirina heremên ronak û rewşen de, ji bo jiyaneke şîrîn û bextewar, hemû însan hewcedarê vê mehebbetê ne. Devera ku bi mehebbetê hatibe avakirin û dagirtin tarîfî, dubendî, cudayî û îxtilaf tê de namîne. Xapandin û derew bi kêr nayê. Bêhêvîbûnî, hesret, çavnebarî, bexîlî peyda nabe. Ji ber hindî, rê û rêça salikan û tesewifê rêya aştîya giştî ye. Hemî kesên dinyayê, hemî ademîzad li ber dilê salikan xwoşewîst in, hêja ne, delal in, birûmet in, qenc in û birêz in. Jiyan ji salik re derfet û keys e ji bo naskirina xwe û Xweda û bi dilekî pak û safî hezkirin û qedirzaniya temamê aferîdeyên Xweda. Îroj ji hemû dem û dewranan zêdetir pêdiviya însanan bi mehebbetê û rêça tesewifê heye. Û bi taybet a ‘alema Îslamê.

Di derbarê hevrehên/iştîqaqên mehebbetê de gelek nêrîn hebin jî<sup>460</sup> hub û mehebbet di ferhengên de bi hevwateriyê hatiye bikaranîn.<sup>461</sup> Herwiha di berhem û pirtûkan de jî, hub û mehebbet bi hevwateriyê tîne bikaranîn. Ji ber hindî di vê mijarê de em ê jî hub û mehebbetê bi yek wateriyê, bi wateriya hebandin, hezkirin û yaraniyê bi kar bînin.

Wek têgehek tesewifî mehebbet, meyla/balkişandina batinê/derûnê însan bi ‘alema cemalê/xweşikahiyê hatiye nasandin. Ew mehebbet du cure ne. Mehebbeta giştî/‘am, di vê mehebbetê de, dil li pey sîfatê cemal digere. Mehebbeta xas/taybet, di vê mehebbetê de, ruh li

<sup>459</sup> مولانا جلال الدین محمد بلخی، مثنوی معنوی (دفتر دوم، بمناسبت عید سعید غدیر) چاپ حکمت، قم ۱۳۸۲، ص ۲۵۵.  
<sup>460</sup> Derbarê nêrînen hevrehên bêjeya ‘mehebbet’ê de bnr;

بخارایی، ص ۵۹۶-۵۹۹.  
<sup>461</sup> سجادی، ص ۳۱۰.

pey dîtina cemal digere.<sup>462</sup> Di vê pênasê de Cemal xweşikahiya Xweda ye. Salik an li pey wê xweşikahiya sifâtên Xweda ye ku şewqa wan sifatan di gerdûnê de belav bûye û an rasterast bi ruhê xwe li pey dîtîna xweşikahiya Xweda digere.

Ehlê tesewifê mehebbet şibandine darê. Ew dar di qelb de hatiye çandin û bi ava îxlasê tê avdan û gelek cureyên fêkiyan digire. Wekî ku ayeta Qurana Pîroz kerem dike.<sup>463</sup> (تَوْتِي أَكْلَهَا) Eslê vê darê 'Ew dar, bi destûra Xwedayê xwe her gav mêweyên xwe dide'<sup>464</sup> (كُلَّ حِينٍ بِأَذْنِ رَبِّهَا) Eslê vê darê 'koka wê binecih e' di qelbê evîndar de ye û<sup>465</sup> (وَفَرَّغَهَا فِي السَّمَاءِ) şaxên wê jî bi sîdret'ul muntehayê ve girêdayi ye.<sup>467</sup>

Ji bo peydabûn û çêbûna hub û mehebbetê du sedem hatine destnîşankirin. Cemal û îhsan.<sup>468</sup> Însan, çi mehebbeta îlahî be û çi mehebbeta wekî din be, an ji bo xweşikahiyê û an ji bo qencî û başiyê di dilê wî de hezkirin û hebandin peyda dibe.

Di fikr û ramanê Şeyda de jî pêdiviya hub û mehebbetê bi başî û xweşikahiyê heye. Şeyda bêjeya 'Husn'ê bi kar aniyê. 'Husn' di ferhangan de hem bi wateya xweşikahî û hem bi wateya başiyê tê.<sup>469</sup> Şeyda wek hêzek edebî merama xwe di bêjeyekê tenê de bi du wateyên bêjeyan bi kar aniyê.

حسن و حب ملزوم و لازم گشته اند در علم غيب در میان شان بیاید اهل دل را امتیاز

Di ilmê xeybê de husn û hub bû hewce û hewcedar

Di navbera wan de ji ehlê dil ra îmtiyaz ew ê were (x.48,b.3)

Li gorî Şeyda di ilmê xeybê de, di vir de em dikarin 'ilmê xeybê' bi tesewifê rave bikin, hub û husn hewcedarê hev in. Yek bê yekî nabin. Ji bo hebûn û peydabûna wan divê her dû jî hebin. Xweşikahî û başî divê jê bête hezkirin da ku bikaribe qedr û qîmet bigire. Qedr û qîmeta tiştê bi hezkirinê, û di wan xisletên di wateyên hezkirinê de hatin rave kirin, wek parastin, veşartin, derxistina holê û paqijkirina ji tiştên nepak, derdikeve holê. Di navbera her du mezmûnan de ku yek hub û a duwem husn e ji bo ehlê dil ra îmtiyazek, bijartinek ew ê

<sup>462</sup> سجادی، ص، ۷۰۱.

<sup>463</sup> Qurana Pîroz, Îbrahîm, 25.

<sup>464</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 258.

<sup>465</sup> Qurana Pîroz, Îbrahîm, 24.

<sup>466</sup> Qurana Pîroz, Îbrahîm, 24.

<sup>467</sup> حسن مندیل العکلی، & نبراس حسین مهاوش، " (حب و عشق) فی ضوء الدلالة القرآنية"، مجلة كلية التربية للبنات، المجلد ۲۵ (۱) ۲۰۱۴، ص، ۹.

<sup>468</sup> نوربخش، ج. ۲، ص، ۲۱-۲۲.

<sup>469</sup> Kanar, hb. r. 305.

hebe. Divê ehlê dil bijartinekê bike, an ew ê hez bike û an jî ewê jê bête hezkirin. Ehlê dil yanî salik, an ew ê bikoşe, bikoşe heta ku Xweda jî ji wî hezbike û bibe şayesteyê sirra ayeta Qurana Pîroz ku dibêje <sup>470</sup> (يَجِبُهُمْ وَيَجِبُونَهُ) ‘Xwedê ji wan hez dike ew jî ji Wî hez dikin’<sup>471</sup> an jî ew ê negihije vî meqamî û hertim li hezkirina Xweda bigere. Ev meqam di Qurana pîroz de ( وَالَّذِينَ آمَنُوا أَشَدُّ حُبًّا لِلَّهِ )<sup>472</sup> ‘belê ew ên ku bawerî anîn ji wan bêhtir ji Xwedê hez dikin.’<sup>472</sup> bi vê ayetê derbas dibe ku Îmamê Xezalî ev ayeta Qurana Pîroz wekî delîla îspata mehebbetê dinasîne.<sup>473</sup> Herwiha ayeta Qurana Pîroz <sup>474</sup> (فَأَتَّبِعُونِي يُحْبِبْكُمُ اللَّهُ وَيَغْفِرْ لَكُمْ ذُنُوبَكُمْ) ‘Bibêje: Eger hûn bi rastî ji Xwedê hez dikin, naxwe bidin pey min, Xwedê dê ji we hez bike û li gunehên we bibore. Xweda her gunehbexş e, dilovîn e’<sup>475</sup> ji aliyê mutesewifan ve delîla hezkirinê hatiye dîtin. Di şîroveya ev ayeta Qurana Pîroz de hatiye gotin; di vê ayetê de du rexên mehebbetê bi hev re tê dîtin. Yanî herkesê ku ji Xweda hez bike, Xweda jî dixwaze ji wî hez bike.<sup>476</sup> Ji vê şîroveyê tê fam kirin ku Xwedayê Te’ala jî dixwaze ji ‘ebdê xwe hez bike, lê ‘ebd hîn negihaştiye wê astê ku hezkirina Xweda bi dest bixe. Hem tê fam kirin ku hin kes hene hezkirina Xweda bi dest xistine û bûne ‘Hebîb’ ji bo Xwedayê Te’ala.

Li cem Şeyda hebîbê Xweda yê yekemîn û yê herî sadiq Resûlê Xweda Mûhemmed Mustefa (s.x.l.) ye. Şeyda li hemberî mehebbetê ‘edawetê/dijminantiyê dibîne û serokê dijminan jî ‘ezazîl/şeytan dest nîşan dike. Li hemberî dijminantiya şeytan Ehmed (s.x.l.) bûye hebîb/dildarê Xwedayê Te’ala.<sup>477</sup> Resûlê Xweda (s.x.l.) hebîbekî wisa ye ku Şeyda pesnê hebîbtiya wî bi sadiqiyê dide. Şeyda bi ev gotina xwe di heman demê de taybetiyek mehebbetê tîne ziman. Divê kesê ku hez bike di hezkirina xwe de rastgo be ango sadiq be. Şeyda beyta xwe wiha honandiye:

احمد بخوه بو حبيب صادق

سردار مخالفان عزازيل

Serdarê muxalifan ‘ezazîl e

Ehmed bi xwe bû ye hebîbê sadiq (x.61,b.4)

<sup>470</sup> Qurana Pîroz, Maîde, 54.

<sup>471</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 116.

<sup>472</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 24.

<sup>474</sup> Qurana Pîroz, Alî ‘Îmran, 31.

<sup>475</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 53.

<sup>473</sup> بخارایی، ص، ۶۰۰.

<sup>476</sup> بخارایی، ص، ۶۰۰.

<sup>477</sup> العبادى، ص، ۱۷۱.

Wek ku li jor hat diyarkirin, meqsed û merama salik bidestxistina hubba Xweda ye. Ji ber hindî di tesewifê de mehbûb her Xweda ye ji salik re.

محبوب قدیمی چو بود یار ندیمی      در هر دو جهان نیست چنین خیر تجارت

Mehbûbê qedîm çî dema bû dostê nedîm

Di her du dinyayan de ji vê bazirganiyê bi xêrtir tune ye (x.19,b.3)

Şeyda di beyta xwe de mehbûbê yekem û qedîm Xweda dinase. Kesên ku li mehebbeta mehbûbê qedîm digere jî, wek nedîm dest nîşan dike. Nedîm, di ferhengê de bi wateya kesên xizmeta kesayetên mezin dikin<sup>478</sup> hatiye ravekirin ku ango ew xulamên herî nêzîkê wan kesayetên in. Nedîm dema bi pêk anîna xizmet, emr û fermanê mezinê xwe hez kirin bi dest xist ji wî re li dinyayê û li axretê ji vê bazirganiyê bi xêrtir tu tiştê tune ye. Şeyda di beyta xwe de, di şexsiyeta nedîm de, pêk anîna xizmet, emr, ferman û her çî tiştê ku fermandar ferman dikin wek ta'et û 'ibadet û ew zikrên ku salik di sulûkê de pêk tînin aniye ziman.

قصده خورشید رخت کرد حبیب اکرمت      تا بسدرت میرسانیدی چه جای انور است

Hebîbê te yê Ekrem qesda ruyê te yê wek rojê kir

Te ew bir sidret-ul menteha ku çî cihekî bi nûr e (x.22,b.6)

Li jor me got di tesewifê de mehebbet ji bo du tiştan derdikeve. Xweşikahî û qencî. Şeyda di beyta xwe de rave dike ku mehebbeta Resûlê Xweda (s.x.l.) ji bo cemala Xweda ye. Lewra di berhemên tesewifê de<sup>479</sup> (ان الله جميل يحب الجمال) 'Xweda Xweşik e û ji xweşikan hez dike' hatiye gotin. Resûlê Xweda (s.x.l.) dil daye cemala Xweda. Ji ber vê hezkirina Hebîbê Xweda (s.x.l.) Xweda ji bo cemala xwe nîşanê wî bide Hebîbê xwe dibe ba xwe û wî digihîne Sidret-ul munteha. Şeyda, Sidret-ul munteha cihekî gelekî bi şewq û nûr dide nasandin. Şeyda di vê beytê de bûyera Mi'racê dide ber çavan.

Şeyda mehebbetê terxanê salikan tenê nake. Mehebbet di dilê salikan tenê tune ye. Di fikr û ramanê Şeyda de mehebbet di dilê herkesî de heye.

از بنی آدم نباشد هر که نبود در دلش      داغ انوار محبت بر رخس آثار عشق

Ji ademîzadan tune ye kesek tune be di dilê wî de

Daxê nûra mehebbetê û di rûyê wî de nîşanên 'işqê (x.62,b.4)

<sup>478</sup> محمد معین، فرهنگ معین، انتشارات ادنا، چاپ چهارم، تهران ۱۳۸۱، ج ۲ - ص ۱۹۲۸.  
<sup>479</sup> حشمت الله ریاضی، آیات حسن و عشق، همراه با شرح زندگانی و آثار شیخ احمد غزالی (به کوشش: اکرم شفائی) جلد اول، حقیقت، تهران ۱۳۸۱، ص ۱۳۴.



Ew kesê ku dilê wî bi nûra mehebbetê nehatibe daxkirin û kewandin û li ser çavê wî, li ser rûyê wî nîşanên ‘işqê tune be ew ne benî adem e, ew ne ji zurriyeta Hezretî Adem (s.l.) e. Şeyda dest nîşan dike ku di dilê hemû însanan de nûrek ji mehebbeta Xweda û li ser çavê wî nîşanên îşqa Xweda heye. Wek Mewlana camî gotiye; ‘kes tune ye ku hundirê wî ji mehebbetê vala be. Belkî hezkirina wî ji mehbûbekî dizîvire bal mehbûbekî din. Lê ya rast divê di hubbê de mehbûbê heqîqî her Xweda be.’<sup>480</sup> Şeyda jî heman şîroveya Mewlana Camî di beytên xwe de aniye ziman. Lewra Cemal sifatekî Xweda yê ezelfî ye. Di berhemên tesewifê de wiha hatiye nivîsandin: Temamê husn û cemalên di mewcûdatan de hene bi giştî pertewên cemala Xweda ne. Ev husn û cemalên di mexlûqatan de li gorî qabiliyeta wan derdikeve holê.<sup>481</sup> Bi rastî Şeyda di beyta xwe de vê şîroveyê tîne ziman. Em jî têdigihêjin ku Şeyda bi bawere ku hemû xweşikahiyên dinê pertewên cemala Xweda ne.

Şeyda bi ev beyta xwe tesdîqa gotina Îbnî ‘Erebî dike. Îbnî ‘Erebî dibêje ‘tu tiştêk û kesek tune ye ku têkiliyek wan bi mehebbetê re tune be.’<sup>482</sup> Hert tiştê ku heye û her kesê ku heye bivê nevwê bi mehebbetê têkiliyek wan ew ê hebe.

محبت هنگافت قلبم شبهت برق و شهاب  
هر د آمانج نشستته نابیتن بووی زوال

Hezkirin li dilê min ket wek pêt û brûsk  
Her bûye armanca me lewma dawî lê nayê (x.64,b.5)

Cih û warê mehebbetê dil e. Divê mehebbet di dil de be û ji dil be. Di tesewifê de armanca mehebbetê gihaştina bal Xweda ye.<sup>483</sup> Divê ev armanc bêşik û şubhe di dil de cih bigire. Şeyda di beytê de, mehebbeta Xwedayê Te’ala ku di qelbê wî de cih girtiye wek armanca jiyana xwe dide nasîn. Ev mehebbet wek brûsk û pêtek agir ketiye qelbê wî û qelbê wî kewandiye. Şeyda ew mehebbeta ku dilê wî dax kiriye wisa bawer dike ku ew ê dawî lê neyê heta ku bigihêje armanca xwe.

روزی اگر نباشد ما را جمال محبوب  
شد سر نوشت فطرت تقسیم را حواله

Rojî girtina cemala mehbûbê ji me re nabe  
Fitreya te bû qedera me ji bo parvekirinê bişîne (x.85,b.4),

چون که نصاب حسنت در غایت کمالش  
هیچت زیان نبود گر میگشای هاله

Lewra nîsaba xweşikatiya te di asta kemalê de ye  
Eger wek sîwanekê li ser me vekî qet ziyan nabe (x.85,b.5)

<sup>480</sup> بخارایی، ص، ۶۱۱.

<sup>481</sup> سجادی، ص، ۷۰۴.

<sup>482</sup> Mehmet Ulucan, "Niyâzî-i Mısırî'nin Şiirlerinde Varlık Anlayışı", *Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, Cilt: 19, Sayı: 1, 31-41 r. 33.

<sup>483</sup> Uludağ, hb. r. 232.

Şeyda bêjeyên mehebbetê bi termên fiqhê rave dike. Hem zanebûna xwe ya fiqhê û hem hunera xwe ya edebî nîşanî me dide. Di dîtina cemala mehbûbê de rojî girtin ji mere nabe. Ji bo dîtina cemala te em nikarin xwe biparêzin, û nabe em xwe biparêzin. Salik divê xwe ji dîtina cemala mehbûba xwe neparêze, lewra ev yek ji ‘elamet û nîşanê mehebbetê tê zanîn.<sup>484</sup> Pêwîst e salik, her lehze li benda dîtina cemala mehbûbê be. Bi her nefesek saliki divê xwestina dîtina mehbûbê zêde bibe. Çawa ku cemala Xweda bêdawî ye herwiha divê hêza mehebbeta salik jî bêdawî be. Şeyda bi gotina xwe ya ku dibêje, eger tu cemala xwe wek sîwanekê li ser me vekî qet tiştek jê zîyan nabe, bê dawîbûna cemala Xweda tîne ziman. Şeyda agahdar e ku cemala Xweda bi giştî para wî nakeve. Piştî rojî girtina meha remezanê wek dayîna fitran, Şeyda fitra cemala mehbûba xwe daxwaz dike. Dibêje nîsaba, pîvana xweşikahiya te gihaştiye heddê herî zêde. Cemala mehbûba xwe di pîvanek herî mezin de dibîne.

تصدق بايدت بر اين فقير حال هندويت

نصاب حسن دبرينت حسابی قطنی دارد

Pîvana xweşikahiya te ya qedîmî qet nayê pîvanê

Pêwîst e ji vî feqîrî re ji wê şanika reş sedeqe bidî (x.14,b.3)

Şeyda xweşikahiya cemala mehbûba xwe bêpîvan dibîne. Wek beyta jor dîsa bi bêjeyên fiqhê merama xwe tîne ziman. Cemala te ewqas pirre ey mehbûba min, derê pîvanê ye, nayê pîvandin. Şeyda di vê beytê de û di beyta jor de bêjebaziyê dike. Lewra di nîsaba/pîvana zekatê de, tiştê ku zekata wê tê dayîn çiqas zêde be zekata wê jî ewqas zêde dibe.<sup>485</sup> Mebesta Şeyda di vir de hem bidestxistina zekat û fitreya zede ye ligorî bêjeyên hilibijarti, û hem jî rastiya cemala hezkiriya xwe dide nîşankirin. Şeyda bi zanebûnî û gelek mahirane bêjeyên fiqhê di mehebbetê de bi kar anîne.

Di dabeşkirina mehebbetê de mehebbeta kesayetên xwedî xesletên qenc û rind wek beşekê cih digire. Ew kesayetên di şexsiyeta wan de xesletên qenc, xesletên wek zanebûnî, camêrî, teqwa, mafdarî ûwd. cih girtine şayesteyê mehebbetê ne.<sup>486</sup> Armanc di vê mehebbetê de ne mehebbeta cesed û bedena van kesayetên e. Ew xesletên qenc dibin sedema mehebbeta wan. Ruh û dilê însan hertim ji tiştên xweşik û qenc hez dike. Xesletên qenc di kîjan însanan de hebe dibe sedema hezkirina wî însanî. Lewra kaniya temamê xesletên baş û qenc Xwedaye. Ew xesletên di hin kesayetên de tînin qetreyên kaniya xesletên Xweda ne. Ev

<sup>484</sup> بخارایی، ص، ۶۰۷.

<sup>485</sup> Der barê mijara zekatê de ji bo agahiyên zêdertir; Ebû Yehya Zekerîya Nevevi, *Minhac'üt Talibin (Arapça-Türkçe tam Metin)* (tercûme, Abdulhalik Duram -Mîthath Acat) Seyda Kitabevi, Diyarbakır 2013, r. 180.

<sup>486</sup> سجادی، ص، ۷۰۵.

mehebbet dîsa vedigere bal Xweda. Ehlên tesewifê bi vê nêrînê, mehebbeta li hemberî murşidên kamil, an bi bikaranîna di nav gel de, mehebbeta şêxan pêwîst dîtine.

Di destnîşankirina ‘elamet û nîşanên mehebbeta Xweda de, hezkirina amûr û hacetên gihiştina Xweda, îta’et û xwesipartina van amûran jî cih digre.<sup>487</sup> Lewra ew radest û xwesipartin heman wek radest û xwesipartina Xweda hatiye dîtin. Murşidê kamil, ango şêx di tesewifê de ji salik re rêber e ji bo gihaştina bal Xweda. Di rêya tesewifê de, di wê rêya dûr û dirêj de ji bo gihaştina Xweda pêwîst e ku salik li hemberî şêxê xwe bi mehebbet be û xwe radestî fermanên wî bike da ku bikaribe bigihêje meqsed û meramên xwe.

Mehebbet û hogiriya di navbera şêx û murîd de wek wasita, amrazekê hatiye dîtin. Li gorî hêza mehebbetê rewşa têkilîya salik û murşid tê guhertin. Murid, salik bi qasî hêza mehebbeta xwe ji murşidê xwe sûd distîne. Lewra mehebbet ‘elamê naskirinê ye. Naskirin çî qas zêde bibe, mehebbet jî dê zêde bibe, mehebbet çî qas zêde bibe, sûdwegirtin ew ê zêde bibe.<sup>488</sup> Ehlê tesewifê mehebbeta li hemberî şêx wek hezkirina şagirt û mamoste dîtine. Şagirt çiqas ji mamoste hez bike ewqas ew ê zanebûna mamoste û rewşa exlaqên mamoste sîrayetî şagirtî bibe. Murşid di tesewifê de heman mamosteyê salik e. Salik ji bo ku bikaribe herî zêde ji mamosteyê xwe sûd wergire divê mehebbeta wî gelekî zêde be.

Ehlên tesewifê ji bo mehebbeta li hemberî şêx û murşidan ayeta sureya tewbe delîl dest nîşan dikin.<sup>489</sup> (يا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا اتَّقُوا اللَّهَ وَكُونُوا مَعَ الصَّادِقِينَ) ‘Gelî yên ku bawerî anîne! Xwe ji (ezabê) Xwedê bi parêzin û digel rast û duristan bin’<sup>490</sup> Xwedayê Te’ala di ev ayeta xwe de negotiye ‘bibin sadiq’ gotiye bi ‘bi sadiqa re bin’. Ji bo parastina teqwayê hevaltiya bi sadiqan re ferman kiriye. Lewra di rêya sadiqiyê de gava yekem, hevaltiya sadiqan e. Ji bo vê hevaltiyê jî pêdivî bi mehebbet û hogirtiyê heye.<sup>491</sup> Salik dema bû hemnişînê murşidê xwe û mehebbeta murşidê wî di dilê wî de cih girt, ji helwestên murşid, ji tevgerên murşid, ji exlaqên murşid li gorî mehebbeta wî ew ê sîrayetî wî bike, bandorê li wî bike. Ji ber hindî ehlê tesewifê bi bawer in ku pêdiviya salik bi mehebbet û hogiriya murşid heye lewra, ji bo ew xesletên murşid ên qenc bi dest bixe ev yek lazim e.

Şeyda di dîwana xwe de hem medhiye û hem mersiye li ser murşidên xwe nûsîne. Di van helbestan de mehebbeta xwe jî aniyê ziman. Di qelbê Şeyda de mehebbetek gelekî zêde heye li hemberî murşidên wî. Wek mînak çend beytên ku Şeyda mehebbeta xwe tê de aniyê ziman em ê li jêr destnîşan bikin.

<sup>489</sup> Qurana Pîroz, Tewbe, 119.

<sup>490</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 205.

<sup>491</sup> Topbaş, hb. r. 249-255.

<sup>487</sup> بخارایی، ص، ۶۰۶-۶۰۷.  
<sup>488</sup> العجم، ص، ۸۴۱.

کس نباید در جهان شاه فاروقی حبیب

هم ز مروارید او حیران شود مرد لبیب

Kes nabe di dinyayê de wek Şahê Farûqî yar

Kesê zana heyran dimîne ji gotinên wek dur (x.9,b.1)

Di dinyayê de tu kes wek Şahê Farûqî (Şêx Fethullahê Werqanisî q.s.) xwoşewîst nabe. Û dîsa di dinyayê de tu kes wekî wî nikare axaftinên wek durr bike. Kesê zana ji ew axaftinên wî yên wek durr û înciyan heyran û mat dimîne. Şeyda di beyta xwe de hem methê murşidê xwe dike û hem xwoşewîstiya wî tîne ziman.

لكلبي آسيتان خود بپرس ای مهربان من

رفیق روز محنت هم خلیل خالق وهاب

Li kuçikê ber deriye xwe bibirse ey mihrîbanê min

Hevalê roja dijwar û dostê xaliqê Wehhab e (x.11,b.8)

Ez wek kelbekî li ber deriyê dergahê te me ey ew kesê ku min jê hez kiriye, li halê min bipirse. Tu hevalê rojên dijwar û tengasiyê yî. Û hem Xwedayê Wehhab te ji Xwere bi dostantî hilbijartiye. Şeyda di vê beytê de nefsbîçûkbûna xwe û sadiqtiya xwe dest nîşan dike. Xwe wek kûçikekî dibîne li ber dergahê murşidê xwe. Dixwaze murşidê wî li halê wî bipirse lewra hêviyeke wî û baweriyeke wî heye bi murşidê wî. Lewra murşidê wî hevalê rojên zor û zehmet e. Şeyda di rêya seyr û sulûkê de rastî hin zehmetiyan hatiye û alikariyê dixwaze ji murşidê xwe. Sedemek ji hilbijartina murşidan jî ji xwe ev e ku di rêya gihaştina Xweda de alikariya salikan bike.

قطب ارشاد نجل استاد ملجنی بیچاره گان

مظهر انوار حق محبوب و دلدارم کجاست

Qutbê îrşadê, ji nesla ustad, stareya bêçareyan

Mezherê nûrên Xweda, mehbûbamin dildara min li ku ye (x.21,b.3)

Şeyda di pêşiyê de pesnê murşidê xwe dide. Murşidê wî, qutbê îrşadê ye, ji malek zana ye, sitareya bêçare û neçaran e û hem şayesteyî nûrên Xweda bûye. Şeyda li murşidê xwe digere. Jê dûr ketiye, bi hesreta wî dişewite û dixwaze bigihêje murşidê xwe. Xuyaye ku Şeyda ji murşidê xwe gelekî hez dike. Lewra du bêjeyên hezkirinê ‘*mehbûb*’ û ‘*dildar*’ bi hev re bi kar aniye. Ev jî dibe delîla hezkirineke zêde.

شهی فاروقی فتح الله حبیبم

نباشد جز وصال تو نصیبم

Ey hebîbê min, Şahê Farûqî Fethullah

Ji gihaştina te pê ve tiştêk bila nebe para min (x.66,b.1)

Ev beyta Şeyda li ser hezkirina murşidê wî Şêx Fethullah Werqanisî (q.s) hatiye honandin. Şeyda di asta hezkirinek mezin de ye. Ew qas ji murşidê xwe hez dike ji gihaştina

wî pêve tişteki naxwaze. Di beyta Şeyda de mehebbet tam xuya dike. Mehebbetek bi rastî û durustî dixuye. Lewra ku ne mehebbetek bi vî rengî be Şeyda daxwaza wîsala mehbûba xwe nedikir.

### 2.13 'Işq

#### 'Işq<sup>492</sup>

Dema hat gotin; 'işq, di hezkirin/mehebbetê de asta herî bilind e', ew dem pêwîst dibe ji 'işqê re çend ast hebin û navê wan astan çî ne, bên gotin. Pênasa ku li jor hat kirin çiqas rast be ewqasî jî kêr e. Rast e 'işq, asta herî bilind e di hezkirin/mehebbetê de, lê beriya ku em bigihêjin hezkirin/mehebbetê çend astên din jî hene. Di berhemên têgehên tesewifê de neh astên îradeyê hatine nasandin. Îrade wek ku tê zanîn xwestine. Dema dil xwest tişteki bike û pêk bîne jê re îrade tê gotin îrade.<sup>493</sup> Li jêr em ê ew astên îradeyê û wateyên wan dest nîşan bikin.

1- **Meyl.** Dil ku tişteki bi xwaze, dilwazî tişteki bibe, Meyl e.<sup>494</sup>

2- **Wel'e.** Xwestina qelb ku bû ji dil Wel'e ye.<sup>495</sup>

3- **Sebabet.** Dema ev xwestina qelb zêde û bi şîd bû navê wê Sebabet e. Di vê astê de dil bi bal tiştê ku dixwaze, jê hez dike diherike. Wek ava ku ji firaqa xwe birije, dil bi bal hezkiriya xwe dirije û diherike.<sup>496</sup>

4- **Şexef.** Bi tevahî ku dil bi hezkiriyê ve hat girêdan û bû meftûn û zebûnê hezkiriyê rewşa Şexefê ye.<sup>497</sup>

5- **Hewa.** Dema hezkirin di dil de hukum kir û wî ji her tiştî dûr xist Hewa ye.<sup>498</sup>

6- **Xerame.** Dema ev hezkirin hukum û fermanrewatî li ser cesed û bedena wî kir hezkirin dibe Xerame.<sup>499</sup>

7- **Hub.** Paşê ku hezkirin hîn zêde bû û ew tiştên ku bûne sedemên meyla qelb ji holê rabûn tê gotin Hub.<sup>500</sup>

<sup>492</sup>Her çend hezkirin/mehebbet û 'işq du bêjeyên wateyên wan nêzî hevbin jî û di gelek berhemên de bi wateyên hevpar hatibin bikaranîn jî, hezkirin/mehebbet dema ku gihîste heddê kemalê jê re tê gotin 'işq. Li gor vê wateyê 'işq, di hezkirin/mehebbetê de asta herî bilind e. Ji ber hindî, me jî xwest di dîwanê de 'işqê ji hezkirin/mehebbetê veqetînin û di beşek cuda de şîrove bikin.

<sup>493</sup> العجم ، ص ، ٦٤٢ .

<sup>494</sup> العجم ، ص ، ٦٤٢ .

<sup>495</sup> العجم ، ص ، ٦٤٢ .

<sup>496</sup> العكيلي، ص ، ٨ .

<sup>497</sup> سيدنادر محمدزاده، "قلب در عرفان اسلامی، عرفان اسلامی" (ادبیان و عرفان)، زمستان ۱۳۹۲، دوره ۱۰، شماره ۳۸؛ دانشگاه آزاد اسلامی، واحد زنجان، گروه ادبیان و عرفان، زنجان، ایران، ص، ۲۳.

<sup>498</sup> العجم ، ص ، ٦٤٢ .

<sup>499</sup> عیسی ، ص ، ٢٠١ .

<sup>500</sup> العجم ، ص ، ٦٤٢ .

8- **Wudd.** Dema helecana û kelecana ket dilê wî û hezkiriya wî di nefsa wî de winda bû di asta Wuddê de ye.<sup>501</sup>

9- **‘Işq.** Helecana û kelecana hezkirinê dema di dil de fûriya, heta ku gihaşt astekê, ku mehbûb di dilê mûhib de winda bû, ‘işq e. Ango ‘işq tunebûna di me’şûqê de ye.<sup>502</sup>

Ji vê pênasê ev encam derdikeve holê; ‘işq, di xwestinê de asta herî bilind e.

‘Işq bêjeyek ji zimanê ‘erebî ketiye nav edebiyatê û di edebiyata kurd û faris û tirkan de gelekî hatiye bikaranîn. ‘Işq, di zimanê ‘erebî de bingeha xwe ji bêjeya ( عشقه ) **‘Işqe** digire.

‘Işqe, navê giyyayê lavlavkê, dargerînekê ye.<sup>503</sup> Lavlavk, devera ku lê şîn dibe xwe li darekê an dîwarekî dipêçe û wê dorpêç dike. Cureyek lavlavkê dema xwe li darê dorpêç dike, ava darê vedixwe. Paşê rengê darê zer dike. Paşê pelê wê hildiweşîne. Paşê darê hişk dike. Darê dixwe rewşekê êdî ji şewitandinê pêve ji tiştêkî re nabe.<sup>504</sup> ‘Işq şibandine curêyê vê lavlavkê. ‘Işq dema digihêje dilê kesekî, xwe li dilê wî dipêçe. Hêz û taqeta wî nahêle. Hestên wî dişikîne. Wî ji xwarin û vexwarinê dûr dike. Di ruhê wî de keder û keser û diltengî û kovan û xemgîniyê çêdike. Rengê serçavê wî zer dike, diçilmisîne. Lal dike, ji qala hezkiriya xwe pê ve nikare tiştêkî bibêje. Paşê yan nexweş dikeve, yan dîn dibe wek mecnûn, dûr dikeve ji civak û însanan, yan hîlak dibe.

Bêjeya ‘işqê di Qurana Pîroz de derbas nabe. Îbnî ‘Erebî di şîroveya ayeta ku di sureyê Beqere de derbas dibe<sup>505</sup> (وَالَّذِينَ آمَنُوا أَشَدُّ حُبًّا لِلَّهِ) *“belê ew ên ku bawerî anîn ji wan bêhtir ji Xwedê hez dikin.”*<sup>506</sup> (أَشَدُّ حُبًّا) bi ‘işqê şîrove kiriye.<sup>507</sup> ‘Işq, ku di mehebbetê de asta herî bilind be, an îfrata mehebbetê be, ku ferheng jî bi wateya îfrata mehebbetê ‘işqê dinasînin<sup>508</sup> wê demê şîroveya Îbnî ‘Erebî di cih de ye.

Ehlê tesewifê destpêka ‘işqê digihêjin beriya afirandina her tiştêkî. Beriya ku Xwedayê Te’ala her tiştêkî biafirîne ‘aşiqê xwe bûye. Şêx Ehmedê Xanî ev ‘işqa Xweda di destpêka Mem û Zînê de wiha diyar dike.

<sup>505</sup> Qurana Pîroz, Beqere, 165.

<sup>506</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 24.

<sup>507</sup> سعاد الحكيم، المعجم الصوفي، الكلمة في حدود الحكمة، دندرة للطباعة، بيروت، لبنان ١٩٨١، ص ٣٠٣-٣٠٢.

<sup>508</sup> حسن عميد، فرهنگ فارسی عميد، انتشارات راه رشد، تهران ١٣٨٩، ص ٧٥٩.

<sup>501</sup> العكيلي، ص ٨.

<sup>502</sup> العجم، ص ٦٤٢.

<sup>503</sup> معين، ج ١، ص ١٠٦٦-١٠٦٦.

<sup>504</sup> بخارايبی، ص ٦٢٢.

Me'şûqî tu yî, bi fexr û naz î  
'Aşiq tu yî, lêkî bê niyaz î<sup>509</sup>

Şeyda jî di helbestên xwe de destpêka 'işqê digihêjîne beriya afirandina her tiştêkî. Beriya afirandina gerdûnê, beriya afirandina însanan, beriya afirandina her çi tiştên ku hene. Şeyda dibêje; Xwedayê Te'ala, beriya ku gerdûn û însanan biafirîne bi tenê bû. Xwe bi xwe bû. Lê dîsa 'işq hebû. Xweda bi xwe 'aşiqê xwe bû. Şeyda di beyta xwe de ev 'işqa Xweda wiha tîne ziman;

یک بو بخوه بویه بوخوه عاشق

حتا کو خدا نیافریدی

Heta ku Xweda te<sup>510</sup> afirand

Yek bû, bixwe bûye bo xwo 'aşiq (x.61,b.2)

Ji bo 'işqê, divê husn, xweşikahî hebe, cemal hebe. Xwedayê te'ala 'aşiqê cemala Xwe bû. Ew cemala ku hemû ehlê 'işqê muştaqê wê ne, ew cemala ku xweşikahiya her tiştî ji wê tê, ew cemala ku kesên bi çûna bihiştê bextewar dibin bendewarê wê ne.

Xwedayê Te'ala xwest ku mexlûqatan/'alema kewnê biafirîne. Sedema xwestina vê afirandinê ev e; Xwedayê Te'ala xwest xwe bide nasîn. Ehlê tesewifê vê yekê ji hedîsa qudsî a ku dibêje (كنت كَنْزًا مَخْفِيًا فَخَلَقْتُ الْخَلْقَ لِيَعْرِفُونِي) 'Ez gencîneyek veşartî bûm, Min xwest Ez bê naskirin, ji ber hindî Min mexlûq afirandin'.<sup>511</sup> Gelek kes vê hedîsê bi hedistî qebûl nekin jî,<sup>512</sup> ehlê tesewifê wek bingeh ji xwe re qebûl kirine. Yek ji ew kesên ehlê tesewifê ku ev gotin weke hedîsek qudsî qebûl kiriye û di berhema xwe de cih daye Melayê Cizîrî ye;

Ger xeberdar î ji sirra "kuntu kenzen" guh bidêr

Da bi sed tore beyan kit me'neyê "lewlak"ê rûh<sup>513</sup>

Şêx 'Ebdurrehmanê Aqtepî jî wek mela difikire. Aqtepî di berhema xwe ya bi navê *Rewdi'n-Ne'im* ê de wiha dibêje.

Îrade dema kir Xwudayê Wedûd

Ku 'alem bikit serteser der wûcûd

Sûdûr bû kalamê mûqeddes qewî

Ku Zatê me teşbîhê kenza xefî

<sup>509</sup> Xanî, *Mem û Zîn*, r. 9.

<sup>510</sup> Di beytê de muxateb Peyxemberê Xweda ye.

<sup>511</sup> 'Erebî, hb. r. 5.

<sup>512</sup> Ergül, hb. r. 262.

<sup>513</sup> Mela Ehmed Cizîrî, *Dîwan*, (Transkripsiyon; Arif Zêrevan) Aras 2014, Hewlêr, r. 79.

Me hezkir ku me'rûfi bit zatê pak

Me anî wûcûd kir xelayîq ji xak<sup>514</sup>

Şeyda hem, vê gotinê wek hedîsa qudsî qebûl dike. Şeyda di vê mijarê de beyta xwe wiha dihone.

درضمیرم نقش اغیارت عبث کردم عبث

كنت كترأ چون شنیدم از دهان غنچه ات

Çi dema ji devê te yê wek xunçeyê min bihîst te gotiye ez gencine me

Di dilê xwe de min neqşê dijminên te bêsebeb bi cih kir (x.27,b.6)

Dema ku min bihîst ji devê te yê wek xunçeya gulê gotina te ya ez 'gencîne me', min beyhûde û bê mifa di qelbê xwe de hezkirina kes û tiştên xeyrê te bi cih kir, neqîşand.

Beriya afirandina mexlûqat û gerdûnê, Xweda ji nûra xwe, nûra Mûhemmed (s.x.l.) afirand. Ehlê tesewifê ji vê nûrê re dibêjin heqîqeta Mûhemmedî (s.x.l.)<sup>515</sup>. Bateyî ev afirandina nûra Mûhemmed (s.x.l.) wiha tîne ziman;

Girtî yek qebde ji nûra xwe Xweda,

Gote wî konî hebîbê Ehmeda.<sup>516</sup>

Xweda ji nûra xwe hinek girt û ji wê nûrê hebîbê xwe Mûhemmed (s.x.l.) afirand. Weke Bateyî, Aqtepî jî vê afirandinê bi heman şeklî rave dike.

Ji ewwel ve yek qebde nûra 'ezîm

Ji nûra xwo girtî Xwudayê Kerîm

Bi emrê Xwuda nûrê pakê Xuda

Mûhewwel şûde bû îmamê Hûda<sup>517</sup>

Piştî afirandina nûra Mûhemmed (s.x.l.) Xwedayê Te'ala ji qetreyek an pertewek nûra Mûhemmedî (s.aw) 'alema kewnê afirand. Gerdûn û hemû tiştê di gerdûnê de hene, çî însan be, çî heywan be, çî dar û ax û av û kevir be hemû ji nûra Mûhemmed (s.x.l.) hatine afirandin. Lewma em dikarin bibbêjin 'îşq sirra afirandina gerdûnê ye. Gerdûn bi ev sirra ku ji 'îşqê derketiye holê hatiye afirandin. Gerdûn ku bi 'îşqê hatibe afirandin, eger em jî parçeyek ji vê gerdûnê bin, kî em jî parçeyek ji vê gerdûnê ne, divê di derûna me de haveynê 'îşqê hebe, û heye. Eger ku di derûnê însan de maye û haveynê 'îşqê tune be gelo sedemek ji jiyanê re ew ê

<sup>514</sup> Aqtepî, hb. r. 29-30.

<sup>515</sup> Cebecioğlu, hb. r. 263.

<sup>516</sup> Mela Huseyn Bateî, *Mewlud'in-Nebî*, Dini Neşriyat Kitabevi, Diyarbakır (Bê tarîx), r. 6.

<sup>517</sup> Aqtepî, hb. r. 30.



bimîne? Ji ber vê em dikarin bibêjin ‘îşq, tehm û zewqa jiyanê ye. Jiyan bi saya ‘îşqê li ser piyan e. Çi ‘îşqa heqîqî be û çi cureyên ‘îşqa mecazî be.

Bi sedema ku tamamê ‘alema kewnê ji nûra Mûhemmedî (s.x.l.) hatiye afirandin, hemû heqîqetên tecelliyatan, hemû heqêqetên Îlahî, hemû heqîqetên ‘alema kewnê di Resûlê Xweda (s.x.l.) de civiyane. Resûlê Xweda (s.x.l.) behra ‘irfanê ye, deryaya ilmê ye. Yekemîn mamoste û hînkerê ilm û ‘îrfanêye.<sup>518</sup> Lewra di merheleyên afirandina nûra Mûhemmedî (s.a.w.) de behra me’rîfetê cihekî girîng girtiye. Bateî vê merheleyê wiha dibêje.

Çon ji behrê me’rîfet ew hate der

Qetre jê werya bi ilham ew qeder<sup>519</sup>

Dema nûra Mûhemmedî (s.aw) ji behra me’rîfetê derket, qetreyek jê werya û ji wê qetreyê hemû peyxember û ‘alema kewnê hat afirandin. Çawa ku afirandina her tiştekî bi nûra Mûhemmedî (s.aw) dest pê kiriye û sedem û mebesta aferîna her tiştekî ye, herwiha zanîna her ilmî û zanîna her tiştekî jî ji wî hatiye. Ew e kan û çavkaniya her tiştî û her zanistê. Herwiha ji bo zanista me’rîfet û tesewifê jî yekem kanî û behr Ew e. Dema Şeyda ku dibêje;

اقتداءً بپیشوای انبیاء گشت فرد

کنت کنزاً چون شنیدم از شکر بار حبیب

Çi dema ji hebîbê te yê wek şeker min bihist te gotiye ez gencine me

Pewrewîtiya pêşewaê enbiya yên te li min ferd bû (x.53,b.4)

vê heqîqetê şanî me dike. Piştî ku Xweda dibêje ‘Ez gencîneyek veşartîme, Min xwest ku Ez bêm naskirin’, êdî ji bo naskirina Xweda rê û rêbaz pêwîst dibin. Şeyda, ev rê û rêbaz bi peyrewîtiya pêşengê hemû nebiyan ku Resûlê Ekrem (s.x.l.) e girêdide. Ji bo ghiştina ev gencîneya veşartî peyrewîtiya nûra Mûhemmedî (s.x.l.) ferz dibîne. Bi vê sedemê nûra Mûhemmedî (s.x.l.) û sebebê afirandina vê nûrê, ‘îşq, hevîr û haveynê tesewif û sofitiyê ye. Bingeha helecan û kelecan, daxwaz û hewes, kêfxweşî û coşa sofî ye.

سرفرازم تالِب خورشید دیدارم چو شمع

گرچه از آب و ترابم نار عشقت مزج شد

Gerçi ez ji av û axê me, bi agirê ‘îşqa te tevlihev bûme

Bi vê serfrazim û rojê dixwazim wek findê (x.57,b.5)

Şeyda di vê beytê de afirandina Hezretî Adem (s.l.) dide ber çavan. Di rastiye de Şeyda bi şexsê xwe ji av û herîyê çênebûye. Ji dayik û bavekî hatiye dinyayê. Şeyda di vê beytê de, di risteya yekem de du xalan tîne ziman. Di xala yekem de jî du xalê din tîne dîtin.

<sup>518</sup> Tenik, *Ahmed Kuddûsî ve Tasavvuf Düşüncesi*, r, 266.

<sup>519</sup> Bateî, hb. r. 6.

Yek, heqîqeta afirandina Hezretî Adem (s.l.) di şexsê xwe de tîne ziman. Rast e, Hezretî Adem (s.l.) bi fermana Qurana Pîroz<sup>520</sup> ( خَلَقَهُ مِنْ تُرَابٍ ) 'Xwedê ew ji axê afirand'<sup>521</sup> ji axê hatiye afirandin. Hemû însan ku benî adem in, yanî, ji nesla Hezretî Adem (s.l.) hatine dinyayê, wekî hemû însanan di eslê afirandina Şeyda de jî, av û ax heye. Şeyda pêşî vê dibêje. Ez jî wek bapîrê xwe Hezretî Adem (s.l.) ji av û axê hatime afirandin. Dudo, ew xûy û xesletên di afirandina Hezretî Adem de (s.l.) hene gihaştiye min jî. Çawa hemû eşya ji nûra Mûhemmedî (s.x.l.) û ew nûr jî ji 'işqê hatiye afirandin, Adem (s.l.) jî ji wê hatiye afirandin. Madem rastî ev e, ev nûr û ev 'işq gihaştiye min jî. Lewma ku Şeyda dibêje herçiqas ku ez ji av û heriyê hatibim afirandin jî, Ey Xwedayê min! 'işqa te bûye haveynê ev afirandina min. Ji ber ku 'işqa te bûye haveynê xulqiyeta min, lewma ez ser bilindim. Her çend ku ez mûmek bim jî bi hêz û taqeta 'işqa di haveynê min de ez daxwaza dîtina rojê dikim. Xala duwem, tewazû û nefsbîçûkbûna Şeyda xuya dike. Herçiqas ku ez ne tiştêk bim, ji ax û avê hatibim afirandin jî agirê 'işqa te gihaştiye min û ez bi ev agirê 'işqa te bûme tiştêk.

'İşq, hest e. Ji bo çêbûna vê hestî, pêdivî bi du tiştan heye. '**Aşiq**, kesê ku hez dike, di dilê wî de hestê hezkirinê çêbûye û **Me'sûq**, kes/kesa ku jê tête hezkirin. Di helbasta jêrîn de Şeyda ev rastiya 'işqê rave dike.

عشق بی معشوق و عاشق چون نباشد در جهان      زان سبب شد فاعلش محمود و مفعولش ایاز

Di dinyayê de 'işqa bê me'sûq û 'aşiq çênabe

Bi vê sedemê kirdeya 'işqê bû Mehmûd û bireser jî Eyaz (x.48,b.2)

Di dinyayê de 'işq bêyî 'aşiq û bêyî me'sûq çênabe. Ji bo hestê 'işqê derkeve holê pêwîst e ku 'aşiq û me'sûq hebin. Şeyda di vê beytê de bi bêjeyên rîzmanî te'rifa 'işqê kiriye. Di vê te'rîfê de; 'işq **pêveber** e. Mehmûd ('aşiq), **kirde** yê pêveberê ye û Eyaz (me'sûq) jî **birêsera** hevokê ye. 'Aşiq kirde ye, lewra, kirdeya reben û belengaz tiştêk namîne ku bi serî de nayê di hundirê hevokê de. Kirde ye ya ku tî dimîne, kirde ye ya ku bîrsî dimîne, kirde ye ya ku jar û reben dibe, kirde ye ya di êgir de dişewite, kirde ye ya ku bi çol û çiyayan dikeve...ûwd. Di hevokêde yê ku van hemû tiştan bi serê kirdeyê tîne bireser e. Şeyda di ev misreya xwe de wateya bêjeyên rîzmanî di bêjeyên 'işqê de bi kar anîne.

<sup>520</sup> Qurana Pîroz, Alî 'Îmran, 59.

<sup>521</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 56.

Şeyda di ev beyta xwe de Siltan Mehmûd û Ayaz mînak dane ji bo ku têkiliya navbera ‘aşiq û me’şûqî baş rave bike. Ayaz xulamê Siltan Mehmûd e. Siltan Mehmûd ‘aşiqê Ayaz dibe û hemû daxwazên Ayaz pêk tîne.<sup>522</sup>

### 2.13.1 Cureyên ‘Işqê

Di tesewifê de du cûreyên işqê hatine nasandin. Îşqa mecazî û ‘işqa heqîqî. Şêx Ehmedê Xanî jî ‘işqê bi du cureyan, ‘işqa heqîqî û mecazî dide nasîn. Şêx Ehmedê Xanî cureyên ‘işqê wiha dinûse.

Bê behrene ew ji ‘işqibazî  
Farix ji *heqîqî* yû *mecazî*<sup>523</sup>

#### 2.13.1.1 ‘Işqa Mecazî

‘Işqa mecazî, ‘işqa ku ne heqîqî ye, ‘işqa ku ne domdar e, ‘işqa ku miweqet e. ji vê ‘işqê re ‘işqa cismanî jî hatiye gotin. Ew ‘işqa di nava mexlûqên/aferîdeyên zîndî de dibe sedema celb û cezma hev û du. Ê ev celb û cezma wan dibe sedema domandina nesl û cinsan.<sup>524</sup> Di vê îşqa mecazî de rêyek vekirî heye ji bo gihaştina ‘işqa heqîqî. Melayê Cizîrî jî wisa aniye ziman.<sup>525</sup> Li gorî nêrîna Melayê Cizîrî rêya gihaştina ‘işqa heqîqî di ‘işqa mecazî re derbas dibe.<sup>526</sup> Bedî‘uzzeman Se‘îdê Kurdî, di mektûbata yekem de vê mijarê tîne ziman û dibêje ‘işqa mecazî dikare veguhere bibe ‘işqa heqîqî.<sup>527</sup> Bi vê sedemê, em dikarin ‘işqa heqîqî wek destpêka ‘işqa mecazî bibînin. Çawa ku Şeyda dibêje:

شد بنزد اهل عرفان تا قیامت سرفراز

عاشق مسکین اگر بگذشت از کاخ مجاز

Aşiqê reben eger derbas bibe ji qesra mecaz

Ew ê bigihêje ehlê ‘îrfanê û heta qiyametê serfiraz be (x.48,b.1)

Şeyda, di beyta jor de ‘işqa mecazî ji bo ‘işqa heqîqî wek buhurekê dibîne. Aşiqê ‘işqa mecazî jî wek feqîrekî, rebenekî dibîne û xuyaye dilê wî pê dişewite. Eger ‘aşiqê reben û belangaz bikaribe di vê buhurê re derbas be ew ê bigihêje ‘işqa heqîqî, bikeve nav ehlê me’rifet û ‘îrfanê û heta qiyamet rabe ew ê şad be, serbilind be, serfiraz be.

<sup>522</sup> عبدالرحمان ختمی لاهوری، شرح عرفانی غزلهای حافظ (تصحیح و تعلیقات: بهالدین خرمشاهی، کورش منصورى، حسین مطبوعی امین) مجلد سوم؛ چاپ چهارم، نشر قطره، تهران ۱۳۷۱، ص، ۱۸۲۴.

<sup>523</sup> Xanî, *Mem û Zîn*, r. 31.

<sup>524</sup> معین، ج- ۱، ص، ۱۰۶۶.

<sup>525</sup> Nesim Sönmez, "Hâfız-ı Şîrâzî – Melayê Cizîrî Karşılaştırması (aşk, gül, bülbül, rinde, züht ve dini semboller açısından)", *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, c. 8, Sayı. 40, 2015, r. 141.

<sup>526</sup> Aşiq er carek ji bala lê bidit berqa mecaz

Dê li nik sahibdilan hetta ebed bit serferaz (Cizîrî, *Dîwan*, r. 103.)

<sup>527</sup> Bediüzzeman Said Nursî, *Mektûbat*, Sözleryaymevi, İstanbul 1994, r. 10.

Bingeha ‘işqa mecaz ji dema ‘*Qalû Bela*’yê tê. Ruhê însan, di ‘alema erwahan de beriya ku were dinyayê heqîqeta xweşikahiyê û cemala mutleq, bêperde û bêhîcab dîtiye. Piştî ku tê dinyayê dema ew xweşikahiya di mexlûqan de dibîne, ku li hemberî a mutleq nisbî û mecazî ye, xweşikahiya mutleq tê bîra wî û xema dûrbûniya ji wê xweşikahiyê dest pê dike. Agirê ‘işqê wî dorpêç dike. Meftûn û dildayê dinyayê dibe. Wek teyrekî di qefesê de be û bixwaze bi rexê wê bifire, ewqas bêçare ye.<sup>528</sup>Wek bulbulekî meftûnê gulê ku li kîjan deverê gulekê dibîne xwe li ser datîne û jê ra dixwîne. Bulbulê ruh jî xweşikahiyekê li ku dibîne bi mebesta cemala mutleq xwe lê digire. Ev hestên hezkirinê bi tevahî, çi mecazî û çi heqîqî tekoşîna gihaştina cemala Xweda ye. Lê ‘işqa mecazî, wek xweşikahiya rûyan ‘işqa cismanî ye, zû derbas dibe, lewra ew xweşikahiya rûyan jî zûka diçe, dom nake. Şeyda di beytên xwe de wiha cih dide vê mijarê.

زان جمالت رونقی زد بر رخم روز الست      آتش عشقت دران دم بر ضمیر انداختی

Di roja ‘ehda elest de ji wê cemala te çîroskek ber çavê min ket

Agirê ‘işqa te ji wê demê de avêt dilê min (x.96,b.2)

Di dema roja ‘*Qalû Bela*’yê de, di bezma elest de, çîrûskek ji xweşikahiya cemala te li ber çavê min ket, min ew xweşikahî dît, agirê ‘işqa te ji wê demê û vir de avête qelbê min û ez ‘aşiqî te bûm. Şeyda, wek ku li jor hate şîrovekirin di roja ‘*Qalû Bela*’yê de çîrûskek ji cemala mutleq dîtiye û ji wê demê de ‘aşiqî wê cemelê bûye. Di vê beytê de, Şeyda jî wek ku li jor hat şîrovekirin destpêka ‘işqa xwe digihêjîne dema ‘*Qalû Bela*’yê.

### 2.13.1.2 ‘İşqa Heqîqî

‘İşqa heqîqî, işqa Xweda ye. Arezû û daxwaza gihaştina Xwedayê Te’ala ye. Daxwaza bi destxistina me’rifeta zatê Xweda, muşahedaye esma û sifate Wî ne.<sup>529</sup> Ev daxwaz bi sedema bidestxistina jiyaneke ebediye ye. Salik dema gihaşt Xweda û bi muşahedaya cemala Wî mest û sermest bû, yekîtiya zana û zanist, aqil û me’qul bi dest dixwe. Bi vî rengî jiyaneke bêdawî bi dest dixwe. Şeyda di beytên xwe de ‘işqa heqîqî wiha rave dike.

ای بلبل روحم بگل سرخ چه کارت      شو آشنه سنبل زلف و رخ یارت

Ey bulbulê ruhê min çi karê te heye bi gula sor

Nas bike û hîn bibe sunbulê<sup>530</sup> zulf û ser çavê<sup>531</sup> yarê (x.19,b.1)

<sup>528</sup> معین ، ج - ١ ، ص ، ١٠٦٦ .  
<sup>529</sup> العجم ، ص ، ٦٤٢ .

<sup>530</sup> Sunbul, di vir de bi wateya girêkê ye. (Kadri Yıldırım, *Ehmedê Xanî Kulliyatî IV, Dîwan*, Avesta yayinlari, İstanbul 2014, r. 87.

Şeyda, ji ew bulbulê ku di qefesa ruhê wî de girêdayiye û dixwaze bi rexê wê cemala ku di bezma elest de dîtiye bifire wiha dibêje. Tu şaş î. Çi karê te heye bi gula sor? Ew tiştê ku tu lê digerî ne gula sor e. Here nas bike û hîn bibe bê ew girêkên li ser perdeyên celal û cemala Xweda ne, çawa ew ê bîn vekirin, û tu dê çawa wê cemelê bibînî. Rêya vekirina wan girêkan fêr bibe. Bigihêje wan tecelliyatên ku ji wê cemelê tên. Şeyda işqa mecazî dişibîne gula sor. Belê, gula sor bi lewn û bihna xwe xweş û xweşik be jî, ne ebedî ye, nisbî ye, zû diçilmise, fanî ye. Cemala Xweda, ebedî ye, dawî lê nayê, her tiştê ku li dinyayê heye xweşikahiya xwe ji vê cemelê girtiye. Lewma, ji bulbulê ruhê xwe re dibêje, pêwîst e tu rê û reçikên gihaştina vê cemala rûyê yara heqîqî fêr bibî. Wek ku ji beytê tê famkirin, Şeyda, 'işqa heqîqî, gihaştin û bidestxistina cemala Xweda dide nasîn.

Di 'işqa heqîqî de me'sûq her Xweda ye, wek di şîroveya me'sûqê de derbas bû. Şeyda vê yekê aşkere dibêje.

او خاتم انبیانه عاشق

معشوق حقیقی هر خدایه

Me'sûqê heqîqî her Xweda ye

Ew xatemê enbiyan e 'aşiq (x.61,b.12)

Ehlê tesewifê ji bo gihaştina Xwedayê te'ala 'işqê wek rêyekê dibînin. Necmeddîn Kubra (q.s) vê mijarê wiha şîrove dike. Rêyên ku mirov digihînin Xwedayê Te'ala bi qasî hejmarên nefesên mexlûqên Xwedayê Te'ala pirr in. Nêzîktirîn rêya bi bal Xweda Siratê Musteqîm e. Lê rêya herî vekirî û rêya ku mirov herî zûtir digihîne Xweda rêya 'işq û mehebbetê ye.<sup>532</sup> Ji ber hindî, ji ehlê tesewifê gelek ev rêya îşqê ji xwe re hilbijartine. Yek ji wan kesên ehlê tesewifê ku rêya 'işqê ji xwe re hilbijartine Şeyda ye.

جز رهی عشقت نشد کس را طریق مستقیم

در ازل نامت که شد الله رحمن رحیم

Di ezel de dema navê te bû Ellah, Rehman û Rehîm

Ji rêya 'işqa Te pê ve ji kesî re rêya rast çênebû (x.68,b.1)

Şeyda rêya 'işqê ji ehlê tesewifê re ji bo gihaştina Xweda rêyek rast dibîne. Şeyda di vê mijarê de wek Necmeddîn Kubra (q.s) nafikire. Necmeddînê Kubra (q.s) rêya 'işqê rêya herî vekirî û rêya herî kin dibîne. Lê Şeyda rêya 'işqê rêya yekem a rast dibîne û ji xeyrê vê rêyê ji bo gihaştina Xweda tu rêyên din qebûl nake.

<sup>531</sup> Zulf û Rux; di vê beytê de bi wateya Sifetê Celal û tecelliyatê Cemala Xweda ne ku pêwîst e bîn veşartin.

Bnr;

نوربخش، ج - ۱، ص، ۵۴.  
<sup>532</sup> لاهوری، مجلد سوم، ص، ۱۵۹۱.

Rêya îşqê her çiqas rêyek gelekî vekirî be û gelekî zûtir ehlê tesewifê digihîne Xweda, lê rêyek gelekî bi xeter e. Bêrêber, yanî murşidê kamil, derbasbûna di vê rêyê de gelekî bi meşaqet û zehmet e. Necmeddîn Kubra (q.s) tehlûke û xeterên ku di ev rêya îşqê de hene wiha tîne ziman û hişyar dike. Di ev rêya ‘îşqê de gelek xefik û feqên dijminan, bûyerên pirr giran, bela û mûsîbetên bêjimar ew ê hebin. Lê belê kesên di bin terbiye û perwerdehiya murşidekî kamil têkeve ev rêya ‘îşqê, helbet ew ê ji van dijminan xelas bibe û astengan derbas bike û ew ê bigihêje meqsed û mirada xwe.<sup>533</sup> Dijminên ehlê tesewifê ên sereke nefis û şeytan in. Nefis û şeytan bi xezebê, bi şehwetê, bi hezkirina mal û ewlad û bi tiştên ku bala salik dikişîne dixwaze wî ji rêya wî dûr bike. Heta dem tê şeytan wek ejderha, mar, ajalan xwe rê salik dide û wî ditirsîne.<sup>534</sup> Divê salik ji vê rewşê agahdar be. Lê eger ne agahdar be, dikeve xeterek mezin. Ji ber hindî pêwîst e ji bo rehabûna ji xeter û tehlûkeyên vê rêyê rêberêkî, murşidekî zana û şareza hebe. Şeyda di ev rêya ‘îşqê de ji xwe re rêberêk hilbijartîye û bi rêberê xwe, murşidê xwe gelekî bi bawer e.

اگر صد دشمن از لشکر بقصد من کمین سازند      چو فتح الله فاروقی شهی لشکر شکن دارم

Eger hezar leşkerê dijminan ji bo min xefika vedin

Lê, yekî bi dijmina dikare, Fethullahê Farûqî (q.s) li pişt min e (x.73,b.7)

Şeyda agahdar e ji xeter û tehlûkeyên rêya ku tê de ye. Ji ew feq û xefikên nefis û şeytan jî haydar e. Lê natirse. Tirsî wî ji wan tune ye. Pişt xwe bi rêberêkî, murşidekî kamil girêdaye û gelekî bi murşidê xwe bawer e. Eger sed leşkerê dijminan kom bibin û bi hev re li ser rêya min xefikan vedin jî ez ji wan natirsim. Lewra yekî wek Şêx Fethullahê Werqanîsî (q.s) min ji xwe re kiriye murşid. Ew murşidekî wisa zana û şareza ye dikare hemû leşkerên nefis û şeytan tîk bibe.

### 2.13.2 Astên ‘aşiqê heqîqî

Çawa ‘îşq di îrade/xwestinê de asta herî jor e, herwiha ‘aşiq jî di hezkirinê de di asta herî bilind de ye. Di berhema ‘Sofîname’ de pîleyên hezkirinê hatine destnîşankirin. Li gorî vê destnîşanê û bi beytên Şeyda em ê astên hezkirinê şîrove bikin.

1- ‘**Abid**. Salik di silûkê de dema ji Xweda re dest bi ta’et û ‘îbadetê dike ji bo gihastina ‘îşqa Xweda jê re ‘*abid*’ tê gotin.<sup>535</sup>

<sup>534</sup> Cebecioğlu, hb. r. 59.

<sup>533</sup> لاهوری، مجلد سوم، ص، ۱۵۹۱.

<sup>535</sup> العبادی، ص، ۲۱۰.

در ازل نامت که شد الله رحمن رحيم

جز رهي عشقت نشد کس را طريق مستقيم

Di ezel de ku navê te bû Ellah û Rehman û Rehîm

Ji xeyrê rêya 'işqa te ji tu kesî re rêyek rast çênebû (x.67,b.1)

Şeyda, fam dike ji xeyrê ew Xwedayê ku navê Wî ji ezelde *Ellah e, Rehman e û Rehîm e*, ji bo gihastina 'işqa Wî tu rê tune ye û pêwîst e 'ibadet û ta'et ji Wî re bê kirin. Bi vê têgihîştinê Şeyda rêya gihastina Xweda ji xwer e aşkere dike. Ew rê 'işqa Xweda ye û encax ew Xwedayê ku ji ezel de navê Wî bûye Ellah, Rehman û Rehîm şayesteyê perestîşê ye.

**2- 'Aqil.** Asta zanebûniyê ye. Salik di vê astê de fam dike, têdigihêje bê bi çi rewşê ew ê bigihêje me'şûq û mehbûba xwe ya heqîqî. Ji vê astê re hatiye gotin *'Aqil*.<sup>536</sup>

پرتو عشق حقیقی در چه می آید ظهور

مظهر علم لدنی باشد اندر کشف راز

Tîrêjê 'işqa heqîqî di çi de xuya dibe?

Dema tu gihast 'ilmê ledun ewê raz kifş bibin (x.48,b.4)

Şeyda têgihastîye ji bo ku bikaribe bigihêje tîrêjên 'işqa heqîqî divê 'ilmê ledun<sup>537</sup> bizanibe. Rêya gihastina tîrêjên 'işqa heqîqî bi dest xistina ilmê ledun e. Dema negihêje 'ilmê ledun, ew tîrêjên ku ji me'şûq tîn û çi sir û raza bi xwe re tînin ew ê fam neke. Ew sir û razên gihastina 'işqa heqîqî bi 'ilmê ledun aşkere dibin û tîn famkirin. Ji bo vê yekê Şeyda ji bo gihastina me'şûqa heqîqî dikoşe ji bo ku bibe mezherê 'ilmê ledun.

**3- 'Arif.** Dema salik me'şûqa xwe nas dike jê re tê gotin *'arif*. Di vê astê de salik gihastîye hin tecelliyên û bi van tecelliyên me'şûqa xwe dinase<sup>538</sup>. Êdî baş têgihastîye di vê rêya 'işqê de çi pêwîst e.

هرکسی دعوا کند عشقت ولی ناید ز دست

جان سپردن پیش چشمت در سر بازار تو

Herkes daxwaza 'işqa te dike lê tiştekan ji dest nayê

Di rêya hezkirina te de divê can bête radest kirin (x.91,b.5)

Şeyda dibêje; herkes dixwaze ku bigihêje 'işqa te. Lê herkesî fam nekiriye û tî negihastîye ku ew ê çawa bighêjin vê meqsed û miradê. Lê min tu nas kiriyî û daxwaz û telebên te jî min re aşina ne û ez têgihastîye divê ez ê çi bikim. Ji bo ku ez bigihêjim tecelliyatên te divê ez canê xwe radestî kaniya feyza te bikim. Asta duwem û sêyem hinek nêzî hev jî be, di asta duwem de zanabûnî, di asta sêyem de nas kirin çêdibe.

<sup>536</sup> العبادی، ص، ۲۱۰.

<sup>537</sup> 'Ilmê ledun; ew 'ilmê ku Xweda davêje qelbê 'evdên xwe. Herwiha jê re 'ilmê wehbî jî tê gotin. (Cebecioğlu, hb. r. 173.)

<sup>538</sup> الباطومی، ص، ۲۵.

**4- Zahid.** Dema salik ji mehbûba xwe pê ve tişteki nexwaze û xwe ji her tiştî biparêze ji salikî re *Zahid* dibêjin.<sup>539</sup> Asta zuhda ‘işqê ye.

من ندارم در جهان جز آرزوی روی تو      صبح و شامان آیه نامی تو ازبر میکنم

Ji xeynê arezûya ruyê te pê ve di dinyayê de tişteki naxwazim

Sibehan û êvaran nîşanên navên te ezber dikim (x.69,b.6)

Şeyda, di beyta jor de, di dinyayê de ji xeynê dîtina rûyê, cemala me’şûqa xwe pê ve tişteki naxwaze. Hemû tiştên dinyayê li pêş çavê wî winda bûne, neyên pêş çavên wî, wan naxwaze, hebûn û tunebûna wan ji Şeyda re wekî hev e. Ji sibehê heta êvarê û ji êvarê heta sibehê hertim nîşanên navên me’şûqa xwe ezber dike. Hemû kar û şuxlê wî ev e. Şeyda di ‘işqê de di halê zuhdê de ye, zahidê ‘işqê ye.

**5- Muxlis.** Dema salik bi rastî, durustî û dilsozî me’şûqa xwe bixwaze, di ‘işqa xwe de sadiq be û bi vê sadiqî û dilsôziyê hêviya ‘işqê jê bike, jê re *Muxlis*<sup>540</sup> tê gotin.

بی چاره تو بی مونس هم مجرم و هم مفلسم      لیکن د عشق مخلصم لبر درگهی شهبال شاه

Bêçare û bêhogirim hem mucrim û hem muflisim

Lê belê di ‘işqê de muxlisim li ber dergêhê şahê şahan (x.87,b.6)

Bê çarebûniya xwe, bê heval û hogirtiya xwe, guneh û xeteyên xwe û bi ev rewşa muflis bûna xwe, dest vala bûna xwe qebûl dike. Lê ev qebûlkirin wek xwestina lêborînê, bexşandinê dest nîşan dike. Tevlî van kêmasiyên wî, di destê wî de yek xisletek heye, ew jî rastî, durustî, sadiqî û dilsoziya wî ya ‘işqê ye. Mebest û armanca ku hatiye ber dergêhê şah ji xwe bi dest xistina ‘işqa me’şûq e. Di ev mebesta xwe de rastgo ye, sadiq e û li ser soza xwe ye.

**6- Muştâq.** Salik çî dema bi ber dostantî û hevaltiya me’şûqê gav avêt, nêzî bi dest xistina ‘işqa mehbûbê bû, hêdî hêdî perde ji ber çavan radibe û xweşikahiya mehbûbê weke tîrêjan li ber çavan dikeve, jê re tê gotin *Muştâq*<sup>541</sup>.

شرابا وصلتنا محبوب زغیروی نهن مرغوب      کو شیدا هر اوه مطلوب نه مشتاقی رخ حورن

Şeraba<sup>542</sup> gihaştina mehbûbê ji xeyrê wî tişteki nayê ecibandin

<sup>539</sup> العبادی ، ص ، ٢١٠ .

<sup>540</sup> العبادی ، ص ، ٢١٠ .

<sup>541</sup> العبادی ، ص ، ٢١٠ .



Ku Şeyda<sup>543</sup> her daxwaz wî ew e ne hewesdarê ruyê horiya ye (x.79,b.9)

Şeyda di beyta jor de wiha dibêje: Kêf û coşa gihaştina mehbûbê, me'şûqê bes e ji min re. Ji xeyrê vê ji min re tu tiştêkî ku êdî ez bi'ecibînim, ji min re hêja be, ez berê xwe bidimê tune ye. Ez di azmûna sadiqiyê, dilsoziyê de bi ser ketime, min asta muxlistiyê derbas kiriye. Ji xwe tiştê ku min teleb dikir jî ev bû, daxwaz dikir jî ev bû, her ev bû, gihaştina bal mehbûbê bû, mebesta min. Min qet xweşikahiya horiyan, delaliya bihiştê ji xwe re nekiribû armanc, ez ne li pey wan bûm. Şeyda, di azmûnê de bi ser ketiye, asta muxlistiyê derbas kiriye, hêdî hêdî ber bi dostantî û hevaltiya me'şûqa xwe gavan davêje, me'şûqa wî ev rê jê re vekiriye, tîrêjên cemala xwe şanî wî daye. Şeyda di asta muştâq bûniyê de ye.

**7- Xelîl.** Li hemberî razîbûna hemû kes û tiştên ku hatine afirandin daxwaza bi dest xistina razî bûna me'şûq e. 'Aşiq, ji me'şûqa xwe pê ve tiştêkî naxwaze, ji me'şûqa wî delaltir tu tiştêk tune ye.<sup>544</sup> 'Aşiq ku di vê rewşê de be jê re *Xelîl* tê gotin.

آتشی سوزان مرگانت نهادم بر وداج

ترک دنیا ترک عقبی کرده ام از عشق تو

Ji 'işqa te me terka dinya û axretê kir

Agirê mijankê te yê bi şewat min danî ser damara xwe ya şah (x.29,b.5)

Şeyda, di risteya yekem de ji bo bi dest xistina 'işqa me'şûqa xwe ne dinya tenê, axîreta xwe jî li rexekê daniye. Dinya û tiştên li dinyayê, axîret û temamê xweşikahî û qencî û nî'metên axîretê daniye rexekî û li hemberî van 'işqa me'şûqa xwe jî daniye rexekî. Lê ji van 'işqa me'şûqa xwe hilbijartiye û terka hemû tiştên din kiriye. Ev hilbijartina Şeyda hilbijartinek bi zanebûnê ye, tercihek e. Dizane encama ev terciha wî ew ê bigihêjê kîjan radeyê. Dizane ku ew 'işqa li pey diçe, dişopîne ew ê wî bibe helakê. Lewma di risteya duwem de dibêje, tîrêjên 'işqa te wek wan tîrên bi agir in, bi şewat in. Ez datînim ser damara xwe ya şah. Ji ber 'işqa te û daxwaza min a di fenabûna 'işqa te de eger ez di vê rêyê de bimirim jî min ne xem e. Mirinek min hebe jî bila ew mirin di rêya 'işqa te de be.

**8- Hebîb.** Salik, temamê hebûna xwe, can û cesedê xwe, daxwaz û xwestekê xwe di rêya me'şûqa xwe de, ji bo razîbûn û qaîlbûna me'şûqa xwe birijîne digihêje asta *Hebîbti*

<sup>542</sup> Şerab; di vê beytê de bi wateya 'kêf û coşê hatiye. Rewşa wan kesên di azmûna sadiqiyê de bi ser ketine tîne ziman (Cebecioğlu, hb. r. 312)

<sup>543</sup> Şeyda, di vê beytê de mexlesa şa'ir e.

<sup>544</sup> کریم آباد ، ص، ۹۶ .

yê.<sup>545</sup> Di vê astê de derd û keder a ‘aşiqî her razîbûna me’şûq e û dîtina cemala wê ye. ‘Aşiq ji bo pêkanîna daxwazên me’şûqê amade ye.

عاشقک نه فایده خواهم مطلباً جانان چه بت      سرنیزر خاکیرا هم هرچی کو سلطان بقیث

رامی امری پادشاهم من رضا آ ته دقیت      از فقیرم بی نصیبم هم غریبم دل کنیب

طالب وصلاً تمه نینه ژ غیر ته طیب

Ez ne ‘aşiqekî xwe perest im, daxwaza mehbûbê çibe

Her tiştê ku siltan bibêje min qebûl e, serê min jê re tewandî ye

Li benda emrê padîşahim, min razîbûna te divê

Ez hejarim bê nesîbim hem xerîbim dil şikestî

Dilxwazê gihaştina te me nîne ji xeyrê te bijîşk (mux.2,bnd.10)

Wek ku Şeyda di beyta jor de tîne ziman. Ji xeyrê daxwaz, xwestek û emrê me’şûqa xwe pê ve ji bo nefsa xwe, ji bo xwe tişteki naxwaze. Emr û fermana me’şûqa wî çibe, serê xwe jê re tewandiye û bi dil û can qebûl kiriye. Amade ye ji bo pêkanîna emrê me’şûqa xwe. Mebesta wî bi pêk anîna ev emr û fermanên me’şûqê her razîbûn û qaîl bûna me’şûqa wî ye. Carek me’şûqa xwe bi *padîşahî* û carek jî bi *siltanî* wesifandiye. Li hemberî van pesnan xwe jî wek ‘ebd û kole dibîne, ku ne heddê ‘ebdan û kolan e ku bikaribin ji emrê padîşah û siltanan derkevin.

**9- ‘Aşiq.** Salik têkeve rewşek wisa ku fena û beqaya xwe, yanî hebûn û tunebûna xwe, ne hin be hin, bi carekê ji bo hebûna me’şûqa xwe telef bike. Ji bo vê ‘işqa xwe qet xwe heqîr û zelîl nebîne. Belkî, di zatê me’şûqa xwe de, di seyr û temaşa cemal û xweşikahiya wê de noq bibe û ji bo me’şûqa xwe dîn bibe<sup>546</sup>. Ew dem ji salikî re tê gotin ‘aşiq.

مارا نبود هیچ فراری که در این جا      بی شبهه شدم سوخته در عشق جمالت

Ji me ra nabe aram û tebatî di vir de

Bêşik ez şewitîm di ‘işqa xweşikahiya te de (x.18,b.4)

Şeyda, ji ber ‘işqa me’şûqa xwe bê sebr û aram e. Di rewşek û haletekî wisa deye ku dixwaze bi ‘işqa wê tune bibe. Êdî hêz û taqet jê re nemaye ku sebir bike û di rewşek aramî de be. Piştî vê rewşê hebûna xwe di rêya me’şûqa xwe de telef dike. Dişewite ji ber wê xweşikahiya ku di rûyê me’şûqa xwe de dîtîye.

<sup>545</sup> تسکین دوست، ص، ۲۳۲.

<sup>546</sup> العبادی، ص، ۲۱۰.

### 2.13.3 Qonaxên ‘işqa heqîqî

Rêya ‘işqê rêyek dirêje. Rêya ‘işqa heqîqî bêtir dirêj e. Gihaştina ‘eşqa Xweda, gihaştina razîbûna Xweda, gihaştina dîtina cemala Xweda ne asan e. Ehlê tesewifê ji bo gihaştina Xweda û ‘işqa Xweda, divê di sê qonaqên ‘işqê de derbas bibin:

- 1- Qonaxa ku ‘işq tê da derdikeve holê.
- 2- Qonaxa ku ‘işq û me’şûq digihêjin hev du.
- 3- Qonaxa tekamula ‘işqê.<sup>547</sup>

#### 1- Qonaxa ku ‘işq tê da derdikeve holê.

Di qonaxa yekem de aşiq ji me’şûqê işqê dixwaze lê me’şûq bi îşwe û naz e. ‘Aşiq li pey me’şûqê digere lê me’şûq dixwaze ‘aşiq ji xwe dûr bike. ‘Aşiq bi girî û nalîn li pey me’şûqê digere, Lê me’şûq hem bi naz e û bi îşwe ye, bi cureyên ezyet û cefayan ‘aşiq ji xwe dûr dike. Lê ev dûr kirin rewşek azmûnî ye. Me’şûq rastî û sadiqtiya ‘aşiq dipêve. Ev qonax destpêka ‘işqê ye.

داری چنین حالت ژ محبوبان عجا ئبتر نمی بینم      وصال قصد میدارم فراقم قصد می

Ez gihaştina te dixwazim, tu dûrbuniya min dixwazî  
Ji mehbûban, ji vê rewşê ‘ecêbtir tişteki din nabînim (x.67.b,7)

Şeyda ‘aşiq bûye. Li pey me’şûqa xwe digere. Daxwaza wî ew e ku bigihêje me’şûqa xwe. Lê mehbûba wî jî dixwaze wî ji xwe dûr bike, nêzîkî xwe neke. Şeyda di rewşek ‘ecêbmayî de ye. Çawa mehbûba wî dixwaze wî ji xwe dûr bike. Ji vê rewşê ‘ecêbtir tişteki nabîne.

دلربایان رحم نبود عاشقان بیچاره اند      بر دل شان میزنند هر لحظه پنجه چو باز

Me’şûq bê rehm in û ‘aşiq jî bêçare ne  
Herdem wek teyrê baz pençeyên xwe li dilê me didin (x.48,b.5)

Şeyda, gilî û gazincê me’şûqan dike. Evanên (me’şûqên) ku dilê me revandine, me ji wan hezkiriye, bêrehm in, dilê wan wek kevirî hişk e. Li hemberî ev bê merhemetiya wan em nedizanin çi karî pêkbînin. Em çawa bikin ku dilê wan nerm bibe û bi çavê şefqet û merhemetê li me mêze bikin. Herdema em nêzîkê wan dibin wek teyrê baz pençeyên xwe li dilê me didin û dilê me dişikînin. Nahêlin em nêzîkî wan bibin. Bi pençeyên xwe me ji xwe dûr dikin.

#### 2- Qonaxa ku ‘aşiq û me’şûq digihêjin hev du

<sup>547</sup> بخارایی ، ص ، ۶۲۹-۶۳۰.

Qonaxa duwem, qonaxa gihaştina me'şûq'ê ye. Dema me'şûqê 'aşiq di azmûna sedeqetê de û şayestiyê de derbaskir û 'aşiq di vê azmûnê de bi serket, êdî me'şûq nerm dibe û rûyê xwe nîşanê 'aşiqî dide. 'Aşiq bi gihaştina me'şûqa xwe mest û sermest e. Xwe di 'işqa wê de winda dike. Li ber çavê wî herkes û her tişt me'şûqa wî ye. Di vê qonaxê de 'aşiq digihêje me'şûqa xwe.

حسنهت جهان گرفته از مصر تا بتبریز

وصلت نشد میسر بی ترک دین و دنیا

Bêyî terk kirin adîn û dinyayê gihaştina te muyesser nebû

Xweşikahiya te ji Misrê heta Tebrîzê dinya zeft kiri ye (x.47,b.7)

Şeyda di azmûna sadiqiyê de derbas bûye. Di azmûnê de me'şûqa wî ji wî xwestiye ku terka dîn û dinyayê bike. Ji xwe divê gerek armanca 'aşiq her gihaştina me'şûqê be, ne bi dest xistina pertalê dinyayê û ni'metên axîretê be. Wekî din tu tiştêk li ber çavî wî tune be. Me'şûqa wî ev yek jê xwestiye ku terka her tiştî bike. Wî jî heman daxwaz û telebên me'şûqa xwe pêk aniye. Piştî bi serkftina azmûnê gihaştîye me'şûqa xwe. Me'şûqa wî ewqas xweşik e, an me'şûqa xwe ewqas xweşik dibîne, ku xweşikahiya me'şûqa wî dinya hemû daye ber xwe. Ji Misrê bigire heta Tebrîzê dinya bi xweşikbûniya wê hatiye dagirtin. Şeyda di husna me'şûqa xwe de mest û sermest di rewşa istîxraqê de ye.

### 3- Qonaxa kamilbûna 'işqê

Qonaxa sêyem, qonaxa kemala'îşqê ye. Di tesewifê de qonaxa ku Hellacê Mensûr, Mewlana û Hafiz anîne ziman ku ji qonaxên 'îşqê ya herî dawî ye.<sup>548</sup> Bi kurtasî em dikarin ji vê qonaxê re bibêjin qonaxa '*Enel Heq*'. Di dîwana Şeyda de, di derbarê vê qonaxê de me tiştêk nedît.

#### 2.13.4 'Aşiq

Kesê/kesa ji kesekî/kesekê hez dike jê re dibêjin 'aşiq. 'Aşiq, kesê/kesa dildayî ye, dilketî ye, zebûn e.<sup>549</sup> Lê ligorî te'rîfa Şeyda, kirde ya hevokê ye 'aşiq. Kirdeya reben, belengaz, dîl, jar û perîşane ji dest bireserê (me'şûqê). 'Aşiq, wek istilahek tesewifî, ew kesên ku li Xweda digerin,<sup>550</sup> ji xeynê Xweda tiştêkî naxwazin û li tiştêkî din nagerin e. Beyta Şeyda eger bête şîrovekirin;

او خاتم انبیانه عاشق

معشوق حقیقی هر خدایه

Me'şûqê heqîqî her Xweda ye

<sup>549</sup> Uludağ, hb. r. 48.

<sup>548</sup> بخارایی، ص، ۶۲۹-۶۳۰.

<sup>550</sup> نوربخش، ج- ۲، ص، ۲۵.

Ew xatemê enbiyan e ‘aşiq (x.61,b.12)

Me’şûqê heqîqî Xweda be, ‘aşiq jî dibe ew kesê ku ‘işqa Xweda di dilê wî de cih girtiye û li pey vê ‘işqê tekoşînê dike. Mebest û armanca wî gihaştina Xweda û bi dest xistina ‘işqa Xweda ye.

Hêjayî gotinê ye ku Şeyda nexwestiye xwe wek aşiq dest nîşan bike. Bi sedema ku Me’şûqê heqîqî Xweda ye û ‘aşiqê heqîqî jî her Resulê Xweda ye (s.x.l.) xwe bi nasnavê ‘aşiq dest nîşan nekiriye. Yanî bêjeya ‘aşiq ji bo xwe bi kar neaniye.

### 2.13.5 Me’şûq

Tiştên, kesê/kesa ku jê tê hezkirin me’şûq e. Dîlber, yar, dildayî, evandî, hebandî, hezkirî<sup>551</sup> giş wateyên me’şûqêne. Di tesewifê de me’şûq her yek e. Ew jî Xwedayê Te’ala ye. Di berhemên istilahê tesewifê de, kesê ku li Xweda digere û ji xeynê mehbûbê heqîqî (ku Xweda ye) kesî naxwaze û li kesî nagere re, gotine ‘aşiq.<sup>552</sup> Yanî ancax ew kes dikare bibe ‘aşiq ku me’şûqa wî Xweda be. Ji ehlê tesewifê re me’şûq her Xweda ye û meram û mebest jî her gihaştina Xweda ye.

Şeyda di vê mijarê de bi aşkerayî fikr û ramanên xwe aniye ziman. Di fikr û ramanên Şeyda û ehlê tesewifê de tu cudahî nayê dîtin.

او خاتم انبيانه عاشق

معشوق حقیقی هر خدایه

Me’şûqê heqîqî her Xweda ye

Ew xatemê enbiyan e ‘aşiq (x.61,b.12)

Li cem Şeyda, me’şûqê heqîqî hertim Xweda ye. Ji xeynê Xweda tu kes û tu tiştek nabin me’şûqê heqîqî. Lê di misra duwem de tiştekî balkêş dibêje. Xatemê enbiya ku Resulê Xweda Mûhemmed (s.x.l.) e wek ‘aşiqê heqîqî dest nîşan dike. Belê, herkes dikare bibe ‘aşiq lê ‘aşiqê heqîqî jî her Resulê Xweda Mûhemmed (s.x.l.) e. Li vir em tê digihêjin, di dînê Îslamê de pêgirtina sunneta Resulê Xweda (s.x.l.) çawa girîng e herwiha di tesewifê de jî, bo ehlê tesewifê şopandina Resulê Xweda (s.x.l.) ewqas girîng e. Beyta Şeyda ku me li jor dest nîşan kiribû heman vê rastiyê tîne ziman.

اقتداءً پیشواً انبیات گشت فرد

کنت کنزاً چون شنیدم از شکر بار حبیب

Çi dema ji hebîbê te yê wek şekir min bihîst te gotiye ez gencine me

<sup>551</sup> Uludağ, hb. r. 237.

<sup>552</sup> سجادی ، ص، ۵۵۶-۵۵۷.

Pewrewîtiya pîşewaê enbiya yên te li min ferd bû (x53,b.4)

Şeyda, ji bo bikaribe bigihêje ew gencineya veşartî, ku Xweda ye, şopandin û lipeyçûna Resûlê Xweda (s.x.l.) wek ferz/nebe nabe dibîne.

Astên hezkirinê û astên ‘aşiqê heqîqî dema em bidin ber hev du em dikarin tabloyek bi vî rengî destnîşan bikin.

**Tablo 1: Astên hezkirinê û astên ‘aşiqê heqîqî**

<b>Astên 'Işqê</b>	Meyl	Wel'e	Sebabet	Şexef	Hewa	Xerame	Hub	Wudd	'Işq
<b>Astên 'Aşiq</b>	'Abid	'Aqil	'Arif	Zahid	Muxlis	Muştaq	Xelîl	Hebîb	'Aşiq

Şayanê gotinê ye şa'irê me Şeyda zor ‘aşiq e. Hîngî di bin bandora ‘işqa xwe de maye mexlesa xwe ya helbestan Şeyda daniye. Şeyda, di ferhengê de bi wateya dînîti, bengîti, mecnûn (kesê ku ji ber evînê xwe winda kiriye), ‘aşiq<sup>553</sup> hatiye. Di tesewifê de coşa ‘işqê ye. Di vî meqamî de ‘aşiq ji bandora ‘işqê xwe ji bîr dike. Dîsa di desewwufê de ji ehlê cezbê jî re Şeyda hatiye gotin.<sup>554</sup> Şa'ir xwe aşiq dibîne û xwe di meqamê ‘işqê de dibîne.

قط نمی یابم قراری زان حبیب بی مثال

دین و شیدا بوم ژ دردی فرقتا شاه دلال

Ez dîn û Şeyda bûm ji dûrketina şahê xweşik

Ez tebatiyekê qet bi dest naxim ji ew hezkiriyê bê hemta (mlm.b,8)

Di beyta jor de şa'ir bêjeya Şeyda hem bi mexlesî û hem bi wateya dîn û ‘aşiq bi kar aniye. Di vê mijarê de ji bo me derket holê ku;

Şeyda, di dîwana xwe de tenê bêjeya ‘işq, ‘aşiq, me'şûq bi kar neaniye. Astên ‘işqê, cûreyên ‘işqê û qonaxên ‘işqê jî di nav helbestên xwe de bi cih kiriye.

Li cem Şeyda m'eshûqê heqîqî Xweda ye û ‘aşiqê heqîqî jî Resûlê Xweda ye (s.x.l.) Însan ji bo ku bikaribe bigihêje m'eshûqê heqîqî divê rê û rêça ‘aşiqê heqîqî bişopîne

Şeyda di ravekirina ‘işqê de wateyên bêjeyên rêzimanî di bêjeyên ‘işqê de bikar aniye.

## 2.14 Dil

### 2.14.1 Dil

Qelb, bêjeyek ‘erebî ye û wateya wê ya kurdî ‘dil’ e. Dil, di jiyannasiyê de, di bedena însan de parçeyek goşt e. Dişibe berika dara çamê û di sînga însandê li rexê çep bi cih bûye.

<sup>553</sup> معین ، ج - ١ ، ص ، ٩٦٩ .  
<sup>554</sup> سجادی ، ص ، ٥١٨ .

Dil, bi wateya ferhengî, zîvirandin, wergerandin û guhertin e.<sup>555</sup> Di hedîsa Resûlullah (s.x.l.) de derbas dibe; dilê mumin di nav tilikên Xweda de ye.<sup>556</sup> Dema ku ji Xweda re tê gotin ( مقلب القلوب ) 'mûqellîb'ul qulûb' wateya vê hedîsê tîne hişê însan ku Xweda dilê însan li gorî daxwaza xwe dikare bizîvirîne.

Di tesewifê de ji bo dil du wate derketine pêş. Yek, ew goştê di bedena însanan û di bedena heywanan de ye, jê re gotine *Dilê Heywanî* an *Dilê Cismanî*. Ya din, letîfeya rebbanî<sup>557</sup> û rûhanî ye ku tîkiliya wî bi dilê cismanî ve heye<sup>558</sup> jê re hatiye gotin *Dilê Rehmanî*. Ravekirina tîkiliya navbera her du dilan wek tîkiliya navbera cism ( rewşa madeyê ku teşe girtiye) û 'eredan (tiştê ku li cisimê peyda dibe. Wek reng, bihn, nermayî) e, an wek tîkiliya navbera ewsaf ( çawanî, çilotî; taybetmendiyên tişteki, durûv û şiklê tişteki) û mewşûfan (yê ku hatiye wesifandin) e.<sup>559</sup> Mebest ji bêjeya dil di Qurana Pîroz de ev dil e. Ev dil bi têgehî taybetmendiyek çanda Rojhilata Navîn e. Di çanda xerbê de nayê dîtin.<sup>560</sup> Naveroka mijara me jî heman dil e.

## 2.14.2 Mertebeyên Dil û Nefsê

Îslam, bi du baskên xwe yên batinî û zahîrî ava ye. Zahîr wekî bedenê ye û batin jî wekî can e. Bedena bê can mirî ye û canê bê beden jî bi kêr nayê. Ji bo gihiştina batin divê pêşî xwe bigihînin zahîr, ji zahîr dest pê bike. Gav avêtina ji bo gihiştina batin destpêka tesewifê ye. Xweda di Quranê de wiha ferman dike:<sup>561</sup> (يا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا آمِنُوا) Xoce 'Ebdullah Ensarî, di tefsîra<sup>562</sup> xwe de vê ayete wiha şîrove dike; "Ey wan kesên ku we bi durustî îman/bawerî aniye, bi tehqîq jî îmanê bînin. We, şerî'et pejirand, heqîqetê jî bipejirînin."<sup>563</sup> Ji vê şîroveyê tê famkirin, mumînê rasteqîn ew kes e ku dervayê wî bi pîvanê şerî'etê hatiye wezinandin û batinê wî bi qada heqîqetê fireh bûye. Ji ber hindî hatiye gotin

<sup>555</sup> Serdar Mutçalı, *Arapça-Türkçe Sözlük*, Dağarcık yayınları, İstanbul 2015, r. 758.

<sup>556</sup> عفت نقابی، "جایگاه دل در مسنوی"، *زبان و ادبیات فارسی (مجله دانشکده ادبیات و علوم انسانی دانشگاه خوارزمی)*: پاییز ۱۳۸۷، دوره ۱۶، شماره ۶۲ (۸)؛ ص، ۱۱۶.

<sup>557</sup> Letîfeya Rebbanî; cewhereke ku tîkiliya wê bi qelbê bedena însan re heye. (Uludağ, hb. r. 228.) Latife; hestek însane ku pirr nazike û xesas e û girêdayî bi dil ve ye. (Kübra, hb. r. 15.)

<sup>558</sup> محمزناده، ص، ۱۴-۱۵.

<sup>559</sup> العجم، ص، ۷۶۵.

<sup>560</sup> Esra Akbalık, "Yunus Emre'nin Şiirlerinde 'Gönül' İmgesi", *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, c. 6, Sayı. 6, 2013, r. 22

<sup>561</sup> *Qurana Pîroz*, Nîsa, 136.

<sup>562</sup> Navê vê tefsîrê (كشف الأسرار و عدة الأبرار) e, lê bi navê 'Tefsîra Xoce 'Ebdullah Ensarî meşhûr bûye.'

<sup>563</sup> ابو الفضل رشيد الدين الميبدی، *كشف الأسرار و عدة الأبرار (به سعی و اهتمام: علی أصغر حکمت)* انتشارات امیر کبیر، چاپ هفتم، تهران ۱۳۸۲، ج. ۲، ص، ۱۹۷.

<sup>564</sup> (اسعید من له ظاهر موافق للشريعة وباطن متابع للحقيقة) 'bextewar ew kes e ku dervayê wî li gorî şerî'etê be û derûnê wî pêgirê heqîqetê be.'

Li gorî mutesewifan, eger kesek ehlê terîqet nebe û tenê bi şer'etê bigire, teqwatiya Xweda bike, emr û nehyên Xweda pêk bîne mumîne. Xweda ji bo vî kesî mihrîban e û bihişt û ni'metên bihiştê dibe nesîbê wî. Lê hêz û taqet û şayestegiya însanan ji vê hîn zêdetir e. Însan dikare ji <sup>565</sup> (أَسْفَلَ سَافِلِينَ) 'nizimtirînê nizman'<sup>566</sup> derkeve û bigihêje (أَعْلَىٰ عَالِيِينَ) 'jortirînê joran'.<sup>567</sup> Xweda hem hêz û taqeta vê yekê daye û hem jî însan şayesteye. Lewra Xweda dibêje: <sup>568</sup> (وَلَقَدْ كَرَّمْنَا بَنِي آدَمَ) 'Sond be, Me ademî xwedanrûmet û rêzdar kirin.'<sup>569</sup>

Ayetên Quranê, ji bo teqwatiya wan kesên pêşketî, gah bi <sup>570</sup> (جَنَّاتٍ وَنَهْرٍ) 'Bostan û çeman',<sup>571</sup> gah bi <sup>572</sup> (مَقْعَدِ صِدْقٍ) 'Dîwaneke heq',<sup>573</sup> û gah bi <sup>574</sup> (عِنْدَ مَلِكٍ مُّقْتَدِرٍ) 'Li cem padişahêki xwedî qudret û destbilind',<sup>575</sup> soz dide. Xoce 'Ebdullah; a yekê, ji bo ehlê şerî'etê, ya duduyan, ji bo ehlê terîqetê/tesewifê û ya sisêyan ji bo ehlê heqîqetê nîşan dide. Gav avêtina bal şerî'etê qalibê însan rewşen dike. Gav avêtina bal terîqetê/tesewifê dile însên rewşen dike. Heqîqet jî can rewşen dike. Ji ber hindî ji ehlê şerî'etê re meqamê (جَنَّاتٍ وَنَهْرٍ), ji ehlê terîqetê re meqamê (مَقْعَدِ صِدْقٍ) û ji ehlê heqîqetê re meqamê (عِنْدَ مَلِكٍ مُّقْتَدِرٍ) hatiye amadekirin û tê pêşiya wan.<sup>576</sup>

<sup>564</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، "دل آدمی و مراتب آن در عرفان اسلامی"، فصلنامه ادبیات عرفانی و اسطوره شناختی، س ۹، ش ۳۳، زمستان ۹۲، ص، ۱۵۴.

<sup>565</sup> *Qurana Pîroz*, Tîn, 5,

<sup>566</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 596

<sup>567</sup> Topbaş, hb, r. 109.

<sup>568</sup> *Qurana Pîroz*, Îsra, 70.

<sup>569</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 288.

<sup>570</sup> *Qurana Pîroz*, Zariyat, 54.

<sup>571</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 530.

<sup>572</sup> *Qurana Pîroz*, Zariyat, 55.

<sup>573</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 530.

<sup>574</sup> *Qurana Pîroz*, Zariyat, 55.

<sup>575</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 530.

<sup>576</sup> المبيد، ج. ۲، ص، ۱۹۷.



Piştî Xoce ‘Ebdullah, peyrevên Îbnî ‘Erebî, van her sê pêlan bi navê sê meqaman; Îslam, Îman û Îhsan anîne ziman. Ev her sê meqam hatiye girêdan bi nefis, rih û sirra Ademî.<sup>577</sup> Nav li van pêlan hatine kirin.

Se’îdeddîn Ferxanî; di mijara hişyarbûna nefisê û perdeyan de dibêje; di hengama ku nefis bi xwe hesiya û ji xewa xefletê hişyar bû û kêmasiyên xwe fam kir sê astên girîng tên pêşiya wê.

1- Destpêka seyr û sulûkê. Di destpêkê de sofî xwe ji temamê edetên xwe (tiştên ku berê dikir) reha bike û destê xwe vekişîne ji şehwatên heywanî. Di vê astê de salik bi tevahî pabendê emr û nehyên Îlahî ye. Ev ast, asta meqamên Îslamê ye.

2- Salik piştî xwe xilas kir ji edetên xwe yê dinyewî û şehwetên heywanî, di batinê xwe de digihêje dinyaya tenêbûniyê û xurbeta sulûkê. Batin bi exlaqê rûhanî dixemile. Digihêje mertebeya Îmanê.

3- Salik piştî xilasiya ji exlaqên dinyewî û xemilandina bi exlaqên melekûtî, perdeyên ‘alema hebûnê dide aliyekî, ji ber xwe radike. We demê canê wî digihêje muşahedeya Heq û di encamê de dibe tewhîdbar. Ev ast girêdayî bi meqamê Îhsanê ve ye.<sup>578</sup>

Li gorî gelek mutesewifan letayifê heftane yê însanan di seyr û sulûkê de, ku ji nefis, qelb, ‘eql, rih, sir, xefa û exfa pêk tînin, bi van her sê meqaman ve girêdayîne. Nefis, di meqamê Îslamê de ye. Qelb û ‘eql di meqamê Îmanê de ye. Her çar letayifên din jî di meqamên Îhsanê de ne. Li gorî baweriya Ferxanî, heta dema insan li vê dinyayê be têkiliya navbera nefis, rih û sîrrê zêde bi hêz e. Bê şik, ev her sê pêl, tam û lezet û kêfxweşiyek taybet di xwe de digirin. Kêfxweşiya nefisê hîsî/dilînî ye, hikmê wî bi asta Îslamê ve girêdayî ye. Kêfxweşiya rih, xeyba îdafi/rolativ/dîmaneyî ye û hikmê wê bi batinê îmanê ve girêdayî ye. Kêfxweşiya sîrrê, xeyba heqîqî/rasteqîn û Heqq e û hikmê wê bi Îhsanê ve girêdayî ye.<sup>579</sup>

---

<sup>577</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص، ۱۵۴.

<sup>578</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص، ۱۵۵.

<sup>579</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص، ۱۵۵.

### 2.14.3 Letayifê Seb'e

Ehlê tesewifê bi gelemperî di seyr û sulûkê de Letaifê Seb'e wiha jimartine:<sup>580</sup> Teb', nefis, 'eql, qelb (rih), sirr, xefî, exfa.<sup>581</sup> Carînan jî, sirr û exfa yek jimartine û qelb û rih jî ji hev du veqetandine. Di seyr û sulûkê de ev heft merhele bi navên merheleyên pêşkeftin û tekamula însan nasandine.<sup>582</sup> Ji ev rêwîtiya salikî di rêya seyr û sulûkê de, ku mebest bi tekamula derûnî gihîştina ba Xweda ye, tê gotin ; “Qewsê su'ûdî”<sup>583</sup>, “seyr-i urûcî/seyra berzbûnê”<sup>584</sup> yanî, meşa bilindbûniyê an meşa berzbûniyê.

### 2.14.4 Teb'

Her kesek, dema ji dayika xwe dibe, xwedî hin hêz û taqetan e. Ji van hêz û taqetan re teb' tê gotin. Teb', tarî ye û famkirin û zanebûnî bi dest nexistiye. Xezalî, di danasîna teb'ê de dibêje; teb' ew sifet û rewş in ku di cesed de civiyane. Xisletê wê tarîti ye. Lewra ne xwedî têgihîştinek û zanebûniyekê ye. Agahiya teb'ê ji wê û ji eslê wê tune ye. Ronahiyeke wê jî tune ye ku bi çavan bikaribe bibîne û tiştekî fam bike. Însaniyeta însan, di derketina ji mertebeya teb'ê û gihîştina zanebûn û me'rîfetê de ye. Yek ji taybetiyên teb'ê, kîngirtin û tolgirtin e. Eger 'eql/hiş teb'ê girênedê ew ê însan bikişîne ser rêya xwar û nerast. Îbnî 'Erebî, teb'ê dişibîne ew perdeyên ser 'eqlê ku dikare di kar û xebatan de kûr û sipehî bifikire.<sup>585</sup> Wek ajalên kovî ye. Divê bête kedikirin.

### 2.14.5 Nefs

Bêjeya nefisê di Qurana pîroz de gelek caran derbas dibe. Di Qurana pîroz de nefis, bi heşt wateyan hatiye<sup>586</sup>. Însan bi hebûna xwe ya di 'alema maddî/hêmanî de, di mertebeya teb'ê û bi hebûna xwe ya tedbîrî/pêşgirî ya bedene di mertebeya nefse de ye.<sup>587</sup> Dema tê gotin

<sup>580</sup> Huseyin Hemdi İbni Huseyn, di berhema xwe de, dibêje letayifên însan deh hebin. Pênc jê ji 'alema emr in û pênc jê ji 'alema xelq/'alema aferîdeyê ne. Letayifên 'alema emrêwiha dijmêre; qelbê Însanî, rihê Rebbanî, sirr, xefî û exfa. Nefsê ji 'alema xelq/'alema aferîdeyê dijmêre. Bnr;

حسين حمدي ابن حسين ، طريق نقشبندية نك اصولني حاوي حسب حال اسالك في اقوام المسالك ، طبعخانه عامره ، استانبول ١٢٦٣ ، ص ، ١١ .  
<sup>581</sup> Necmettin Ergül, di gotara xwe de, nefis nejmartiye. Hejmara wî bi vî şikliye: “kalb”, “ruh”, “sır”, “sırru's-sır”, “hafî” ve “ahfâ” (Necmettin Ergül, “İnsan-ı Kâmil – Güzel Ahlak İlişkisi”, *The Journal of Academic Social Science Studies*, Number: 35, Summer I, 2015, r. 266.)

<sup>582</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص، ١٥٥.

<sup>583</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص، ١٥٣.

<sup>584</sup> Ergül, hb. r. 266.

<sup>585</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص، ١٥٦-١٥٧.

<sup>586</sup> Di derbarê van wateyên nefisê bnr; Altıntaş, hb. r. 37-45.

<sup>587</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص، ١٥٧.

tedbîrî/pêşgiriya bedenê; ew hêz û taqeta ku Xweda daye ji bo; jiyana, xwedîbûn, mezinbûn û zêdebûnê, divê bête famkirin.<sup>588</sup> Ango ji bo berdeyama jiyana hewcehî û daxwazên nefsa ne.

Di seyr û sulûkê de ji bo tekamil/baştirbûna nefsa heft rewşên nefsa hene. Di her rewşekê de navek li nefsa hatiye kirin. Nefsa bi ‘*Emmare*’-tiyê dikeve seyr û sulûkê û bi nefsa ‘*kamîle*’ tekamil/baştirbûna xwe kuta dike.

#### 2.14.5.1 Nefsa Emmare

Nefsa emmare, heta ku nekeve bin kontrola ‘eqil aram nabe û her tim nebaşî û xerabiyê emir dike.<sup>589</sup> Derbarê vê nefsa de Quran wiha difermîne: (إِنَّ النَّفْسَ لَأَمَّارَةٌ بِالسُّوءِ)<sup>590</sup> ‘*Birastî nefsa zêde xerabîxwaze.*’<sup>591</sup> Ev jî tê vê wateyê ku ev nefsa hêj ji bin perdeyên teb’ê derneketiye. Her tim li pey lezetên dinyewî digere. Kibir/quretî, hirs/hêrs/hêç, hesed/çavnebarî, cehalet/nezanî, zulum/zordestî, şewet/bah<sup>592</sup> taybetiyên vê nefsa. Însanê di mertebeya vê nefsa de be, cudahiya wî ji heywanan/ajalan tune ye. Ji vê nefsa re hatiye gotin (نفس حيوانى) ‘*nefisa Heywanî.*’<sup>593</sup> Ji ber hindî mutesewifan ji kesên divê mertebeyê de gotine; ‘*El İnsanu’l heywanî*’<sup>594</sup>, însanê ajal.

Ji bo xelasiya ji vê nefsa, pêşî divê emr û nehyên şerî’etê yê zerûrî<sup>595</sup> pêk werin. Guhdariya xwarin û vexwarinê, hindikiya xewê, hindikkirina axaftinê û gotina bêjeya tewhîdê ‘*La Îlahe Îllellah*’<sup>596</sup> sedemên derbasbûna vê mertebeya nefsa ne.

#### 2.14.5.2 Nefsa Lewwame

Quran, di derbarê vê nefsa de wiha dibêje: (وَلَا أُفْسِمُ بِالنَّفْسِ اللَّوَّامَةِ)<sup>597</sup> ‘*Sond bi nefsa lomekar*’<sup>598</sup> weke ku Quran ferman dike, ev nefsa hay ji xwe heye ku xerabî û neqenciyan

<sup>588</sup> Altuntaş, Servet, *Gazâlî’de Tasavvuf Felsefesi*, Yüksek Lisans Tezî, Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Felsefe ve Din Bilimleri Anabilim Dalı Din Felsefesi Bilim Dalı, Konya 2006, r. 36

<sup>589</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص، ۱۵۷.

<sup>590</sup> *Qurana Pîroz*, Yûsûf, 53.

<sup>591</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 241.

<sup>592</sup> Altuntaş, hb. r. 45.

<sup>593</sup> عزیزالدین نسفی، انسان کامل، ص، ۱۵۹.

<sup>594</sup> Altuntaş, hb. r. 37.

<sup>595</sup> Topbaş, hb. r. 136.

<sup>596</sup> Altuntaş, hb. r. 37.

<sup>597</sup> *Qurana Pîroz*, Qiyame, 2.

<sup>598</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 576.

dike. Ji ber hindî lomê li xwe dike û dixwaze ji xerabiyên vegere.<sup>599</sup> Hinekî ji xefletê xilasbûye û arezûya gunehan kêmbûye. Lê ji ber ku bi temamî ji nefsa emmaretîyê xilas nebûye dîsa guneh û xerabiyên dike.<sup>600</sup> Di vê mertebê de nefis, hin tiştan fam dike, qada zanebûnê firehbûye. Guhdariya ‘eqil dike. Hindik hindik pakkirina me’newî dest pê dike.<sup>601</sup>

Ji bo xelasiya ji vê nefsê, perwerdehiya me’newî, sebata ser tobê, hertim rabûn û rûniştina bi kesên qenc, berdewama rabiteyê, naskirina xuyên neqenc û dermankirina wan<sup>602</sup> wek rê û rêbaz hatine destnîşankirin.

### 2.14.5.3 Nefsa Mulhîme

Di meqamê sisiyan de navê nefsê ‘*Mulhîme*’ ye. Xweda ravekirana rêya hîdayet û delaletê îlhamê vê nefsê dike.<sup>603</sup> Quran di derbarê vê nefsê de wiha dibêje; <sup>604</sup> فَأَلْهَمَهَا فُجُورَهَا

( وَتَقْوِيهَا ) ‘*Vêca sirûşa (îlhama) neqencî û teqwayê nîşan daye.*’<sup>605</sup> Di vê mertebê de însan êdî emr û nehyên dîn li gorî wateyên wan ên zahîrî û bi batinî pêk tîne. Nefs ne serdestê însan e, rih rêbere ji bo însan. Rewşa ‘îşqê di însan de ferwar e.’<sup>606</sup> Ji ‘ilm hez dike, camêre, qenaetkar e, dilnizm e, hêza sebrê û sebatê zêde bûye. Dev ji civakê berdide û berê xwe dide Heqq.<sup>607</sup> Ji fermana <sup>608</sup> (أَدْخُ إِلَى سَبِيلِ رَبِّكَ بِالْحِكْمَةِ وَالْمَوْعِظَةِ الْحَسَنَةِ) ‘*Tu bi zanîn û bi şîreta spehî (mirovên) vexwîne riya Xwedayê xwe*’<sup>609</sup> bi par dibe û axaftinên xweşik û bi hikmet dike.<sup>610</sup>

### 2.14.5.4 Nefsa Mutmeînne

Piştî ghiştina hin rewş û xweşikahiyan di meqamê çaran de navê ‘*Mutmeînne*’ lê hatiye kirin. Di vî meqamî de kul û kederên nefsê bi dawî bûne û qelb ji her tiştî ewle ye.

<sup>599</sup> Altuntaş, hb. r. 46.

<sup>600</sup> Topbaş, hb. r. 137.

<sup>601</sup> Altuntaş, hb. r. 39.

<sup>602</sup> Topbaş, hb. r. 138.

<sup>603</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص، ۱۵۷.

<sup>604</sup> *Qurana Pîroz*, Şems, 8.

<sup>605</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 594.

<sup>606</sup> Altuntaş, hb. r. 39.

<sup>607</sup> Altuntaş, hb. r. 45.

<sup>608</sup> *Qurana Pîroz*, Nehl, 125.

<sup>609</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 280.

<sup>610</sup> Topbaş, hb. r. 140.

Qelbê xwediyê vê nefsê bi bawariyeke rast û temam dagirtiye.<sup>611</sup> Xweda di derheqê vê nefsê de; <sup>612</sup>( يا أَيُّهَا النَّفْسُ الْمُطْمَئِنَّةُ ) ‘Hey nefsa bi bawer û ewle, nefsa piştrast û hedini!’<sup>613</sup> dibêje.

Di vî meqamî de hemû xûy û xisletên nebaş ji însan dûr dibin.<sup>614</sup> Li dewsa wan, exlaqê Resûlê Xweda (s.x.l.) bi kêfxweşiyê bêpênas dijî. Qelb, bi aramî, tewekul, xwesparî û qaîliyê di bandewêde ye. Ev nefs, nefsa kesên ‘arifê bîllah, xwedî teqwa û ehlê yeqînê ye. Qelbê van kesan her tim bi zikrê Xweda meşxûl e û waqîfê batinê ehkamên şerî’etêne.<sup>615</sup>

#### 2.14.5.5 Nefsa Radiye

Ew nefsa ku ji Rebbê xwe kêfxweş û qaîlbûye nefsa ‘Radiye’ ye. Di vê mertebeye de, şadî û xemên dinyayê ji salik re wekî hev in. Tiştên ji Xweda tîn çî şerr be û çî xêr be, bi her tiştî qaîl e.<sup>616</sup> Nefs, ji sîfatên beşerî xilas bûye û gihîştîye fenayê. Emr û nehyên şerî’etê herf bi herf pêk tîne. Exlaqên xweşik tê de xuya dike. Herkes jê hez dike û giramiyê dide wî. Carinan tecelliyatên esma û sîfatên Xweda tê de xuya dibin. Zanebûn di asta Heqqelyeqînê de ye.<sup>617</sup> Quran ji bo vê nefsê wiha dibêje; <sup>618</sup>( اِرْجِعِي إِلَىٰ رَبِّكِ رَاضِيَةً مَّرْضِيَّةً ) ‘Qaîlbûyî û qaîlkirî li Xwedayê xwe vegere.’<sup>619</sup>

#### 2.14.5.6 Nefsa Merdiyye

Di ev meqamê nefsê de, êdî Xweda jî ji nefsê qaîl e. Di ayeta jor de bêjeya ( مَرْضِيَّةً ) di derbarê vê nefsê de ye. Nefs ewqas pak û paqij bûye ku qaîlbûna Xweda bidest xistiye. Nefs, ji Xweda hez dike û Xweda ji nefsê (xwediyê vê nefsê) hez dikê. Quran vê yekê wiha nîşanî me dide: <sup>620</sup>( رَضِيَ اللَّهُ عَنْهُمْ وَرَضُوا عَنْهُ ) ‘Xwedê ji wan razî bûye û ew jî ji Xwedê razî bûne.’<sup>621</sup> Di vî meqamî de, ji xwediyê vê nefsê re, hinek sîrrên xeybê bi îzna Xweda ji wî re eşkere

<sup>611</sup> Altıntaş, hb. r. 47.

<sup>612</sup> Qurana Pîroz, Fecir, 27.

<sup>613</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 593.

<sup>615</sup> Topbaş, hb. r. 141.

<sup>616</sup> Topbaş, hb. r. 144-145.

<sup>617</sup> Altıntaş, hb. r. 47.

<sup>618</sup> Qurana Pîroz, Fecir, 28.

<sup>619</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 593.

<sup>620</sup> Qurana Pîroz, Beyyîne, 8.

<sup>621</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 598.

<sup>614</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص، ۱۵۸.

dibin.<sup>622</sup> Kesên di vî meqamî de şayesteyê ev Hedîsa Qudsî dibin:<sup>623</sup> (فاكون سمعه الذى يسمع به ،  
 ولسانه الذى ينطق به ، وبصره الذى يبصر به ، ) ‘*Ez dibim guhên wî yên ku pê dibihîze, çavên wî yên ku  
 pê dibîne, zimanê wî yên ku pê diaxive.*’

#### 2.14.5.7 Nefsa Kamîle

Meqamê herî bilind û meqamê dawî ye. Bi gelemperî kesên ku digihêjin vê meqamê bi peywira îrşadê tîr erkdarkirin. Ji ber hindî ji vê meqamî re ‘*Meqamê Îrşadê*’ jî hatiye gotin.<sup>624</sup> Tê famkirin ku kesên nefsa wan ne ‘*Kamîle*’ be nabe murşidê heqîqî. Sifatên herî xweşik ên vê nefse ne. Ev nefis, tîgihêştina di kesretê de wehdetê (di piraniyê de yekîtiyê) û di wehdetê de kesretê (di yekîtiyê de piraniyê) bi dest dixê. Temamê rewşa wî qencî û ‘îbadet e.’<sup>625</sup> Xwediyên vê nefse di astekê de ne, dikarin kesan ji xefletê hişyar bikin.<sup>626</sup> Lewra di meqamê îrşadê de ne.

#### 2.14.6 Eql

Însan bi îtîbara fikra zatê xwe, fikra destpêka hebûna xwe û fikra xwe ya di halê xwe yê mehdût/sînorkirî de di mertebeya ‘eql de ye. Eger nefsa emmare di bin desthilatdariya ‘eql de be, ji rutbeya lewwame dest pê bike heta nefsa kamîle dikare bi pêş bikeve. Bi gelemperî dema di berhemên tesewifê de tê gotin nefis - ku bêyî girêdayî bi tiştekî din ve be – mebest nefsa emmare ye. Li hemberî vê nefse ‘eql heye.’<sup>627</sup> Nefis, xuyabûna şeytan, ‘eql xuyabûna heqîqeta firişteyan e di bedena însên de.

Xisletên rezîle yên nefsa emmare, wek; hirs, şehwet, meqamperestî û arezûyên dinyewî, zincîr û pabendê ‘eql in.’<sup>628</sup> Pêwîst e nigên ‘eql ji van zincîr û pabendan bîr rizgarkirin û însan bikaribe azad bibe û bi reqs were qada seyr û sulûkê. Di derûna însan de nefis û ‘eql her tim bi nîqaş û ceng in.’<sup>629</sup> Salik divê bikoşe ku ‘eql serkeftê nefse bibe.

<sup>622</sup> Topbaş, hb. r. 146-147.

<sup>623</sup> Konevi, r. 125.

<sup>624</sup> Topbaş, hb. r.147.

<sup>625</sup> Altıntaş, hb. r. 47.

<sup>626</sup> Topbaş, hb. r.147.

<sup>627</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص، ۱۵۸.

<sup>628</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص، ۱۵۸.

<sup>629</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص، ۱۵۸.

## 2.14.7 Qelb

Însan, bi îtibara mezher/xuyangehek giştî li hemberî esmayên Celaliye û Cemaliye û li hemberî hatina tecelliyên Zatî di mertebeya qelb de ye. Temamê hêzên rûhanî û cismanî ji qelbî derdikevin. Ji ber hindî qelb ne aram e, her tim di veguherandinê de ye û hergav di halê qebd û bestê de ye<sup>630</sup>. Wekî ew parçeyê goştê di bedena însan de ku her deqîqe çend caran dikeve rewşa qebd û bestê û yek lehze aram nabe.<sup>631</sup> Ji ber hindî qelb bûye mezherê ayeta:<sup>632</sup> (كُلَّ يَوْمٍ هُوَ فِي شَأْنٍ) 'Ew, hergav di karekî ji hev cuda de ye.'<sup>633</sup>

Qelb du alî ye. Aliyekî qelb di 'alema rûhanî de ye û aliyekî qelb di 'alema cismanî de ye.<sup>634</sup> Tesewifê giringî daye aliyê qelb ê rûhanî. Ev qelb, navenda yekane ya însan e, hetta hatiye gotin Qelb puxte û xulaseya însane.<sup>635</sup> Mekanê ku Xwedayê Rehman ji xwe re wargeh pejirandiye. Ev der, wasiteye di navbera xelq û Heq de. Cih e ji bo têkiliya bi 'alema erwahan re. Ev qelb, bi têkiliyeke taybet bi 'alema mîsal ve girêdayî ye.<sup>636</sup>

Qelb, di heman demê de, berzexe di navbera dinya û axretê de. Bi gotina Se'deddîn Hemewî 'Neynika Wechê Baqî ye.' Cihê bi hevgerêdana sirra ezel û ebed e, menzîla Quran û Furqanê ye, nazir û menzûrê Padîşah e. Bi pênaseya 'Eynulqudat Hemedanî, heman qelb, lewha Mehfûzê ye<sup>637</sup> (بَلْ هُوَ قُرْآنٌ مَّجِيدٌ \* فِي لَوْحٍ مَّحْفُوظٍ) 'Birastî ew, Qurana Mecîd'e (pîroz û Qedirbilind e). (Ew Quran) di Lewhul Mehfûzê de parastî ye.'<sup>638</sup> û mûxatebê Qelema Xweda ye. Bi pênasa Ehmed Xezalî; qabê qewseynê ezel û ebed e û dîsa qelb, cih û wargeha 'işq û mehebbet, seyr û sulûk, hîkmet û 'ilmê ledunnî ye.<sup>639</sup>

## 2.14.8 Sirr

Însan, bi îtibara rûhaniyeta zat di mertebeya sirrê de ye.<sup>640</sup> Di derheqê sirrê de du nêrînên mûtesewifan hene. Yek; sir, letayifek ji letayifên ruhanî ye û cihê mûshahedeya Heqq'

<sup>632</sup> Qurana Pîroz, Rehman, 29.

<sup>633</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 531.

<sup>637</sup> Qurana Pîroz, Burûc. 21-22.

<sup>638</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 590.

<sup>630</sup> عين القضاة ، ص ، ١٧ .  
<sup>631</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی ، ص ، ١٥٩ .

<sup>634</sup> محمدزاده ، ص ، ١٨ .  
<sup>635</sup> عزيزالدين نسفى ، بيان تنزيل ، ص ، ٢٥ .  
<sup>636</sup> محمدزاده ، ص ، ١٨ .

<sup>639</sup> محمدزاده ، ص ، ١٨ .  
<sup>640</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی ، ص ، ١٦٠ .

e.<sup>641</sup> Du; sir, hal/rewşek e di navbera bende û Xweda de ye û veşartî ye û kesek bi wê nizane.<sup>642</sup>

Sir, veşartînek di navbera hebûn û tunebûnê de ye. Zimanê ‘ilm heqîqeta sirrê negotiye. Nedikare bibêje. ‘Arif bê wasîte ji ber xwe ve dizane û ne mimkun e ku îfşa bike. Ev, yanî sirr, veşarte ne ji keşfên mulk û melekûtê.<sup>643</sup>

Sirr bi sê beşan dabeş kirine. Yek, sirra însanan e. Ev sirr ji rih û rih jî ji qelb tê. Dudu, sirra tiştan e. Ew sirra ku di esmayên Îlahî de xuya dibin. Sisê, sirra Xweda ye. Ji xeyrê nebiyan û bijarteyên weliyan kes pê nizane.<sup>644</sup>

### 2.14.9 Xefî

Însan, bi îtibara ku di wucûda namutenahî de fanî ye û heqîqeta zatê wî ne veşartî ye, di mertebeya xefî de ye. Xefî, latîfeyeke Rebbanî ye û bi emanetî hatiye dayîn ji bo rih. Çi dema tecelliyatên Îlahî xebebe li salikî kir, ji bo qebûlkirina tecelliyatên sîfatên Îlahî di navbera Hedretî Heq û rih de wasîte ye. Tecelliyatên Îlahî ji rih re îfade (rave-şîrove) dike. Sirra<sup>645</sup> (تَخَلَّقُوا بِأَخْلَاقِ اللَّهِ) ‘*Bi exlaqê Xweda xwe xwedan exlaq bikin*’ bi wasîteya xefî hasil dibe. Lewra însan di vê mertebeyê de qabilîyetê peyda dike ji bo bidestxistina sîfatên Xweda û bi te’bîra ‘arifan digihêje (keşfê Sîfatî) keşfa sîfatên Îlahî.<sup>646</sup>

### 2.14.10Exfa

Însan, bi îtibar fenabûna xwe ya di ehediyetê de û beqaya xwe ya di wucûda Siltanê Wucûd de di mertebeya êxfayê de ye. Armanç û mebest ji seyr û sulûkê gihiştina vê mertebeyê ye. Yanî meqamê bendetîya kamil e. Bi rastî, însan bi gihiştina meqamê ‘Fena Fîllah û Beqa Bîllah’ gihiştiye ew tiştê ku herdem di eslê wucûda wî de ye. Lewra Xweda wucûd e û tu tişt nikare ji wucûda wî bîrûn bibe.<sup>647</sup>

<sup>641</sup> سجادی ، ص ، ۴۶۰ .

<sup>642</sup> مرتضای شجاری & زهرا گوزلی ، ص ، ۱۶۱ .

<sup>643</sup> شیرازی ، عبیر العائنین ، ص ، ۵۷۴ .

<sup>644</sup> العجم ، ص ، ۳۶۲ .

<sup>645</sup> عین القضاة ، ص ، ۷۴ .

<sup>646</sup> مرتضای شجاری & زهرا گوزلی ، ص ، ۱۶۱ .

<sup>647</sup> مرتضای شجاری & زهرا گوزلی ، ص ، ۱۶۱ .



Gelek mutesewifan, nefis; wargeha emanetê, qelb; mala me'rîfetê, rih; nîşana muşahedeyê, sirr jî cihê 'işqê nasandine. Lê tekîd kirine ku bes Xweda dizane exfa çi ye û zanebûna bi exfa yê derveyî 'ilmê însanan e.<sup>648</sup>

Bi pênaseya wan mutesewifên ku sirrê, rewşa navbera Xweda û bende dizanin, ji sirrê re sirreke din jî heye, navê wê danîne Exfa. Wek ku Xweda ferman kiriye:<sup>649</sup> (فَانَّهُ يَعْلَمُ السِّرَّ) 'Sirr, ew e ku ji Xweda û bendeyê wî pê ve kes nizane, sirra sirrê jî ew e ku bende jî têngihêjê.<sup>651</sup>

#### 2.14.11 Quran û Dil

Qurana Pîroz, dil; bi cih û wargeha îmanê, me'rîfetê, pêşgêriyek rast, hedan û tebatî, aramiya Îlahî û fam kirinê dide nasîn.<sup>652</sup> (أَفَلَا يَتَذَكَّرُونَ الْقُرْآنَ أَمْ عَلَى قُلُوبٍ أَقْفَالُهَا) 'Erê ma ew li Qurane nafikirin, an jî ma li ser dilê wan kilî hene?<sup>653</sup> <sup>654</sup> (أُولَئِكَ كَتَبَ فِي قُلُوبِهِمُ الْإِيمَانَ وَأَيَّدَهُم بِرُوحٍ) 'Ha ew, Xwedê di dilên wan de îman nivîsiye û bi cih kiriye, bi alîkarî û piştgiriyê ji cem xwe ew xurt kirine<sup>655</sup> <sup>656</sup> (فَأَمَّا الَّذِينَ فِي قُلُوبِهِمْ زَيْغٌ فَيَتَّبِعُونَ مَا تَشَابَهَ مِنْهُ ابْتِغَاءَ الْفِتْنَةِ وَابْتِغَاءَ تَأْوِيلِهِ وَمَا يَعْلَمُ) 'Vêca herçî kesê kudi dilê wan de ji rastiye averêbûn heye, ji bo derxistina fitnê û da ku te'wîla ayetan (ji cem xwe ve) lê bînin, dikevin pey ayetên muteşabih. Hal ev e ku ji Xwedê pê ve tu kes te'wîla wan nizane<sup>657</sup> Qurana Pîroz zanebûn û agahiyê bi dil û nezanebûn û bê agahiyê jî bi korbûniya dil dest nîşan dike.<sup>658</sup> (أَذَانٌ يَسْمَعُونَ بِهَا فَإِنَّهَا لَا تَعْمَى الْأَبْصَارُ وَلَكِنْ تَعْمَى الْقُلُوبُ الَّتِي فِي الصُّدُورِ) 'Erê ma ew li ser erdê nagerin, vêca ku ji wan re dil hebin ku pê têngihêjin û ibret bigrin û guh hebin pê seh bikin û fehm bikin. Vêca birastî korayî ne korayiya çehvan e, belkî korayiya dilê di sîngan de ye.<sup>659</sup> Ev

<sup>648</sup> المبيد، ج. ٦، ص. ١١٢.

<sup>649</sup> Qurana Pîroz, Taha, 7.

<sup>650</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 311.

<sup>652</sup> Qurana Pîroz, Muhammed, 24.

<sup>653</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 508.

<sup>654</sup> Qurana Pîroz, Mûcadele, 22.

<sup>655</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 544.

<sup>656</sup> Qurana Pîroz, Alî 'Imran, 7.

<sup>657</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî. r. 49.

<sup>658</sup> Qurana Pîroz, Hec, 46.

<sup>659</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 336.

<sup>651</sup> مرتضا شجاری & زهرا گوزلی، ص. ١٦٢.

korbûnî ya dil taybetiyek însanê gunehkar e ku Xweda di Qurana pîroz de bi ‘qesweta dil’ dide nasîn.<sup>660</sup> ( فَلَوْلَا إِذْ جَاءَهُمْ بِأُسْنَا تَصْرَعُوا وَلَكِنْ قَسَتْ قُلُوبُهُمْ وَزَيَّنَ لَهُمُ الشَّيْطَانُ مَا كَانُوا يَعْمَلُونَ )<sup>661</sup> ‘Vêca dema ezabê me bi ser wan de hat, de bila wan bi bal me ve bikira zarezar. Lê belê dilên wan hişk bû û şeytan jî ya ku wan dikir ji wan re dixemiland û li ber çavê wan xweş dikir<sup>661</sup>, Quran vê qesaweta dil wek perdeyekê dinase ku Xweda daniye ber dilê însanan da ku ji rastiye dîr bikeve.<sup>662</sup> ( وَمِنْهُمْ مَنْ يَسْتَمِعُ إِلَيْكَ وَجَعَلْنَا عَلَى قُلُوبِهِمْ أَكِنَّةً أَنْ يَفْقَهُوهُ وَفِي آذَانِهِمْ وَقْرًا وَإِنْ يَرَوْا كَلِمًا إِتْرَابًا فَهُمْ لَا يُؤْمِنُوا بِهَا حَتَّى إِذَا جَاءُوكَ يُجَادِلُونَكَ يَقُولُ الَّذِينَ كَفَرُوا إِنْ هَذَا إِلَّا أَسَاطِيرُ الْأَوَّلِينَ (Resûlê min!) Hin ji wan (dema tu Quranê dixwîni) li te guhdarî dikin. Me li ser dilê wan perde û di guhên wan de jî giranî danî da ku ew tenegehîjin. Çendî ew tevekê mucîzeyan bibînin jî dîsa ew ê bawer nekin. Çi dema tene cem te, bi te re nîqaşê dikin û dibêjin: Ev çîrokên pêşiyên pê ve ne tiştêkî din e.’<sup>663</sup>

Lê belê dil, bi alikariya ew Xwedayê ku ji dilê însan agahdar e dikare wê perdeyê bide alî û xwe bigihîne rastiyan.<sup>664</sup> ( لَقَدْ رَضِيَ اللَّهُ عَنِ الْمُؤْمِنِينَ إِذْ يُبَايِعُونَكَ تَحْتَ الشَّجَرَةِ فَعَلِمَ مَا فِي قُلُوبِهِمْ فَأَنْزَلَ )<sup>664</sup> ‘Sond be, Xwedê ji mumînan razî bûye wê dema ku wan li binê darê peyman dayî te. Vêca bi (rastî û wefadarî) ya ku di dilê wan de heye Xweda zaniye, êdî aramî û tenahî bi ser wan de şand û bi vekirina rêke serkeftineke nêzîk ( bi fetha Xeyberê) ew xelat kirin.’<sup>665</sup> Dema Xweda dil pak û paqij kir, perdeyên ber dil rakir wê demê dil dibe şayesteyê huzûra Îlahî û aramiya îlahî. Çawa ku Quran kerem dike<sup>666</sup> ( هُوَ الَّذِي أَنْزَلَ السَّكِينَةَ فِي )<sup>666</sup> ‘Ew Xwedayê ku aramiyê dixwe dilê mumînan da ku îmana wan xurt û zêde bibe.’<sup>667</sup>

Li ser ev nasandina Qurana Pîroz du wesfê dil derdikeve holê. Sefwet, paqijîya dil û Qeswet, hişkbûniya dil. Qeswet ji xwarina heram çêdibe<sup>668</sup>. Kesên ku heram bixwe dilê wî

<sup>660</sup> Qurana Pîroz, En’am, 43.

<sup>661</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 131.

<sup>662</sup> Qurana Pîroz, En’am, 25.

<sup>663</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 129.

<sup>664</sup> Qurana Pîroz, Feth, 18.

<sup>665</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 512.

<sup>666</sup> Qurana Pîroz, Feth, 4.

<sup>667</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 510.

<sup>668</sup> سجادی ، ص ٣٨٩.

hişk dibe, reş dibe. Kesên ku helal bixwe li gorî ayeta çaran a sureya Feth aramî di dil de çêdibe, bawerî zêde dibe û digihêje hezkirina Xweda.

#### 2.14.12 Tesewif û Dil

Di tesewifê de dil û mijarên ku bi dil ve girêdayî ne ewqas girîng hatiye dîtîn ji ehlê tesewifê û meşayîxan re tebîbî dil-bijîşkê dil hatiye gotin.<sup>669</sup> Dema tebîb hebe tê fam kirin ku nexweşî û nexweş jî hene. Bi sedema hebûna nexweşiya bijîşk pêwîst dibin. Mele Xelîlê Sii'rdî saxkirina nexweşiyên dil ferz dibîne. Di *Nehcu'l-Enam* ê de wiha dibêje;

Ji emradê dil ra nî ferde dewa

Ku hirs û hesed kibr û 'icb û riya<sup>670</sup>

Piştî ku hat selimandin nexweşiyên dil hene û pêwîst e nexweşiyên dil bêtin saxkirin ew dem ji bo saxkirina nexweşiyên bijîşkê divê. Di tesewifê de bijîşkên dil rêberên terîfetê ne. Şeyda hem, murşidê xwe hem tebîb û hem wek serwerê tebîban dipesinîne.

الا ای سرور جمله طیبیان

رخت بنما و ما خود را فدا کن

Ruyê xwe rê me bide û me ji xwe re feda bike

Ey serwerê hemû tebîban (x.75,b.2)

Di tesewifê de meqam û halên di seyr û sulûkê de tînin bi giştî bi dilê însan ve girêdayî ye û di dilê însan de peyda dibe. Mewlana dil, wekî; 'erşê Xweda, nezergaha Xweda, mala Xweda, navenda me'rîfet û 'işqa Xweda û neynika cemala Xweda di helbestên xwe de rave dike.<sup>671</sup> Mewlana jî wek Îmamê Xezalî dil wek neynikekê<sup>672</sup> dinasîne ku şiyar û hêza vê neynikê heye dikare heqîqeta hemû tiştan zelal bike, bibe wargeha tecelliyatên heqîqetên xeybî û muşahedeya wan, dîtina heqîqetên xeybê. Ji bo pêkhatina vê rewşê divê dil ango ev neynik pak û paqij be. Mewlana dema dibêje dil 'erşê Xweda ye, mebesta wî; dilên enbiya û weliyên Xweda ne. Dilên enbiya û ewliya wek neynika şeş alî, şeş rû dinasîne ku enbiya û ewliya bi her şeş rexên vê neynikê digihêjin me'rîfetê û tecelliyatan an ji her şeş rexan ji wan re tecelliyat tînin.<sup>673</sup> Şeyda jî wek Mewlana difikire û vê neynikê bi şeş rexan rave dike.

آمدند از شش جهت بی خیر

لشکر غمهای تو عبد العزیز

'Ebdul'ezîz, leşkerên xemên te

<sup>669</sup> مرتضی شجاری & زهرا گوزلی، ص، ۱۴۰.

<sup>670</sup> Sii'rdî, hb. r. 38.

<sup>671</sup> بهنام فر، محمد & رستمی، صدیقه، "مقام و مرتبه دل در مثنوی"، دو فصلنامه علمی- تخصصی علامه، سال دهم شماره پیاپی ۲۶ بهار و تابستان ۸۹، ص، ۲۵-۲۹.

<sup>672</sup> Nurbol Abubakirov, *Gazzâlî' de Kalb Kavramı*, Yüksek Lisans Tezi, Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Felsefe ve Din Bilimleri Ana Bilim dalı, Din Felsefesi Bilim Dalı, 2009, r. 13-24.

<sup>673</sup> نقابی، ص، ۱۲۰-۱۲۳.

Ji şeş rexan bê xeber hatin (x.44,b.9)

Dema li gorî diyarkirina Mewlana em bifikirin, ku welî bi şeş rexên neynikê dibin mezherê tecelliyatan wê demê em dikarin bibêjin Şeyda jî welî ye. Şeyda ‘arif e.

### 2.14.13 Astên Dil

Ehlê tesewifê li gorî paqijbûna dil û li gorî hatina tecelliyatan ji dil re ast dest nîşan kirine. Secadî ji dil re çar astan rave dike. Astên Secadî ev in;

Sedr → Qelb → Fûad → Şexef.<sup>674</sup>

Kesên ku li ser astên Secadî sê astên din zêde dikin û bi heft astên dil dest nîşan dikin jî hene.

Sîne → Qelb → Şexef → Fûad → Hebbet’ul Qelb → Sewdayê  
Qelb → Muhcet’ul Qelb.<sup>675</sup>

Sîne û Sedr bi heman wateyê, bi wateya sîngê ne. Tê dîtî di navbera her du sefandinan de bes Şexef û Fuad cih guhertine. Şeyda di helbesta xwe de, em dibêjin di helbesta xwe de, lewra helbestek xwe ango ji bo destnîşankirina astên dil nûsiye, wek Secadî çar astan ji bo dil diyar dike. Li jêr em ê astên dil li gorî rêza Şeyda ku di helbesta xwe de nûsiye bi wateyên wan û mînakên beytên Şeyda şîrove bikin.

#### 2.14.13.1 Dil

Dil, hem wargeha nûra Îslamê ye û hem cihê zulmeta kufrê ye. Di ayetên Qurana pîroz de ku li jor hatin destnîşankirin, wek ayetên sûreya Muhammed-24, Mûcadele-22 û Alî ‘Imran- 7 vê wateyê tînin ziman. Di vê astê de Xwedayê Te’ala bi kemenda lutfa Xwe ew dilê jê reviyaye bi bal Xwe ve dikişîne. Li sînga wî nezer dike ta sîneya wî ji daxwazên nefsê û tiştên nepak paqij bibe û têkeve rêya rast.<sup>676</sup> Asta destpêka seyr û sulûkê ye. Tê famkirin ji salikî re nefis neyar e. Divê salik xwe ji nefsê biparêze. Ev alikariya Îlahî ji bo parastina salikî ji nefsê ye.

داد دلم کرد بدان کر بکر

خسرو خوبان که مرا یک نظر

Padîşahê xweşikan ku nêrînek li me

Kir, dilê mi bi wê nêrînek ker ker bû (x.44,b.1)

<sup>674</sup> سجادی ، ص ۳۸۸.

<sup>675</sup> مرتضی شجاری & زهرا گوزلی، ص ۱۶۷.

<sup>676</sup> سجادی ، ص ۳۸۸.

Şeyda hem di beyta xwe de ev rastî aniye ziman. Xweda, nêrînekê li dilê wî dike û dilê wî ji hev parçe parçe dike. Mebesta Şeyda ji ker kirinê ji hev belabûna daxwazên nefsê ye, hilweşandina bid'etan e.

### 2.14.13.2 Qelb

Qelb, wargeha îmanê ye.<sup>677</sup> Wek ku Quran ferman dike.<sup>678</sup> ( كَتَبَ فِي قُلُوبِهِمُ الْإِيمَانَ ) 'Ha ew, Xwedê di dilên wan de îman nivîsiye û bi cih kirîye' Xweda, dîsa nezerekê lê dike, xûy û xisletên nebaş wek, betranî, çavnebarî, quretî, durûtî, çavbirçî bûnî, dijminantiyê ji dilê wî derdixe û wî ji heraman dûr dixwe, wî dixwe rêya rast.<sup>679</sup> Çawa ku Hedîs dibêje; qelb nezergaha Xweda ye;<sup>680</sup> ( إِنَّ اللَّهَ لَا يَنْظُرُ إِلَىٰ أَجْسَادِكُمْ وَلَا إِلَىٰ صُورِكُمْ وَلَكِنْ يَنْظُرُ إِلَىٰ قُلُوبِكُمْ ) 'Xweda li cesedê we û li ser çavê nanihêre, lê, li qelbê we dinihêre'. Heman xesletên ku Mele Xelîlê Sii'rdî wek nexweşiyên dil dîtîye û di *Nehcu'l-Enam* ê de diyar kiriye,<sup>681</sup> li jor me mînakek jê anîbû. Ev ast, asta saxkirina nexweşiyên dil e. Salik bi van nexweşiyên di rêya seyr û sulûkê de nikare gav biavêje. Lewra nexweş e. saxîtiya cesed girêdayî saxîtiya qelb e, bi agahiyên Hedîsa resûlê Xweda (s.x.l.);<sup>682</sup> ( وَإِذَا فَسَدَتِ الْجَسَدُ فَسَدَ الْجَسَدُ ) 'Hişyar bin! Di cesed de parçeyek heye, dema ew selihî cesed giş di selihe, û dema ew çû fesadê cesed giş diçe fesadê. Hişyar bin ew qelb e.' Divê sax bibe ku bikaribe di ev rêya dûr û dirêj de bimeşe.

امتلاً الحوض بما المطر

فامتلاً القلب واداداً كما

Qelbê min tije bû bi wîdadê wekî

Hewdê bi ava baranê tije bibe (x.44,b.2)

Şeyda dibêje; çawa ava baranê tê û hewdî tije av dike, qelbê min tije bû bi wîdadê.

Wîdad ji wuddê hatiye. Bêjeyek Quranê ye.<sup>683</sup> ( وَقَالَ إِنَّمَا اتَّخَذْتُم مِّن دُونِ اللَّهِ أَوْثَانًا مَّوَدَّةَ بَيْنِكُمْ فِي الْحَيَاةِ )

(الدُّنْيَا) 'Got: Bêguman ew a ku ji bilî Xwedê Hûn pûtan dihebînin, ew di

<sup>678</sup> *Qurana Pîroz*, Mûcadele, 22.

<sup>681</sup> *Sii'rdî*, hb. r. 38-47.

<sup>683</sup> *Qurana Pîroz*, 'Enkebût. 25.

<sup>677</sup> مرتضى شجاری & زهرا گوزلی، ص ۱۶۷.

<sup>679</sup> سجادی، ص ۳۸۸.

<sup>680</sup> عیسی، ص ۲۹.

<sup>682</sup> إبراهيم، ص ۱۷.

*navbera we de hezjêkirineke dinyewî ye.*<sup>684</sup> Wudd, astek ji astên hezkirinê hatiye jimartin. Di beşa ‘işqe de derbas bû. Wek ku baran çawa hewzê tije av dike qelbê min jî tije hezkirin bû. Li vir hêjayî gotinê ye, Şeyda ev hatina hezkirinê wek baranê wesifandiye. Baran lib lib tê, dema lib lib tê hewz dereng tije dibe. Şeyda hatina tecelliyatan hêdî hêdî û wek libên baranê bi hatina hindik hindik dide nasîn.

### 2.14.13.3 Şexef

Şeyda rêza Secadî naşopîne, şexefê dixwe pêşiya fûadê. Sê wateyên ferhengî hatine diyarkirin ji bo şexefê. Berbendiya li ser qelb e ku qelb ji her tiştî diparêze, hezkirina ku digihêje hundirê dil û hezkirina ku digêhije zara ser dil.<sup>685</sup> Şexef di Quranê de di sûreya Yûsuf de derbas dibe <sup>686</sup> وَقَالَ نِسْوَةٌ فِي الْمَدِينَةِ امْرَأَتُ الْعَزِيزِ تُرَاوِدُ فَتَاهَا عَن نَّفْسِهِ قَدْ شَغَفَهَا حُبًّا إِنَّا لَنَرِيهَا فِي ضَلَالٍ

(مبين) *‘Hin pîrekên li bajêr gotin: jina serwerî xizmetkarê xwe bi bal xwe ve daxwaz dike, bi rastî jî evîna wî perda dilê wê qetandiye! Bêguman em wê di rêşaşiyêke aşkera de dibînin’*<sup>687</sup> Bes wek têgehek tesewifê di wateya şexefê de yekîtî nayê dîtin. Hin kesan şexef wekî hezkirina însanan nasandiye,<sup>688</sup> hin kesan wekî pêkanîna daxwazên hezkiriyê rave kirine,<sup>689</sup> hin kesan di dil de asta ku hezkirina însanan lê disekine dane nasandin.<sup>690</sup> Li gorî wateyên dil û qelb ku li jor hat dayîn ev wateyên ji şexefê re hatine dayîn bi hev re ne guncav in. Secadî bi vê şêwazê şexefê şîrove dike. Dema nezera Xweda gihaşt şexefa salikî wî ji av û heriyê derbas dike, gava wî davêje meqamê fenayê wê demê sê tişt di sê tiştî de tune dibe. Gerandin di peydabûnê de, nas kirin di nasiyê de û hezkirin di hez kirinê de tune dibe.<sup>691</sup> Pênasa Secadî hîn bêtir guncav e li gorî pênasên li jor hatin destnîşankirin. Lewra dema ku mijar tesewif be û di tesewifê de jî mijar tecelliyat bin divê em pênasa Secadî hilbijêrin.

اذ سلب العقل بلمح البصر

قد شغف القلب بطرف كحيل

Şexefa Qelbê min girt bi ew mijankên bi kil

‘Eqlê min çû bi ew tîrêjên çavan (x.44,b.5)

<sup>684</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 398.

<sup>685</sup> العكيلي ، ص ٨.

<sup>686</sup> *Qurana Pîroz*, Yûsuf, 30.

<sup>687</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 237.

<sup>688</sup> مرتضى شجاری & زهرا گوزلی، ص ١٦٧.

<sup>689</sup> Uludağ, hb. r. 330.

<sup>690</sup> Cebecioğlu, hb. r. 33.

<sup>691</sup> سجادی ، ص ٣٨٨.

Beyta şeyda pênasa Secadî pesend dike. Dema te bi ew mijankên xwe yên bi kil li min mêze kir, nezera te gihaşt şexefa qelbê min, ji xweşî û şahiya ew tecelliyatên te yên ku wek tîrêjan dihatin, hişê min ji serê min çû.

#### 2.14.13.4 Fûad

Fûad, wargeha muşahedeya nûrên xeybê ye.<sup>692</sup> Salik di vê astê de gihaştiye meqamê nêrîna nûrên xeybê. Fûad jî wek şexefê di Qurana Pîroz de derbas dibe.<sup>693</sup> (مَا كَذَبَ الْفُؤَادُ مَا رَأَى) ‘*Dilê wî, ya ku çavê wî dîtî derew dernexistiye.*’<sup>694</sup> Secadî fûadê wiha dinasîne. Dema Xweda nezerek da fûada wî, wî ji hemû peywendiyên wî, ji hemû têkiliyên wî û ji hemû kesan dûr dixe. Kaniya ‘ilm û hikmetê jê re vedike û nûra hîdayetê dide wî.’<sup>695</sup> Her du wate jî nêzî hev in. Salik bi tevahî têkiliyên xwe û hemû kes û tiştan ji hev qut dike. Ji salikî şahî û xweşiya nêrîna tecelliyatan ji her tiştî girîngtir e.

اذ غرب الشمس وليس القمر

ان فؤادی بفراق کتیب

Fûada min bi dûrketina te xemgîn e

Dema ku roj çû ava û hîv jî tune be (x.44,b.6)

Fûada min ji dûrketina te gelekî xemgîn e. Xasma dema ku roj diçe ava û hîv jî xuya nake. Şeyda, dûrketina ji muşahedeyan, ji tecelliyatên ‘ilm û hikmetê aniye ziman. Çi wexta ez ji muşahedeyan bi dûr ketim fûada min bi hesreta wan gelekî xemgîn dibe. Şeyda tecelliyatan wek tîrêj û ronahiya rojê dibîne. Lewma ku dibêje ‘roj çû ava’ û hem wek ronahiya hîvê dibîne, lewma dibêje ‘hîv tune be’. Bi bikaranîna roj û hîvê mebest ronahiya wan e.

Şeyda ev xezel ji jiyana xwe ya me’newî girtiye. Vê yekê di serê xezelê de diyar dike. Lewra di serê xezelê de dibêje (نظر داد دل) nezer li dilê min kir. Eger bi gotina (نظر داد دل) nezer li dil dike, wê demê me yê fam bikira ku Şeyda bes astên dil diyar dike. Bi vê sedemê em têdigihên ku Şeyda rewşa jiyana xwe ya me’newî aniye ziman. Ango Şeyda jiyaye û paşê nivîsandiye.

Şeyda dema di beyta dawî de dibêje (آمدند از شش جهنت بی خبر) ‘*ji şeş rexa hatin*’, em têdigihêjin ku ji şeş rexên neynikê tecellî ji wî re hatine. Li gorî agahiyên ku Mewlana û

<sup>693</sup> Qurana Pîroz, Necm, 11.

<sup>694</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 525.

<sup>692</sup> مرتضی شجاری & زهرا گوزلی، ص ۱۶۷.

<sup>695</sup> سجادی، ص ۳۸۸.

Îmamê Xezalî didin<sup>696</sup> bi tenê heçî ku nebî bin an welî bin dikarin bigihêjên vê qonaxê. Wê demê tê selmandin ku Şeyda welî ye, ango ‘arif e.





## BEŞA SÊYEM

### 3 MECAZ Û SEMBOLÊN TESEWIFÊ

Şa'irên sofî di ş'ir û helbestên xwe de ji bo mehbûb û me'sûqê ezelfî endamek temsîlî avakirine û ji bo her endamekê têgehê nîşan dane. Bi van têgehên hezkirina xwe anîne ziman û sir û razên rêya seyr û sulûke bi van têgehên bi hunera îstî'are û mecazên wêjeyê dest nîşan kirine.

Nûrbexş di serê ferhanga xwe de sedema avakirin û bikaranîna sembol û têgehên sê xalan dest nîşan dike.<sup>697</sup>

- 1- *Zulf, rû û mûyê me'sûqê xweşikahiyek taybet dide şî'rê. Ev bikaranîna mecazî di ş'irê 'aşiqan de ronahiyek daye ş'irên wan. Sofîyan jî bi vê rêyê xwestine ş'irên xwe xweşik û ronahî bikin û bi bêjeyên pir wate şî'rên xwe bixemilînin.*
- 2- *Bi rêya mecaz û îstî'areyan sîfat û qudreta Heq hin bi asanî di heş de dimîne û hîn bi kûrahî di dil de rûdinê. Bi vî şiklî dikarin rewşa xwe bi kesên din bidin famkirin.*
- 3- *Ji bo sir û razên seyr û sulûkê nekevin devê namehrema, lê bes ehlê hal ji beyt û misrayên wan bi par bibin.*

Di vê beşê de em ê ev sembol û têgehên tesewifê ku di dîwana Şeyda de derbas dibin di sê beşan de rave bikin.

- 1- Têgehên têkiliya wan bi mey, xemr û şerabe ve hene.
- 2- Têgehên ku têkiliya wan bi bedena însanan ve hene û xweşikahiyê tînin ziman.
- 3- Têgehên dînî, dîrokî û wekî din.

#### 3.1 Sembol û Mecazên Mey û Şerabê

##### 3.1.1 Saqî

Saqî, di edebiyatê de bêjeyek sereke ye. Helbestavanan ev bêje gelekî bi kar anîne. Saqî hem têgehê wêjeyê ye û hem cûreyek ji teşeyên nezmê ye. Ji ev cure teşeya nezmê re 'saqîname' hatiye gotin. Di derbarê pênasa saqînameyan de wiha hatiye gotin: Bi teşeya mesnewî<sup>698</sup>, bi wezna 'erûzê bi behra muteqarib hatine nivîsandin. Mijarên wek bîranîn,

<sup>697</sup> نوربخش، ج ۱، ص ۱۱.

<sup>698</sup> Mesnewî: Her beytek wê di nava xwe de bi serwa ye:

.....a .....a  
.....b .....b  
.....c .....c

mirin, bê feyde bûna dinyayê, pend, raz û hikmet..û wd. di xwe de digirin. Di saqînameyan de bêjeyên bi saz û şerabê təkildar in wek bade, meyxane, mutrib, cam, mey, şerab, ney bêjeyên sereke ne. Helbestvan derd û kulê xwe ji saqî re dibêje<sup>699</sup>. Di saqînameyan de muxatabê helbestvan saqî ye. Wek kesekî li hemberî mirovî rûne û li derdê mirovî guhdarî bike û cureyên şerabê pêşkêşî mirovî bike.

Di edebiyata milletê misilman de û bi taybetî di edebiyata farisan de gelek saqîname hatine nivîsandin. Ev saqînameyên hatine nivîsandin dibin ku berhemek bi serê xwe bin û dibin ku di nav dîwanan an di berhemê de wek helbestekê an beşekê bi cih bûbe.<sup>700</sup> Di edebiyata farsî de saqînameya Nîzamiyê Gencewî<sup>701</sup>, saqînameya Îbnî Farîd<sup>702</sup>, saqînameya Se'dî<sup>703</sup>, di edebiyata tirkî de saqînameya Aynî<sup>704</sup> wek mînak em dikarin dest nîşan bikin. Di edebiyata kurdî de ji Mem û Zîna Şêx Ehmedê Xanî beşa heftan<sup>705</sup>, di Rewdu'n-Ne'îma Şêx 'Ebdurrehmanê Aqtepî de benda şeşan<sup>706</sup> mînakên saqînameyan in.

Di dîwana Şeyda de li gorî destxeta em li ser xebitîn mesnewiya yekem saqîname ye. Di vê saqînameyê de şa'ir deh caran bangî saqî dike. Di vê saqînameyê de wekî taybetiyên saqînameyan têgehên bi saqî û meyxanê ve girêdayî ne, wekî; *cam, şerab, qedeh, kase, mey, şarib, sebûh* tên dîtin. Mijara saqînameyê tesewif e. Beyta pêşîn a saqînameyê ev e.

که با وی کنم دین و ایمان درست

بیا ساقی با جام روز نخست

Were saqî bi wê cama roja yekem

Ku bi wê dîn û îmana xwe rast bikim (mes.1,b.1)

Yek ji wateyên camê şerab e.<sup>707</sup> Cam di beytê de bi wateya şerabê hatiye. Şerab jî wek ku tê zanîn 'işq e. Şeyda ji saqî ew 'işqa di roja 'Qal û Bela'yê de bi dest xistiye dixwaze.

---

Hemû menzûmeyên dirêj di teşeya Mesnewîyê de hatine nivîsandin. Mesnewî hem navê teşeyek nezmê ye, hem jî navê cureyek berhemên klasîk e. (Hêmin Omar Ahmed, *'Eqîdenameyên Soranî, Nişeyên Waneya Klasîk ên Neçapbûyî, Bingöl 2016.*)

<sup>699</sup> زهرا شفیعیان، بررسی و تحلیل ساقینامه های ادب فارسی (بر اساس پنج شاعر برجسته)، پایان نامه ی کارشناسی ارشد رشته ی زبان و ادبیات فارسی، دانشگاه شهرکرد دانشکده ادبیات و علوم انسانی گروه زبان و ادبیات فارسی، شهرکرد (۱۳۹۲)، ص، ۱۲.

<sup>700</sup> سیداحمد حسینی کازرونی، "تبیین حقایق عرفانی و معرفت شناسی در ساقی نامه های ادبی"، *مطالعات ادبیات تطبیقی (ادبیات تطبیقی)* ۱۳۸۶، دوره ۱، شماره ۲؛ ص، ۳۳-۳۴.

<sup>701</sup> سید احمد پارسا، & محمد آزاد مظهری، "ساقی نامه نظامی گنجه ای و تعداد واقعی ابیات آن" *فصلنامه زبان و ادب فارسی دانشگاه آزاد اسلامی واحد سنندج*، بهار ۱۳۸۹، دوره ۱، شماره ۲؛ ص، ۴۹-۶۶.

<sup>702</sup> محمد رضا برزگر خالقی & رقیه نیساری تیریزی، "بررسی مضامین مشترک ساقی نامه های ابن فارض و فضولی بغدادی" *مسان مبین (پژوهش ادب عرب)*، اسفند ۱۳۸۹، دوره ۲، شماره ۲؛ ص، ۱۹-۱.

<sup>703</sup> سید احمد پارسا، & محمد آزاد مظهری، "ساقی نامه ها نزدیک ترین نوع ادبی به رباعیات خیام"، *ادب پژوهی گیلان سال چهارم بهار ۱۳۸۹* شماره ۱۱، ص، ۶۱-۷۶.

<sup>704</sup> Banu Durgunay, *Seküler Hayatla Tasavvuf Arasındaki İlişkide Köprü Metinler: Sâkînâmeler*, Yüksek Lisans Tezi, İhsan Doğramacı Bilkent Üniversitesi, Ekonomi ve Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Edebiyatı Bölümü, 2013, r. 79-87.

<sup>705</sup> Xanî, Mem û Zîn, r. 34-39.

<sup>706</sup> Aqtepî, hb. r. 45-63.

<sup>707</sup> فرهاد دیوسالار، "تمثیل صفای می و لطافت جام"، *دانشگاه آزاد اسلامی، واحد کرج فصلنامه تخصصی عرفان*، سال پنجم، شماره ۱۹، بهار، زنجان، ص، ۱۳.

Lewra bi wê ‘îşqê dîne xwe û îmana xwe ew ê sererast bike. Dixwaze li ser ew soza di roja ‘Qal û Bela’yê de daye bimîne. Di vê beytê de xuyaye ku mebesta şa’irî ji saqî Xweda ye.

Saqî, di ferhengan de bi wateya ew kesê av an şerabê dide hatiye.<sup>708</sup> Di tesewifê de saqî an Feyyadê Mutleq, Xweda ye, an saqîyê hewdê kewserê, Resûlê Xweda ye (s.x.l.) û an murşidê kamil e.<sup>709</sup> Saqî bi hersê wateyan jî di helbestên tesewifî de tên dîtin.

### 3.1.1.1 Saqî –Xweda ye

Di helbestên tesewifê de saqî, feyyadê mutleq e, Xweda ye. Lewra kaniya ‘îşqê, hezkirin û feydê Xweda ye.

چو قصدیر رنگ دلان میبرد

بده ساقی جامی که جان پرورد

Bide saqî cama ku can perwerde dike

Wek şeraba qesdîrê rengê ji dilan dibe (mes.1,b.11)

Saqî ji ew şeraba ku canê mirovî perwerde dike bîne. Ew şeraba ku wek qesdîr tê de be rengê dilê mirovî dibe bîne. Helbestvan ji saqî şerabê dixwaze û pesnê şerabê dide. Di vê beytê de saqî Xweda ye. Em ji beyta heman li dû vê beytê wê wateyê xweş fam dikin.

بر آورده اند زان بدستش مرام

همه اولیا انبیا کرام

Hemû ewliya û enbiya yên mezin

Merama xwe bi vê bi dest xistine (mes.1,b.12)

Hemû pêxemberên Xweda û weliyên Xweda ji ew şeraba – pesnê wê şerabê li jor hat gotin – saqî daye wan, temamê daxwazên xwe bi dest xistine. Encax Xweda ye daxwazên pêxemberan bi cih tîne. Bi vê beytê em têdigihêjin ku saqî di saqînameya Şeyda de Xweda ye.

### 3.1.1.2 Saqî- Pêxemberê Xweda ye

Şa’irên sofî meşreb di helbestên xwe de Resûlê Xweda (s.x.l.) bi bêjeya saqî anîne ziman. Di axretê de Resûlê Xweda (s.x.l.) ji hewzê kewserê avê dide umeta xwe. Ev bikar anîn ji vê avdayîne hatiye wergirtin.

شافی امراض قلبان الغیاث

ساقی کأس شراب سلسبیل

Saqiyê îşkana şeraba selsebîl

Saxkerê nexweşiyên qelba hey hawar (x.28,b.5)

Selsebîl di bihiştê de navê kaniyê ye ku ehlê bihiştê ji vê kaniyê ava zencebîlê vedixwin. Şa’ir, Resûlê Xweda (s.x.l.) wek saqiyê wê kaniyê dest nîşan dike. Dema ku em li

<sup>708</sup> معین ، ج - ۱ ، ص ، ۸۱۸ .  
<sup>709</sup> حسینی کازرونی ، ص ، ۴۲ .

beytê dinihêrin wek ku ev beyt li ser murşidê kamil hatibe nivîsandin xuya dike. Lê dema em li giştîyê helbestê dinihêrin em têdigihêjin ku şa'ir helbest li ser Resûlê Xweda (s.x.l.) nivîsandiye. Li gorî bîr û baweriyên dînê Îslamê tenê Resûlê Xweda (s.x.l.) roja qîyametê saqiyê ava kewserê ye. Lewra şa'ir di beyta heftan de wiha dibêje;

پیشوائی انبیاء محترم

عاشق و محبوب یزدان الغیاث

Pîşewa ê enbiya ê birêz

‘Aşiq û mehbûbê Yezdan hey hawar (x.28,b.7)

Tu, pêş û pêşengê pêxemberên birêz î, hem ‘aşiq û hem mehbûbê Yezdan î, em hewara xwe bi te tînin. Ji beyta jor hat famkirin ku di helbestê de şa'ir hewara xwe bi Resûlê Xweda (s.x.l.) tîne.

### 3.1.1.3 Saqî - Murşidê Kamil e

Di helbestên tesewifî de yek ji wateyên saqî jî murşidê kamil e. Saqî, murşidê kamil e, lewra murşidê kamil wasite ye ji salikî re ji bo hatina feyd û tecelliyatan. Murşidê kamil rêber e ji bo salik. Salik ji bo gihaştina Xweda û ‘işqa Xweda pêdiviya wî bi murşidê kamil heye. Saqiyê meyhanê bi dayîna şerab û meya cur be cur çawa dilê meyxwuran xweş û aram dike, herwiha murşidê kamil jî bi perwerdehiyên xwe yê cur be cur di rêya seyr û sulûkê de dilê salikî xweş û aram dike. Bi vê sedemê murşidê kamil di helbestên sofîyan de bi saqî hatiye ziman.

توی مقصود توی مطلوب توی شاهد توی مرغوب      توی ساقی توی محبوب توی هر یوسف کنعان

Meqşûd jî metlûb jî şahid jî yê ku tê ecibandî jî tu yî

Saqî jî, mehbûb jî, Yûsufê li Ken'an jî tu yî (x.78,b.6)

Helbestvan di beyta xwe de pesnê murşidê xwe tîne ziman. Di van pesnan de murşidê wî saqî ye jî. Her çend ev beyta jor bişibihin beytên mela jî, ku mela di wan de sifetên Xweda aniye ziman<sup>710</sup>, lê di beyta berya wê de Şeyda, navê murşidê xwe tîne ziman. Bi vî rengî em dizanin ku di beytê de şa'ir qala şêxê xwe dike. beyta Şeyda wiha ye.

الا ای شاه فاروقی ز حال ما تفقد کن      که جودت بحر عمان است منم بنده توی سلطان

Ey şahê farûqî li ser vê rewşa me şefqetê li me bike

Kerema te behra ‘umman e, tu siltanî ez geda me (x.78,b.5)

<sup>710</sup> Huwe l-ewwel huwe l-axir huwe z-zahir huwe l-batin  
Huwe l-me'bûdu we-l-meşhûdu fî kulli l-huwiyyatî (Cizîrî, *Dîwan*, r. 232.)

### 3.1.2 Şerab û Mestî

#### Şerab û Şerbet

Yek ji ew bêjeyên di wêjeya tesewifî û 'irfanî de ji xwe re cihêkî taybet bi dest xistiye şerab e. Ev têgeh, bi taybetî û xisletên xwe yên bêjimar di wêjeya menzûm a Rojhilata navîn de gelek wateyên tesewifî di xwe de dihewîne. Şa'irên mutesewifji bo ravekirina hestên xwe yên derûnî û me'newî û destnîşan kirina 'işq û mehebbeta xwe ya Îlahî ji hin peyv û bêjeyan bi şiklê kînaye û remzan sûd wergirtine ku yek ji van peyv û bêjeyan şerab e. Cara yekem bêjeya şerabê ji teref Bestamî (q.s.) wek têgehek tesewifî hatiye bikaranîn.<sup>711</sup> Piştî bikaranîna Bestamî (q.s.) şerab, wek têgehekî tesewifî di berhemana de cih girtiye.

Di berhemên tesewifî de Ji bo têgeha şerabê wateyên cuda hatine diyarkirin. Her çend wate ji hev cuda bin jî bingeha van wateyan 'işqa Xweda ye. Di vê dinyaya heyînan de her hebûnek ji 'aşîqî re qonaxek şerabê ye. 'Aşîq, te'eyyunat, tecelliyat û wechê me'şûqa xwe di hebûnan de dîtiye û sîtav û şewqa mehbûba xwe dizane.<sup>712</sup> Bi vê sedemê 'aşîq li ku dinihêre her tişt me'şûqa wî ye.<sup>713</sup> (فَإِنَّمَا تُؤَلُّوا فَتَمَّ وَجْهُ اللَّهِ) *Vêca hûn berê xwe bidin ku (kîjan rexî) wechê Xweda (qibla wî) li wir e.*<sup>714</sup> Her tişt mehbûba wî ye. Wê demê di 'işqa Îlahî de her tişt şerab e. Şerab û têgehên bi şerabê girêdayî wek saqî, mey, xemr, kase, bade, qedeh û wd. li ser vê 'işq û mehebbeta Îlahî, kêf û coş û rewşa vê 'işq û mehebbetê hatine watedarkirin.

Bêjeya şerabê di helebestan de hem bi tenê hatiye bikaranîn û hem her helbestvanekî li gorî hestên xwe navek lê daniye û bi vî rengî hatiye bikaranîn. Lê di hin navên şerabê de wek ku lihevkirinek pêk hatiye. Em vê lihevkirinê di *şeraba tehûr*, *şeraba safî*, *şeraba 'işqê* de dibînin.

Şeyda hem wek hemû helbestvanên sofî şerab û navên şerabê di helbestên xwe de bi kar aniye. Li jêr em ê di beytên wî de navên şerabê û wateyên wan şîrove bikin.

### 3.1.3 Şerab

Însan bi rêya 'işqê digihêje Xweda û heqîqetê. Bi rêya 'işqê digihêje ruşt û bê kêmasiya me'newî û bi perr û baskê vekirî ber bi asîmanan perwaz dike. Dema însan şeraba me'newî venexwe ji qalikê heywanî û nezaniyê dernakeve û venaguhêze şiklê însan û meqamê agahî û zanayiyê bi dest naxe. Xuy û xisletên wî nayên guhertin. Bi her halî ev 'işq e ku însan ji rewşa heywanî derdixe û wî bilind dike digihîne peywira însaniyetê. Lewra

<sup>711</sup> حیدرقلی زاده & محبوبه خوش سلیقه ، «باده» و «می» و تعابیر آن در شعر عرفانی فارسی" ، فصلنامه تخصصی عرفان ، سال ششم ، شماره ۲۳ ، بهار ، ص ، ۱۵۱ .  
<sup>712</sup> حیدرقلی زاده & محبوبه خوش سلیقه ، ص ، ۱۵۳ .

<sup>713</sup> *Qurana Pîroz*, Beqere, 115.

<sup>714</sup> Çantay, hb, c.1, r. 48.

temamê erz û nirxên li ba Xweda di wê bandevê de xuya dikin.<sup>715</sup> Şerab ev ‘işq e. Helbestvanên sofî meşreb ev ‘işqa gihâştina Xweda û gihâştina heqîqetê di helbestên xwe de bi têgeha şerabê anîne ziman.

تا نکردی توشه راه حقیقت آن شراب کی شدی از زمره ئی عشاق رویش با مزاج

Heta ku tu vê şerabê nekî zewadeyê rêya heqîqetê

Çawa tu yê bibî yek ji zumreya ‘aşiqên rûyê xuy xweşikê (x.30, b.3)

Heta ku tu vê şerabê nekî tûşe û zewadeyê rêya heqîqetê, tu yê çawa bibî yek ji endamê civata ‘aşiqan. Civata ew ‘aşiqên rûyê wê me’sûqa ku xûy û xisletên wê xweşik e. Şa’irê me di beyta xwe de şerab bi wateya ‘işqa ji bo gihâştina bal Xweda bi kar aniye.

### 3.1.3.1 Şeraba Le’l

Di tesewifê de şerab sedema jiyanek ebedî û bêdawî ye. Jiyanê heqîqî û ebedî bi vexwarina şeraba Îlahî tê bidestxistin.<sup>716</sup> Ew kesên ku bi ‘işqa xwe gihâştine hezkirina Xweda, ango Xweda ji wan hez kiriye, di nav wê hezkirinê de winda dibin. Digihêjin qonaxa me’rîfet û zanebûniyê. Ev yek bidestxistina jiyanek ebedî ye. Hem li gorî dînê Îslamê ew kesên bawermend di bihiştê de jiyanek ebedî bi dest dixin. Bidestxistina vê jiyanê li bihiştê ya ebedî bes bi hezkirina Xweda û pêk anîna emrê Wî pêk tê.

آنکه دیده است خوب رو ترک می کی چون شراب لعل تو هر مرده را حی میکند

Ew kesên ku xweşik dîtine ew ê çawa terka meyê bikin

Lewra şeraba le’lê te her miriyî tîne jiyanê ( x.36, b.1)

Şeyda di beyta xwe de hem têgeha meyê û hem têgeha şerabê bi hev re bi kar aniye. Mey di beyta helbestvan de bi wateya ew kêfxweşiya dilê ‘aşiqî ku bi bîranîna me’sûqê derdikeve holê hatiye. Le’l, xisleta şeraba sor û zela û birqandî ye. Ew kesên ku carekê rûyê te yê xweşik dîtibe ew ê te çawa ji bîr bike. Dilê wî ew ê çawa bi bîranîna te kêfxweş – ev bîranîn û kêfxweşî i’şq e – nebe. Lewra ‘işqa te miriyan jî dide jiyandin. Şeyda jiyanê ebedî bi şeraba le’l aniye ziman.

### 3.1.3.2 Şeraba ‘İşqê

Helbestvanên sofî meşreb di helbestên xwe de gelek wêjekiyê şerabê anîne ziman. Yek ji wêjekiya şeraba me’newî pakkirina nefis û dilê salikî ye.<sup>717</sup> Nexweşiyên dil gelek in. Dil dema ku nexweş be dibe asteng ji salikî re di rêya seyr û sulûkê de. Lewra nexweşiya dil dibe

<sup>715</sup> تسکین دوست ، ص، ۹۵.

<sup>716</sup> دیوسالار، ص، ۱۴۵.

<sup>717</sup> دیوسالار، ص، ۱۴۵.

sedema tarîbûniya dil. Çavbirçîbûnî / hirs, quretî / kibir, zikreşî / buxl, xwe ‘ecibandin /’ucb, rûmetî /riyayî nexweşiyên dil ên ku qelb tarî dikin hatine bilêvkirin.<sup>718</sup> Şeraba ku van nexweşiyên sax dike jê re hatiye gotin şeraba ‘işqê. Dema salik şeraba ‘işqê venexwe dilê wî ji nexweşiyên pak nabe. Dema salikî ev şerab noş kir di dewsa ew xisletên nebaş de di dilê wî de hubba heqîqî cih digire.

تا در شراب عشقت دلق ریا نشستند      از جمله خود پرستان زاهد نگشت پاکیز

Heta di şeraba ‘işqa te de xirqeyê rûmetê rûniştî be

Ji hemû xweperistan zahid nagere xalis (x.47,b.8)

Heta dema ku di şeraba ‘işqa te de xirqeyê riyayê rûniştî be, zahidê xweperest safî û xalis nabe. Şeyda şeraba ‘işqê wek pênasa li jor hat dayîn bi wateya pakbûniyê bi kar aniye. Şeyda di beyta xwe de perwerdehiyek tesewifê jî bi lêv dike û sofîyan hişyar dike. Dibêje heta dema di dilê te de nexweşiyên wek rûmetê û xweperstî hebe dilê te nagere pak û saf.

### 3.1.3.3 Şeraba Kewserê

Şerab, ‘işq û mehebbeta ezeli ye. Ew ‘işq û mehebbeta ezeli ye ku rihê însanan beriya werin vê dinyayê di ‘alema erwahan de peyda kirine. Sozdayîna vê ‘işq û mehebbetê bi ew peyman Xweda ku bi zurriyeta Hezretî Adem (s.l.) girêdaye, dema Xweda ji wan re got (أَلَسْتُ بِرَبِّكُمْ)<sup>719</sup> ‘Ma ez ne Xwedayê we me?’<sup>720</sup> di bersivê de wan jî got (بَلَى) ‘erê’ dest pê kiriye. Ji vê re hatiye gotin mehebbet û ‘işqa ezeli.

شراب کوثر لعلت که در روز ازل خوردم      رواکی باد مستوری که می آلوده شد طینم

Ew şeraba kewsera te ya sor ku min di roja ezel de vexwar

Kengî tu yê bidî min badeya veşartî, herriya min tevlî meyê bûye (x.67,b.2)

Şeyda di vê beyta xwe de sê têgehên tesewifê ku tekiliyên wan bi hev du re hene bi kar aniye. Şerab, bade û mey. Mey, di beytê de heqîqeta Mûhemmedî (s.x.l.) ye. Lewra hemû eşya ji nûra Mûhemmedî (s.x.l.) hatine afirandin. Nûr jî ji ‘işqê hatiye afirandin. Di afirandina Hezretî Adem (s.l.) de heriya wî bi vê nûrê, bi vê ‘işqê hatiye strandin. Lewma şa’ir dibêje heriya min tevlî meyê bûye. Bade, ew hez kirina di destpêka sulûkê de di dilê salikî de ye. Helbestvan ‘işqa ezeli bi şeraba kewserê aniye ziman. Ew ‘işqa lê peyda bûye di ‘alema erwahan de di destpêka sulûka xwe de dixwaze. Hezkirinek heye lê hem hindik e û hem veşartî ye. Ew ‘işqa ezeli dixwaze. Destpêka afirandina xwe jî dike sedema vê xwestinê. Ango

<sup>718</sup> سجادی ، ص ، ۴۹۹.

<sup>719</sup> Qurana Pîroz, E’raf, 172.

<sup>720</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 172.

ez ji dema afirandina xwe de girîftarê 'işqa te bûme, ev ne bes di 'alema erwahan de jî ez mubtelayê vê 'işqê bûme, êdî bes e, ev 'işqa ji min veşartî tu yê kengî ji min re rewya bibînî.

### 3.1.3.4 Şeraba Safî

Şeraba safî, şeraba mestî û serxweşiyê ye. Dema salik ji şeraba me'newî vedixwe mest dibe, ji xwe diçe. Lewra di xweşikahiya zatê me'şûqê de tune dibe. Xwe nema dibîne. Ji ber hindî helbestvanan ev mestiya di xweşikahiya me'şûqê de bi şeraba safî anîne ziman.

ساغر بدست برراق در وی شراب صافی      گفتا بنوش گشتم سرگرم و مست و سکران

Di dest de îskana zelal tê da şeraba xwerû

Got; vexwe, ez bûm mest û serxweş (x.77,b.3)

Di destê mehbûbê de îskana zelal, di îskanê de şeraba safî, ji min re got vexwe. Min vexwar û ez bi vexwarina wê şerabê sergerm û mest û serxweş bûm. Wek ku ji beyta Şeyda xuya dibe şeraba safî bi wateya mestbûna 'işqê bi kar hatiye.

### 3.1.3.5 Şeraba Bê Xeş

Şeraba bê xeş, şeraba ku serxweşiyê nade. Ji yana ku sofî ji 'ez' û 'em' ê 'itibarî dîr dike bê serxweşî ye.<sup>721</sup> Sofî pêwîst e ji hemû qeyd û bendên xwe xilas bibe. Qeyd û bendê herî giring enaniyet e, ezîfî ye. Şeraba bê xeş hişê sofî tîne serê wî û wî ji ezîtiyê azad dike bi destxistina 'işqa me'newî.

مست مدام اولدم اول گلزاره قارشو      اچدم شرابی بی غش دیدار یاره قارشو

Min vexwar şeraba bê xeş li hemberî ruyê yarê

Ez mestê mûdam bûm li hemberî baxê gulan (x.89,b.1)

Mestê mûdam hem têgehek tesewifê ye û bi wateya mehebetta fitrî û tecelliyatên sifatan e.<sup>722</sup> Dema helbestvanê me li hemberî ruyê mehbûba xwe şeraba ku serxweşiyê nade vedixwe ji enaniyeta xwe reha dibe û digihêje mehebbeta ku ji ezel de di fitreta wî de heye.

### 3.1.3.6 Şeraba Tehûr

Helbestvanên mûtesewif ji bêjeyên Qurana Pîroz gelekî sûd wergiritne. Şeraba tehur jî ji Quranê anîne xistine nav helbestên xwe.<sup>723</sup> ( وَسَقِيهِمْ رَبُّهُمْ شَرَابًا طَهُورًا )<sup>724</sup> Xwedayê wan dê ji şerabeke paqij wan av bide.<sup>724</sup> Şerab çawa ku wek avê zelal û rewşen e, bi vê sedemê 'eks û

<sup>721</sup> نوربخش، ص، ۱۰۸.

<sup>722</sup> نوربخش، ص، ۱۰۳.

<sup>723</sup> Qurana Pîroz, Însan, 21.

<sup>724</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 578.



rewşeniya wê di şevê tarî de canê ‘aşiq rohnê dike.<sup>725</sup> ‘Işqa me’newî nûr û ronahiya çavên ‘aşiq zêde dike. Ne tenê dil û çavên ‘aşiq belkî temamê zerratan ji nûra şeraba me’şûqê ronahiyê peyda dike û bi nûr dibe. ‘Işqa ku nûrê di dil û canê ‘aşiq de peyda dike bi şeraba tehûr hatiye nasandin.

کران قلب مشتاق می تافت نور

بده ساقی جامی شراب طهور

Bide saqî qedeha şeraba tehûr

Ku jê dilê hewesdar nûr çirûskan dide (mes.1,b.4)

Şeyda di saqînameya xwe de bangî saqî dike. Saqî, qedehek şerba tehûr bîne. Lewra ji wê şerabê dilê hewesdar û arzûdar çirûskên nûrê belav dike.

### 3.1.3.7 Şeraba Rehîq

Bêjeya Rehîqê ji Qurana Pîroz hatiye ketiye nav helbestan. Bi wateya di Quranê de derbas dibe meya safî ye.<sup>726</sup> ( *يَسْقُونَ مِنْ رَحِيقٍ مَخْتُومٍ* ) ‘Ew ji meya safî ya dev girtî tene avdayîn.’<sup>727</sup> Dema arezûya gihaştina mehbûba heqîqî di dilê salikî de hil dibe, dixwaze ku nêzîkî mehbûba xwe bibe. Di wesfê heqîqetê û mehbûba heqîqî de diaxive. Wê demê mehbûba heqîqî bêhna *rehîqa mextûm* digihîne pozê ehlê ‘îrfanê.<sup>728</sup> ‘Arif û ehlê ‘îrfanê bi ew bêhna şeraba rehîq tebatî tê wan û aram dibin. Li gorî vê wateyê; me’şûq, me’şûqa heqîqî, ‘aşiq, ‘aşiqê heqîqî, şeraba rehîq jî ‘işqa heqîqî ye.

بشیدا عطا کن شرابی رحیق

تو خود با کرم شهره گشتی حقیق

Te heqîqeten bi keremê nav daye

Bi bexşîne ji Şeyda re şeraba rehîq (mes.1,b.26)

Ev beyt ji saqînameya Şeyda beyta dawî ye. Em bi dilrehetî dikarin bibêjin wateya li jor hat şîrovekirin bi giştî di saqînameya wî de û di ev beyta dawî de xuya dike. Wek ku di basa saqî de hat gotin saqînameya Şeyda bi giştî tesewif e û saqî jî me’şûqê heqîqî Xweda ye. Di beyta jor de Şeyda camêrtiya saqî dide ber çavan û daxwaza şeraba rehîq dike. Şeraba rehîq wek ku ji saqînameyê û beyta dawî tê fam kirin ‘işqa heqîqî ye.

### 3.1.3.8 Şeraba Miskê

Şeraba miskê taybetiya şeraba rehîq e li gorî ravekirina Qurana Pîroz. Di Qurana Pîroz de wiha derbas dibe;

<sup>726</sup> Qurana Pîroz, Mûteffîfîn, 25.

<sup>727</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 587.

<sup>725</sup> حیدرقلی زاده & محبوبه خوش سلیقه ، ص ، ۱۷۳ .

<sup>728</sup> ملا محسن فیض کاشانی ، رساله مشواق (بہکوشش: اکرم شفائی) ص، ۳ .

(يَسْقُونَ مِنْ رَحِيقٍ مَخْتُومٍ \* خِتَامُهُ مِسْكَ وَفِي ذَلِكَ فَلْيَتَنَافَسِ الْمُتَنَافِسُونَ \* وَمِزَاجُهُ مِنْ تَسْنِيمٍ)<sup>729</sup>

‘Xwedayê wan dê ji şerabeke paqij wan av bide. \* Dumahiya vexwarina wê tehma miskê dide. Ha di vê de bila pêşbaz pêşbaziye bikin. \* Ya tevlî wê meyê dibe ava tesnîmê ye’<sup>730</sup> Ji bo bêhna xweş ji şerabê were gulav û miskê dixin nava şerabê. Şeraba bi bêhn hîn bêtir bi nirx û qîmet e. Hem ji bo hin zererên şerabê bèn dûrkerin jî misk û gulav dixistin nav şerabê. Di bijîşkiya kevn de xisleta şerabê sar e û xisleta miskê jî germ e. Ji ber hîndê misk dixistin nav şerabê ji bo sermahiya şerabê kêmbibe. Di tesewifê de şeraba miskê tecelliyatên ef’alan e. Agirê ‘işqa salikî bi zelaliya tewhîdê vedimirîne.<sup>731</sup> ‘Aşiq li gorî astên ‘işqa xwe meqaman bi dest dixê. Dema ji ‘aşiqî re yekîtiya Xweda zelal dibe hîlbûna agirê ‘işqa wî aram dibe. Şeraba miskê an şeraba ku bêhna xweş jê tê gihastina meqamên bilind dest nîşan dikan.

بود رهبرش سوی اعلى المقام

شرابی که باشد بمسکش ختام

Şeraba ku bêhna miska te jê tê

Dibe rêber ji bo meqamê herî jor (mes.1,b.23)

Şeraba ku bêhna miska te jê tê ji me ra dibe rêber ku em bigihêjin rexê meqamê herî jortir. Şa’irê me şeraba miskê bi wateya gihastina meqamên bilind bi kar aniye.

### 3.1.3.9 Şeraba Wesletê

Ji her kesekî re armanc û hedefek heye. Ji bo gihastina hedef û armancên xwe divê tekoşînek hebe. Girîngiya vê tekoşîne li gorî hin nirx û hêjanan tîn guhertin. Ji bo salik û sofî jî hedef û armancek heye. Hedefa herî girîng gihastina hezkirina Xweda ye. Helbestavanan di helbestên xwe de ev yek bi remz û îşaretan anîne ziman. Nirx û hêjanên Xweda herdem rêber û peşkêşiya raman û karên ‘arifî dikan. Girîngî û pêşaniya van nirx û hêjanan ji bo her du dinyayan ne wekî hev in. Şeraba me’newî sofî perwerde dike ji bo nirxên ku pêdiviya wî pê heye. Hingî bi yarê xwe yê rasteqîn ku Xweda ye difikire. Ev fikr û raman dibin hedefa tekoşîna wî.<sup>732</sup> Hedefa salikî her gihastina mehbûba heqîqî ye. Dema hedef bû mehbûba heqîqî divê çavê salik ne li tiştêkî dinê be. Şeraba wesletê hin caran bi wateya kêf û coşa dilê salikî jî hatiye bikaranîn.<sup>733</sup> Dema salik di azmûna sadiqiyê de bi ser dikeve bivê nevê di dilê wî de kêf û coşek tê holê. Şeraba wesletê ji bo gihastina yara heqîqî ew fikr û raman û kêf û coşa dilê salikî tîne ziman.

<sup>729</sup> Qurana Pîroz, Mûteffifîn, 25-27.

<sup>730</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 587-588.

<sup>731</sup> حیدرقلی زاده & محبوبه خوش سلیقه ، ص ، ۱۷۱ .

<sup>732</sup> تسکین دوست ، ص ، ۱۳۱ .

<sup>733</sup> Cebecioğlu, hb. r. 312.

شرابا وصلتا محبوب ژغیروی نهن مرغوب      کو شیدا هر اوه مطلوب نه مشتاقی رخ حورن

Şeraba gihaştina mehbûbê, ji wê pê ve tiştekan nayê ‘ecibandin

Ku daxwaza Şeyda jî her ev e, ne muştaqê rûyê horiyân e (x.79,b.9)

Daxwaza gihaştina mehbûbê hedef û armanç e ji bo şa’ir. Ji xeynî gihaştina mehbûbê tu tiştekanî dinê ne dihebîne û ne di’ecibîne. Teleb û daxwaza Şeyda<sup>734</sup> jî her ev e. Ne hewesdar û arzûdarê rûyê horiyên bihiştê ye. Ji bo vê yekê jî gelekî bi kêf û coş e. Ev kêf û coşa şa’irî di bêjeyên beytê û di honandina beytê de xuya dibe. Şeraba wesletê ji şa’irî re rêbertî kiriye û ew perwerde kiriye, di dilê wî de ji xeynî gihaştina mehbûba heqîqî tu hedef û armanç nehiştiye.

### 3.1.3.10 Şeraba Zehrê

Di ‘işqê û hezkirinê de çawa gihaştin heye herwiha dûrbûnî, ji hev du veqetandin, hesret kişandin jî heye. Di tesewifê de şa’irên sofî ev dûrbûnî û dûrketina ji mehbûbê bi vexwarina şeraba jehrê anîne ziman.<sup>735</sup> Dûrbûnî û dûrketina ji m’êşûqê herwekî mirina ‘aşîqî ye. Ew qeder ji ‘aşîqî re giran tê.

جرک من شد پاره پاره از شراب زهر هجر      کی بود ما را شفائی از صفای خال و خط

Cegera min parçe parçe bû ji şeraba jehra firqetê

Tu yê kengî me sax bikî bi şahiya xal û xetan (x.56,b.6)

Şa’ir ji mehbûba xwe dûr ketiye. Ev dûrbûnî ji şa’ir re wek vexwarina şeraba bi jehr e. Ceger û hinavê wî ji ber vê veqetandinê perçe perçe bûye. Daxwaza gihaştinê dike ji mehbûba xwe. Saxbûniya wî bes bi dîtina xal û xetê yarê ye ku ew ê şahiyekê di dilê wî de bîne holê.

### 3.1.4 Şerbet

#### 3.1.4.1 Şerbeta Lefz û Kelaman

Şerab bi wateya xelashûna ‘aşîqî ji bela û mûsîbetan ketiye nav berhemên helbestvanên sofî. Şerab û şerbet bi sedema ku hiş ji serî dibe însan ji derd û kulan dûr dixê. Ango wî ji fitne, zirar û ziyane dem û dinyayê dûr dixê. Ji ber hindî ‘aşîqê şerabxwer ji ber xilashûna ji fitne û xapandina dinyayê û mekrê asîmanan, berê xwe dide meyxaneyê pîrê xerbatê di bin siya şerabê de xwe diparêze.<sup>736</sup> Ji bo xelasiya salikî ji van zirar û ziyane me’newî pêdiviya wî bi şerabê heye. Ev şerab şeraba lefz û kelaman e.

<sup>734</sup> Şeyda, di beytê de mexlesa şa’ir e.

<sup>735</sup> الزفنگی، ج ۱، ص، ۸۷.  
<sup>736</sup> حیدرقلی زاده & محبوبه خوش سلیقه، ص، ۱۶۷.

شربتا لفظ کلامان گشت از ما منقطع

هم تبه بودیم از آسیب دهر بی حساب

Şerbeta lefz û kelaman dema ji me hat birrîn

Ez kerrixîm ji zirarê demê ên bê jimar (x.12,b.9)

Helbestvan ji şerabê dûr ketiye. Xwe nagihîne şerabê lewra şerab ji ser wî birrîne. Masiyê ku av ji ser wî tê birrîn çawa diperpîte, helbestvan jî bi birrîna şeraba lefz û kelaman di bin zirar û ziyana dem û dewranê de diperpîte.

### 3.1.4.2 Şerbeta lêvan

Şeraba ku serxweşiyê nede şerbet e. Lê di helbestan de û bi taybetî di helbestên sofîyan de şerab û şerbet bi heman wateyê tên bikaranîn.

شربتا لیفان دوايه قلزما خمرا حلال

شاهکی پر با وفایه مستغاث عالمان

Şahekî pîrr bi wefa ye û alîkarê ‘aliman e

Şerbeta lêvên wî dewa ye behra xemra helal e (x.64,b.12)

Şeyda di pesnên murşidê xwe de bêjeya şerbeta lêvan bi kar tîne. Beriya em şerbetê şîrove bikin divê em xemrê binasin ji bo wate zelal xuya bike. Xemr, di tesewifê de zanebûn e. Ew zanebûna ku xasê xas dizanin.<sup>737</sup> Dema şa’ir divê ‘qulzema xemra helal’ vê zanebûnê tîne ziman. Lê ev zanebûn, zanebûna zanistên me’newî ye. Murşidê şa’ir ne tenê zanayê zanistên me’newî ye, belkî zanayê zanistên maddî ye jî. Dema şa’ir dibêje ‘mustexasê ‘aliman’ vê yekê tîne ziman. Helbestvan bibikaranîna ‘şerbeta lêvan dewa ye’ zanebûna murşidê xwe a me’newî ku salik hîdayetê rêya musteqîm dike tîne ziman.

Di nav helbestên Şeyda de bikaranîna şeraba kasa kafûrîn bi wateya şeraba miskê (x.79,b.8), şerbeta le’l bi wateya şeraba le’l (x.57,b.2) û şerbeta zulal (x.50,b.1) bi wateya şeraba safî hatiye bikaranîn.

### 3.1.5 Mey û Meyxane

#### 3.1.5.1 Mey

Di edebiyata tesewif û ‘irfanî de gelek bêje ji jîyana rasteqîn bi deyn hatiye standin. Wateyên van bêjeyan li gorî rewş û daxwazên şa’ir û helbestvanên sofî bi rêya teşbîh û mecaz û îstîfereyan hatine guhertin û bi wateyên tesewifî û ‘irfanî di helbest û berheman de cih girtine. Yek ji van bêjeyan mey e. Mey di wêjeya sofîyan de bi çend wateyan tê bikaranîn.

<sup>737</sup> نسفی، كشف الحقایق، ص، ۱۱۸.

Helbestvanên 'arif, mey bi wateya serdestiya 'işqê<sup>738</sup> dest nîşan kirine. Dema 'işq serdestê 'aşîqî dibe, 'aşîq dixê bin fermanrewaniya xwe ew dem kêf û coşek li 'aşîqî peyda dibe. Ev serdestiya 'işqê û kêf û coşa vê serdestiyê bi meyê tê ziman.

چون لذت می در در میخانه چه داند      آنکس که غبار خمش بر چشم و سری نیست

Tehm û lezeta meya ber deriyê meyxaneyê ew ê çawa zanibe

Ew kesê ku toz û xubara kûzê wî ne li ser çav û serê wî ye (x.25,b.6)

Ew kesê ku di destpêka seyr û sulûkê de êş û jana 'işqê nekişandibe ew ê çawa di meqamê 'işqê de bigihêje kêf û coşa 'işqê. Şeyda di beyta xwe de mey bi wateya kêf û coşa serdestiya 'işqa di meqamê 'işqê de bi kar aniyê. Di beytê de hem meyxane û hem xom bi wateyên tesewîfî hatine bikaranîn. Li jêr di derbarê her du têgehên de û heman beytê di bin xala Meyxaneyê de şîroveyek berfireh ew ê were.

Mey ji salikî re dîtina rêya rast e.<sup>739</sup> Salik bi vexwarina meyê rêya rast peyda dike. Em dikarin wiha jî bibêjin. Murşidê kamil an mehbûbê heqîqî meyê bi salikî dide vexwarin û bi wasiteya meyê rêya rast nîşanî wî dike. Mey di vê wateyê de dibe xwedî qabiliyeteke, bi ev qabiliyeta meyê çavê dilê salikî vedibe û derd û kulan jê derdixe bi sedema gihaştina rêya rast.

Mey bi wateya sir û razan jî hatiye bikaranîn.<sup>740</sup> Ew sir û razên ku salik bi wan digihêje rêya rast. Wate ji rêya rast her rêya gihaştina 'işqê ye. Çi murşidê kamil vê rêyê dest nîşan bike û çî mehbûbê heqîqî dest nîşan bike, rê her rêya gihaştina 'işqa heqîqî ye ku 'işqa Xweda ye.

در ازل دادی مرا زان آب گلگون ساغری      زان سبب امروز می نوشم و می بینم صلاح

Di roja ezel de te da me yek îkanek ava gulgûn

Bi vê sedemê îro ez meyê vedixwin û rêya rast di meyê de dibinim (x.30,b.6)

Şa'ir di dema roja ezel de îskanek ava gulgûn vexwariye. Bi sedema vexwarina vê avê îro meyê vedixwe û rêya rastî û xelasiyê di meyê de dibîne. Şa'ir di beyta xwe de di 'alema erwahan de dema 'aşîqê cemala Xweda dibe, di 'alema heqîqî de - ku ev 'alema em tê da dijîn- li pey vê 'işqê digere. Ji bo peydakirina vê 'işqê jî meyê vedixwe û bi vexwarina meyê rêya ku digihêje me'sûqa xwe peyda dike. Bi vexwarina meyê rêya rast peyda kiriye, bi

<sup>738</sup> رضا حیدری نوری & احمد خاتمی ، "سیرتحوّل فکر نظامی در ساقی نامه" ، پژوهشنامه فرهنگ و ادب ، شماره سیزدهم ، سال هشتم ، بهار و تابستان ، ص ، ۲۳۳ .

فخرالدین ابراهیم عراقی ، رساله اصطلاحات ، به کوشش: محمد بیدآباد ، ص ، ۶ .

<sup>739</sup> سیده مریم ابوالقاسمی ، "تأملی بر ساقینامه حکیم فغفور گیلانی" ، پژوهشنامه علوم انسانی: شماره ۵۴ ، تابستان ۱۳۸۶ ؛ ص ، ۵ .

<sup>740</sup> مریم مشرف الملک ، "زمینه شناسی ادبیات خمی و جلو ههای آن در شعر عربی و فارسی" ، کین نامه ادب پارسی ، پژوهشگاه علوم انسانی و مطالعات فرهنگی ، سال سوم ، شماره دوم ، پاییز و زمستان ، ص ، ۱۱۰ .

vexwarina meyê çavê dilê wî vebûye û bi vexwarina meyê sir û razên rêya gihaştina me'sûqa xwe peyda kiriye. Şa'ir bi van sedeman meyê dinoşe.

Mey ew zewqa bibîranîna Xweda di dilê salik de derdikeve holê û wî mest dike.<sup>741</sup> Mey, bi vê bîranîne zewqê di dilê salik de çêdike û wî kêfxweş dike. Ji vê kêfxweşiyê mest û sermest dibe.

آنکه دیده است خوب رو ترک می کند      چون شراب لعل تو هر مرده را حی میکند

Ew kesên ku xweşik dîtine ew ê çawa terka meyê bikin

Lewra şeraba le'lê te her miriyî tîne jiyane ( x.36, b.1)

Ew kesê ku xweşik dîtibin ew ê çawa terka meyê bikin. Lewra ew şeraba te ya le'l her miriyî sax dike. Di derbarê şerab û cureyên şerabê de di mijara şerab û şerbetê de agahiyên berfireh hatin dayîn. Di şîroveya vê beytê de em li ser nasekinin. Şerab di vê beytê bi wateya jiyane bêdawî hatiye. Ew kesê ku carekê bi tenê jî te dîtibe ey mehbûba min ew ê çawa te ji bîr bike. Tu nayê jibîrkin. Tu yê herdem di bîra me de bî û em ê bi ev bîranîna te ji xwe re jiyane bêdawî bi dest bixin.

### 3.1.5.2 Meyxane

Meyxane, bêjeyek Farsî ye. Cihê mey û bade lê tê vexwarin jê e tê gotin Meyxane.<sup>742</sup> Meyxane wek mezmûnek tesewifî, wateyên devera ku bende/kole bi dil û can bangî Xwedayê Te'ala dikin, qelbê murşidê kamil, alema lahût,<sup>743</sup> meqamê işq û mehebbeta ku serdestiyê li mirovî dike<sup>744</sup> hatiye bikaranîn. Di wî meqamî de, temaşa xweşikahî û nûra 'işq û mehebbetê tê kirin. Temaşa xweşikahî û nûra 'işq û mehebbetê tê kirin lewra, nûr û xweşikbuniya mehebbet û 'işqê di astek gelek zelal û rewşen de ye, eger kesek temaşa bike ew ê mest û bê aram û hejmetkar bimîne.

Meyxane, li gel ew wateyên jor, ji 'uzletxaneya pîr û murşid re jî tê gotin. Ger salik an murîd rast û dilsoz be, hişyarî lê peyda dibe, û bi vê hişyariyê mest û heyran dimîne di vê 'uzletxaneyê de. Ji ber vê, ji meyxaneyê re hatiye gotin ; 'Meyxaneya 'İşqê'.<sup>745</sup>

Herwiha, bi wateyeke din; ji 'Alema Ceberrût ku 'Alema Sifatan e, Meyxaneya 'İşqê hatiye gotin.<sup>746</sup> Ji ber ku mîratgir û wêrisê 'Alema Ceberrût welî û dostê Xweda ne, Meyxaneya 'işqê bûye war û cihê pîr û murşidê kamil.

<sup>741</sup> دیوسالار، ص، ۱۴۱.

<sup>742</sup> Cebecioğlu, hb. r. 233.

<sup>743</sup> Uludağ, hb. r. 248.

<sup>744</sup> لاهوری، مجلد سوم، ص، ۱۷۷۷.

<sup>745</sup> لاهوری، مجلد سوم، ص، ۱۷۷۷.

<sup>746</sup> لاهوری، مجلد سوم، ص، ۱۷۷۷.

Însan, yanî her kesekî ji zurriyeta Hezretî Adem (s.l.), dema ku hatiye afirandin tînetî wî, afirandina wî yanî, hevîrê wî di Meyxaneyê ‘İşqê de hatiye strandin. Ava ev hevîrê afirandinê meya ‘eşq û mehebbetê ye. Çawa ku di Hedîsa Qudsî de Xwedayê Te’ala ferman kiriye: (خَمْرٌ طَيِّبَةٌ آدَمُ بِيَدِي أَرْبَعِينَ صَبَاحًا) ‘Heriya Hezretî Adem (s.l.) bi du destê Xweda çil şev û rojan de hatiye stirandin.’<sup>747</sup> Ji ber vê salik an sofî di Meyxaneyê ‘İşqê de digihêje ‘eşq û mehebbeta me’ şûqa heqîqî, ku Xwedayê Ezel û Ebed e.

چون لذت می در در میخانه چه داند      آنکس که غبار خمش بر چشم و سری نیست

Tehm û lezeta meya ber deriyê meyxaneyê ew ê çawa zanibe

Ew kesê ku toz û xubara kûzê wî ne li ser çav û serê wî ye (x.25,b.6)

Di vê beytê de, ‘Xum’ wateya wê ya ferhengî kûz, şerbik, cêr e, ku di demên berê de tiştên ron; wek sirke, dims, av di wan de diparastin.<sup>748</sup> Wateya istilahi; destpêka seyr û sulûkê ye ku salik di vê astê de bi coş û xiroş e, kelecânî ye. Herwiha, xum di istilahiê tesewifê de bi wateya cihê sekinandinê jî hatiye.<sup>749</sup> Şeyda di vê beytê de sedema gihaştina tehm û lezzeta meya meyxanî aniye ziman. Gihaştina vê tehm û lezzeta meya meyxanê li gel Şeyda gelekî girîng e. Kes nagihêje vê tehm û lezetê heta ku toz û xubara, yanî êş û elem û kul û derdê işqê bi serê wî de nehatibe. Beriya ku salik bigihêje vî meqamî divê di destpêka seyr û sulûkê de cewr û cefaya ‘işqê dîtibe ku bikaribe bigihêje tehm û lezeta meya meyxaneyê.

Li gorî van pênasayan em dikarin beyta şa’irî wiha şîrove bikin. Di ew meqamê ‘işq û mehebbetê de (meyxane) , di hengama temaşeya xweşikahiyê de, lezeta kêf û coşa li ‘aşiqî peyda dibe (mey) ew ê çawa fam bike ew kesê ku di destpêka seyr û sulûka xwe de jana ‘işqê (xum) nekişandibe?

### 3.1.6 Bade

Di zimanê farsî de navek ji navên şerabê ye. Di edebiyata ‘irfanî û bi taybet di menzûmên edebiyata ‘irfanî de pir hatiye bikaranîn. Wek têgehek tesewifê, ‘işqa sofî ya lawaz a di destpêka seyr û sulûkê tîne zimên. Bade, ji ‘işqa ‘ewam/’am (kesên ji rêzê) re tê gotin. Ji ‘işqê re tê gotin bade, ku di vê ‘işqê de, tundiya hezkirina dinyayê heye û asta hezkirina sofî ya destpêkê ye.<sup>750</sup> Bade herwiha wateyên înayeta Îlahî û ‘eşqa Îlahî<sup>751</sup> jî di xwe de digire.

گفتمش در وصل خوبان چیست کار      عاشقان گفت با رویش نظر با باده کردن امتزاج

<sup>748</sup> Kanar, hb. r. 323.

<sup>747</sup> لاهوری، مجلد سوم، ص، ۱۷۷۷.

<sup>749</sup> سجادی، ص، ۳۶۹-۳۷۰.

<sup>750</sup> نوربخش، ج- ۱، ص، ۱۰۲.

<sup>751</sup> Uludağ, hb. r. 63.

Min jê re got: ji bo gihaştina xweşikan divê 'aşiq çi bike?

Got: bihevgrî (însîcam) a nêrîna serçav û bade (x.29,b.9)

Şeyda, bade, bi wateya gihaştina 'işqê bi kar aniye. Ev 'işq xuyaye 'işqa destpêkê ye ku Şeyda hîn kar û barê 'işqê nizane. Di helbestê de Şeyda bi me'şûqa xwe re goftûgoyê dike. Xwe li nezaniyê datîne, ango naxwaze me'şûqa wî zanibe ji wê hez dike. Jê dipirse; 'ji bo gihaştina xweşikan divê 'aşiq çi karî bike?' Mehbûba wî jê re dibêje pêwîst e ku tu bi vexwarina badeyê, yanî tevî hezkirina min, 'işqa min, li min mêze bike. Armanca salikî gihaştina Xweda ye. Ji bo gihaştina Xweda jî divê salik 'aşiqê Xweda be. Ji bo vê yekê jî pêwîst e ku salik emr û fermanên Xweda pêk bîne. Ji bo gihaştina Xweda pêk anîna emrê Wî, 'işqa wî pêwîst e. Şeyda di beyta xwe de vê yekê tîne ziman.

### 3.1.7 Cam

Cam, ew îskana ku tê de av, şerab, mey tê vexwarin. Cam, cara yekem ji teref Ebû Se'îd bi wateya wucûda salik hatiye bikaranîn.<sup>752</sup> Li gorî vê pênaseyê bedena însan cam e û bade jî pakkirina bedenê ye.<sup>753</sup> Salik bi vexwarina badeya îlahî bedena xwe pak û temîz dike. Yanî dilê xwe bi tewhîd û yekîtiya Xweda dadigire, tije dike. Dema Xweda ji esma û sifetên 'izzeta xwe tecelliyatan dide esîrê xwe û ji xizneya dewleta xwe dewletê dide wî, bi cama îkrama xwe ya bêdawî wî mest dike.<sup>754</sup> Salik bi hatina tecelliyatan, ku ji esma û sifetên Xweda wek îkaramekê Xweda jê re dişîne mest û sermest dibe. Heta dema 'aşiq mestê cama şeraba 'işqê ye me'zûr e, 'itab lê nayê kirin.<sup>755</sup> Di ev mest û sermestiya 'işqê de 'aşiq ji xwe ne agahdar e. Ji ber hindî Nûrbexş camê wek 'hal' dide nasîn.<sup>756</sup> Ew halên ku salik di seyra sulûkê de wek merheleyan derbas dike û di wan merheleyan de li gorî rewşa salikî tecelliyat jê re xuya dibin.

یک جرعه ده ما والشکر لله

باز آی ساقی از جام وصلش

Dîsa bîne saqî cama wesletê

Qurtekê bide me û şukur ji Xweda re be (x.83,b.8)

Helbestvan ji saqî cama wesletê dixwaze ku bi wê camê dilê xwe pak bike, ango bi tewhîda Îlahî dagire û bigihêje me'rîfeta îlahî. Di beytê de balkêşe ku şa'ir dibêje 'dîsa'. Ji vê gotinê tê famkirin ku şa'ir beriya vê jî ji camê tiştêk vexwariye. Ev tê wateya ku şa'ir di seyr û sulûkê de hin merhele derbas kirine û gihaştîye hin merheleyan û dixwaze halê ku tê de ye

<sup>752</sup> جميله اعظميان بيدگل ، "جام در ادبيات فارسی و پیشینه آن" ، فصلنامه علمی پژوهشی ادبیات عرفانی و اسطوره شناختی (زبان و ادبیات فارسی) ، زمستان ۱۳۸۸ ، دوره ۵ ، شماره ۱۷ ؛ ص، ۱۶.

<sup>753</sup> سجادی ، ص ۲۸۰.

<sup>754</sup> شیخ احمد غزالی طوسی، سوانح، به کوشش: دکتر علی محمد صابری، ص، ۲۷.

<sup>755</sup> طوسی ، ص، ۲۸.

<sup>756</sup> نوربخش، ج - ۱، ص ، ۹۴.



derbas bike. Ji bo vê yekê jî tewazûya xwe nîşan dide, dibêje; ‘yek qurtekê bide min’. Yek qurtekê ji camê bide min bes e ji bo ku ez ji Xweda re şikir bikim. Yek qurtek bi tenê ji camê ew ê bibe sedema derbasbûna merheleyekê û gihastina merheleyeke din. Û ev yek ew ê bibe sedem ji bo ku şa’ir şikrê Xweda bike.

### 3.1.8 Cur’e

Cur’e di ferhengê de, bi wateya qurt, firt, dilopa herî dawî ya şerabê ku dikeve erdê<sup>757</sup> tê. Di istilahê tesewifê de, ji tecelliyatên wucûdî<sup>758</sup> re tê gotin. Ji taybetiyên tecelliyatên wucûdî re tê gotin cur’e, ku di temamê zerreyan de derdikeve holê. Di sulûkê de ji wan sirrên ku di meqaman de ne û di hemû halan de ne û ji salikî hatine veşartin<sup>759</sup> re, cur’e tê gotin. Cur’e, di heman demê de meqamê seyrê<sup>760</sup> ye ku salik bi dest dixê. Pêwîst e salik cur’eya mehebbetê vexwe, welew ku zêde zêde dijwar jî be.<sup>761</sup>

روز اول جرعة زان شربت لعل لبث      نوش کردم تا ابد مدهوش گفتمارم چو شمع

Roja ewil qurtek ji wê şeraba lêvê te yên sor

Min vexwar û heta ebed ez wekî mûmê serxweşê axaftinê me (x.57,b.2)

Şeyda di ev beyta xwe de cur’e, wek sirrekê bi kar aniye. Roja ewil min sirrek ji devê te bihîst. Te sirreke xwe ji min re aşkere kir ku bi ew sirra te da min heta ku ez hebim wek mûm û çirayê bi gotinên xwe serxweş bimînim. Rûzê ewwel, roja bezma/peymana elestê ye. Ew gotin jî soz û peymanên wê rojê ne. Sir û razên ku Şeyda qal dike, di ew roja bezma/peymana elestê de dîtina tîrêjek ji cemala Xweda ye. Ji wê demê de Şeyda bi dîtina wê sir û razê heta dawiyê ew ê serxweş be.

### 3.1.9 Kase

Îskan, îstekan, sênîk, tasa serê însan, tasa çoka însan<sup>762</sup> re di ferhengê de kase tê gotin. Di istilahê tesewifê de, îstekana şereba wehdetê ye ku di seyr û sulûkê de, di seyra ‘Seyr Îlellah’ de, ku meqamê ‘Fenafillah’ e, salik mest û sermest dike.<sup>763</sup> Îstekana ku qelbê kesên ‘aşiq mezherê van tecelliyatan dibe.<sup>764</sup> Balkêş e ku anatomiya qelb di dirûv û forma kaseyê de ye.

<sup>757</sup> Kanar, hb. r. 272.

<sup>758</sup> Ji sê astên tecelliyê, asta sêyemîne.

<sup>760</sup> Uludağ, hb. r. 91.

<sup>762</sup> Kanar, hb. r. 553.

<sup>763</sup> ۷۴۹، ص، سجادی، Uludağ, hb. r. 207.

<sup>764</sup> Cebecioğlu, hb. r. 193.

<sup>759</sup> نوربخش، ج- ۱، ص، ۱۰۳-۱۰۴.

<sup>761</sup> سجادی، ص، ۲۸۶.

Weke gelekî têgehên tesewifî helbestvanên mutesewif bêjeya kaseyê ji Qurana Pîroz wergirtine. <sup>765</sup> ( إِنَّ الْأَبْرَارَ يَشْرَبُونَ مِنْ كَأْسٍ كَانَ مِزَاجُهَا كَافُورًا ) ‘ *Bi rastî mirovê qenc, ên bawermend dê ji meykaseyeke ku kafûr tevî wê bûye vexwin.* <sup>766</sup> Nûrbexşî di ferhenga xwe de kaseyê wiha dinasîne:

‘‘Kase ku tije be jêr e ke-s ( كَأْس ) tê gotin. Ku vala be jêre ke-s nayê gotin.

Şeraba tahir û safî, bes ji bo me’rifeta Xwedayê Te’ala ye. Xwedayê Te’ala dema bixwaze sirra meşîtetê (îrade û xwestinên Xwedayê Te’ala) bide hinek ‘ebdê xwe yê taybet, xas vê şerabê bi wan dide vexwarin. Vexwarina vê şeraba me’rifetê bi kase yê, carînan di şikil de dibînin, car caran, di me’nayê de dibînin, hin caran bi rêya ‘ilmê tê dîtin.

Muşahede, dîtina şiklî, kêf û xweşiya bedenê û nefsê ye. Muşahedeya me’newî kêf û xweşiya qelb û ‘eql e. Muşahedeya zanistî kêf û xweşiya rih û sirran e.

Ev kaseya şerabê ji fedla Xwedayê Te’ala ye ku bide kesekî. <sup>767</sup> (قُلْ إِنَّ الْفُضْلَ بِيَدِ اللَّهِ يُؤْتِيهِ مَنْ يَشَاءُ وَاللَّهُ وَاسِعٌ عَلِيمٌ) ‘Bibêje: Dayîn û kerem bi destê Xweda ye, ew kê bivê dide wî, Teqez Xwedê (bi kerem û dayîna xwe) destfireh û zana ye. <sup>768</sup> Carînan ji civata hezkiriyên vê kaseyê re (ew kesên ku di huzûra Xwedayê Te’ala de ne) kaseyek tenê şerab didin. Car caran ji gelek kaseyan giş bi hev re vedixwin. Hin caran ji her yekî re kaseyek tê lê kaseya her kesî li gorî wan tije ye. Carînan ji kesekî bi tenê re çend kase şerab tên. Herwiha bi jimara kaseyan şerabên cuda hene.

Car caran di kaseyekê bi tenê gelek şerabê cuda heye û bi hezaran qafîleyên bê jimar ji hezkiriya, ji vê kaseyê vedixwin û ne nikarin xelas bikin. Çi bextewar e ew kesê ji vê şeraba pak û saf û bi tam vedixwe û herdem di rewşa mestî yê de ye. <sup>769</sup>

شافيى امراض قلبان الغياث

ساقىى كأس شراب سلسبيل

Saqiyê îskana şeraba selsebîl

Saxkerê nexweşiyên qelba hey hawar (x.28,b.5)

<sup>765</sup> Qurana Pîroz, Dehr, 5.

<sup>766</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 577.

<sup>767</sup> Qurana Pîroz, Alî ‘imran, 73.

<sup>768</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 58.

<sup>769</sup> نوربخش، ج. ۱، ص. ۹۷-۹۸.

Şeyda di vê beytê de hawar û gaziya xwe bi mehbûba xwe dike û alîkariyê jê dixwaze. Di bangkirina vê hawar û gaziye de medh û pesnê mehbûba xwe dide. Mehbûba wî saqî ye û kaseyên şeraba selsebilê belav dike. Mehbûba xwe wek şifakiroxê nexweşiyên qelban (di vir de wate ji qelb, qelbê me'newî ye) dipesinîne û alîkariyê jê dixwaze.

Şeyda bêjeya kaseyê bi ( کأس ) bi kar aniye. Ev tê wateya 'aşiqbûyîna sirra wehmeta Xwedayê Te'ala. Lazimî gotinê ye di beyta şa'ir de saqî Resûlê Xweda (s.x.l.) ye. Lewra tenê Resûlê Xweda (s.x.l.) dikare kesan ji ava kewserê av bide.

### 3.1.10 Piyale

Piyale, bêjeyek farsî ye, di ferhangê de bi wateyên; îstekan, îskana biçûk,<sup>770</sup> firaxa ji çînî, ferfûr an ji camê ji bo vexwarina şerabê û tiştên vexwarinê hatiye amadekirin, derbas dibe.<sup>771</sup> Ji bo me'sûq û mehbûbê wek kînaye jî tê bikaranîn. Hatiye gotin; her zerreyek ji zerratê mewcûdatan piyaleyek e. Kesên 'arif di van piyaleyan de şeraba me'rîfetê vedixwun. Piyale hem bi wateya pakî û temîziya zahir û batin jî hatiye ku her tiştê di wan de be, bi vê pakiyê zahir dibe, derdikeve holê.<sup>772</sup>

Di tesewifê de piyale bi van wetayan jî hatiye bikaranîn; xuyabûna hebûnê, mewcûdiyetê ye ku ev hebûn bi tevahî neynik û eynika Xwedayê Te'ala ye. Ji 'işqê re jî tê gotin, ev 'işqa ku di asta destpêkê de ye. Piyale, navê asta duwem ji astên seyr û sulûka terîqetê ye.<sup>773</sup>

مطرب بز نوائی ساقی بده پیاله

ما مستی الستم لب تشنه وصالم

Ez mestê roja elest im, lêv tî yê wîsalê ye

Mutrib li sazê bixe, saqî piyaleyê bide (x.85,b.3)

Şeyda di beytekê de neh têgehên tesewifî bi hev re bi kar anîne. Ez mest û medhûşê roja elest im, lêva min tî bûye ji derdê gihaştinê. Mutrib dest pê bike li sazê bixe û rewşa me bîne ziman! Saqî tu jî piyaleyek şerabê bîne! Ew kesên ku agahiyên dide bi mutribî hatiye nîşandan.<sup>774</sup> Agahiyên ku rewşa 'aşiqî dest nîşan dikin. Lê belê Hafîzê Şîrazî saqî û mutrib bi heman wateyê bi kar fîne.<sup>775</sup> Saqî wek ku tê zanîn ji mehbûbê Mutleq an şêxê terîqetê re tê gotin ku feyd û himmetê belav dike. Şeyda dibêje, ez ji roja elestê ku min tecelliyatên xweşikahiya Cemala Xweda dît ez 'aşiqê wê xweşikahiyê bûm. Ji wê rojê ve ez tî me ji

<sup>770</sup> Kanar, hb. r. 201

<sup>771</sup> معین ، ج - ١ ، ص ، ٣٨٢-٣٨١.

<sup>772</sup> سجادی ، ص ، ٢١٥-٢١٦.

<sup>773</sup> نوربخش ، ج - ١ ، ص ، ٩٤-٩٥.

<sup>774</sup> عراقی ، ص ، ٩.

<sup>775</sup> علی دهقان & خلیل حدیدی & موسی احمدی، "بررسی تصوف عابدانه و عرفان عاشقانه در غزلیات حافظ"، فصلنامه ادبیات عرفانی و اسطوره شناختی ، س ١٠ ش ٣٧ زمستان ٩٣، ص، ١٣.

gihaştina wê xweşikahiyê. Mutrib dest bi lêxistina sazê bike û bi perdeyên musîkiya xwe nalîn û giriyên me bîne ziman. Lewra ev mûsikî û sazên te nîşan dide rêya ‘işqê bi meşqet e, dijwar e, dirêj e. Li ser dijwariya vê rêyê sebr û sebat lazim e. Saqî tu jî şereba m’erîfetê bixe pîyaleyê û ji me re bîne da em bizanibin di ev rêya ‘işqê de em çi kar û xebatê bikin.

### 3.1.11 Peymane

Wateyên peymanê di ferhengan de wiha hatiye: Îstikan, îskana şerabê, pîvaneka tiştên rohn. Şerab.<sup>776</sup> Di menzûmên edebiyata ‘irfanî û tesewiffî de wek mezmûnekî; dilê sofî ye, ji wî tiştê ku muşahedeya nûra xeybê tê da tê kirin û wateyên nûra xeybê tê da xuya dibe, wek dilê ‘arif.<sup>777</sup>

برو زاهد بتسییحت فرییم می دهی تا کی      که از پیری مغان صد گونه پیمانہ سخن دارم

Here ey zahid, bi tizbiya xwe heta kengê tu yê min bixapînî

Ez ku, ji cem pîrê mûxan bi sed rengî xwediyê peymaneya axaftinê me (x.73,b.3)

Şeyda di beyta xwe de peymanê, bi wateya dilê salikê ku ji aliyê pîrê mûxan (murşidê kamil) bi nûra muşahedeyê hatiye tijekirin bi kar anîye.

## 3.2 Sembol û mecazên Xweşikahiya Mehbûbê

### 3.2.1 Zulf

Zimanê ş’irê, zimanê helbestê, zimanê îstî’are û teşbîh û îşaretan e. Yek ji ew bêjeyên ku şa’irên klasîk di helbestên xwe de gelekî jê sûd wergirtine û bi hunerek edebî, ‘istî’are’, bi kar anîne zulf e. Di helbestên ‘işqê de zulf, hîn bêtir ji bo pesnandina xweşikahiya rûyê dost û yarê, delaliya dildarê hatiye bikaranîn.<sup>778</sup> Herçiqaş ku çend wateyên cuda hatibin destnîşan kirin jî, hemû xweşikahiya rû tînin ziman. Zulf di helbestên şa’irên mutesewifde hem ji bo hestên derûnî û giyanî û hem ji bo wesfandina her du sifetên Xweda; *Celal* û *Cemal*, bi kar hatiye.<sup>779</sup> Helbestvanan ji bo vegotina hestên xwe ji taybetiyên zulfê jî sûd wergirtine. Wek ku em ê di beytên Şeyda de bibînin, bêhna zulfê, reşahiya zulfê, mûyên zulfê jî bûne têgeh û di helbestan de cih girtine.

Zulf, bi wateya ferhengî, por, bisk, kezî û gulî ye.<sup>780</sup> Li vir pêwîst e ku em wateya zulfeynê jî şîrove bikin. Zulfeyn, ji her du qulpên li deriyên an li sendoqan dikevin û bizmik û

<sup>776</sup> Kanar, hb. r. 207.

<sup>777</sup> نوربخش، ج- ۱، ص، ۹۴

<sup>778</sup> Ahmet Tanyıldız, “Sevgilide Güzellik Unsuru Olarak Saç”, *Turkish Studies, International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Volume 4/2 Winter 2009, r. 979-980.

<sup>779</sup> مریم زیبایی نژاد، "مقایسه تطبیقی اصطلاح زلف در اصطلاحنامه های عرفانی"، *فصلنامه تخصصی عرفان*، پاییز ۱۳۸۹، دوره ۷، شماره ۲۵، ص، ۱۶۱.

<sup>780</sup> عمید، ص، ۶۰۴.

zirzeya derî û sendoqê, an zincîra bi wan tên girêdan re tê gotin.<sup>781</sup> Bêjeya zulfeynê jî di helbestan de wek zulfê tê bikaranîn. Em vê bêjeyê di helbestên Şeyda de jî dibînin.

### 3.2.2 Wateyên Zulfê

#### 3.2.2.1 Kesret û Te'eyyunat

Zulf wek têgehek tesewifê bi çend wateyan hatiye bikaranîn. Yek ji van wateyan, dest nîşan kirina kesret<sup>782</sup> û te'eyyunatên<sup>783</sup> mewcûdatan/heyînan e.<sup>784</sup> Bi sedema ku mijar baş bête fam kirin pêdiviya me bi şîroveya vê pênasê heye. Kesret, yekîtiya Xwedayê Te'ala bi rêya nav û sifatan dema tecellî bike û bi pirranî bê dîtin, tê gotin kesret<sup>785</sup>. Tecelliyatên ku ji nav û sifetên Xweda tên û di heyînan de xuya dibin. Li gorî vê pênasê ango hemû tişt dibin kesret. Te'eyyunat, derketina holê, xuyabûnî, aşîkarbûnî ye.<sup>786</sup> Di zatê Xweda de her tişt heye lê ne xuya ye, derneketiye holê. Dema derket holê, ango bi tecelliyan di tiştan de xuya bû te'eyyunat çêdibe. Şa'irên mutesewifdi helbestên xwe de zulfê bi wateya ew bandora kesretê ku dilê 'aşiq bi xwe ve girêdide û wî dîl û dîn dike bi kar anîne.

چو بر آن عارض سیمین سر زلفش پریشان شد      پریشان شد همه عالم از آن زلف و وزان عارض

Çawa ku li ber serê zulfê te 'aridê zîvîn perîşan bûye

Perîşan bûye hemû 'alem û 'arid ji wan zulfê te (x.54,b.2)

Çawa ku 'aridê zîvîn li ber serê zulfê te perîşan bûye, herwiha hem û 'alem, ango hemû tiştê ku hene, hatine afirandin û 'aridê zîvîn ji ew zulfên te perîşan bûne. Di vê beytê de Şeyda bêjeyek zanista 'Kelam'ê, 'Arid' bi kar aniye. *Cewher* û 'Arad du bêjeyên Zanista Kelamê ne û têkilîyên wan bi hev re hene. *Cewher*, tiştên ku hebûna wan ne girêdayî bi tiştêkî din ve ye. 'Arad jî ew tiştê ku hebûna wî girêdayî bi tiştêkî din hebe tê gotin.<sup>787</sup> Wek mînak, kevir *cewher* be, reşahiya kevir an şiklê kevir an hişk bûn û nerm bûna kevir 'arad e. Ango pêşî *cewher* heye û paşê 'arad heye. Şeyda, di beyta xwe de tîne ziman ku, tecelliyatên Xweda, ew tecelliyatên ji esma û sifetên Wî hatine hemû 'alem û tiştên ku paşê çêbûne ji ber serê zulfan perîşan û sergerdan bûne.

<sup>781</sup> عمید، ص، ۶۰۴-۶۰۵.

<sup>782</sup> Kesret; Xweda ku yek e, dema bi nav û sifetên xwe tecellî bi ke û di rewşa pîrbûniyê de xwuya bibe, kesret tê gotin. (Uludağ, hb. r. 212.)

<sup>783</sup> Te'eyyun; ji salikî re ew perdeyên di navbera wî û Xweda de ne. Bi pêşketina di seyr û sulûkê de salik perdeyan ji ber xwe radike û bi bal Xweda ve dimeşe, ji bo gihastina Xweda. (Uludağ, hb. r. 340.)

<sup>784</sup> حیدرقلی زاده، "زلف و تعابیر عارفانه و عاشقانه آن در شعر فارسی"، نشریه دانشکده ادبیات و علوم انسانی (تبریز): پاییز ۱۳۸۳، دوره ۴۷، شماره ۱۹۲؛ ص، ۱۵۷.

<sup>785</sup> Uludağ, hb. r. 212.

<sup>786</sup> Uludağ, hb. r. 340.

<sup>787</sup> Kadri Yıldırım, *Ehmedê Xanî Kulliyatî, 'Eqîdeya İmanê*, Avesta Yayınları, İstanbul 2008, r. 224.

### 3.2.2.2 Xeyba Huwiyeta Xweda

Zulf, bi wateya Xeyba Huwiyeta Xweda tê bikaranîn ku kes nikare bigihêje vê yekê.<sup>788</sup> Ango, nexuyabûna zatê Xweda ye ku kes nikare bigihêje rastiya zatê Xweda. Zatê Xweda, ne qabilê îdrak û famkirinê ye ji bo tu kesî. Zulf di vir de nexuyabûna zatê Xweda bi hunerek edebî, bi îstî'arê dide nîşandan. Zulf, zatê Xweda dinuxumîne û vedişêre û nahêle xuya bibe. Lewra zatê Xweda mechûlê mutleq e. Ancax, bi wesîleya sîfat û esmayê Xweda tê fam kirin. Sîfat û esmayên Xweda bi tecelliyatan tên fam kirin. Zulf, ew sîr û razên ku bi tecelliyatan tên û dibin sedema famkirina esma û sîfetên Xweda tîne ziman.

بگذشت ازین کلفت با زمره عاقلها

شیدای سر زلفت گر موی بدست افتد

Dîne serê zulfê te eger mûyekî bi dest bixe

Ew ê derbas be ji vê tengasiyê û bigihêje hişmenda (x.2,b.7)

Ez dîn û harê serê zulfê te me. Eger ez mûyekî bi tenê ji serê zulfê te bikaribim bi dest bixim. Ez ê ji ev zehmet û tengasiyan reha bibim û bikevim nav koma hişmendan. Şeyda dixwaze ji serê zulfê mûyekî bi dest bixe. Lewra di serê her mûyekî de bi hezaran behrên zanîne ji 'alema sir û razan heye û mû, nîşana tecelliyatan e.<sup>789</sup> Yanî di bin her tecelliyek ji tecelliyatên esma û sîfetên Xweda de bi hezaran behrên 'ilm û me'rifetê û sîrên 'alema xeybê hene û zulf van hemûkan vedişêre.

### 3.2.2.3 Hîcab û Perdeya Sîfetên Xweda

Zulf, bi wateya hîcab û perdeya her du sîfetên Cemal û Celal ên Îlahî hatiye bikaranîn.<sup>790</sup> Zulf, bi ser çavan de berjêr dibe. Dema zulf ket ser çavan ji ser çavan re dibe wek perdeyekê. Ev perde dibe asteng ji bo aşîq. Lewra 'aşîq xweşikahiya ser çavê yara xwe nabîne.

مدتی رفت نمی پرسد به سامانم هنوز

دین و دل دادم بدان زلفین خوشبویش ولی

Min dil û dîne xwe da bi ew zulfeynê xweş bêhn lê

Demek derbas bû lê hîn nepirsiye li rewşa min (x.46,b.3)

Min dil û dîne xwe da bi her du zulfên te yê xweşbêhn lê ev çend wext û zeman li min borîn te hêj li rewşa min nepirsiye. Şeyda di vê beytê de û di yek misrayekê de sê têgehên ku bi zulfê ve girêdayî ne bi kar tîne; *dil, zulfeyn* û *bûy*. Zulfeyn, wateya wê ya ferhengî li jor

<sup>788</sup> نوربخش، ج - ۱، ص، ۵۳.

<sup>789</sup> نژاد، ص، ۱۷۳.

<sup>790</sup> قلی زاده، ص، ۱۶۴.

hat ravekirin. Di tesewifê de bi wateya her dû sifetên Xweda; Cemal û Celal tê bikaranîn<sup>791</sup>. Bûy, ku kurdiya vê bêjeyê bêhn e. Bêhn û bêhnvedana zulfan, bi têgehî, zahir bûna her du sifetan e.<sup>792</sup> Her dû sifet, sifetên Celal û Cemal in. Şeyda, li pey zahir bûna sifetên Xweda digere. Temamê hebûna xwe di ve rêyê de daye û çend dem û dewran derbas bûye lê hêja zulf bûne perde ketine ber çavê wî. Bi vê sedemê sifetên Îlahî ji wî re derneketine holê û negihîştîye wan.

### 3.2.2.4 Terîqet û Merheleyên Terîqetê

Zulf, ji bo destnîşan kirina terîqetê, merheleyên terîqetê û rewşa salikî di terîqetê de û zor û zehmetiyên seyr û sulûkê de jî tê bikaranîn.<sup>793</sup> Di vê destnîşan kirinê de zulf, bi bêjeyên têkilî bi zulfê, wateyên cuda digire. Wek mînak, serê zulfê destpêka sulûkê, helqeyên zulfê hal û meqamên tesewifê, bêhna xweş, cezbe û şewqa gihaştinê tîne ziman.<sup>794</sup> Hemû wateyên di zulfê de û di bêjeyên bi zulfê re tîne bikaranîn ji bo rewşa salikî di rêya seyr û sulûkê de watedar bûne.

نسیمی سوی مابفرست از ان زلفین خوش بویت

بجاه شاه فاروقی و قطب العالم التاخی

Bi cahê Şêx Fethullahê Werqanisî û Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî bike

Bayê nesîmê bi rexê me bişîne ku jê bêhna her du zulfên te werin (x.14,b.9)

Xuyaye Şeyda vê daxwazê ji Şêx Mûhemmed Dîyauddin (q.s) dike. Lewra Şêx Mûhemmed Dîyauddin (q.s) lawê Şêx ‘Ebdurrehmanê Taxî (q.s) û xelîfeyê Şêx Fethullahê Werqanisî(q.s)<sup>795</sup> ye. Ji murşidê xwe hêvî û rica dike ku bi xatirê bavê xwe û murşidê xwe bayê nesîmê ji wan re bişîne ku ji wî bayî bêhna her dû zulfên wî yên bêhn xweş werin. Di vê beytê de *nesîm* bi xwe têgehekî tesewifê ye ku pêwîst e li vir wateya nesîmê ya têgehî bê dayîn. Nesîm, ew bayê ji rexê înayeta Îlahî tê û rehmeta bênavber bi xwe re tîne tê gotin.<sup>796</sup> Di vê beytê de Şeyda ev wate zîvirandiye û bi murşidê xwe ve girêdaye. Înayet, alîkariyê ji me ra bişîne ku cezbeya me û şewqa me li ser seyr û sulûkê zêde bibe.

<sup>791</sup> قلی زاده ، ص ، ۱۶۶ .

<sup>792</sup> نژاد ، ص ، ۱۶۴ .

<sup>793</sup> نژاد ، ص ، ۱۷۵ .

<sup>794</sup> قلی زاده ، ص ، ۱۷۶-۱۸۴ .

<sup>795</sup> Kurtejiyana van rêberên terîqetê di bin sernavê ‘Rêberên Terîqetan li Cem Şeyda’ de derbas bû.

<sup>796</sup> Cebecioğlu, hb. r. 256.

### 3.2.3 Cureyên Zulfê

#### 3.2.3.1 Bêhna Zulfê

Bêhna zulfê xisletên nav û sifetên Xweda dest nîşan dike. Salik bi sedema wê bêhnê dikeve halê tecelliyê. Ev tecellî dibin derman ji bo nexweşiyên dilê salikî.<sup>797</sup> Ji ber hindî helbestvan gelek caran bêhna zulfê wek darû nîşan dide.

بوی زلفش مرده را حی میکند همچون مسیح چونکه از نور خدا و مجتبیائی اکبر است

Bêhna zulfê te miriya sax dike wek Mesîh

Lewra tu ji nûra Xweda yî û bijartiyekî mezin î (x.20,b.7)

Bêhna zulfê te wek Hezretî 'Îsa (s.l.) miriyan ji gorê radike û sax dike. Lewra ev bêhna zulfê te ji nûra Xweda ye û ji nûra yekî bijartî ye ku ew yek gelekî mezin e. Şeyda di rêya seyr û sulûkê de peyrewiya Resûlê Xweda (s.x.l.) tîne ziman. Lewra di tesewifê de peyrewiya Resûlê Xweda û pêkanîna sunnetên Resûlê Xweda (s.x.l.) gelekî girîng û pêwîst e. Di Qurana Pîroz de <sup>798</sup> (قُلْ إِنْ كُنْتُمْ تُحِبُّونَ اللَّهَ فَاتَّبِعُونِي يُحْبِبْكُمُ اللَّهُ) hatiye fermankirin. 'Eger hûn bi rastî ji Xwedê hez dikin, naxwe bidin pey min, Xwedê dê ji we hez bike'<sup>799</sup> gihaştina Xweda û hezkirina Xweda bi peyrewiya Resûlê Xweda (s.x.l.) hatiye girêdan. Şeyda vê peyrewiyê ji bo salik û di rastiyê de ji bo hemû bawermendan wek saxbûna miriyan girîng dibîne.

Şeyda di beyta jorîn de zulf û bêhna zulfê bi kar aniyê. Dema mirov li beytê tenê binihêre tecelliyatên celal û cemala Xweda tê famkirin. Lê dema li xezelê tê nêrîn, em tê digihêjin ku ev xezel pesindana Pêxember e, ango n'et e. Ev bikaranîn balkêş e. Lewra di tu berhemana de, berhemên ku wek têgehêk tesewifî bêjeya zulfê watedar û şîrovekirine wateyek bi vî rengî me nedît. Wek mînak, ferhenga Nûrbexş ji bêjeya zulfê û bêjeyên bi zulfê re hatine bikar anîn bîst û heft (27) wateyan dest nîşan dike û mînak dide.<sup>800</sup> Di gotarên li ser zulfê hatine amadekirin de jî em wateyek bi vî şêwazê nabînin.<sup>801</sup> Ne di wateyên zulfê de û ne di beytên ku ji bo zulfê wek mînak hatine destnîşankirin de li ser Resûlê Ekrem (s.x.l.) em tiştekî

<sup>797</sup> هیمین، عومه ر نه حمهد، هنیرمیتوتیکای شیعری سؤفیانی مهحوی، تیزی دکتورا زانکوی سلیمانی ۲۰۱۴، ص، ۲۲۰.  
<sup>798</sup> Qurana Pîroz, Alî 'Imran. 31.

<sup>799</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 53.

<sup>800</sup> نوربخش، ج- ۱، ص، ۵۳-۵۹.

<sup>801</sup> Wek Mînak; hin gotarên li ser zulfê;

حیدرقلی زاده، «زلف و تعابیر عارفانه و عاشقانه آن در شعر فارسی»، نشریه دانشکده ادبیات و علوم انسانی (تبریز): پاییز ۱۳۸۳، دوره ۴۷، شماره ۱۹۲.

مریم زبانی نژاد، «مقایسه تطبیقی اصطلاح زلف در اصطلاحنامه های عرفانی»، فصلنامه تخصصی عرفان، پاییز ۱۳۸۹، دوره ۷، شماره ۲۵.

صیادکوه، اکبر & رحمانیان، علی، «پیوند «زلف» و «دل» و کارکردهای هنری آن در دیوان حافظ «مجله ی شعر پژوهی (بوستان ادب علوم اجتماعی و انسانی) دانشگاه شیراز، تابستان ۱۳۹۲، دوره ۵، شماره ۲.



nabînin. Li gorî jêderên berdest bikaranîna zulfê bi vê şêwazê wateyek nuh bi dest dixê û em vê wateyê di helbestên Şeyda de dibînin.

### 3.2.3.2 Serê Zulfê

Xweşikahiya cemala Xweda di binê perde û nîqabê de zêde dibe. Bi xuyabûna serê zulfê tecelliyatên Xweda ji salikê di halê seyr û sulûkê de ye xuya dibin. Dema serê zulfan xuya nebe salik di xemê de ye û ji ber vê xemê nexweş e.<sup>802</sup> Bi xuyabûna serê zulfê, yanî bi hatina tecelliyatan xweşî û şadî di ruhê salikî de peyda dibe û nûr û rewşenî di rûyê wî de xuya dibe.

قدحال اسیر سر زلف تو نپرسی  
مجرور دلم تشنهٔ یک جرعه زلالم

از آه نترسی  
دانی بچه حالم

Tu qet li rewşa esîrê serê zulfê xwe napirsî

Ji ahê wî natirsî

Dilê min î birîndar tî ye ji bo dilopek şeraba zelal

Dizanî rewşa min çi ye (70-5)

Şeyda dîl û esîrê serê zulfê bû ye. Lê, serê zulfaxuya nabe, hatine veşartin. Ji ber hindî dilê wî birîndar e. Bi hesret û kovan e. Ewqas birîndariya wî xedar e ku bi hesreta dilopek av e.

Şeyda di beyta xwe de wekî her salikê di seyr û sulûkê de li bendê tecelliyatan e. Ji ber nehatina tecelliyatan dilê wî xemgîn e. Wek ku aniye ziman dilê wî tî bûye û li bendê ye ku hinek dilopek av bidin wî, ango ji wî re tecellî werin.

### 3.2.3.3 Tabê Zulfê

Birqandin û rewneqîya zulfan hem bi sir û razên îlahî û hem bi veşartina wan sir û razan hatiye bikaranîn.<sup>803</sup> Di vê pênasê de veşartin, bi wateya ku ‘aşîq wan sirra veşêre, biparêze û ji kesekî din re nebêje hatiye. Di helbestên Şeyda de tab, bi wateya veşartin û parastinê bi kar hatiye.

تاب زلفش گرچه در دل میکند صد خستگی  
صور گل رویش دهد ناگه شفاء عن قریب

Birqandina zulfê te her çend di dil de sed nexweşiyên çêdike

Şeklê rûyê te ye wek gulê ji nişka û zû şîfa dike (x.9,b.5)

<sup>802</sup> شمس الدین محمد لاهیجی، مفاتیح الاعجاز فی شرح گلشن راز (مقدمه، تصحیح و تعلیقات محمد رضا بزرگی خالقی و عفت کرباسی) چاپ چهارم، انتشارات زوار، تهران ۱۳۸۱، ص ۴۹۰.

<sup>803</sup> نوربخش، ج - ۱، ص ۵۶-۵۷.

Şeyda dibêje; veşartin û parastina wan sir û razên te yên ku ketine dilê me zor zehmet e. Ewqas zehmet e di dilê me de bi sedan nexweşiyên peyda dike. Bes şiklê rûyê te yê wek gulê xweşik ji nişka ve dema ji me re xuya dibe ku di demek pir nêz de em bi ser xwe werin û sax bibin.

### 3.2.3.4 Damê Zulfê

Dam, ku kurdiya wê xefik an feq e, bi têgeha zulfê re pir tê bikaranîn. Her esma û sifetekî Îlahî wek xefikekê ye û ‘aşiq bi rexê xwe dikişîne û wî ‘aşiqî xwe dike û ‘aşiq bi benê *hebl’ul metîn*, benekî zexm û qewîn girêdide. Bi sedema ku ‘aşiq bi vî rengî pê bigihêje hîdayetê.<sup>804</sup> Di vir de lazim e bê gotin, dema seyd û xefik hat gotin, ‘aşiq bû seyd û seydvanî jî bû me’şûq, xebata ‘aşiq bê kêr e bê mefa ye, lewra wek kewa di xefikê de her xwe bilepitîne hîn zêdetir di benê xefikê de digevize. Pêwîst e ku hewl û cehda me’şûqê hebe an na xebata ‘aşiq nagihêje meqsed û mirazê.

Hebl’ul metîn hem wek têgehek tesewifî ‘ezameta Xweda ye.<sup>805</sup> Benekî wisa ye zulf, dikare hezar dilî bi mûyekê tenê girêbide û rêya hezar çaregerî ji her çar rexan bi asanî bigire. Û tu kes nedikare li hemberî vê yekê bisekine.<sup>806</sup> Ev yek li hemberî ‘ezamet û mezinantiya Xweda ne tiştê zor û zehmet e.

وانکه در دام سر زلفت فند جز بحث او از علوم فقه و تفسیر و حدیث طی میکند

Ew kesên ketin xefika serê zulfên te ji xeyrê behsa wî

‘İlmê fiqhê û tefsîrê û hedîsî li pey xwe dihêle (x.36,b.2)

Şeyda di vê beytê de bal kişandiye ser xefikê. Ew xefika di serê zulfê de ye û ‘aşiqê reben wek kewa gozel tê û dikeve xefikê.

Şeyda bi destxistina van sirr û razên bi tecelliyatên esma û sifâtên Îlahî tên û salik bi dest dixin ne tenê sir û razên me’rifeta îlahî dide nasîn. Li gorî Şeyda hin kes bi wan tecelliyatan ‘ilmê wehbî jî bi dest dixin. Şeyda, ew kesên ku ketin xefika te, û ji tere dibin seyd ey mehbûba min, ji xeynê zanistê zatê te pê ve çî ‘ilm û zanist hebin wek fiqih, hedîs û tefsîra di heman xefikê de fêr dibin û li pey xwe dihêlin. Şeyda di vê beytê de ji xeyrê şîroveya jor bidestxistina ‘ilmê wehbî jî girêdide bi ‘aşiqbûna Xweda.

### 3.2.3.5 Zulfê reş

Di helbestên tesewifî de zulf ne bi tenê, bi gelek têgehên ku têkiliya wan bi zulfê re hene hatiye bikaranîn. Yek ji wan reşahiya zulfê ye. Reşahiya zulfê, tarîbûna te’eyyunatan e,

<sup>805</sup> Uludağ, hb. r. 150.

<sup>804</sup> نژاد، ص، ۱۷۵.

<sup>806</sup> اکبر صیادکوه & علی رحمانیان، ص، ۶۹.

windabûn û reşbûna wan e<sup>807</sup>. ‘Aşiq dema te’eyyunat li ber çavê wî reş dibe an winda dibe an tarî dibe bi reşbûna zulfa yarê vê rewşê tîne ziman.

سرگشته زلف سیه یار شوی

گفتم که دلا تا کی تو بیمار شوی

Min got ey dilê min! Tu yê heta kengî nesax bî

Perîşanê wan zulfên reşê yarê bibî (x.95,b.1)

Şeyda bi dilê xwe re hesbihal, guftûgo dike. Ey dilê min! Heta kîjan demê tu yê perîşan û awareyê wan te’eyyunatên ku li ber çavên te reş û tarî bûne û nema xuya dikin bimînî. Êdî bi vê perîşaniyê tu nesax bûyî. Şeyda ji ber tarîbûn û windabûna te’eyyunatan nesax bûye û jar û perîşan bûye.

### 3.2.3.6 Zincîra zulfê

Zincîra zulfê bi cezbe û xebata seyr û sulûkê hatiye ravekirin.<sup>808</sup> Hatiye şibandin bi ew zincîra ku ‘aşiqê dîwane pê tê girêdan. Salik jî di seyr û sulûkê de aşiq e û bi zincîrê hatiye girêdan di xefikê de. Zincîra zulf hin caran bi wateya qeyd û benda kesret û te’eyyunatan jî hatiye bikaranîn.<sup>809</sup>

زخال خدّ نورینش زهی مشک ختن دارم

منال ای دل که در زنجیر زلفش خوش وطن دارم

Menal ey dil di zincîra zulfa de warekî min ê xweş heye

Ji wan deq û rûyê te yê bî nûr ji te re çî miska hoten heye (x.73,b.1)

Şeyda zincîra zulfê bi wateya ‘aşiqê girêdayî bi kar aniye. Girêdana bi zincîrê ji xwe re bidestxistina welatekî dizane. Lewra dema yek bê zincîrkin wî li cihekê girêdidin. Ew cih jî bi piranî ew kesê ku mirov girêdaye nêzîkî wî ye. Şeyda vê yekê tîne ziman. Bi girêdanê nêzîkî me’şûqa xwe bûye. Û ji vê rewşa xwe gazinan nake.

### 3.2.3.7 Zulfê çewgan

Çewgan wek ku tê zanîn ew şiv û ço ye ku serê wî xwar e. Asa jî jê re tê gotin. Bi piranî di destê padîşah, siltan û began de asa heye. Herwiha kesên şivan jî şiv û çoyên wan hene. Asa jî, ço jî, şiv jî ji bo lêdanê û rê destnîşankirinê tê bikaranîn. Ehlê tesewifê di helbestan de zulfê çewgan bi wateya me’şûq bi çewganê xwe li ‘aşiq dixê ji bo ji rê dernekeve, herdem di bin emrê wê de bimeşe hatiye bikaranîn.<sup>810</sup>

<sup>807</sup> قلی زاده، ص، ۱۶۰.

<sup>808</sup> نژاد، ص، ۱۸۱.

<sup>809</sup> نوربخش، ج- ۱، ص، ۵۷.

<sup>810</sup> نژاد، ص، ۱۷۰.

Zulfê çewganê te li serê me dixe

Ez giliyê xwe bi te dikim, were alîkariyê (x.26, b.2)

Şeyda giliyê xwe bi me'şûqa xwe dike. Ev rewşek balkêş e. Lewra kesê ku li wî dide heman kes e ku giliyê xwe bi wê dike. Ev rewş wek rewşa zarok û dê ye. Dê, bi sedema terbiyeyê li zarokan dide û pê re dixeyîde, lê zarok tevî girî û giliyên xwe, xwe davêjin hembêza diya xwe. Lewra hembêza dê hembêza rehmet û şefqetê ye. Şeyda jî ji ber derb û lêdana bi çewganê zulfê xwe davêje hembêza me'şûqa xwe, gilî û gazine zulfa wê dike. Şeyda wek ku xuya bû çewganê zulfê bi asayê me'şûqê bi kar aniye.

### 3.2.3.8 Zulfê Serkeş

Zulfê serkeş du wateyan bi hev re di xwe de digire. Hem bi wateya zulfên dirêj û hem bi wateya zulfên belawela tê bikaranîn. Bi her dû wateyên xwe veşartina rûyê yarê tîne ziman.<sup>811</sup>

مدتی بودیم سرمست هوای خال و خط

کاشکی آن زلف سرکش دور بودی از رخت

Xwezî ew zulfên te yê serkeş dûr bibûna ji rûyê te

Ez demekê sermestê xweşikiya deq û rûyê te bibûma (x.55,b.2)

Şeyda di beyta jor de kula dilê xwe ji mehbûba xwe re dibêje. Xwezî ew zulfên te yên dirêj û ji hev belawela ser çavê te nenixumandina û min demekê têr li rûyê te temaşe bikira û bi vê temaşayê ez mest û sermest ji xwe biçûma.

### 3.2.3.9 Zulfê Ejder

Di helbestên tesewifî de zulf û dirêjbûna zulfê bi hev re hatiye bikaranîn. Lê Şeyda raste rast dirêjahî neaniye ziman. Bi dirêjahiya ejder dirêjahiya zulfê aniye ziman. Dirêjahiya zulfan carînan îşaret dike bi tunebûna kesret û te'eyyunatan.<sup>812</sup> Çawa ku zulf perde ye ji bo dîtina rûyê mehbûbê, herwiha dirêjahiya zulfê jî bi tunebûna te'eyyunatan perde û nîqab e ji bo wechê Xweda.

روز و شب مرغ دلم در دام زلف ازدراست

از خیال شمع رخسارش شدم بی عقل و هوش

Ez bi xeyala ruyê te yê wek mûmê bê 'eql û hiş bûm e

Teyrê dilê min roj û şev di xefika zulfê te yê ejder de ye (x.20,b.2)

<sup>811</sup> کاشانی، رساله مشواق، ص، ۵.

<sup>812</sup> لاهیجی، ص، ۳۳-۳۴.

‘Aşiqê me Şeyda bi xeyala dîtina rûyê me’şûqa xwe ‘eql û hişê xwe berdaye, dîn bûye. Dilê wî ketiye xefîka zulfa me’şûqê, lê kîjan xefîk? Ew xefîka zulfên wek ejderha dirêj ku bûne asteng ji bo dîtina wechê me’şûqa wî. Hem bi şîroveyeke din em dikarin bibêjin şa’ir, dilê xwe şibandîye teyrekî ku ew teyr ketiye xefîka zulfa wek ejderha.

Di mijara zulfê û peywendiyên zulfê de em têdigihêjin ku;

Di berhemên li ser helbestên tesewifê hatine nûsîn de bi gelemperî çar wate ji bo zulfê hatine nîşandan. Şeyda her çar wate jî di helbestên xwe de bi kar anîne.

Şeyda bêtîyên bi zulfê re têkilîya wan heye û dema bi zulfê re tê bikaranîn wateyek tesewifî hilgirtine, wek; *dirêjahiya zulfê*, *serkeşiya zulfê*, *zulfê çewgan*, *zîncîra zulfê*, *reşahiya zulfê*, *xefîka zulfê*, *bêhna zulfê*, *birqandin* û *serê zulfê* jî bi kar anîne.

### 3.2.4 Xal û Xet

Xal û xet, ji ew bêtîyên di wêjeya tesewifê de zêde hatine bikaranîn tî jîmartin. Xal û xet, wek du bêtîyên ji hev cuda hatibin bikaranîn jî bi piranî bi hev re bi kar hatine. Ji ‘xet’ê zêdetir ‘xal’ bitenê tê bikaranîn. Di dîwana helbestvanê me de xet bi tenê nehatiye bikaranîn lê xal bi tenê hatiye bikaranîn. Dema em dinihêrin bikaranîna xal û xet bi hev re hîn zêdetir e.

### 3.2.5 Xal

Di tesewifê de ji bo xal gelek wate diyar bûne. Li ser wateya ‘nuqtîka wehdeta heqîqî ye ku ev nuqtîk destpêk û dawîya kesretan e’<sup>813</sup> lihev kirinek heye. Xal ku bi şikl û dirûvê xwe nuqte ye yekîtiya heqîqetê tîne ziman.<sup>814</sup> Ev nuqtîk kîneye ye ji bo yekîtiya Xwedayê Mutleq. Ev nuqteya xal ne pêkane ji bo famkirina tu kesekî.<sup>815</sup> Ne pêkane famkirin û îdraka wê lewra hatiye şibandin bi huwiyeta xeybî. Xal, bi wateya ew salikê ku li hemberî dinyayê bêxem e, ji bo ku hundirê xwe ava bike derveyê xwe xera kiriye, nefsa xwe nas kiriye û me’şûqa xwe dibîne, û ji ‘alema şuhûdê bi bal ‘alema xeybê rêyek dîtiye jî hatiye gotin.<sup>816</sup>

Şêx Mehmûdê Şebusterî di beytên xwe de mijara xalê bi zimanekî asan rave kiriye. Li ber cemala Xweda nuqteyek heye. Ev nuqte esl û navenda daîreya (grover) mewcûdatan e. Ji vê nuqteyê re ‘xal’ hatiye gotin. Ji vê nuqteyê (xalê) xetek derdikeve û li dora her dû ‘aleman; ku ‘alema xeyb û ‘alema şuhûdê (a li ber çavan) digere û wan digihîne hev. Ji wê re ‘xet’ dibêjin. Çawa însan neynik e ji bo wehdet û kesretê, dilê însan ji ‘eksa (şewq-sîtav) vê xalê

<sup>813</sup> کاشانی، رساله مشواق، ص، ۷.

<sup>814</sup> شوان، ص، ۱۲۶.

<sup>815</sup> لاهوری، مجلد سوم، ص، ۲۲۷۴.

<sup>816</sup> Nilüfer Tanç, "Gülşen-i Vahdet te Seyr u Sülûk Alegorisi Olarak Yüz", *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Cilt: 9 Sayı: 42, Şubat 2016 r. 369.

ye. Xala dilê mehbûba mutleq dema xûn bû, dilê me jî ji 'eksa wê hat holê. Di vir de Şebusterî di gotinên xwe de du dilî ye. Wiha dibêje;

ویا دل عکس خال روی زیباست

ندانم خال او عکس دل ماست

Nizanim xala wî 'eksa dilê me ye

Weya dil 'eksa xala rûyê xweşik e

Paşê wiha didomîne Şebusterî; dil di rûyê wî de ye, ya ew di dil de ye. Ev raz û sira muşkil ji min re veşartî ma.<sup>817</sup> Dema şîroveyên ku li jor hatin kirin bêtin danhev kirin wateyek wiha derdikeve holê: Di xweşikahiya cemala Xweda de nuqtetek heye. Ji vê nuqtetê re 'Xal' hatiye gotin. Li gorî mutesewifan hemû mewcûdat ji vê xalê hatine holê. Piştî avakirina 'alema xeyb û şuhûdê, ji xalê xetek di navbera her du 'aleman de hatiye avakirin ji bo têkiliya navbera her dû 'aleman de. Ji vê re 'xet' dibêjin.

پس بچشم و خال خود آزردهم بی سببیت

در وجود عدمم جز جلوه یک نکته نشد

Di wicûda min a tune de ji xuyabûnekê pê ve tu raz nebû

Vêca tu bi çav û xalê xwe bê sedem ezyetê didî min (x.23,b.8)

Di bedena min a tune de ji xeynî ku carekê tenê te xwe nîşanê min da tu sir û raz ji min re çênebûn. Madem ku rewşa min ev e, tu bi çav û ew deqa li ser rûyê xwe bê sebeb cefa û ezyetê bi min didî kişandin. Şeyda, xal bi xweşikahî û ew deqa ser çav bi kar aniye. Di 'alema erwahan de ew raza xweşikahiya cemala Xweda dîtiye. Di ev 'alema şuhûdê de li pey wê razê digere. Lê mehbûba mutleq bi nîşan nedana çav û deqên xwe bi 'aşîqê xwe ezyetê dide kişandin. Gazina Şeyda ji vê yekê ye. Em dikarin bibêjin Şeyda di meqamê 'naz'ê de ye.

### 3.2.5.1 Xalê Hîndû

Bêjeya xal li gel gelek peyvên din bi hev re tînan bikaranîn. Di helbestên klasîkên farsî û kurdî û rojhelatî de, bêjeyên mîna feqîr, siyeh, reş, muşkîn, dilrûba, 'enberîn, goşegîr, zemîngîr, berdî, heceruleswed, şevê tarîk, hîndû, harût, şebnem, hebeş ...û wd. wek rengdêr û hevalnavê xal bi kar hatine.<sup>818</sup> Xalê hîndû, nîşana 'ebdîtiya bo Xweda ye. Herwiha bikaranîna bêjeya hîndû bîranîna çanda hîndûyan e ku ev çand jî nîşana 'ebdîtiyê ye. Dema ku hîndûyî ji mala xwe derdiketin diçûn ser karê xwe, pêwîst bû biçûna me'bedê û li wir 'ibadet bikirana. Piştî rîtuêlê 'ibadetên xwe li pêş pîr-feqîr-ê me'bedê rûdiniştin. Li ber pîrê wan hevîrek hebû ji wî hevîrî hinekî li rûyê wan dida, li ser enîya wan wek xalekê çêdikir. Rengê wî hevîrî sor

<sup>817</sup> محمد کاظم کهدوبی، "نگاهی به خال هندوی حافظ"، مجله دانشکده ادبیات و علوم انسانی دانشگاه تهران، تابستان و پاییز ۱۳۸۳، دوره ۵۵، شماره ۱۷۱، ص: ۱۴۷-۱۴۸.

<sup>818</sup> هینن، ص، ۲۲۰.

bû, ew xala sor ji sibehê heta êvarê li ser çavê wan dima û nîşana bendayetî û 'ebdîyetiya wan bû.<sup>819</sup> Mutesewifên me bi bikaranîna ev bêjeya xalê hîndû bendebûnî û 'ebdîtiya xwe ya bê dawî û ebedî tînin ziman.

تصدّق بایدت بر این فقیر خال هندویت

نصاب حسن دیرینت حسابی قَط نمی دارد

Pîvana xweşikahîya te ya qedîmî qet nayê pîvanê

Pêwîst e ji vê feqîrî re ji wê şanika reş sedeqe bidî (x.14,b.3)

Şa'irê me di beyta xwe de xalê hîndû bi wateya 'ebditiyê bi kar aniye. Wek ku tê zanîn ji pîrê hîndûyan re feqîr tê gotin. Şa'ir, xwe wek wan feqîrê hîndûyiyan dibîne ku hemû karê wan zikr û 'ibadet in. Ez ewqas ji te re 'ibadet dikim, bû me bendeyê te, ji wê xweşikahiya xwe ya bêdawî wek ku mirov sedeqekê dide feqîran xêra xwe tiştêkî ji min re jî bibexşîne. Daxwaza şa'ir dîtina xweşikahiya mehbûbê ye.

### 3.2.5.2 Xalê Hebeş

Rengê şanikê reş e. Reşahiya şanikê, xalê wek têgehekî di tesewifê de bi cih bûye. Ji 'alema xeybê re xalê reş hatiye gotin.<sup>820</sup> Hem bi wateya tarîbûniyê hatiye bi sedema ku dibe perde ji bo rû.<sup>821</sup> Wek perdeyekê dikeve ser rû û xweşikahiya rû di bin wê taritiyê de dimîne.

مفتون خال حېشم یا للفوانی مالها

شیدای زلف سرکشم مجنون قوس مهوشم

Şeydayê zulfê serkêş im, dîne birûyê wek hîvê me

Meftûnê xalê hebeş im, hawar ji destê faniyan (x.3,b.7)

Helbestvan, ji dewsa reş bi kar bîne bêjeyek ku reşitiyê bi bîr tîne bi kar aniye. Hebeş kînaye ji Hebeşistanê û însanê hebeşî ne ku rengê bedena wan reş in. Şeyda dildayî wê xalê bûye ku rengê wê reş e. Şeyda her 'aşiqê tiştê baqî ye. Lewma bêjeya zulfê bi kar aniye ku yek ji wateya zulfê her du sifetên Xweda; Cemal û Celal in. Hem zulf û hem birû bi wateya cemala Xweda bi kar aniye û piştê jî dildayê ew xala hebeş bûye ku hemû cemelê vedişêre. Şa'ir aşiqî cemelê ye, dil daye camalê û meftûn û zebûnê ew cemala veşartiye. Xuyaye ku şa'ir di beyta xwe de xalê hebeş bi perdeya ku xweşikahî veşartiye, bi kar aniye.

<sup>819</sup> کهدویی ، ص، ۱۴۷- ۱۴۸.

<sup>820</sup> عراقی ، ص ، ۱۰

<sup>821</sup> لاهوری ، مجلد سوم ، ص، ۲۲۴۷.

### 3.2.6 Leb

Leb bêjeyeke farsî ye wateya wê lêv e. Lêva ku ji ber tîbûnê ziwa dibe û avê dixwaze. Ew lêva ku gotin û axaftin jê derdikevin. Lêv di wêjeya tesewifê de bi çend wateyan hatiye bikaranîn. Li jêr em ê li ser wateyên lêvê ku di dîwana Şeyda de hatine bikaranîn bisekinin.

Lêv axaftina mehbûbê ye. Ew gotina bi sîrr û raz e<sup>822</sup>. Ew peyv û gotinên qala husn û cemala mehbûbê dike.<sup>823</sup> Ş'air dema qala nazikî û xweşikahiya me'şûqa xwe bi kêfxweşiya dil dixwaze bîne ziman ji têgeha lebê û bi taybet ji lebê le'l sûdê werdigire.

ای که از عشق و جمالت گشته ام مدهوش و مست      جامی از لعل لب نوشیده ام روز الست

Ey ew a ku ez ji 'îşq û cemala wê mest û serxweş bûme  
Camek ji lêvên te yên sor min vexwar roja elest (x.22,b.1)

Di roja elest de ji devên me'şûqa xwe hin sir û raz bihistine û bi wan sir û razan mest û sermest bûme. Dema vê mijarê dibêje cemal, xweşikahiya me'şûqa xwe bi kêfxweşiyekê tîne ziman.

Leb, jiyana bêdawî ye, ebedî ye.<sup>824</sup> 'Aşiq bi bihîstina peyvekê ji devê me'şûqa xwe an bi vexwarina mey, bade û şerabê ji devê mehbûba xwe jiyaneke bêdawî bidest dixwe. Di rastiye de ev jiyana ne jiyana dinê ye. Jiyana axretê ye ku bi çûyina bihiştê tê bidestxistin.

گر نهی لب بر لبم یابم حیات جاودان      روز عقبا میثوم در گلشن فوز و فلاح

Eger tu lêva xwe bidî lêva min jiyaneke ebedî bi dest dixim  
Di axretê ez ê bigihêjim xelasî û rihetiyê di nav bihiştê de (x.30.b.5)

Şa'ir bi sedema ku bikaribe bigihêje jiyaneke bêdawî ji lêva mehbûba xwe tiştêkî dixwaze. Eger mehbûba wî ji lêva xwe tiştêkî bide wî ew ê roja axretê di bihiştê de bigihêje xelasî û rehetiyê.

Leb dijwariya 'îşqê ye. 'Îşq wek rengê xwînê ye. Lebê le'l, hêstirên 'aşiqî ye û wek rengê xwînê ye. Ev hemû zorbûnî û dujwariya rêya 'îşqê ye.<sup>825</sup> Her çend ev wate ji bo lebê le'l hatibe nasandin jî em dibînin ku Şeyda leb bi tenê di vê wateyê de bikar aniye.

مرا تاکی بسوزی جان من باری تلاف کن      بنه لب بر لب شیدا که خدمتکار دیرینم

Heta kengî tu yê canê me bişewitînî tew nebe litif bike  
Lêva xwe bide ber lêva Şeyda ku ez xizmetkarê te ye kevî im (x.67,b.9)

<sup>822</sup> عراقی، ص ۱۰، 212; Cebecioğlu, r.

<sup>823</sup> نوربخش، ج - ۱، ص ۷۵.

<sup>824</sup> Duygu Albudak, *Kadı Burhaneddin ile Seyhî'nin Gazellerinin Din ve Tasavvuf Açısından Karşılaştırılması*, Yüksek Lisans Tezi, Trakya Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, 2008 r. 31-32.

<sup>825</sup> تسکین دوست، ص ۱۴۳.



Xizmetkar di beytê de bi wateya ‘aşiqî hatiye. Şa’ir wek giliyê xwe bi me’sûqa xwe dike dibêje; ez ‘aşiqê te yê kevn im. Heta kengî tu yê canê min bişewitînî. Tew nebe hinek rehmê li min bike, vê dijwariyê ji ser min rake.

Leb peyva devê murşidê kamil e. Devê ku hebûn û ‘işq tê da veşartî ye. Kesê ku di derbarê heqîqetê de dev şîrîn in û heqaîq û remz û razê jiyane fam kirine û heqîqetê bi zimanê şîrîn beyan dikin.<sup>826</sup> Murşidê kamil, rêber e ji bo salikî di rêya seyr û sulûkê de. Pêdiviya salik di rêya seyr û sulûkê de bi rêbertiya murşidê kamil heye. Ew gotinên murşidê kamil di warê rêbertiyê de bi lêvê hatiye ziman.

لبت آب حیات و کوثر است ای عاشق باقی کسی لفظت بجان بشنید رها کردد من الانواب

Lêva te wek ava heyat û kewserê ye, ey ‘aşiqê Xwedayê Baqî

Kesê peyvek bi dil ji te bibihîze xelas dibe ji belayan (x.11, b.4)

Şeyda di vê beytê de *leb*, di dewsa peyva ji devê weliyê Xwedê derdikeve bi kar anîye ku em vê welîtiyê ji bêjeya ‘*Aşiqê Baqî* derdixin. Lêva murşidê kamil dişibîne ava heyatê û ava kewserê. Kesê ku peyvekê bi tenê bibihîze ji lêva dostê Xwedê û bi dil û can guhdarî bike xelas dibe ji bela û mûsibetan ên di rêya seyr û sulûkê de hene. Bi vî rengî digihêjin miraza xwe.

### 3.3 Hin Têgehên Din

#### 3.3.1 Ab

Bêjeyek farsî ye. Av, ab, bi mecazî, metaforî; bi wateyên wekî: xweşikbûnî, delalî, bedewî, çelengî<sup>827</sup> hatiye sepandin. Di tesewifê de, têgehên wekî; me’rifet, feyza Îlahî, zat, hebûn, heyîn, nefsa ku gihastiyê kemalê, rihê ‘e’zem û ‘eqlê giştî, kull<sup>828</sup> temsîl dike.

Ab, bi wateya ‘bav’ jî hatiye bikaranîn. Bav çawa sê tiştên zarokên xwe terbiye dike, ku, ‘eql, nefis û cism e’<sup>829</sup>, ab jî wek kaniya heyatê salik terbiye dike.

Şa’irê me Şeyda, Ab, bi bêjeyên yekgirtî bi kar anîye. Abê Ateşgûn, Abê Selsebîl û Zencebîl, Abê Heyat û Abê Heywan.

#### 3.3.1.1 Abê Ateşgûn

Ateşgûn, bêjeyek farsî ye û bi wateya rengê sor wek êgir hatiye lê bi kînaye tê wateya şeraba sor.<sup>830</sup> Şerab jî wek ku tê zanîn di tesewifê de mehebbet û ‘işqa salikî ye.

<sup>826</sup> ۲۵۹ ص، تسکین دوست، Muhterem Saygın, *Usûlî Divanı’nda Din Tasavvuf ve Cemiyet*, Yüksek Lisans Tezi, Pamukkale Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Eski Türk Edebiyatı Programı, Denizli 2016, r.35.

<sup>827</sup> Uludağ, hb. r. 17.

<sup>828</sup> Cebecioğlu, hb. r. 1.

<sup>829</sup> العجم، ص ۲۰.

چون چشیدم یک قدح زان آب آتشگون تو      بحث فردوس جحیم و فکر این و آن نبود

Bi sedema vexwarina yek qedehek ava te ya wek êgir

Êdî ji me ra behsa bihişt û dogeh û tiştên din nema (x.34,b.8)

Şa'ir dibêje; bi sedema ku me qedehek ji şeraba te ya sor vexwar, ango ji dema ku min ji te hez kir, êdî qîmeta tu tiştêkî li ber çavê min nema, êdî nefsa me daxwaz û teleba bihiştê jî nake, tirsas me ya ji ketina dogehê jî nemaye. Di fikir û ramanên me de bes hezkirina te heye. Ji xeynê te û gihaştina te, tiştêkî dîtir nîne.

Di vê beytê de ab bi wateya tesewifî, me'rîfetê nîşan dike. Lewra hez kirin ji me'rîfetê, ji naskirinê tê. Dema nas kirin tune be hez kirin peyda nabe. Şeyda dibêje ji dema ku min te nas kir û ji te hez kir, hezkirina te ket dilê min, daxwaza min her gihaştina te ye. Li jor me got *ab* di heman demê de tê wateya terbiyeyê jî. Di beyta Şeyda de, ev wate jî derketiye holê. Nefsa însan hertim li pey tiştê xweş û xweşik dimeşe. Bihişt cihê herî xweş e ku misliman her daxwaz dikin bigihêjin wê xweşî û xweşikahiya wê. Dogeh jî, misliman xwe jê diparêzin ji ber ku cihekî gelek nexweş e. Lê em dibînin bi terbiye û perwerdehiya tesewifê ji Şeyda re xweşî û nexweşiya bihişt û dogehê bê qîmet kiriye. Şeyda her li pey gihaştina Xweda ye. Em çawa fam dikin ku Şeyda li pey gihaştina Xweda ye? Di zikrê Neqşebendiyan de<sup>831</sup> (إلهى انت) *Îlahî ente meqsûdî we ridaeke metlûbî* ' *Ya Rebî, meqseda min Tu yî, daxawaza min jî razîbûna Te ye* ' hevokek zikrê ya sereke ye. Armanca terîqeta Neqşebendî ya sereke wek ku ji hevoka zikrê wan hat famkirin gihaştina Xweda û razîbûna Xweda ye. Ji beytê tê famkirin ku nefsa Şeyda hatiye terbiyekirin. Ji ber vê terbiyeya nefsa Şeyda ji Xweda pê ve tiştêk ne girîng e, ne xweşikahiya bihiştê û ne tirsas çûyina dogehê.

### 3.3.1.2 Abê Selsebîl û Zencebîl

Selsebîl û Zencebîl du bêje ne di Qurana Pîroz de derbas dibin. (وَيَسْقُونَ فِيهَا كَأْسًا كَانِ )

832،، *Ew, tê de ji meyeke wisa tene avdayîn ku zencefîl tevî* (مَزَاجُهَا زَنْجَبِيلًا \* عَيْنًا فِيهَا تُسَمَّى سَلْسَبِيلًا) *wê bûye. Ew şerab di bihiştê de kaniyeke wisaye ku jê re 'selsebîl' tê gotin.*<sup>833</sup> Selsebîl di bihiştê de navê kaniyê ye û zencebîl jî navê ava wê kaniyê ye.

قط مگو با ما وعید دوزخ وعهد بهشت      بحث آب سلسبیل و زنجبیلش در مزاج

<sup>832</sup> Qurana Pîroz, Însan, 17-18.

<sup>833</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 578.

<sup>830</sup> عمید، ص، ۱۹.  
<sup>831</sup> الباطومی، ص، ۵۱.

Ji me ra qet behsa tirsra dojhê û soza bihiştê neke

Û behsa ava selsebîl û zencebîlê neke di xisleta me de hezkirina wan heye (x.29,b.2)

Şeyda di heman beytê de ji mehbûba xwe re dibêje, me bi agirê dojhê netirsîne û soza bihiştê jî nede me. Ji me re behsa ava selsebîl û zencebîlê jî neke, ku hin kes bi çûna bihiştê û vexwarina vê avê kêfxweş dibin. Em ne ji wan kesa nin.

Dema mirov bêjeyên beyta Şeyda yeko yeko bigire û watedar bike bêjeya ‘ab’ê wek wateya ferhengî, av, xuya dike. Çawa ku tê zanîn ji bo wateyên bêjeyên helbestan bîn famkirin bi kêmanî divê li beytê bête nihêrîn. Dema em li beyta Şeyda binêrin, Şeyda bi bêjeyên ‘*abê selsebîl û zencebîl*’ê bihişt û xweşî û xweşikahiya wê dide ber çavan. Bihişt armanc e ji bo mislimanan. Xelata Xweda ye ji bo kesên ku li dinyayê di rêya Xweda de meşiyane. Şeyda vê xelatê naxwaze. Ji ketina dojhê jî natirse. Ji ber hindî dibêje ji me re qet behsa tirsra çûyina dojhê, xweşî û xweşikahiyên bihiştê neke. Ez vê naxwazim. Daxwaza min û mirazê min her gihaştina te ye. Di beytê de Şeyda xwestina gihaştina bal Xweda zimnen/nerasterast aniye ziman û bi bêjeyên abên ‘*selsebîl û zencebîl*’ jî ew xweşikahiyên bi giştî dilê mislimanan û bi taybetî jî dilê salik û sofîyan bi bal xwe ve dikişîne, bi kar anîne.

### 3.3.1.3 Abê Heyat

Ji du bêjeyan pêk tê. Bêjeya yekem farsî ye, a duwem ‘erebî ye. Wergera wê ya bi kurdî; ‘ava jiyane’ ye. Kesê ku vê avê vexwe digihêje jiyaneke bêdawî, nema dimire. Kesê ku dilopekê tenê jî jê vexwe, jiyaneke bêdawî didomîne.<sup>834</sup> Di destana Îskenderê Zulqerneyn de, Îskender li pey ev ava jiyane an kaniya jiyane li dinyayê geriyaye, heta gihaştîye welatê tarîstanê (cihê ku qet ronahî lê tune ye, herdem tarî ye). Li welatê tarîstanê rastî kaniya ava jiyane hatiye, lê ji wê avê venexwariye.<sup>835</sup>

Hem bi zimanê farsî û hem bi zimanê ‘erebî gelek nav li vê avê hatine kirin. Heman nav bi kurdî tên wateya *Ava Jiyane* an *Kaniya Jiyane*. *Abê Cawîd*, *Abê Cawîdan*, *Abê Beqa*, *Mau’l Beqa*, *Mau’l Heyat*, *‘Eynu’l Heyat*, *Abê Zindegî*, *Abê Zindeganî*<sup>836</sup> û ji ber ku hezretî Xizir (s.l.) ev av vexwariye *Abê Xizir* û ji ber ku Îskender li vê avê geriyaye *Abê Îskender* jî

<sup>834</sup> Uludağ, hb. r. 20.

<sup>836</sup> Uludağ, hb. r. 20.

<sup>835</sup> سجادی ، ص ۲۰-۳.

jêre tê gotin.<sup>837</sup> Di ferhengan de, *Abê Heyat û Abê Heywan*<sup>838</sup> bi hev re û bi hemwateyî hatine nivîsandin.<sup>839</sup>

Abê Heyat an Abê Heywan wek têgehên tesewifî; kaniya ‘eşq û mûhebbetê/ hezkirinê, ku kesên ji vê kaniyê avê vexwin mirin û tunebûnê ji wan re namîne û peyv û pend û nefesên weliyên Xweda<sup>840</sup> nîşan dide. Kaniya ‘eşq û mehebbetê ye lewra dema ‘aşiq ‘işqa me’şûqî bi dest xist êdî ji wî re mirin namîne. Gotinên ji devê murşidê kamil derdikevin ji salikî re rêçên seyr û sulûkê nîşan dide, astêngên di rêyê de û xelasiya ji wan astengan destnîşan dike. Ji ber hindî ji salikî re her axaftineke şêx ava heyatê ye ji bo gihaştina meqseda wî.

Nesefî, Ava Heyatê wek behra nûrê pêzanî dike. Ev behra nûrê di nava tarîtiyê de ye. Nesefî wiha rave dike; ‘alema melekûtê behra nûrê ye, ‘alema mulk behra zulûmatê/tarîtiyê ye. Ev behra nûrê *ava heyatê* ye û di nav tarîtiyê de ye. Ev behra nûrê, bi behra ‘ilm/zanist û hikmetê li hemberî behra tarîtiyê ye. ‘Ilm û hikmet *ava heyatê* ye û di hundirê tarîtiyê de ye.<sup>841</sup> Şîhabuddîn Suhrewerdî wiha şîrove dike; *ava heyatê*, nîşan û îşareta gihaştina me’rifeta/zanebûna heqîqeta/rasteqîna Heq (Xweda) e.<sup>842</sup> Di her dû wateyan de armanca gihaştina tişteki heye. Ev gihaştina vê armancê di tesewifê de bi rêya seyr û sulûkê tete encam dayîn. Ji ber hindî *ava heyatê* ji bo murşidê kamil jî tê bikaranîn.

یک جرعه زان خمیره نی گفتار بیارید

من تشنه لبم منتظر آب حیاتم

Lêvên min zuha bûn li benda *ava heyatê* ne

Dilopekê ji ew şeraba gotinên xwe bîne (x.41,b.2)

Ava heyatê di beyta Şeyda de bi wateya kaniya ‘işqê bi kar hatiye. ‘Aşiq herdem amade û li bendê ye ku me’şûqa wî biaxive û ew jî ji wê axaftinê çêjê werbigire. Di tesewifê de salik li bendê ye ku me’şûqê heqîqî Xweda tecelliyatên esma û sîfatên xwe bişîne qelbê wî. An li bendê ye ku murşidê wî, hîmmetekê lê bike. Ji helbesta Şeyda xuya dibe ev xwestina wî ji Xweda ye. Xweda me’şûqê heqîqî ye û Şeyda li bendê ye ku Xweda ji kaniya ‘işqê dilopekê jê re bişîne û bi vê dilopê bigihêje jiyanê bêdawî.

کسی لفظت بجان بشنید رها کردد من الانواب

لبت آب حیات و کو تراست ای عاشق باقی

Lêva te wek *ava heyatê* û kewserê ye, ey ‘aşiqê Xwedayê Baqî

Kesê peyvek bi dil ji te bibihîze xelas dibe ji belayan (x.11, b.4)

<sup>837</sup> Cebecioğlu, hb. r. 12.

<sup>838</sup> Şükun, hb. r. 9.

<sup>839</sup> Kanar, hb. r. 9.

<sup>840</sup> Uludağ, hb, r. 20.

<sup>841</sup> سجادی، ص ۳.

<sup>842</sup> سجادی، ص ۳.

Şeyda di vê beytê de *Abê Heyat*, bi wateya peyv û gotinên ji devê weliyê Xweda derdikeve bi kar anîye. Em vê agahiyê ji bêjeya '*Aşiqê Baqî* derdixin. Lewra Şeyda pesnê murşidê xwe bi '*Aşiqê Baqî* dide. Şêxê wî 'aşiqê Xweda yê. Lewra yek ji navên Xweda Baqî ye. Şeyda di vir de ji bo beyta wî bi hêz be di misraya yekem de pênc têgehên tesewifê bi hev re bi kar anîne. Leb, abê heyat, kewser, 'aşiq û baqî. Peyv û gotinên ku ji devê murşidê wî derdikeve wek ava heyatê û ava kewserê di rêya seyr û sulûkê de jiyaneke bê dawî dide salikî. Lê ev gotin tenê ne ava heyatê ye, di heman demê de wek ava kewserê ye jî. Ava kewserê ew av e; di roja axîretê de misliman jê vedixwin û êdî nema tî dibin.<sup>843</sup> Kesekî ku ji devê murşidê Şeyda peyvekê bi dil û can guhdarî bike xelas dibe ji bela û mûsîbetan êdî di rêya seyr û sulûkê de jiyaneke aram û bêdawî, ebedî ew ê bi dest bixe.

### 3.3.1.4 Abê Heywan

می شوی دائم بانواع بلاها دل کزئیب

تا نوشی ساغری از آب حیوان لبش

Heta ku venexwî tasek ava heywanê ji lêva wê

Hertim di nav cureyên belayan de dilê te ew ê şikestî be (x.9, b.6)

Şeyda di beyta jor de abê heywan û leb bi hev re bikar anîne. Di tesewifê de yek ji wateyên lebê sifetê jiyane ye.<sup>844</sup> Ji ew lêvên me'şûqa heqîqî ku sedema jiyane yê, eger tu îskanek ava zanebûn û me'rifetê venexwî, di rêya gihaştina me'şûqê de - rêya seyr û sulûkê ye, ev rê tarî û tê da gelek neyar û xefîk û tehlûke hene - hertim dilê te wê bi derd û belayên cure cur xemgîn bibe û tu yê negihêjî meqsed û mirazê xwe.

### 3.3.2 Batil

Di ferhengan de bi wateyên tiştên bê binyad, tiştên bê esas, tiştên nelê,<sup>845</sup> tiştên ku rastiya wan tune ye, tiştên vala,<sup>846</sup> peyvên ku guneh ji wan çêdibin û heram in,<sup>847</sup> hatiye bikaranîn. Batil, dijber, ziddê heqq<sup>848</sup> tê bi van wateyên xwe.

Batil bi wateya têgehek tesewifî; wateyên, masîwa, her tiştê ji xeyrê Xweda û tunebûniyê<sup>849</sup> di xwe de digire. Lewra qet hebûnek ji batilê re tune ye, eşya ku hebûnek peyda bike dibe heqq.

Şeyda di beytên xwe de batil bi wateya tunebûyînê bi kar anîye. Di heman beyta ku em jê mînakê digirin batil û heqq, yanî tunebûn û hebûnê bi hev re bi kar anîye.

<sup>843</sup> Çantay, hb. c. 3, r. 445.

<sup>845</sup> Uludağ, hb. r. 67.

<sup>846</sup> Cebecioğlu, hb. r. 43.

<sup>844</sup> نوربخش، ج - ۱، ص ۷۶.

<sup>847</sup> العجم، ص ۱۳۸.

<sup>848</sup> الحكيم، ص ۳۳۷.

<sup>849</sup> الحكيم، ص ۳۳۸.

Di navbera batil û heqq de ji me ra cudahî tune ye

Eger peyva devê te ya wek cewher ji me re nebe rêber (x.4,b.2)

Ey mehbûba min! Eger peyv û axaftinên mîna cewherên hêja û giranbiha ji lêvên te em nebihîzin û ji me re rêbertiyê neke, di navbera hebûn an tunebûna me de cudahî tune ye. Hem ji bo wateya beytê û hem jî ji bo wateya bêjeya batil bê famkirin divê wateya *le'le leb* a tesewifî bê nîşankirin. Di ferhengên têgehên tesewifî de le'le hatiye nivîsandin. Lê Şeyda wek Hafîzê Şîrazî cihê her dû bêjeyan guhaztiye.<sup>850</sup> Le'le leb an le'le; cihê şeraba me'rîfet û zanayiyê ye û viyana Xweda ye.<sup>851</sup> Eger şeraba me'rîfet û zanayiyê ji me re rêbertiyê neke ji bo gihaştina te di navbera hebûn û tunebûna me de tu cudahî tune ye. Armanca hebûna me her gihaştina te ye. Dema em nikaribin bigihêjin te ew ê çî cudahî hebe ji bo hebûn û tunebûna me.

### 3.3.3 Behr

Bêjeyek ji zimanê 'erebî hatiye. Derya, zerya. Di edebiyata tesewifê de bi gelek wateyan tê bikaranîn. Tecelliyatên Xwedayê te'ala û heqîqetên îlahî, wek pêlan bi şeklê me'rîfetê ji însanan re tên, bi behrê hatiye îfadekirin.<sup>852</sup> Meqamên zat û sîfatên Xwedayê Te'ala ên bêdawî ku temamê mewcûdat û eşya pêlên vê behrê ne. 'Alema hebûnê a kullî, wehdet û kesret pêlên vê behre ne.<sup>853</sup>

Îbnî 'Erebî, bêjeya behrê li hemberî berrê (bejayî) bi kar aniye. Li gorî Îbnî 'Erebî, behr; batin/derûnî û me'newî, berr; zahir û bedenî dest nîşan dike. Îbnî 'Erebî li gorî ayeta Qurana Pîroz digihêje van wateyan.<sup>854</sup> *وَهُوَ الَّذِي جَعَلَ لَكُمُ التُّجُومَ لِتَهْتَدُوا بِهَا فِي ظُلُمَاتِ الْبَرِّ وَالْبَحْرِ قَدْ* (Ew Xwedayê ku stêrk ji bo we (li asîmanan) danîn da ku hûn riya xwe di tarîtiya bejahiyê û deryayê de bi wan bibînin. Bêguman ji bo civateke ku bifikirin me bi berfirehî nîşanên (qudreta) xwe aşkera kirine)<sup>855</sup> Bêjeya 'berr' ê ku di ayetê de derbas dibe; di seyr û sulûkê de 'emel û kirinên zahir û bi bedena însan tên kirin nîşan dide. Behr jî di seyr û sulûkê de 'emel û kirinên bi nefse tên kirin ku batinî û me'newî ne hatiye şîrovekirin.<sup>856</sup>

<sup>850</sup> Der qelem awered Hafîz qisse ê le'le lebeş

Abê heywan mî rewed her dem z eqlamem henuz (حافظ شیرازی، ص، ۳۰۵).

<sup>851</sup> تسکین دوست، ص، ۳۵۳.

<sup>852</sup> Cebecioğlu, hb. r. 38.

<sup>853</sup> Uludağ, hb. r. 64.

<sup>854</sup> Qurana Pîroz, En'am, 97.

<sup>855</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 139.

<sup>856</sup> الحكيم، ص، ۱۸۳-۱۸۵.

Hem bi yekjimarî, mufred, hem bi pirjimarî, cem' û hem bi hevedudanî, terkiybên behrê di edebiyata tesewifê de pirr hatiye bikaranîn. Wek mînak em hinekan destnîşan bikin; behrê bî payan, behrê bî giran, behrê mûhît, behrê ebediyet, bîharê ûlûhiyet, biharê îlham, biharê tefekkur, bîharê 'eta, behrê ezel, behrê ezeliyet, behrê ûlûhiyet, behrê înbîsat, behrê bela şatî, behrê tecellî, behrê ceberrût, behrê heyat, behrê heyret, behrê 'îşq, behrê melekût, behrê qudsî, behrê qidem, behrê qulzem, behrê kîbriya, behrê nûr, behrê wehdet<sup>857</sup>.

Behr, bi wateyek giştî, kînaye ye ji bo pirbûnî û bêdawîbûniyê. Behr meqamê yekîtiyê û pêla meqamê pirrbûniyê ye. Wek wateya ji Behra 'Eta re hatiye dayîn, ku, Feyza Xweda ya daimî ye, Behra Mûhît, kînaye ye ji bo nûra Xweda ya bêdawî, wateya Behra Bela Şatî; deryaya bêсахil, bêdawî ye.<sup>858</sup>

Li gorî pênasîn û te'rîfek din behr; dinya ye. Dinya û tiştên ku li dinyayê tîn serê mirov, wek; xetere, talûke, derd, keder, tirs û nepenî ne.<sup>859</sup>

Şeyda di dîwana xwe de şanzdeh cureyên behrê û carek jî derya bi kar anîye. Deryayê 'Isyan, Behrê Keremkar, Behrê Şerî'et, Behrê Mûhît, Behrê Zunûb, Behr, Behrê Bela, Behrê Feyz û Cûd, Behrê 'Îrfan, Behrê Zaxir, Behril Humûm, Behrê 'Umman, Behra Kerbê, Behrê Terîqet, Behr-il Me'arif, Behr-il Wefa, Behrê 'Îşq.

### 3.3.3.1 Behrê 'Umman

الا ای شاه فاروقی ز حال ما تفقد کن      که جودت بحر عمان است منم بنده توی سلطان

Ey şahê farûqî li ser ev rewşa me şefqetê li me bike

Kerema te behra 'umman e, tu siltan î ez geda me (x.78,b.5)

Di beyta jor de Şeyda; kerem, rehm û beşsendeya mehbûba xwe wek behra 'ummanê pirr û bêdawî dibîne, pesnê mehbûba xwe bi pirrbûna kerema wî dike. Cûd, yanî qencî û camêrî di beyta Şeyda de ne qencî û camêriya mal û diravan e. Camêrtî belav kirina feyd û himmeta me'newî ye. Di vir de derket holê ku Şeyda di heman beytê de bêjeya cûdê jî bi wateyek tesewifî bi kar anîye. 'Umman jî bi serê xwe têgehek tesewifî ye. Wateya wê, cihên derxistina durr û sedefan e. Ango cihê me'rîfet û zanebûna Xweda ye.<sup>860</sup> Di heman demê de bêdawîbûniyê jî di xwe de digire, lewra dawiya zanebûna Xweda tune ye. Şeyda dibêje; Camêrtiya te ya belavkirina feyd û himmetê wek ew behra me'rîfet û zanebûna Xweda bêdawî ye. Ji wan feyd û himmetan tiştek bila para me jî bikeve. Li rewşa me binihêre, tu siltan î û em jî bendeyên te ne. Şayesteyê siltanan e ku qencî û camêriyê bikin.

<sup>857</sup> سجادی ، ص ، ۱۸۶ .

<sup>858</sup> سجادی ، ص ، ۱۸۷-۱۸۹ .

<sup>859</sup> العجم ، ص ، ۱۳۹ .

<sup>860</sup> Tenik, *Ahmed Kuddûsî ve Tasavvuf Düşüncesi*, r. 120.

Şeyda di beytên xwe de, wek, Terîqet, Behr-il Me'arif, Behr-il Wefa, Behrê Keremkar, Behrê Şerî'et, Behrê Mûhît û wd. bi vê wateyê bi kar tîne.

### 3.3.3.2 Behrê Bela

در بحر بلا غرق شده اند هر که بلی گفت  
زیرا ز عجبهای جمالش خبری نیست

Di di nav behra belayan de noq bûne ew kesên gotin erê

Lewra ji xweşikbûna te ya derî edet hay jê tunebûn (x.25.b.3)

Di beyta jor de Şeyda; gazinên xwe bi mehbûba xwe dike. Di nav behra derd û kul û belayan de xerq bûne ew kesên ku di roja 'Qal û bela' de gotin erê û te bi Rebbîtî qebûl kirine. Lewra wan nizanibûn û hay jê tunebûn ku xweşikbûyîna te ewqas mirov mat û metel û şaşwazî dike û dihêle. Şeyda di beyta xwe de behra belayê bi wateya derd û kulên di 'işqa Xweda de tîna serê salikî bi kar aniyê. Dîtina cemal û xweşikahiya Xweda ne tiştêkî erzan û asan e, jê re rêyek dûr û dirêj divê. Ji ber hindî ş'air bêjeya belayê bi kar aniyê. Lewra bêjeya belayê têgehek tesewifî ye û di beytê de şa'ir bi heman wateya tesewufî bi kar hatiye. Bela, azmûn û îmtîhan e di tesewifê de ji bo peydakirina hêz û quwwetê û bidestxistina nêzîkahiye. Bela, wek cil û bergê Welîyan û zad û xorekê Nebîyan hatiye nasandin. Wek ku di Hedîsa Resûlê Xweda (s.x.1.) de derbas dibe, belayên herî mezin taybetê Nebîyan e paşê welîyan e û paşê li gorî qencbûniya kesan e.<sup>861</sup> Şa'ir vê rastiya wateya belayê aniyê ziman. Kesê ku dostaniya Xweda bixwaze divê amade be ji bo belayan. Di vê beytê de em dibînin ku şa'ir du têgehên tesewifê bi hev ve girêdane û bi kar anîne.

### 3.3.4 Dergah

Bêjeyek farsî ye. Derî, şemîk<sup>862</sup> wateyên dergah ên ferhengî ne. Di tesewifê de, bi wateyên wek; kax, pêşerbûnî-huzûr<sup>863</sup>, tekke, xanqah, zawiye,<sup>864</sup> hatiye bikaranîn. Cih û warê ku şêx, murşidê kamil lê disekine û salik û murîd lê dicivin jî bi dergah tê nasîn. Di helbestan de eger mûxateb Xwedayê Te'ala be bi nêzîkbûniyê divê bête famkirin.<sup>865</sup> Eger mûxateb ne Xweda be bi mecazî tê bikaranîn. Mecaz e ji bo xwestin û gihastina 'işq, feyz, himmet, mehebbet, bexşandin, rêbertiya ku salik û murîd di van mijaran de pêdivîya wan bi şêx û murşidê kamil heye.

رقیب وصلت یارم اسیر روی شیرینم

ولی هر دم امیدوارم ز درگاہت رجا کارم

<sup>861</sup> سجادی، ص، ۱۹۹، ۲۰۰.

<sup>862</sup> Cebecioğlu, hb. r. 78.

<sup>863</sup> Kanar, hb. r. 341.

<sup>864</sup> Uludağ, hb. r.102.

<sup>865</sup> Ziya, hb. c. 2, r. 876.



Lê herdem ez hêvîdar im û ji dergahê te tika dikim

Dizdarim ji bo gihaştina yarê û dîlê rûyê şîrîn im (x.67,b.5)

Şeyda di vê beytê de dergah bi wateya ‘işq û mehebbet û bexşandinê bi kar anîye. Ji bo bexşandina xwe bi vî rengî xwe diparêze. Ewqas ez ji te hez dikim ku ez bûme dîlê wechê te yê xweşik. Bi sedema ku ez bikaribim bigihêjim te, wek cerdevan û dizdarekî, ez hezkirina te diparêzim. Bi van sedeman hertim min hêviya xwe wenda nekir û li ber dergahê te sekinîme, ez ricakar im ku bigihêjim ‘işqa te.

### 3.3.5 Dîn

Bêjeyek ‘erebî ye. Bi wateya rê, şêwaz û metodê de hatiye bi kar anîn.<sup>866</sup> Di istilaha Îslamî de, rê û rêbaz in ku têkiliyên navbera Xweda û ‘ebd saz dikin.<sup>867</sup> Dîn, heman rê û rêçik in ku, bi fermana Qurana Pîroz û li gorî hedîsên Resûlê Xweda ku divê ‘ebdê Xweda pêk bîne.

Wek bêjeyek tesewifî, baweriya ku di meqamê firqetê (cudahî- ji hev qetandin) tê holê<sup>868</sup> dîn jê re tê gotin. Li gorî wateyek din, însan nefsa xwe ji Xwedayê xwe re nizm bike<sup>869</sup> bi dîn hatiye nasandin.

حسنَتِ جِهَانَ كَرَفْتَهُ مِنْ مِصْرٍ تَابِتِيْرِيْنَ

وَصَلَتْ نَشْدَ مَيْسَرٍ بِي تَرْكِ دِيْنٍ وَ دُنْيَا

Gihaştin pêk nayê, bê terkkirina dîn û dinyayê

Xweşikbûna rûyê te ji Misrê gihaştiye Tebrîzê (x.47,b.7)

Nav û dengê xweşikbûniya rûyê te li dinyayê belav bûye, ji Misrê gihaştiye heta Tebrîzê. Lê belê ji bo em bikaribin bigihêjin ev xweşikbûniya te divê em terka dîn û dinyayê bikin.

Şeyda di vê beytê de Dîn, wek ku li jor hat nasandin, di meqamê firqetê de bi bawerî û hêviya gihaştinê bi kar anîye. Ji bo gihaştina mehbûba xwe, ku vê gavê jê dûr e - di meqamê firqetê de ye – bi bawer e ku ancax bi terkkirina dîn û dinyayê dikare bigihêjê.

### 3.3.6 Himmet;

Bêjeyek ‘erebî ye. Di ferhengan de, bi wateya; mebest, daxwaz, cehd û xîreta zexm û qewîn,<sup>870</sup> arezû, hewes, niyet û biqerarî, mirad, wêrek, cesûr, eleqedarbûna pir û

<sup>866</sup> Kanar, hb. r. 358.

<sup>867</sup> İdris Söylemez, *Seyfullâh Nizâmioğlu Dîvânı*, Yüksek Lisans Tezi, İnönü Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili Ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı, Eski Türk Edebiyatı Bilim Dalı, Malatya 2013, r. 86.

<sup>868</sup> Cebecioğlu, hb. r. 84.

<sup>869</sup> العجم، ص، ٣٥٤.

<sup>870</sup> عميد، ص، ١٠٦٩.

hindik,<sup>871</sup> destvekirî, dilê berzekirî, kesê xwedî bendewariyên mezin<sup>872</sup> hatiye dest nîşan kirin. Ev bêje, di Qurana Pîroz de bi wateya daxwaz û cehda ser tiştêkî hatiye bikaranîn. <sup>873</sup> (وَلَقَدْ

هَمَّتْ بِهِ وَهَمَّ بِهَا *‘Pîrekê (zuleyxa) ew kire dilê xwe û qesda wî (Hezretî Yûsûf a.s.) kir, wî jî qesda wê kir...’*<sup>874</sup>

Îbnî ‘Erebî du wateyan jî bêjeya himmetê re derdixe holê. Bingeşa van wateyên xwe jî Qurana Pîroz werdigire. Di Qurana Pîroz de <sup>875</sup> (قَالَ لَوْ أَنَّ لِي بِكُمْ قُوَّةً) *‘Xweziya li hemberî we, min hêzek hebûya.’*<sup>876</sup> Îbnî ‘Erebî ev bêjeya “quwwetê” bi ‘himmeta çalak’ şîrove kiriye. Wateya duyemîn ‘taqet’ e. Yanî, pertav, qudûm û mecal e. Ew mecal û pertava ku dikare tiştê bi re ve bibe, tevger û hereketê bide çêkirin.<sup>877</sup>

Di tesewifê de himmet, li gorî pênaseya Curcanî; dil, bi temamê hêza xwe ya giyanî û rûhanî qesd bike û berê xwe bide Xwedayê Heq, ji bo bidestxistina kamilbûniyê hatiye manekirin.<sup>878</sup> Di pênaseyêke din de himmet wiha hatiye; hêza weliyan e.<sup>879</sup> Welî bi vê hêzê daxwazên xwe bi cih tînin û meramê xwe pê hasil dikin. Herwiha Himmet, bi dil bi tevahî xwe bi Xwedayê Te’ala ve girêbide û ji her tiştên xeynî Xwedayê veqete, jê dûr bikeve<sup>880</sup>, hatiye nasandin.

Di derbarê himmetê û cureyên himmetê de wiha hatiye gotin:

*Himmet; bi her reng û rewşê teweccuha bal Xwedayê Te’ala ye, bi hemû esbab û wesaîtan, wek ‘emel, emel, qelb bi Xweda ve girêdayibûnî ye.*

*Dirûv û şiklên himmetê, di destpêkê de; bi sozdana tobeyê girêdana temamê hêz û taqeta xwe li ser ta’et û wefa û dilsoziyê ye.*

*Di serîde; girêdana qelb bi ni’metê baqî, dûrketina ji tiştê fanî û ku bikaribe di xwestekê xwe de ciddî be.*

*Di dan û standinê de (mû’amelat); himmeta ku bibe sedema istîqametê di ‘emelkirinê de tevî dewama mûraqebê û quweta girêdana bi Xweda, di tewekkul û teslîmiyetê de.*

*Di exlaq de; serfkirina temamê himmetê bi tevahî ji bo bi destxistina se’adetê û kamilbûniyê.*

<sup>871</sup> معین، ج - ۲، ص، ۲۱۱۰.

<sup>872</sup> Mutçalı, hb. r. 968.

<sup>873</sup> Qurana Pîroz, Yûsûf. 24.

<sup>874</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 124.

<sup>875</sup> Qurana Pîroz, Hûd. 80.

<sup>876</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 229

<sup>877</sup> معین، ج - ۲، ص، ۲۱۱۰.

<sup>878</sup> نوربخش، ج - ۲، ص، ۵۲.

<sup>879</sup> Uludağ, hb. r. 170

<sup>880</sup> العجم، ص، ۱۰۱۰.

*Di ûsulê de; cazîbeya ku xwediyê xwe digihîne rexê Xwedayê Te'ala bi hêza yeqînê/baweriyê û rihê enîs, dîsa ew cazîbeya dibe rêgir û mani' ji xwediyê xwe re li ser dûrketina ji seyr û sulûkê, guherandina armançê, kêmbûyina rewşê, bi dagirkirina 'işqê ku xemên wî bibin xemek bi tenê.*

*Di welayetê de; berfirehkirina himmetê li ser hal û meqamên ku ji esma û sifâtên Xwedayê Te'ala tèn.*

*Di heqîqet de; bilindkirina sifetan û berpêbûna ji pesnan wek pesnê şexsê xwe.*

*Di asta dawî de; himmet tune ye, encax, di hemû pêkan û mimkinatan de tesîr bike bi tesîra Heq.<sup>881</sup>*

### **Ji himmetê re sê pêl hatine nîşankirin.**

- a- **Himmeta Tenbîh:** Valakirina dil ji arezû û xwestekan. Çi xwestekê ku divê bibin û çî xwestekê ku çêbûn û bidestxistina wan ne mimkin e. Kesên ev himmet di dest wan de be, divê li xwestekên xwe binêre.<sup>882</sup> Divê xwediyê himmetê zana be ku pêdiviya wî bi 'ilm û zanîne heye da ku bizanibe hukmê xwestekê wî çî ne. Eger xwestek û arezûyên wî ne li gorî 'ilmê musteqîm be, divê ji wan xwestekan bizîvire û dûr bikeve.<sup>883</sup> 'Ilmê musteqîm, rê û rêbazên dîne Îslamê ne ku, ji wan re tê gotin Şerî'et.
- b- **Himmata Îrade:** Destpêka bawerîya salik e. Ji vê himmetê re tê gotin himmeta civakî.<sup>884</sup>
- c- **Himmata heqîqet:** Ev himmet xweserî mexsûsê meşayix û welîyên mezin e. Kombûna temamê himmetan bi îlhama Xweda ye. Hatina ev îlham û himmeta Xweda ji welîyan re, bi sedema dûrbûniya wan ji kesretê û daxwaziya wan a tewhîdê ye.<sup>885</sup>

### **Ji himmetê re sê ast hatine nîşankirin.**

- a- **Himmata Afaqî:** Di seyr û sulûkê de asta yekem a himmetê ye. Di vê astê de; terka tiştên fanî tê kirin û daxwaza tiştên baqî tèn kirin.<sup>886</sup>
- b- **Himmata Anîfe:** Di vê astê de, xwediyê himmetê daxwaza xêra 'emelê xwe dike. Heta dilê wî li hêviya tiştên ku Xwedayê Te'ala we'd û soz dayê ye ji bo xêra 'emelên wî. Dil vala bûye ji mûşahedeya heq, teleba mûşahedeya Heq nake. Belkî bi hêviya îhsan û qenciyan ji Xweda re ta'et dike.<sup>887</sup>
- c- **Himmata Erbab-il Hûmem-il 'Aliye:** Salik di vê astê de bi tişteki ne girêdayî ye ji xeynê Xwedayê Te'ala. Ji xeyrî Xwedayê Te'ala iltîfatê bi kesî re nake, li kesî

<sup>881</sup> العجم ، ص ، ١٠١٠ .

<sup>882</sup> نوربخش ، ج - ٢ ، ص ، ٥٢ - ٥٣ .

<sup>883</sup> العجم ، ص ، ١٠١٠ .

<sup>884</sup> الحكيم ، ص ، ١١١٣ .

<sup>885</sup> نوربخش ، ج - ٢ ، ص ، ٥٣ .

<sup>886</sup> الكاشاني ، ص ، ٧١ .

<sup>887</sup> الكاشاني ، ص ، ٧١ .

nanihêre. Ev asta himmetê, a herî mezin e. Bi hal û meqam û bi sekn û temaşeya esma û sifetê Xweda têr nabe. Ji bilî zatê Xweda tu qest û armanc jêre namînin.<sup>888</sup>

بلبل آن باغ جنت مکسر احسان و نعمت      موجد انواع همت مفتی هر سائلانی

Bulbulê baxê bihiştê yî, qencî û ni'meta te pir e

Peydakerê himmeta cur be cur î, rêberê hemû salikan î (x.93,b.9)

Di ev beyta li ser pesindana şêxê Şeyda hatiye avakirin de, Şeyda şêxê xwe bi peydakerê hemû cureyên himmetê dipesinîne. Hemû cure û astên himmetê li cem murşidê Şeyda peyda dibe. Şeyda ev bêje bi zanebûn bi kar aniye. Lê zanebûna wî ne zanebûneke zanistiyê ye. Dibe ku Şeyda bi zanistî jî agahdar be ji ast û cureyên himmetê, lê pêwîst e ev zanebûna wî zanebûneke 'hal' be ne 'qal' be. Şeyda di seyr û sulûkê de hemû cureyên himmetê ji murşidê xwe bi dest xisti ye. Ji ber hindî ku dizane li cem murşidê wî li gorî rewşa salikî hemû cureyên himmetê peyda dibe û wek rêberê salikên xwe perwerde dike.

### 3.3.7 Şeytan- Iblîs

Şeytan, yek ji cinnan e û bi pîrbûna ta'et û 'îbadetê xwe ketiye nav firişteyan. Piştî afirandina Hezretî Adem (s.l.) bê emriya Xweda dike, ji Hezretî Adem (s.l.) re secde nake û ji dergahê Xweda tê avêtin.

Di ferhengan de bin xala (شطن) de tê wateya muxalefetê. Her tişteki, çi însan be, çi cin be û çi heywan be, ku muxalif û tuxyanger be jê re tê gotin şeytan. Şeytan di Qurana Pîroz de bi sê cureyan hatiye bikaranîn. Yekem; bêjeya şeytan bi mufred hatiye bikaranîn ku wateya şeytan dibe her ferd be, ji însanan, ji cinnan û ji şeytanan.<sup>889</sup> وَمَنْ يَعِشْ عَنْ ذِكْرِ الرَّحْمَنِ نُفِضَ لَهُ (Şeytanê ku berê xwe ji Qurana Xwedayê rehman biguherîne, em ê jê re şeytanekî vebohtî (hazir) bikin, êdî ew şeytan hevalê wî ye.)<sup>890</sup> Duwem; bi piranî bi wateya xas a şeytan hatiye bikaranîn. Wek Ayeta Qurana Pîroz dibêje:<sup>891</sup> يَا بَنِي آدَمَ لَا يَفْتِنَنَّكُمُ الشَّيْطَانُ كَمَا أَخْرَجَ أَبَوَيْكُم مِّنَ الْجَنَّةِ (Gelî zaroyên Adem! Bila şeytan we jî nexapîne ka çawa dê û bavên we (Adem û Hewwa) ji bihiştê derxistin...)<sup>892</sup> Sêyem; bi wateya muxalif û dijmin hatiye bikaranîn.

<sup>888</sup> العجم ، ص ١٠١٠.

<sup>889</sup> Qurana Pîroz, Zuxrûf, 36.

<sup>890</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 491.

<sup>891</sup> Qurana Pîroz, E'raf, 27.

<sup>892</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 152.

<sup>893</sup> (وَكذَلِكَ جَعَلْنَا لِكُلِّ نَبِيٍّ عَدُوًّا شَيَاطِينَ الْإِنْسِ وَالْجِنِّ) <sup>894</sup> ‘Herwiha me ji her pêxemberekî re şeytanên îns û cinnî kirine neyar.’

Iblîs, ji bêjeya ( ابلاس ) bi wateya xem û kederên ku ji tundbûna huzn û bêhêvîtiyê tê. Wek ku Qurana Pîroz ferman dixe: <sup>895</sup> (وَيَوْمَ تَقُومُ السَّاعَةُ يُبْلِسُ الْمُجْرِمُونَ) ‘ Roja ku qiyamet radibe, gunehkar bêhêvî û bêdeng dimînin.’ <sup>896</sup> Jê re hatiye gotin iblîs, bi sedema ku Xwedayê Te’ala ew ji rehmeta xwe bêhêvî kiriye.

Şeytan û Iblîs, wek mezmûnekî tesewifî, bingeha wateyên xwe ji Qurana Pîroz hildigirin. Sedema ‘isyanê, çêkerê bê emriya Xweda, peyda kirina kufr, xeflet û jibîrkirinê, <sup>897</sup> dijmin, wateyên istilahê tesewifî ne.

### 3.3.7.1 Şeytan

Şeyda di helbestên xwe de bi piranî nefis û şeytan bi hev re bi kar anîye. Bikaranîna bêjeya şeytan bi tenê jî em di hin beytên wî de dibînin.

اسیری نفس و شیطانم ره‌ی تخلیص این بینم      کلیب شاه خوبانم و قد جنناک بالعدوی

Bûme dîlê nefis û şeytan û rêya xelasiyê vê dizanim

Kûçikê şahê delala me û hatime ba te bi gelek kêmasiyan (x.7,b.4)

Di vê beytê de Şeyda, li xwe mukir tê ku di nav destê nefis û şeytan de esîr bûye. Lê ev dîlbûnî ne dîlbûniyek cismî ye, dîlbûniyek rûhanî ye. Nefis û şeytan ew dûr kirine ji mehbûba wî. Wî xistine xefletê, mehbûba wî, bi wî didin jibîrkirin. Şeytan, wek ku di ayeta sûreyê E’raf ayeta 27an de –li jor derbas bû- hatiye neyarê Hezretî Adem (s.l.) û nesla wî ye. Armanca wî ew e ku însanan ji Xweda û rêya Xweda dûr bike. Kesên bi rêya tesewifê ji bo gihaştina Xweda, xebata şeytan li ser wan tûndtir dibe. Şeyda, şeytan bi vê wateya ku Qurana Pîroz nîşan daye bi kar anîye. Şeyda agahdar e ji vê dijminantiya şeytan. Dixwaze ku ji vê rewşê reha bibe. Rêya xelasiyê jî ew bi xwe nîşan dide ku ev rê, li ber dergahê mehbûba xwe, xwe tune bihesibîne weke kûçikekî. Divê ev yek jî bê gotin, Şeyda di beyta xwe de rewşa salikî li hemberî murşid anîye ziman. Divê salik di tesewifê de li hemberî murşidê xwe hertim xwe kêmbibîne, bê qîmet bibîne û tune bibîne. Di beytê de her çend muxateb nefsa Şeyda be jî, ji bo sofî û salikan hişyarî û pend jî tê dîtin.

<sup>893</sup> Qurana Pîroz, En’am. 112.

<sup>894</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 141.

<sup>895</sup> Qurana Pîroz, Rûm. 12.

<sup>896</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 404.

<sup>897</sup> العجم ، ص ٥١٨.

### 3.3.7.2 Iblîs

Şeyda, bi sedema iblîs ji Hezretî Adem (s.l.) re secde nekiriye ji ber xurûra xwe, û bi vê rewşê cudatî xistiye navbera xwe û Hezretî Adem (s.l.) ji xwe re wek dijmin dibîne. Ev dijminantiya Şeyda û şeytan dijminantiyeke tesewifî ye. Dema ehlê tesewifê digihêjin hin meqam û halan, şeytan xefika kibr û xurûrê, pozbilindahiyê li ser rêya wan datîne<sup>898</sup> û dixwaze wan ji rêya wan dûr bixe. Kibr û xurûr di tesewifê de tehlûkeyên herî mezin in.

در ازل شد دشمنم ابلیس ملعون زان سبب      کان گرفت از خود پرستی راه و رسم افتراق

Ji roja ezel de bûye dijminê min iblîsê bi le'net bi vê sedemê;

Ku ew bi pozbilindtiyê rê û rêçika cudatiyê ji xwe re girt (x.60,b2)

Şeyda, dide zanîn ku kibr û xurûr çawa bûye sedema avêtina şeytan ji bihiştê, ev her du xislet dibe sedema avêtina salikî ji hal û meqamên tesewifê. Ji ber hindî şeytan dijmin û neyar e ji bo Şeyda.

### 3.3.8 Ke'be

Yekem me'bed, perestgeha ku hatiye avakirin ji bo Xwedayê te'ala Ke'be ye. Ke'be, weke ku tê zanîn qibleya Mislîmanan e. Di pêkanîna, edakirina heccê, ku yek ji pênc erkanê Îslamî ye, kesên hec dikin, li dora Ke'bê dizîvirin, wê tewaf dikin. Ke'be ji bo Mislîmanan cihekî gelek girîng, pîroz û mûqeddes e. Ke'bê, bi ev giringî û pîroziya xwe, di edebiyatê de wek mezmûnekî tesewifî cih daye xwe.

Ke'be, wek mezmûnekî tesewifê, meqamê wusletê ye.<sup>899</sup> Wek ku hecî li heccê îhraman li xwe dikin, divê 'aşiq jî, di ev meqamê wusletê de ihramê li xwe bipêçe.<sup>900</sup> Ke'be, di heman demê de bi wateyên Cemala Xweda û Wechê Xweda<sup>901</sup> jî hatiye bikaranîn. Ji xeynî van wateyan, kesên ku Ke'be, wek, ew dilê ku berêxwe daye Xwedayê Te'ala<sup>902</sup>, pênasîn kirine jî em dibînin.

Li ser ev wateya dawîn, du Ke'be dertên holê. Ke'ba Xelîl; Ke'beya heqîqî ku li Mekkêye ji teref hezretî Îbrahîm Xelîl (s.l.) hatiye avakirin û hecî wê tewaf dikin. Ke'beya duwemîn, Ke'ba Celîl (Ke'ba Xweda) e, ku ev Ke'be qelb e, dil e.

Muqayeseya her dû Ke'beyan bi vî rengî hatiye kirin. Kesên ku bi pêyan dimeşin, Ke'bê ziyaret dikin; kesên ku bi dil dimeşin Ke'be wan ziyaret dike. Ke'beya zahirî qibleya

<sup>898</sup> Topbaş, hb. r. 123.

<sup>899</sup> Cebecioğlu, hb. r. 181.

<sup>900</sup> Uludağ, hb. r. 200.

<sup>901</sup> لاهوری، مجلد سوم، ص، ۱۷۶۹.  
<sup>902</sup> سجادی، ص، ۶۶۴.

ta'et û 'ibadetê ye, Ke'beya batînî, qibleya muşahede û dîtinê ye. Ke'beya zahîrî, dergahê 'izzet û 'ezemetê ye, Ke'beya batînî, pêşiya deriyê lutf û meqamê bestê ye.<sup>903</sup>

تلبیه و اسعاد دایم بست احرام ترا

طائف کعبه رویت زکر و تسبیحش بُود

Ke'beya rûyê te tewaf dîkin, zîkr û tesbîhê te bûne

Telbiye û îs'ada me herdem ji bo te îhram girêdayî ne (x.1,b8)

Şeyda, di beyta jor de, hemû mezmûn û wateyên bi Ke'beyê girêdayî ne bi kar anîne. Weke ku me li jor behs kir, weke muqayesekê di navbeyna her dû Ke'beyan de jî kiriye. Şeyda, ji mehbûba xwe re hestê xwe wiha tîne ziman. Rûyê te ji me re weke Ke'beyê ye û em weke ku hecî li hecê tewafa Ke'bê dîkin, em jî tewafa rûyê te dîkin. Dilê me hertim bi te ve girêdayî ye. Zîkr û tesbîhê ku em dîkin di dewsa telbiyeyên heciyan de ne ku li hecê di tewafa Ke'beyê de tînin ziman. Kêf û şadiya me jî, herdem îhram girêdayîna ji bo te ye. Heciyan ku diçine hecê bi girêdana îhraman kêfxweş dibin, lewra piştî vekirina îhraman êdî dibin hecî. Çawa ku ew bi îhraman kêfxweş in, em jî bi girêdayîna îhraman weke wan şad û bextewar in.

### 3.3.9 Mîhrab

Mîhrab, di camî û mizgeftan de cihê ku îmam lê nimêj dîke û remz û îşareta qibleyê ye. Di demên berê de ji bo ew quncika ku zahîd û sofî tê da diketin inziwayê/xelwetê, jê re mîhrab dihate gotin.<sup>904</sup> Di istilahê tesewifê de; her tiştê ku ji salîk re armanc û meqsed û mûrad e jê re mîhrab tê gotin.<sup>905</sup> Lê bi pîranî ji bo nava her dû birhên mehbûbê, rû û wech tê bikaranîn. Eger mîhrab bi birh û ebrûyan re bê bikaranîn, nîşana tecelliyatên cemala Xweda ye, ku 'aşîq muteveccihê me'şûq dîke<sup>906</sup>, dest nîşan dîke.

اگر چه کعبه شد قبله ولی قوس تنه محراب

در آمانج دلم هر دم نشسته حاجب اسود

Di xwesteka dilê min de hertim perdeya reş rûniştiye

Çiqas ku Ke'be bû qible jî, lê birhên te ji min re mîhrabî (x.11,b.2)

Di beyta jor de 'hacibê eswed' hemû tiştên ku ketine navbera 'aşîq û me'şûq e. Kînaye ye ji pûşiya Ke'bêye ku ji xeynî nivîsên ser wê pûşiyê, rengê wê reş e. Qews, kînaye ye ji bo birhên mehbûbê. Dilê min hertim te dixwaze lê perdeyek reş ketiye navbera min û te. Çawa ku pûşiya Ke'beyê nahêle kes dîwarê wê bibîne, ev perde jî nahêle ez te bibînim. Her çend, ku Ke'be bû qible jî, ji min re mîhrab birhên te ne. Min berê xwe daye birhên te û ez ta'et dikim. Ne girîng e ji min re ku birhên te Ke'beyê nîşan bike an nîşan neke.

<sup>904</sup> Uludağ, hb. r. 249.

<sup>903</sup> سجادی، ص، ۶۶۴.

<sup>905</sup> سجادی، ص، ۷۰۵ - ۷۰۶.

<sup>906</sup> نوربخش، ج - ۱، ص، ۱۱.

### 3.3.10 Pîr

Pîr, di edebiyata ‘irfanî û tesewifî de pir tê bikaranîn. Gelek bêjeyên yekgirtî jê hatine avakirin. Pîrê dêrê, pîrê xankah, pîrê meyxaneyê, pîrê mûxan, pîrê salxworde, pîrê xerabat, pîrê terîqet hemû jî yekgirtiyên bêjeya pîr in. Di tesewifê de, geh bi wateya murşid û geh bi wateya ‘eql hatiye bikaranîn.<sup>907</sup> Lê bi piranî bi wateya murşidê kamil bi kar hatiye.

Şeyda di helbestên xwe de sê bêjeyên yekgirtî ji bêjeya pîr bi kar aniyê. Pîrê mûxan, pîrê xerabat û pîrê terîqet. Li jêr em ê mînakên her sê bêjeyan rave bikin.

#### 3.3.10.1 Pîrê Mûxan;

Bêjeyek farsî ye, bi wateya serok keşîş, serok keşe, an keşîşê mezin<sup>908</sup> di ferhengan de bi cih bûye. Di berhemên tesewifî de, wek mezmûnek tesewifî bi wateya; ew murşidê kamil ku şeraba ‘îşqê pêşkêş dike,<sup>909</sup> rêber,<sup>910</sup> pêşengê terîqetê ku salik bê rêbertî û alikariya wî nagihêje Xwedayê Te’ala,<sup>911</sup> hatiye bikaranîn. Pîrê Mûxan rêberê di hemû ast û merheleyên terîqetê de derbas bûye û bûye şayanê temamkirina kêmasiyên peyrewên xwe.<sup>912</sup> Di vê wateyê de em taybetmendiya Pîrê Mûxan dibînin.

Di şerha Gulşenî raz de wateyeke wêjeyî ji bo Pîrê Mûxan hatiye dayîn. Pîrê Mûxan; heqîqeta/rasteqîna Hezretî Mûhemmed (s.x.l.) e.<sup>913</sup>

برو زاهد بتسیح فریم می دهی تا کی      که از پیری مغان صد گونه پیمانہ سخن دارم

Here ey zahid, bi tizbiya xwe heta kengî tu yê min bi xapînî

Ez ku, ji cem pîrê mûxan bi sed rengî xwediyê peymaneya axaftinê me (x.73,b.3)

Bi wateya ferhengî her çi qeder peymanê, qedeha meyê be jî<sup>914</sup>, di istilaha tesewifê de, bi wateya dilê salik û ‘aşiq tê.<sup>915</sup> Di beytê de, Şeyda; ji zahid re dibêje; êdî tu nema dikarî min bixapînî, lewra li cem min ji teref Pîrê Mûxan, yanî, ji teref ew kesê ku min perwerde kiriye, ku ew jî Murşidê Kamil e, di dilê min de bi sed cureyê peyvê (muşahedeyên nûra xeybê) hene, ku êdî ez nema bi te dixapim.

<sup>908</sup> Cebecioğlu, hb. r. 270.

<sup>909</sup> Uludağ, hb. r. 286.

<sup>914</sup> Kanar, hb. r. 207.

<sup>907</sup> سجادی ، ص ، ۲۱۶.

<sup>910</sup> سجادی ، ص ، ۲۱۷.

<sup>911</sup> بخارایی ، ص ، ۸۸.

<sup>912</sup> لاهوری ، مجلد سوم ، ص ، ۲۱۳۸.

<sup>913</sup> لاهوری ، مجلد سوم ، ص ، ۲۱۳۸.

<sup>915</sup> سجادی ، ص ، ۲۱۸.



### 3.3.10.2 Pîrê Xerabat;

Pîrê Xerabat heman weke Pîrê Mûxan, di istilahê tesewifê de bi wateya murşidê kamil û rêber<sup>916</sup> tê bikaranîn. Ew murşidê kamil, ayîn û seremoniya bi murîdê xwe dide devjêberdan û berê wî dide rêça feqr û fenayê. Bi vî rengî murîdê xwe digihîne hişdariyê û beqayê yanî payîdar mabûnê.<sup>917</sup>

کرد با نالین و آهم جان من در ضیقته است      اودما پیر خراباتی ز دنیا ارتحال

Ew dema pîrê xerabatê ji dinyayê çû (wefat kir)

Ji nalîn û ahê min canê min ket rewşeke xirab (x.16,b.3)

Şa'ir di vê beytê de, li ser mirina murşidê xwe rewşa xwe ya giyanî aniye ziman. Di dema pîrê xerabatê (murşidê Şeyda ye) diçe ber dilovaniya Xweda, Şeyda ji xemgîniyê ewqas nalîn û girî dike, rihê wî dikeve tengasiyekê ku dike canê xwe ji dest bide. Ew yek ji rexeke ve tîkiliya navbera salik û murşid de ji me ra zelal dike. Şeyda, weke salikekî sadiq û dilsoz bi murşidê xwe ve girêdayî ye. Ev xemgîniya bi tund û dijwar ji hezkirina li hemberî murşid hatiye holê.

### 3.3.10.3 Pîrê Terîqet

Pîrê terîqetê ew kes e ku usûl û adabê terîqetê ji sofî re rave dike.<sup>918</sup> Li gorî bikaranîna me ji şêx re tê gotin. Ev ravekirina usûlên terîqetê li gorî meşrebê şêx dibe bi remz û îşaret be û dibe bi gotinê be. Bi zimanê tesewifê ji vê perwerdehiyê re tê gotin 'Îrşad.

Şêx wasite ye ji bo murid û salik bigihêje razîbûna Xweda.<sup>919</sup> Ji ber hindî, pêwîst e murîd hefsarê hemû karên xwe bide dest şêx ku bikaribe bigihêje miraza xwe.

بسی پیری طریقت در جهان بودند ای عاقل      چو فتح الاله فاروقی شهی شیرین نخواهد شد

Ey kesê bi 'aqil! Gelek pîrê terîqetê li dinyayê hebûn

Tu kes wek Fethullahê Farûqî şîrîn nebû (x.39,b.5)

Helbestvan di beyta xwe de pesnê şêxê xwe dide. Bêjeya pîrê terîqetê bi wateya şêx û murşidê kamil bi kar aniye. Li gorî şa'ir şêxê wî Şêx Fethullah Werqanisî (q.s) gelekî şîrîn e ewqas şîrîne wî wek şahê şîrînan dinasîne. Di vir de nêrîna Şeyda ji bo pîrên terîqetê jî derdikeve holê. Li gorî wî hemû pîrên terîqetê şîrîn in lê di dilê wî de şêxê wî ku Şêx Fethullah Werqanisî (q.s) ye ji hemûkan bêtir şîrîn e. Ev nêrîn nêrînek tesewifî ye. Lewra li

<sup>916</sup> Uludağ, hb. r. 286

<sup>917</sup> لاهوری، مجلد سوم، ص، ۱۴۰۵.

<sup>918</sup> دهقان، علی & حدیدی، خلیل & احمدی، موسی، ص، ۶.

<sup>919</sup> جباری، مهدی & طهما سبی، فرهاد، "بررسی آداب صحبت و خلوت در تصوف"، فصلنامه تخصصی عرفان اسلامی، سال یازدهم شماره ۴۳ بهار ۹۴، ص، ۱۹۰.

jor me got divê murîd di hemû karên xwe de xwe bispêre şêxê xwe. Ji bo vê yekê divê şêxê wî di dilê wî de gelekî şîrîn be û ji şêxê xwe hez bike ku bikaribe bi baweriyek mezin xwe bispêre şêxê xwe.

### 3.3.11 Qible

Ji îstîqameta Ke'beyê re qible tê gotin. Di tesewifêde Qible, bi wateyên murşid, mehbûb, Xwedayê Te'ala<sup>920</sup> hatiye bikaranîn. Di istilaha tesewifê de qible, li ser sê qisman hatiye dabeşkirin. Qible ê 'Am, Qible ê Xas û Qible ê Xas-il Xas. Qible ê 'Am; ev Ke'beya ku ji Misilmanan re qible ye. Qible ê Xas; 'Erşê Xweda ye, li asîmanan e, ku Xwedayê Te'ala ew îstiwa, raser (raserbûneke babetê xwe) kirîye. Wek ku Qurana Pîroz ferman dike;<sup>921</sup> (الرَّحْمٰنُ)

Qible<sup>922</sup> *Xwedayê ku rehman e, li ser 'Erş raser bû (raserbûneke babetê xwe)* ê xas-il xas; dilê murşidê kamil û canê 'arifan e. Di derheqê beşa sêyem de wiha hatiye gotin: *'Ew bi nûra qelbê xwe li Xwedayê xwe dinihêrin.*<sup>923</sup> (فهم ينظرون بنور قلوبهم الى ربهم)

Mawlana Celaleddînê Rûmî, di berhema xwe ya bi navê Mesnewiyê de beşên qibleyan wiha şîrove kiriye: 'Qibleya 'arifan, nûra wîsalê ye. Qibleya 'eqlê muflis, xeyal e. Qibleya zahidan, divê Xweda be. Qibleya temahkaran, zêr e. Qibleya ehlê Xweda, 'emelên baş in. Qibleya ne ehl û cahilan, mîrat e. Qibleya 'aşiqan, Xwedayê Heq e.'<sup>924</sup> Şeyda di vê mijarê de wiha gotiye:

دستگیر هر فقیران مفخر جمله شهیران حاکم میر و وزیران قبلیا اهل دلانی (x.93,b.4)

Helbestvan di beyta xwe de qible bi wateya murşid bi kar aniye. Di pesinandina şêxê xwe de wî bi qibleya ehlê dilan dipesinîne. Ehlê dil jî têgehek tesewifî ye. Di helbestên tesewifê de ehlê dil li şûna 'arif hatiye bikaranîn.<sup>925</sup> Ehlê dil, li şûna murşidê terîqetê jî hatiye bikaranîn.<sup>926</sup> Ew murşidê ku rêya 'işqê nas kiriye û dikare bide naskirin. Ew murşidê ku sifetê pêxemberan tê de xuya dike.<sup>927</sup> Yanî exlaq û xisletên pêxemberan di wî de hebe. Şêxê Şeyda ji bo ehlê dilan bûye qible. Li gorî pênaseyên jor murşidê Şeyda Qibleya Xas-il Xas e. Li gorî pênasiya Mawlana jî, şêxê Şeyda Qibleya 'arifan e, nûra wîsalê ye. Ew nûra qelb e ku bi wê nûrê li Xweda tê nêrîn, li gorî wateya Ayeta li jor derbas bû.

<sup>920</sup> Cebecioğlu, hb. r. 201.

<sup>921</sup> Qurana Pîroz, Taha, 5.

<sup>922</sup> Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, r. 311.

<sup>923</sup> سجادی ، ص ، ۶۶۴.

<sup>924</sup> سجادی ، ص ، ۶۶۵.

<sup>925</sup> دهقان ، علی & حدیدی ،خلیل & احمدی ،موسی ،ص، ۱۲.

<sup>926</sup> تسکین دوست ، ص ، ۲۲۵.

<sup>927</sup> بهنام فر ، محمد & رستمی ، صدیقه ،ص، ۳۲.

### 3.3.12 Şîta

Şîta, bêjeyek ‘erebî ye, bi kurdî wateya wê zivistane. Wek mezmûneke tesewifê li hemberî meqamê keşfê<sup>928</sup> hatiye bikaranîn. Hem bi wateya qutbûniya feyzê û di sûlûkê de bê alîkarî mayîn<sup>929</sup> jî bi kar tê.

فصل شتایه بگزر تازه بهاره قارشو

اولب زمان فرقت چون زمهریر دوزخ

Dema firqetê wek zemherîra dojhê ye

Demsala zivistanê derbas bike li hemberî bihara nû (x.89,b3)

Di ev beyta jor de zivistan, bi wateya qutbûniya feyzê hatiye bikaranîn. Şeyda, dibêje; zemanê dûrketina ji feyzê wek zemherîra dojhê sar û serma ye, nayê tehemulkirin. Piştî feyz li ser me hat birîn, em jê bêpar man ji me re wek demsala zivistanê sar e. Ev demsala zivistanê biguherîne bihareke nû, di vê biharê de em dîsa bigihêjin feyzê.

### 3.3.13 Tûr

Navê çiyayekî ye. Ev çiya li çola Sînayê ye. Hezretî Mûsa (s.l.) li ser çiyayê Tûr axaftina Xwedayê Te’ala bihîstiye.<sup>930</sup> Ev bihistîn di Qurana Pîroz de wiha derbas dibe:<sup>931</sup> (وَنَادَيْنَاهُ مِنْ جَانِبِ الطُّورِ الْأَيْمَنِ) ‘*Me ji rexê rastê, yê çiyayê Tûr gazî wî kir.*’<sup>932</sup> Di vir de wate nefs e. Yanî ji rexê nefşê me gazî wî kir. Axaftina Xwedayê Te’ala ne axaftinek bi dev, û ne bihîstinek bi guh bûye. Axaftin; tecelliya Xwedayê Te’ala li ser nefsa Hezretî Mûsa (s.l.) ye. Xwedayê Te’ala tecelliyatên Xwe barandiyê ser Hezretî Mûsa (s.l.). Li gor van agahiyên, Tûr di tesewifê de mezmûneke ku nefşê nîşan dide.<sup>933</sup> Ew nefsa ku Xwedayê te’ala lê tecellî kiriyê. Herwiha Tûr, di heman demê de bi wateya ‘sînga ku bi dînê Îslamê hatiye firehkirin’<sup>934</sup> jî tê bikaranîn.

گفت خوبست تا بُودجای تجلی همچو طور

گفتمش دل در فراق روی خویت پخته شد

Min jê re got; dil ji dûrbûna rûyê xweşikê pijiyay

Got; baş e, heta bibe warê tecelliyê weke Tûr (x.45,b.6)

Şeyda di beyta jor de; derdê dûrbûniya ji mehbûba xwe tîne ziman, dibêje; min ji mehbûba xwe re got: Ji dûrbûniya te, ji dûrbûniya xweşikahiya rûyê te ez pijiyam, hedana min nema tê. Mehbûba wî jê re dibêje; gelekî baş e, ev rewşa ku tu tê da yî, ev hesreta dûrbûniya

<sup>928</sup> Cebecioğlu, hb. r. 373.

<sup>929</sup> سجادی، ص، ۴۴۵.

<sup>930</sup> Uludağ, hb. r. 361.

<sup>931</sup> *Qurana Pîroz*, Meryem, 52.

<sup>932</sup> *Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*, r. 308.

<sup>933</sup> Cebecioğlu, hb. r. 347.

<sup>934</sup> سجادی، ص، ۵۵۲.

ku tu tê da yî, ev pijandina te, dê bibe sedema tecelliyatên min. Çawa çiyayê Tûr bû warê tecelliyan ji Hezretî Mûsa (s.l.) re, ev rewşa te ew ê bidome heta nefsa te bibe war û wargehê tecelliyatan.

Em dibînin Şeyda, Tûr, bi wateya war û wargeha tecelliyatên Mehbûba heqîqî, ku ev mehbûba heqîqî, Xwedayê Te'ala ye, bi kar aniyê, ku heman wate li jor şîroveya wê hat kirin.

### 3.3.14 Zunnar

Bêjeveke yewnanî ye.<sup>935</sup> Mesîhiyê ku di nav xaka mislimanan de dijîn, ji bo ku ji mislimanan bîn cuda kirin kemer didan nava xwe, bi hukmê Îslamê. Ji wê kemerê re tê gotin zunnar. Qûrdeleya mesîhiya ku selbê/xaçê xweyê biçûk bi vê qurdeleyê bi stûyê xwe dadileqandin,<sup>936</sup> jê re tê gotin zunnar.

Wek mezmûnek e tesewifî zunnar; sozdayîna xizmetkirina ji mehbûbê, û bi cih anîna emrê mehbûba heqîqî ye<sup>937</sup>. Dildayîn û hezkirina dinyayê, xurûr, xweperestî û xwexazî<sup>938</sup> jî bi zunnarê hatiye îfade kirin/derbirandin.

باده انگوری باشد بهتر از درمانما

گر بفرمای مرا ز ناز بستن جائزست

Eger tu emrê me bikî bi girêdana zunnar, caîz e

Badeya engûrî ew ê bêhtir bibe dermanê derdê me (x4,b5)

Şeyda, divê beytê de; ewqas girêdayî bi mehbûba xwe ve ye, ewqas jê hez dike, ku mehbûbawî jê re bibêje were bikeve xizmeta min, ji minre xizmetê bike, ev gotina mehbûba xwe caîz/durust, wek mafekî mehbûbê, didêre. Ewqas 'aşîqe, ji bo nêzîkbûna mehbûba xwe, xizmeta wê bi dil û can dipejirîne.

## 4 ENCAM

Tesewif di nava edebiyata kevn a milletên misilman de gelekî berbelav e. Şa'irên dîwanan bi şa'irên xwe 'işq û mehebbeta Xweda û Resûlê Xweda, di vegotinên xwe de bilind kirine. Bi vê rêyê birîna dilên xwe kewandine, êşa xwe cebirandine. Ji muhebbetê taqeta wan çûye ku ew êş û azar bûye helbest û ketiye nava rûpelên dîwanan. Weke edebiyatên milletên

<sup>935</sup> Kanar, hb. r. 397.

<sup>936</sup> عمید، ص، ۶۰۶.

<sup>937</sup> سجادی، ص، ۴۴۵.

<sup>938</sup> Cebecioğlu, hb. r. 379.

din (tirk, ereb, faris...) kurdan jî ji vê sifreyê têra xwe fêkî berhev kirine û ji nifşên dû xwe re hiştine. Vêca ferqa tesefiwa dîwanên kurdî/kurmancî ev e ku heta niha kes li wan xwedî derneketiye. Şeyda jî yek ji wan helbestvanên ku di vî warî de rê qeti' kiriye, û heta niha kes hay jê nebûye. Di vê xebatê de hat dîtîn ku bi kurdî jî tesewif rewan û selîs ji hubra serê qelemên nivîskarên kurd niqutiye û nezma kurdî bi tesewifê xemilîye.

Şeyda, helbestvanekî edebiyata klasik a kurdi ye. Navê wî 'Ebdul'ezîz e. Di dawiya sedsala 19an û di serê sedsala 20an de jiyaye. Şeyda di kîjan salê de ji dayik bûye? xelqê ku ye? li ku û li cem kê xwendiyê? li ku jiyaye û di kîjan salê de wefat kiriye ne diyar e. Bes ji dîwana wî em bi teqez dizanin di navbera salên 1875-1923an de li jiyane bûye. Berya 1875an bi çend salan hatiye dinyayê û piştî 1923an bi çend salan an çend mehan ji dinyayê koç kiriye ne diyar e.

Şeyda, sofî ye û pêgirê terîqeta neqşebendi ye. Her çend di hinek çavkaniyan de bi şêxetî hatibe nasandin jî, di derbarê wergirtina xelifetiya terîqetê de di tu berhemana de navê wî nehat dîtîn. Li ser destxeta ku em li ser xebitîn jî di serê xezela yekem de 'ev xezelên Mela 'Ebdul'ezîz Bitlîsî ne' hatiye nivîsandin. Ev hevok; hem tê wateya ku ev destxet ne destxeta nivîskar bixwe ye û hem derbarê şêxîtiya wî de agahiyên dide me. Bi teqez em dizanin ku Mela ye, lê derbarê şêxîtiya wî de agahiyên peyitandî nehat dîtîn.

Şeyda, şa'irekî gelek şareza ye. Di edebiyatê de gelekî serkeftiye. Ji dîwana wî bi asanî tê famkirin ku di derbarê edebiyata 'ereban, farisan û tirkî de agahiyên wî yê gelek zêde hene. Ji ev zanebûna wî dîwanek çar zimanî (farsi, kurdi, erebi, tirkî) derketiye holê. Di dîwanê de ji teşeyên nezmê; xezel, mesnewî, muxemmes, dubeytî, ferd û mulemme' bi terzek gelek pêşkeftî tên dîtîn. Di dîwanê de hebûna mijarên tesewifê, mehdiye, mersiye, 'işqa Xweda, ne'tên Resûlê Xweda (s.x.l.), dîrok û munacatan nîşane ji bo hêza wî ya edebî. Helbestên dîwanê % 65 bi farsî hatine nivîsîn. Ev jî tê wê wateyê ku, edebiyata farisan bandor li Şeyda kiriye û ew jî hakimê zimanê farsî bûye.

Di amedekirina helbestên xwe de 6 behrên erûzê (Remel, Hezec, Muzarî, Recez, Serî', Tewîl) bi kar anîye. Ev bi kar anîn, meharetê wî ya di zanista erûzê de nîşanî me dide.

Tesewif bi termên xwe, têgehên xwe û hemû rê û halên xwe ve di dîwana Şeyda da derketin pêşberî me. Di vî warî de em dikarin bi hêsanî bibêjin ku Şeyda di soffigeriya xwe de jî serkeftî ye û di vegotina xwe ya helbestkî/tesewifî de jî jêhatî û şareza ye.

Zanîna tesewifê, keşf û kerametên qelbî ne. Yanî ev zanîn, heqîqeta qerdûn û Xweda bi rêya dil kişf dîke û destûra rih îdrak dîke. Ji bo têgihaştina tesewifê, bi giştî terbiyekirin û hevotina nefse pêwîst hatiye dîtîn. Ev zanist tenê dikare di binê rehleya murşidekî kamil were bidestxistin. Ji vê bidestxistin û zanîne re Me'rîfetullah tête gotin. Di helbestên Şeyda de ev

behs gelek destêwerdan hatiye kirin. Lewra ew di gelek ciyan de behsa murşidên xwe yê kamil dike. Şeyda li ser murşidên (li ser hersê murşidên xwe) xwe hem helbestên pesindanê, medhiye û hem helbestên li ser wefata wan, mersiye nivîsandiyê. Şeyda di hin helbestan de navê şêxên xwe nivîsandibe jî bi piranî navê wan negotiye. Di helbestên ku navê şêxên xwe negotiye de, wan bi bêjeyên ‘yar’, ‘dîlber’, ‘pîrê Xerabat’, ‘tebîb’ û hin bêjeyên tesewifî weke; qutb, qutbê eqtab, şah, canan, sahîbe celal, fadil, kamil, saqî, pesinandiye. Şeyda jî xeynê murşidên xwe navên hin rêberên terîqeta neqşebendî û qadirî jî aniyê ziman. Ev bîranîn jî toreyek tesewifê ye. Kesên sofî di munacatên xwe de jî rêberên terîqetê hawarê dixwazin ku Şeyda jî heman tradisyona tesewifê di dîwana xwe de bicîh aniyê.

Şeyda di helbestên xwe de gelek bêjeyên hal û meqamên tesewifê bikar aniyê. Ji bêjeyên hal; mehebbet, Şewq, Uns, Celal, cemal, kemal, Qebd, best, Sekir, ji bêjeyên meqama; Tewbe, Zuhd, Sebr, Rida, Şukur, Îhsan, Fena, Beqa, Îxlas, Xewf, Reca, Qurb di dîwanê de hatine dîtin. Ji van bêjeyan hinek bi wateya ferhengî hatibin bikaranîn jî, bêjeyên bi wateya tesewifî hatine bikaranîn jî tînin dîtin. Hejmara bêjeyên bi wateya tesewifî hatine bikaranîn ji bêjeyên bi wateya ferhengî hatine bikaranîn zêdetirîn. Ji derî bêjeyan bi beyt û misrayên xwe jî rewşa hal û meqaman hatiye destnîşankirin. Bi vî awayî em têdigihên ku Şeyda di vê rêyê de gelek meratib buharandine û cihekî xwe yê taybet heyê di tesewifê de.

Di dîwanên şa’irên sofîyan de wek, Hafizê Şîrazî û Melayê Cizîrî mijara ‘îşqê mijara sereke ye. Di dîwana Şeyda de jî heman mijar, mijara sereke ye. Li cem Şeyda m’êşûqê heqîqî Xweda ye û ‘aşîqê heqîqî jî Resûlê Xweda ye (s.x.l.) Însan ji bo ku bikaribe bigihêje m’êşûqê heqîqî divê rê û rêça ‘aşîqê heqîqî bişopîne. Bi vê sedemê Şeyda di dîwana xwe de hezkirina Resûlê Xweda (s.x.l.) bi şeş helbestan aniyê ziman.

Şeyda, di dîwana xwe de tenê bêjeya ‘îşq, ‘aşîq, me’şûq bikar neaniye. Astên ‘îşqê, cûreyên ‘îşqê û qonaxên ‘îşqê jî di nav helbestên xwe de bi cih kiriye. Bi vî awayî em têdigihêjin ku Şeyda derbarê termonolojiya ‘îşqê de xwedî agahiyeke berfireh e.

Şeyda di ravekirina ‘îşqê de wateyên bêjeyên fiqhê di bêjeyên ‘îşqê de bi kar aniyê. Hem wateyên bêjeyên rêziman (rêzimana ‘erebî) jî xistiye xizmeta ravekirina ‘îşqê. Ev yek, hêz û taqeta wî ya li ser şî’rê dest nîşan dike û zanebûna wî ya fiqhê û rêzimanê nîşanî me dide.

Bandora sofîgeriya Mela, zêde li ser sofîyên piştî wî hene. Ji heval û şagirtên Mela, Feqiyê Teyran heta Şeyda, hemû sofîyan ji ‘îşqê û mehebbeta dilê Mela sûd wergirtine. Di rêya tesewifê de Şeyda pêgirekî melayê Cizîrî ye. Fikr û ramanên Şeyda di derbarê rêbazên tesewifê de wek Mela be jî, rêbazên şî’rên wî û şêwaza helbestên wî di rêça hafîz de dixûyê.

Ev mehebbet e ku şa'ir û sofîyên seyra sulûkê sergerdan kirine, heş ji serê wan birine, di halê îstîqraq û wecdê de noqî zewqên ruhanî bûne, û dema ji wê rewşê fersend dîtine, bi çend beytan xwestine ku behsa wê jiyanê ji me re jî bikin, loma ev dîwan û dîwanên bi vî terzî hatine wucûdê. Ji ber hindî di tezê de mehebbeta Şeyda li hemberî Xweda, Resûlê Xweda (s.x.l.) û pîrên terîqetê di beşek serbixwe de hat şîrovekirin.

Di dîwanê de gelek têgehên tesewifî hatiye bikaranîn. Sembol û mecazên girêdayî bi mey û şerabê wek, şerab û şerbet û cûreyên wan, meyxane, bade, cam, kase, mecazên girêdayî bi xweşikahiya bedenê wek, zulf, xal leb û hin têgehên din wek, abê heyat, dergah, himmet, ke'be, mihrab, şîta, tûr, zunnar bi wateyên tesewifî hatine bikaranîn. Di berhemên li ser helbestên tesewifê hatine nûsîn de, bi gelemperî 4 wate ji bo zulfê hatiye nîşandayîn. Şeyda her çar wate jî di helbestên xwe de bi kar aniyê. Şeyda bêjeyên bi zulfê re têkilîya wan heye û dema bi zulfê re tîkên bikaranîn wateyek tesewifî hilgirtine, wek; dirêjahiya zulfê, serkêşiya zulfê, zulfê çewgan, zîncîra zulfê, reşahiya zulfê, xefika zulfê, bêhna zulfê, birqandin û serê zulfê jî bi kar aniyê. Bikaranîna van têgehan bi me dide zanîn ku Şeyda di edebiyata tesewifê de gelek mahire û bingehek wî ya edebiyata tesewifê kûr berfireh heye.

Ji ber ku Şeyda sofî bû, rêwiyê vê rêyê bû, hal û meqamên tesewifê jiyaye û di nava vê jiyanê de vegotina xwe honandiye. Loma him bandora helbestên wî zêde ne, him jî deng û rengê mûsikaya wan hêjayî xwendin û sehkirinê ne. Bi vî awayî Şeyda ji helbestkarên zorakiyane dinivîsin vediqete û dikeve nava helbestvanên hal ku ev jî tesewif bi xwe ye. Ev rasteqîn di gelek malikên şî'rên wî de rû dane ku me di nava beşên peywendîdar de, bi hûrgulî qala wan jî kiribû.

Helbestên Şeda dîdaktîkî û pendamîz nîn in. Herwiha realîst jî nînin. Helbestên wî ji 'eql zêdetir ruhî ne, ji teoriyê wêdetir pratîk in. Ji ramanê bêtir zewqî ne, ji hîkemê pirtir tesewifî ne.

Ramana tesewifê rê nedaye ku Şeyda di mijareke din de binivîse. Derdekî wî yê ku zêde were xwendin, an were famkirin tunebûye. Lewra wî piranî bi farisî nivîsiye. Eger derdekî wî wisa hebûya dê hemû bi kurdî, ji bo civaka kurdan binivîsanda. Ji bo wî ziman amûr û pertaleke di rêya 'işqê de. Wî xwestiye ku evîna hundurê xwe der bike, loma bandora helbestên wî zêde ne.

Eşkereye ku Şeyda bi helbestên xwe di sedsala 20an de, xwedî ciyekî taybet ê tesewifa kurdî/kurmancî ye. Eger bi rastî û durustî dîroka tesewifa kurdî bête nivîsîn, dê ciyekî taybet bo Şeyda bête terxankirin.

Ev xebat dikare weke binegekê yan weke destpêkekê jî bête pejirandin, di warê termînolojî, metodolojî û veçirîna tesewifa kurdî de. Loma ihtîmal e ku hin kêmasiyên wê hebin.



## **5 PÊVEK**

**PÊVEK-1:** Rûpela yekem ji dîwana Şeyda




يا الله باسمه الرحمن الرحيم وبه نستعين يا معين

حرف الالف

ای که عالم گشت حیاتك فضل انعام ترا	ابتدا کردند در هر چیز با نام ترا
بیکد امر عالی قدرت گشت جبریل امین	شماره جمیع مسلمات و ای الیهم ترا
ضیع و شاماً صد بنی از یلیو صلوات سلام	باد بر آن سفره رسالت ریغام ترا
آدم از کل آفرید بر ملک کبریاوت شرف	زانکه مظهر گشت از تعلیم انعام ترا
جامی از لیل بت نوشتیم در روز الست	تا ابد مدیوش بودیم حسرت اندام ترا
چو کفایت گشتیم جنتاً در آنجا	تا که یابیم لذت احسان کرام ترا
ترک عیسوی مشتتاً لغیر کردند اهل عشق	تا چو می خواهم بود بر تو در کام ترا
طایفه کعبه رویت در کوشش بود	تلبی و تعاد نام بست احرام ترا
طوطی خوش لغو نام از اید و صد	چو نماند ای ایتمی و سخن و بار نام ترا
هر چه پیش گشته ام مفقود تو مامون	تا که یابم رویت روی دل اسرام ترا

وله ایضاً

ای پاک خسارت بیعت بسوی دلها در وضوء کلمات کوی بند چو نیتها  
 بمانند امشب از زکس بهمان سرگشته شدم دائم زده زده چو نیتها



## 6 ÇAVKANÎ

### Çavkaniyên 'Erebî

القرآن الكريم

- إبراهيم ، محمد زكى ، (٢٠٠٦) ، *أبجدية التصوف بعض ما له وما عليه* ، مطبوعات و رسائل العشيرة المحمدية ، الطبعة الخامسة ، القاهرة ، مصر .
- الأنصارى الهروى ، أبو إسماعيل عبد الله بن محمد بن علي ، (١٣٨٥) ، *منازل السائرين (شرح عبد الرزاق القاشانى)* ، تحقيق محسن بيدارفر ، انتشارات بيدار ، قم ، ايران
- الباطومى ، محمد فوزى ابن شريف ، (بدون سنة الطبع) ، *خلاصت التصوف* ، آستانه ، اسكدار
- البرنسى ، محمد بن عيسى زروق الفاسى ، (٢٠٠٥) ، *قواعد التصوف* ، تحقيق عبد المجيد خيالى ، دار الكتب العلمية ، بيروت ، لبنان
- البقلى ، ابي محمد روزبهان (٢٠٠٥) ، *مشرب الأرواح* ، ضبطه وصرحه عاصم إبراهيم الكيالى ، دارالكتب العلمية ، بيروت ، لبنان
- التفتازانى ، أبو الوفا الغنيمى ، (١٩٥٠) ، *مدخل إلى التصوف الإسلامى* ، دار الثقافة للنشر والتوزيع ، الطبعة الثالثة ، القاهرة ، مصر
- الحكيم ، سعاد ، (١٩٨١) ، *المعجم الصوفى ، الكلمة فى حدود الحكمة* ، دندرة للطباعة ، بيروت ، لبنان
- الزفنى ، احمد بن ملا محمد ، (١٩٧٨) ، *العقد الجوهري فى شرح ديوان الشيخ الجزرى* ، مطبعة الصباح ، دمشق
- الشعرانى ، عبد الوهاب ، (١٩٨٨) ، *الأنوار القدسية فى معرفة قواعد الصوفية* ، مكتبة المعارف ، بيروت ، لبنان
- \_\_\_\_\_ ، عبد الوهاب ، (١٩٦٧) ، *آداب الصحبة* ، تحقيق ؛ عباس يوسف شامى ، دارالفارابى ، دمشق
- الشيبي ، كامل مصطفى ، (١٩٩٧) ، *صفحات مكثفة من تاريخ التصوف الإسلامى* ، دارالمناهل ، بيروت ، لبنان
- الطوسى ، أبى نصر عبد الله بن على السراج ، *اللمع فى التصوف* ، (١٩١٤) ، تحقيق رنولد الن نيكلسون ، مطبعة بريل ، ليدن
- العجم ، رفيق ، (١٩٩٩) ، *موسوعة مصطلحات التصوف الإسلامى* ، مكتبة لبنان ناشرون ، لبنان
- العكيلي ، حسن مندويل ، & مهاوش ، نبراس حسين ، (حبّ وعشق) فى ضوء الدلالة القرآنية ، مجلة كلية التربية للبنات ، المجلد ٢٥ (١) ٢٠١٤
- القره داغى ، محمد على ، (٢٠١٥) ، *مكتوبات مولانا خالد ، بقسميها العربي والفارسي* ، المكتبة الهاشمية ، بيروت ، لبنان .
- القسبرى ، أبو القاسم عبد الكريم بن هوازن ، (٢٠٠٨) ، *أربع رسائل فى التصوف* ، تحقيق قاسم السامرائى ، دار الوراق ، بيروت ، لبنان .
- الكلاباذى ، أبوبكر محمد بن إسحاق ، (١٩٦٠) ، *التعرف لمذهب أهل التصوف* ، تحقيق وتعليق ، محمود ، عبد الحلیم & سرور ، طه عبد الباقي ، مكتبة الثقافة الدينية ، القاهرة ، مصر .
- الكاشانى ، عبد الرزاق ، (١٩٩٢) ، *معجم اصطلاحات الصوفية* ، تحقيق: عبد العال شاهين ، دار المنار ، الطبعة الأولى ، القاهرة ، مصر .
- الندوى ، عبد البارى ، (١٩٦٣) ، *بين التصوف والحياة* ، نقله الى العربية: محمد الرابع الحسنى الندوى ، مكتبة دار الفتح ، دمشق
- بن عجيبة ، أحمد ، (بدون تاريخ) ، *معراج التشوف إلى حقائق التصوف و يليه كتاب كشف النقاب عن سر لب الألباب* ، تحقيق الدكتور عبد المجيد خيالى ، مركز التراث الثقافى المغربى ، الدار البيضاء .
- حمدي ، أيمن ، (٢٠٠٠) ، *قاموس المصطلح الصوفى* ، دارقبا ، القاهرة ، مصر
- ظهير ، احسان الهى ، (٢٠٠٥) ، *دراسة فى التصوف* ، دار الإمام المجدد ، القاهرة ، مصر
- \_\_\_\_\_ احسان الهى ، (١٩٨٦) ، *التصوف المنشأ والمصادر* ، ادارة ترجمان السنة ، لاهور ، باكستان

عبدالباقي ، محمد فواد ، (١٣٦٤) ، المعجم المفهرس لألفاظ القرآن الكريم ، دارالاحياء التراث العربي ، بيروت ، لبنان  
عون ، فيصل ، (١٩٨٢) ، التصوف الاسلام ، الطريق والرجال ، مكتبت سعيد رأفت ، القاهرة ، مصر  
عيسى ، عبدالقادر ، (١٩٩٣) حقا ثق عن التصوف ، دارالعرفان ، حلب ، سورية  
قاسم ، عبد الحكيم عبدالغني ، (١٩٩٩) ، المذاهب الصوفية ومدارسها ، مكتبة مدبولي ، الطبعة الثانية ، القاهرة ، مصر  
ماسينيون & مصطفى عبدالرازق ، (١٩٨٤) ، التصوف ، دارالكتاب اللبناني .مكتبة المدرسة ، بيروت ، لبنان  
محمد ، يوسف خطار ، (١٩٩٩) ، الموسوعة اليوسفية في بيان أدلة الصوفية ، مكتبة دارالآلآباب ، دمشق ، سورية  
نصر ، عاطف جودة ، (١٩٧٨) ، الرمز الشعري عند الصوفية ، دارالكندی ، بيروت ، لبنان

## Çavkaniyên Kurdî

نه قشبه ندى ، شيخ نه مين شيخ علائه ددين ، (١٩٨٦) ، ته صه ووف چى به ، نه مينداريتى گشتى رۆشنبيرى و لاوان ، دار الحرية للطباعة ، به غداد .  
شوان ، ئيبراهيم نه حمه د ، (٢٠٠١) ، سؤفيگه رى شيعرى ئابيني و سؤفيگه رى له شيعره كورديه كاني مه حويدا ، چاپخانه ي وه زاره تى په روه رده ، هه ولتر  
نه حمه د ، هيمن عومهر ، (٢٠١٤) ، هيرمينوتيكاي شيعرى سؤفييانه ي مه حوى ، تيزى دكتورا ، زانكو سليمانى .  
له شكرى ، حه يدەر ، (٢٠١٣) ، له شيعره ته وه بو حقيقت سه ره ئداني سؤفيگه رى له پانتايى كورديدا ، د. حه يدەر له شكرى ، بلاوكراوه ي موكريان ، چاپى  
يه كه م ، هه ولتر .  
په سوول ، عيزه دين مسته فا ، (٢٠٠٨) ، نه حمه دى خانى ، شاعير و بيرمه ند ، فهيله سووف و سؤفى ، وه رگيراني له عه رده ي يه وه ، نووسه ر خؤى ، مه كته بي بير و  
هؤشيارى ، سليمانى .

*Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî*. (2015). Ankara: Serokatiya Karûbarê Diyanetê.

Adak, A. (2013). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. İstanbul: Nûbihar.

\_\_\_\_\_, A. (2016). *Helbestvanên Klasîk ji Perspektîfa Herêmi: Nimûneya Herêma Bedlîsê*. The Journal of Mesopotamian Studies, C: 1/1, Havîn , 33-56.

Ahmed, H. O. (2016). *‘Eqîdenameyên Soranî, Nişeyên Waneya Klasîk ên Neçapbûyî*. Bingöl.

Aqtepe, Ş. ‘E. (2016). *Rewdin-Ne'im*. Diyarbakır: Mektebeti Seyda.

Batef, M. H. (Bê Tarix). *Mewlud'in-Nebî*. Diyarbakır: Dini Neşriyat Kitabevi.

Cizîrî, M. E. (2014). *Dîwan*, Transkripsiyon; Arif Zêrevan. Hewlêr: Aras

Ertekin, M. Z. (2017). *Agirê ‘Işqê di Perspektîfa Mela de*. Mukaddime, Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, Melayê Cizîrî Özel Sayısı, Cilt 8, Özel Sayı 1, Kış 2017, r, 77-92.

\_\_\_\_\_, M. Z. (2015). *Biyografiyeke Menzûm a Mela ‘Eliyê Baqustanî, Siltan Şêxmûs (metn û Lêkolîn)*. Wan: Lorya.

\_\_\_\_\_, M. Z. (2015). *Dîwançeya baqustanî (Metn û Lêkolîn)*. Wan: Lorya.

Güllü, Z. (2016). *Mesnewiya Seyf-ul milûk û Bedî-ul Cemal a Siyahpoş*. Kovara Wêje û Rexne, hejmar 7, sal 2016, Diyarbakır, r. 59-80.

Koyuncu, H. (2014). *Di Hin Dîwanên Kurdî de Bandora Tesewûfê*, Teza Lîsansa Bilind. Bîngol: Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Ziman û Wêjeya Kurdî.

Orkin, Ş. (2015). *Di Berhemên Feqiyê Teyran de Hêmanên Tesewîfî*, Teza Lîsansa Bilind. Muş: Zanîngeha Alparslan a Mûşê, Enstîtuya Zanistên Civakî, Şaxa Makezanista Ziman û çanda Kurdî.

Sadnî, M. X. (2012). , *Feqiyê Teyran, Jiyan, Berhem û Helbestên wî*, Çapa Şeşem. İstanbul: Nûbihar.

Si'irdî, M. X. (2004). *Nehcu'l-Enam*, Şerh; Ahmed Hilmî Qoxî. İstanbul: İhsan Yayınları

Xanî, Ş. E. (2014). *Nûbehara Biçûkan*, Şerh; Ehmed Hilmî Qoxî. İstanbul: İhsan Yayınları.

\_\_\_\_\_, Ş. E. (2009). *Mem û Zîn*. İstanbul: Nûbihar.

Yıldız, A. (2015). *Qewlê Hespê Reş (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind. Mardin: Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.

Yûsif, E. (2012). *Dîwana Kurmancî, Şairên Klasîk ên Kurd*, latînîze; Ziya Avcı. İstanbul: Dîwan.

Zaxoyî, H. (2014). *Cegexwîn -Şa'ir û Mirov û Kurdperwer*. Hewlêr: Wezaretê Perwerdeyî.

Zinar, Z. (2011). *Şêx Fethullahê Werqanisî*. Kovara Nûpelda, Hejmar. 5, Van .

\_\_\_\_\_, Z. (1983). *Xwendina Medresê*. Stockholm: Pencînar, Weşanxaneya Çanda Kurd.

## Çavkaniyên Tirkî

ابن حسين ، حسين حمدي ، (١٢٦٣) ، طريق نقشبنديه نك اصولني حاوي حسجال اسالك في اقوام المسالك ، طبخانه عامره ، استانبول .

Abubakirov, N. (2009). *Gazzâlî'de Kalb Kavramı*, Yüksek Lisans Tezi. Konya: Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Felsefe ve Din Bilimleri Ana Bilim dalı, Din Felsefesi Bilim Dalı.

Akbalık, E. (2013). *Yunus Emre'nin Şiirlerinde 'Gönül' İmgesi*. Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi , 20-28.

Akot, B. (2013). *Nurşin Medresesinin Yetiştirdiği Mutasavvıflar*, Bingöl Üniversitesi Medrese ve İlahiyat Kavşağında İslamî İlimler Uluslar arası Sempozyomu-2012 . Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yayınları.

Albudak, D. (2008). *Kadı Burhaneddin İle Şeyhî'nin Gazellerinin Din ve Tasavvuf Açısından Karşılaştırılması*, Yüksek Lisans Tezi. Edirne: Trakya Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Algar, H. *Mazhar Cân-ı Cânân*. DİA, c. 28.

- Altıntaş, H. (1986). *Tasavvuf Tarihi*. Ankara: Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi yayınları.
- Altıntaş, S. (2006). *Gazâlî'de Tasavvuf Felsefesi*. Konya: Yüksek Lisans Tezî, Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Felsefe ve Din Bilimleri Anabilim Dalı Din Felsefesi Bilim Dalı.
- Arabî, M. İ. (2013). *Sırrın Sırrı (lubbü'l-Lübb ve Sırru's-Sırr)*, Çeviri; Arzu Meral. İstanbul: Revak Kitabevi.
- Baz, İ. (2014/2). *Osmanlı'dan Cumhuriyet'e Norşin Dergâhı ve Şeyh Abdurrahman-ı Tâgî*. Tasavvuf İlmî ve Akademik Araştırma Dergisi , 73-108.
- Bilen, M. *Ohinli Şeyh Alaaddin ve Hadis Usulüne Dair Manzumesi*, Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, sayı.37, Erzurum, 2012
- Cebecioğlu, E. (2010). *Avârifü'l- Ma'arif*. E. Cebecioğlu içinde, Tasavvuf Klasikleri (s. 223-250). İstanbul: Erkam Yayınları.
- \_\_\_\_\_, E. (2010). *Tasavvuf Terimleri Ve Deyimleri Sözlüğü*. İstanbul: Anka Yayınları.
- Cizîrî, M. E. (2012). *Dîwan*, Werger Osman Tunç. Ankara: Kültür ve Tûrizm Bakanlığı.
- Çağlayan, M. (1996). *Şark Uleması*. İstanbul: Çağlayan Yayınları.
- Çakar, M.S. & F. I. (2010). *Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*. İstanbul: Tarih Vakfı.
- Çakır, M. S. (2017). *Şeyh Abdurrahman-ı Tâgî ve NorşinTekkesi'nden Yayılan Kollar*. İhya Uluslararası İslam Araştırmaları Dergisi, c.3, s. 2, Güz 2017 26-53.
- Çantay, H. B. (1996). *Kur'ân-ı Hakîm ve Meâl-i Kerîm, Tefsirli Meal*. İstanbul: Risale Yayınları.
- Çatak, A. (2012). *Şihâbeddin Sühreverdi, Hayatı Eserleri ve Tasavvuf Anlayışı*. Ankara: Afşar Matbaası.
- Çift, S. (2010). *Hatmu'l-Evliyâ*. E. Cebecioğlu içinde, Tasavvuf Klasikleri (s. 23-54). İstanbul: Erkam Yayınları.
- Durgunay, B. (2013). *Seküler Hayatla Tasavvuf Arasındaki İlişkide Köprü Metinler: Sâkînâmeler*, Yüksek Lisans Tezî. Ankara: İhsan Doğramacı Bilkent Üniversitesi, Ekonomi ve Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Edebiyatı Bölümü.
- El Kelimati'l Qudsiyyetî Li's Sadati'n Neqşebendiyyetî, Nakşibendi Şeyhlerinin Mukaddes sözleri*. (1983). Tercüme: Salih Uçan, İstanbul: Huzur Yayınevi.
- Eraydın, S. (2014). *Tasavvuf ve tarikatlar*. İstanbul: Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Vakfı yayınları.

Ergül, N. (2015). İnsan-ı Kâmil – Güzel Ahlak İlişkisi. The Journal of Academic Social Science Studies , 259-270..

Fayda, M. *Ebû Bekir*. DİA, c.10.

Fığlalı, E. R. *Ali*. DİA, c. 2.

Gazâlî, E. H. (1973). *İhyâu 'Ulûmi'd-Dîn*, Tercüme, Ahmet Serdaroğlu. İstanbul: Bedir yayınevi.

Göktaş, V. (2008). *Kelâbâzî'nin Et-ta'arruf Li-mezhebi Ehli't-tasavvuf Adlı Eserinin Şerhleri ve Şârihleri*. Hitit Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, 2008/2, c. 7, sayı: 14 , 129-146.

Gürer, D. (2010). *Fusûsu'l-Hikem*. E. Cebecioğlu içinde, Tasavvuf Klasikleri (s. 251-308). İstanbul: Erkam Yayınları.

Hânî, M. B. (1976). *Büyük Sürür, Âdâb*, Tercüme, Abdülkâdir Akçiçek. İstanbul: Gonca Yayınları.

Hatipoğlu, İ. *Selmân-ı Fârisî*. DİA, c. 36.

Kadri, A. (1994). *Risâle-i Behâiyye, Tarikat-ı Nakşibendiyye*, Çeviren Rahmi Serin. İstanbul: Pamuk Yayınları.

Kanar, M. (2011). *Farsça-Türkçe Sözlük*. İstanbul: Say Yayınları.

Kavak, A. (2016). , *Hakkâri'den Yükselen İlim ve Tasavvuf Güneşi, Seyyid Taha-i Nehri, Hayatı, Tasavvufî Yönü ve Tesirleri*. Van: Daka.

\_\_\_\_\_, A. (2013). *Hâlidiyye Medreselerinin Anadolu'daki İlmî ve Kültürel Hayata katkıları*, Bingöl Üniversitesi Medrese ve İlahiyat Kavşağında İslamî İlimler Uluslar arası Sempozyumu-2012. Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yayınları.

\_\_\_\_\_, A. (2015). *Melayê Cizîrî ve Tasavvufî Kürt Edebiyatının Gelişim Dönem*. Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Yıl: 1, Cilt 1, Sayı 2, Kasım 2015.

Konevi, S. (Tarihsiz). *Tasavvufta 40 Hadis*, Tercüme Harun Ünal. İstanbul: İhvan Neşriyat.

Kübrâ, N. (2010). *Fevâihu'l Cemal ve Fevâtihu'l Celal*. çeviren, İsmail Hakkı Altuntaş. İstanbul.

Küçük, S. (2010). *İhyâu Ulûmi'd Dîn*. E. Cebecioğlu içinde, Tasavvuf Klasikleri (s. 159-178). İstanbul: Erkam Yayınları.

Kuşeyrî, E. I. K. (1978). *Tasavvufun İlkeleri (Risale-i Kuşeyrî)*, Çeviren Tahsin Yazıcı. İstanbul: Tercüman Yayınları.

Muslu, R. (2010). *Kütü'l-Kulûb*. E. Cebecioğlu içinde, Tasavvuf Klasikleri (s. 71-88). İstanbul: Erkam Yayınları.

Mualı, S. (2015). *Arapa - Trke Szlk*. İstanbul: Dağarcık yayınları.

Nevevi, E. Y. (2013). *Minhac'üt Talibin (Arapa-Trke tam Metin) tercme, Abdulhalik Duram -Mithat Acat*. Diyarbakır: Seyda Kitapevi.

Nursî, B. S. (1994), *Mektûbat*. İstanbul: Szler Yayınevi.

\_\_\_\_\_, B. S. (1987), *Barla Lahikası*. İstanbul: Szler Yayınevi

Özaydın, M. (2008). *Şeyh Abdurrahman Aktepe, Hayatı Eserleri ve Tasavvufî Görüşleri*, Doktora Tezi. Ankara: Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, İslam Bilimleri (Tasavvuf), Anabilim Dalı.

Saygın, M. (2016). *Usûlî Divanı'nda Din Tasavvuf ve Cemiyet*, Yüksek Lisans Tezi. Denizli: Pamukkale Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Eski Türk Edebiyatı Programı.

Sönmez, N. (2015). *Hâfız-ı Şîrâzî – Melayê Cizîrî Karşılaştırması (aşk, gül, bülbül, rinde, züht ve dini semboller açısından)*. Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi , 137-149.

Söylemez, İ. (2013). *Seyfullâh Nizâmiođlu Dîvânı*. Yüksek Lisans Tezi. Malatya: İnönü Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili Ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı, Eski Türk Edebiyatı Bilim Dalı.

Şukun, Z. (1984). *Farsa-Trke Lgat, Gencinei Güftar, Ferhengi Ziya*. İstanbul: Milli Eğitim Bakanlığı Basımevi.

Tan, N. (2016). *Gulşen-i Vahdet te Seyr u Sülük Alegorisi Olarak Yüz*. Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi, Cilt: 9 Sayı: 42 , 365-378.

Tanyıldız, A. (2009). *Sevgilide güzellik Unsuru Olarak Sa*. Turkish Studies, International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic , 975-992.

Tenik, A. (2007). *Ahmed Kuddûsî ve Tasavvuf Düşüncesi*. Doktora Tezi. Ankara: Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Temel İslâm Bilimleri, Tasavvuf Anabilim Dalı.

\_\_\_\_\_, A. (2015). *Tarihsel Sürete Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*. İstanbul: Nûbihar.

Topbaş, O. N. (2014). *İmândan İhsâna Tasavvuf*. İstanbul: Erkam Yayınları.

Ulucan, m. (2009). *Niyâzî-i Mısri'nin Şiirlerinde Varlık Anlayışı*. Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Cilt: 19, Sayı: 1 , 31-41.

Uludağ, S. *Arif Rîvegerî*. DİA, c. 3.

\_\_\_\_\_, S. (2016). *Tasavvuf terimleri Szlüğü*. İstanbul: Kabalcı.



Yalar, M. (2013). *Seyda, Mela ve Feqilerin Bölgenin Dini ve Kültürel Hayatındaki Yeri*. Muş: Seyda, Mela ve Feqilerin Bölgeni Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler Sempozyomu, Muş Alparslan Üniversitesi, İlahiyat Fakültesi yayınları.

Yıldırım, K. (2014). *Ehmedê Xanî Kulliyatı IV, Dîwan*. İstanbul: Avesta.

\_\_\_\_\_, K. (2008). *Ehmedê Xanî Kulliyatı, 'Eqîdeya İmanê*. İstanbul: Avesta.

\_\_\_\_\_, K. (2011). *Ehmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*. Ağrı: Ağrı Kültür ve yardımlaşma Derneği.

Yılmaz, H. K. (2004). *Anahatlarıyla Tasavvuf ve Tarikatlar*. İstanbul: Ensar Neşriyat, 10. Baskı.

Yüce, A. (2010). El-Lüma. E. Cebecioğlu içinde, *Tasavvuf Klasikleri* (s. 55-70). İstanbul: Erkam Yayınları.

## Çavkaniyên Farsî

ابوالقاسمی، سیده مریم، *تأملی بر ساقینامه حکیم فغفور گیلانی*، پژوهشنامه علوم انسانی: شماره ۵۴، تابستان ۱۳۸۶.  
اسلامی، فاطمه، *مقامات و احوال*، آفتاب اسرار فصلنامه فرهنگی هنری (عرفانی)، سال دوم، بهار ۱۳۸۷، شماره ۵.  
العبادی، ابوالمظفر منصور بن اردشیر، (۱۳۴۷)، *صوفی نامه التصفیة فی احوال المتصوفة*، به تصحیح: دکتر غلامحسین یوسفی، بنیاد فرهنگ ایران، تهران.

المیبدی، ابو الفضل رشید الدین، (۱۳۸۲)، *کشف الأسرار و عدة الابرار*، به سعی و اهتمام: علی أصغر حکمت، انتشارات امیر کبیر، چاپ هفتم، تهران  
بخارایی، احمد علی رجایی، (۱۳۷۵)، *فرهنگ اشعار حافظ*، انتشارات علمی، چاپ هفتم، تهران.

برزگر خالقی، محمد رضا & تبریزی، رقیه نیساری، *بررسی مضامین مشترک ساقی نامه های ابن فارض و فضولی بغدادی*، لسان مبین (پژوهش ادب عرب)، اسفند ۱۳۸۹، دوره ۲، شماره ۲.

بهنام فر، محمد & رستمی، صدیقه، *مقام و مرتبه دل در مثنوی*، دو فصلنامه علمی- تخصصی علامه، سال دهم شماره پیاپی ۲۶ بهار و تابستان ۸۹

بیدگل، جمیله اعظمیان، *جام در ادبیات فارسی و پیشینه آن*، فصلنامه علمی پژوهشی ادبیات عرفانی و اسطوره شناختی (زبان و ادبیات فارسی)، زمستان ۱۳۸۸، دوره ۵، شماره ۱۷.

پارسا، سید احمد & مظهری، محمد آزاد، *ساقی نامه ها نزدیک ترین نوع ادبی به رباعیات خیام*، ادب پژوهی گیلان سال چهارم بهار ۱۳۸۹ شماره ۱۱.

\_\_\_\_ سید احمد & مظهری، محمد آزاد، *ساقی نامه نظامی گنجه ای و تعداد واقعی ابیات آن*، فصلنامه زبان و ادب فارسی دانشگاه آزاد اسلامی واحد سنندج، بهار ۱۳۸۹، دوره ۱، شماره ۲.

تسکین دوست، محمد تقی، *مدار سیر و سلوک عرفانی حافظ*

(ceia.iust.ac.ir/files/islamicar/Doc/taskin\_doost/madare\_hafez.pdf) (Gihaştın:09.09.2017)

جامی، نورالدین عبد الرحمان، (۱۳۷۴)، *نفحات الانس من حضرات القدس*، به تصحیح: محمود عابدی، اطلاعات، تهران

جباری، مهدی & طهماسبی، فرهاد، *بررسی آداب صحبت و خلوت در تصوف*، فصلنامه تخصصی عرفان اسلامی سال یازدهم شماره ۴۳ بهار ۹۴

حسینی کازرونی، سیداحمد، تبیین حقایق عرفانی و معرفت‌شناسی در ساقی‌نامه‌های ادبی، مطالعات ادبیات تطبیقی (ادبیات تطبیقی): ۱۳۸۶، دوره ۱، شماره ۲.

دامادی، محمد، (۱۳۶۷)، شرح بر مقامات اربعین یا مبانی سیر و سلوک عرفانی، دانشگاه تهران، تهران.

دهقان، علی & حدیدی، خلیل & احمدی، موسی، بررسی تصوف عابدانه و عرفان عاشقانه در غزلیات حافظ، فصلنامه ادبیات عرفانی و اسطوره‌شناختی، س ۱۰، ش ۳۷ زمستان ۹۳.

دیوسالار، فرهاد، تمثیل صفای می و لطافت جام، دانشگاه آزاد اسلامی، واحد کرج فصلنامه تخصصی عرفان، سال پنجم، شماره ۱۹، بهار، از صفحه ۱۲۷ تا صفحه ۱۴۹، زنجان.

راستگو، سید محمد & راستگوفر، سید محمدفرید، جمال جلال و جلال جمال، مطالعات عرفانی (مجله علمی پژوهشی)، دانشکده علوم انسانی دانشگاه کاشان، شماره دهم، پاییز و زمستان ۸۸.

ریاضی، حشمت‌الله، (۱۳۸۱)، آیات حسن و عشق، همراه با شرح زندگانی و آثار شیخ احمد غزالی، به کوشش: اکرم شفاغی، جلد اول، حقیقت، تهران  
زرین کوب، عبدالحسین، (۱۳۴۴)، رزق مرآت صوفیه، انتشارات آریا، تهران.

سجادی، سید جعفر، (۱۳۸۳)، فرهنگ اصطلاحات و تعبیرات عرفانی، انتشارات طهوری، چاپ هفتم، تهران

سنائی غزنوی، ابوالمجد مجدود بن آدم، حقیقه الحقیقه و شریعه الطریقه، به کوشش: دکتر علی محمد صابری، رقیه تیموریان و بهزاد سعیدی.

سهروردی، شهاب‌الدین، عوارف المعارف، (Gihāštīn:09.09.2017) ([http://www.sufism.ir/MysticalBooks\(52\).php](http://www.sufism.ir/MysticalBooks(52).php))

شجاری، مرتضی، & گوزلی، زهرا، دل آدمی و مراتب آن در عرفان اسلامی، ادبیات عرفانی و اسطوره‌شناختی (زبان و ادبیات فارسی): زمستان ۱۳۹۲، دوره ۹، شماره ۳۳.

شبستری، شیخ محمود، (۱۳۸۱)، مراتب العارفين، مقدمه و تصحیح و توضیحات صمد موحد، طهوری، تهران.

شفیعیان، زهرا، بررسی و تحلیل ساقینامه‌های ادب فارسی (بر اساس پنج شاعر برجسته)، (۱۳۹۲)، پایان‌نامه‌ی کارشناسی ارشد رشته‌ی زبان و ادبیات فارسی، دانشگاه شهرکرد دانشکده ادبیات و علوم انسانی گروه زبان و ادبیات فارسی، شهرکرد.

شیرازی، روزبهان بقلی، (۱۹۸۱)، شرح شطحیات، به تصحیح و مقدمه: از هنری کربن، طهوری، تهران

\_\_\_\_\_، روزبهان بقلی، (۱۹۵۸)، عبهر العاشقین، قسمت ایران شناسی انستیتو ایران و فرانسه، تهران

شیرازی، شمس‌الدین محمد، (۱۳۹۱)، دوان حافظ، دفتر نشر معارف، چاپ سوم، قم

صدری، جهشید & صمدی، قسمتعلی، تاثیر تصوف و عرفان بر شعر و شاعری، فصلنامه تخصص ادبیات فارسی دانشگاه آزاد مشهد تابستان ۱۳۸۸، دوره ۵، شماره ۲۲.

صیادکوه، اکبر & رحمانیان، علی، بیوند «زلف» و «دل» و کارکردهای هنری آن در دیوان حافظ، مجله‌ی شعر پژوهی (بوستان ادب و علوم اجتماعی و انسانی) دانشگاه شیراز، تابستان ۱۳۹۲، دوره ۵، شماره ۲ (پیاپی ۱۶).

طریقی، عبدالحسین، تجلی در عرفان اسلامی، فصلنامه تخصصی عرفان، سال چهارم، شماره ۱۶، تابستان ۸۷

طوسی، شیخ احمد غزالی، سوانح، (Gihāštīn:09.09.2017) ([http://www.sufism.ir/MysticalBooks\(19\).php](http://www.sufism.ir/MysticalBooks(19).php))

عراقی، فخرالدین ابراهیم، رساله اصطلاحات، (Gihāštīn:09.09.2017) ([http://www.sufism.ir/MysticalBooks\(23\).php](http://www.sufism.ir/MysticalBooks(23).php))

عفت، نقایی، جایگاه دل در مثنوی، زبان و ادبیات فارسی (مجله دانشکده ادبیات و علوم انسانی دانشگاه خوارزمی): پاییز ۱۳۸۷، دوره ۱۶، شماره ۶۲ (۸).

عمید، حسن، (۱۳۸۹)، فرهنگ فارسی عمید، انتشارات راه رشد، تهران.

عین القضاة عبدالله بن محمد، تمهیدات، (http://www.sufism.ir/MysticalBooks(37).php) (Gihaştin:09.09.2017)

قلی زاده، حیدر & خوش سلیقه، محبوبه، «باده» و «می» و تعابیر آن در شعر عرفانی فارسی، فصلنامه تخصصی عرفان، سال ششم، شماره ۲۳، بهار ۸۹.

قلی زاده، حیدر، زلف و تعابیر عارفانه و عاشقانه آن در شعر فارسی، نشریه دانشکده ادبیات و علوم انسانی (تبریز): پاییز ۱۳۸۳، دوره ۴۷، شماره ۹۲. کدکی، محمد رضا شفیعی، (۱۳۹۲)، زبان شعر در نثر صوفیه، انتشارات سخن، تهران.

کهدویی، محمدکاظم، نگاهی به خال هندوی حافظ، مجله دانشکده ادبیات و علوم انسانی دانشگاه تهران، تابستان و پاییز ۱۳۸۳، دوره ۵۵، شماره ۱۷۰، ۱۷۱.

کاشانی، ملا محسن فیض، رساله مشواتی، (http://www.sufism.ir/MysticalBooks(56).php) (Gihaştin:09.09.2017) کریم آباد، داود حسن زاده، مراتب قرب در عرفان اسلامی، دو فصلنامه حکمت عرفانی، سال اول، شماره چهارم، پاییز و زمستان ۱۳۹۱،

گوهرین، سید صادق، (۱۳۷۶) شرح اصطلاحات تصوف، زوار، چاپ دوم، تهران.

لاهوری، عبدالرحمان ختمی، (۱۳۷۱)، شرح عرفانی غزلیهای حافظ، تصحیح و تعلیقات: بهالدین خرمشاهی، کورش منصوری، حسین مطیعی امین: مجلد سوم؛ چاپ چهارم، نشر قطره، تهران.

لاهیجی، شمس الدین محمد، (۱۳۸۱)، مفاتیح الاعجاز فی شرح گلشن راز، مقدمه، تصحیح و تعلیقات محمد رضا بزرگی خالقی و عفت کرباسی، چاپ چهارم، انتشارات زوار، تهران.

محمدزاده، سیدناذر، قلب در عرفان اسلامی، عرفان اسلامی (ادیان و عرفان)، زمستان ۱۳۹۲، دوره ۱۰، شماره ۳۸؛ از صفحه ۱۳ تا صفحه ۳۴، دانشگاه آزاد اسلامی، واحد زنجان، گروه ادیان و عرفان، زنجان، ایران.

مشرف الملک، مریم، زمینه شناسی ادبیات خمیری و جلوهای آن در شعر عربی و فارسی، کهن نامه ادب پارسی، پژوهشگاه علوم انسانی و مطالعات فرهنگی، سال سوم، شماره دوم، پاییز و زمستان ۱۳۹۱.

معین، محمد، (۱۳۸۱)، فرهنگ معین، انتشارات ادنا، چاپ چهارم، تهران

مولانا، جلال الدین محمد بلخی، (۱۳۸۲)، مثنوی معنوی، دفتر ششم، بهناسبیت عید سعیدغدیر، چاپ حکمت، قم.

میرباقری فرد، علی اصغر & محمدی، معصومه، عبارت و اشارت در زبان عرفانی، پژوهش نامه عرفان: ۱۳۹۵، دو فصلنامه، شماره ۱۵.

نژاد، مریم زیبایی، مقایسه تطبیقی اصطلاح زلف در اصطلاحنامه های عرفانی، فصلنامه تخصصی عرفان، پاییز ۱۳۸۹، دوره ۷، شماره ۲۵.

نسفی، عزیزالدین، انسان کامل، (http://www.sufism.ir/MysticalBooks(57).php) (Gihaştin:09.09.2017)

\_\_\_\_، عزیزالدین، بیان تنزیل، (http://www.sufism.ir/MysticalBooks(57).php) (Gihaştin:09.09.2017)

\_\_\_\_، عزیزالدین، کشف الحقایق، (http://www.sufism.ir/MysticalBooks(57).php) (Gihaştin:09.09.2017)

نکونام، محمدرضا، (۱۳۸۶)، عرفان و مقامات؛ شرح و نقد دو نمط نهم و دهم کتاب «الاشارات و التنبیها» ، ظهور شفق، قم، ایران.

نوربخش، جواد، (۱۳۶۶)، فرهنگ نوربخش: اصطلاحات تصوف (جلد اول و دوم)، انتشارات خانقاه نعمت الهی، تهران.

نوری، رضا حیدری & خاتمی، احمد، سیر تحول فکر نظامی در ساقی نامه، پژوهشنامه فرهنگ و ادب، شماره سیزدهم، سال هشتم، بهار و تابستان ۱۳۹۱.

نوش آبادی، محمد مشهدی، نخستین تبیین احوال و مقامات عرفانی در مناجات «حَمْسَ عَشْرَه»، مطالعات عرفانی (مجله علمی پژوهشی)، دانشکده ادبیات و زبانهای خارجی دانشگاه کاشان، ۲۴۰ شماره بیست و دوم، پاییز و زمستان ۹۴.

(Gihaştin:09.09.2017) ([http://www.sufism.ir/MysticalBooks\(53\).php](http://www.sufism.ir/MysticalBooks(53).php)) , كشف المحجوب ، على بن عثمان ، هجويرى ،

## Çavkaniyên Înternetê

[www.vajehyab.com](http://www.vajehyab.com)

